## DAHÛRÎNÊN RÊBERTÎ YÊN DI NAVBERA SALÊN 91-92-93 AN DE BI ROJNEMEVANÊN BIYANÎ RE HATIYE KIRINE

**Amadekirina Pirtûkê:** Komîteya Ziman û Perwerdeya **KCK**'ê

**Dîroka Çapê:** Tîrmeh, 2014

**Cihê Çapê:** Çapxaneya Azadî

**NAVEROK**

TÊBÎNÎ: ........................................................................................ 7

HEVPEYVÎNA ROJNAMEVANÊ HOLANDÎ VOLKSZEİTUNG YA BI RÊBER APO RE ........................................................................................ 8

HEVPEYVINÊN ROJNEMEVANÊN FRANSI YÊN BI RÊBERTÎ RE .................... 43

HEVPEYVÎNA BI ROJNEMEVANÊN ÎTALÎ Û FRANSÎ RE ................................ 75

HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA  BI ROJNEMEVANÊN FRANSÎ RE ........................ 94

HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA BI ROJNEMEVANÊN ÎSVEÇ RE KIRÎ .................. 100

GUFTÛGOYÊN BI ÇAPEMENIYA BIYANÎ RE............................................. 127

HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA BI CIVATA .................................................... 162

YUNAN RE LI SER ŞAGIRTÊN AKADEMIYÊ KIRINE.................................... 162

HEVPEYVÎNA BERIYA ÎLANKIRINA ŞERÊ GIŞTÎ ........................................ 168

3-7/06/1993........................................................................................ 168

HEVEYVÎNA MUHABÎRÊN ALMAN YÊN ROJNAMEYA DER SPİEGEL DI ROJA 03.06.1993’AN DE BI RÊBERTÎ RE DAYÎN ÇÊKIRIN .................................. 168

AXAVTINA RÊBERTÎ BI BBC’YÊ RE.......................................................... 205

RÊBERTIYA PARTIYÊ BI WESÎLEYA SALVEGERA DEHEMÎN DAXWUYANIYA KU DAYE BBC’YÊ.................................................................................... 218

MUHABÎRÊ ROJNAMEYA CUMHURIYETÊ ORAL ÇALIŞLAR:: ROPORTAJA KU BI RÊBERTIYA PARTIYÊ RE KIRIYE ........................................................ 228

HEVPEYVÎNA LI GEL ROJNAMEVANÊN CUMHURÎYET Û HÛRIYETÊ .........332

HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA LI GEL MUHABÎRÊ ROJNAMEYA HURIYETÊ .....371

## TÊBÎNÎ:

**HEVALÊN HÊJA; EV PIRTÛK JI DAHÛRÎNÊN RÊBERTÎ YÊN DI NAVBERA SALÊN 91,92 Û 93'AN DE HATINE BERHEFKIRIN. HEYA KU JI DESTÊ ME HAT, ME DEST NEDA RESENIYA NAVAROKA HEVPEYVÎNAN. TENÊ ME JI DÊLA SEROK, "RÊBERTÎ" BIKAR ANIYE. LÊ DI HINEK HEVPEYVÎNÊN TIRKÎ DE HEVOK ŞIKESTÎ Û KÊM HATIBÛN NIVÎSANDIN. HEYA JI DEST ME HAT ME HEWL DA KU BI AWAYÊ KU BÊ FÊMKIRIN WERGERÎNIN.**

**JI NIHA DE DI DERBARÊ KÊMASIYÊN HEYÎ DE EM LÊBORÎNA XWE DIXWAZIN.**

**Silav û Rêzên Şoreşgerî**
**KOMÎTEYA ZIMAN Û PERWERDÊ YA KCK'Ê**

# HEVPEYVÎNA ROJNAMEVANÊ HOLANDÎ VOLKSZEİTUNG YA BI RÊBER APO RE

**Volkszeitung:** Di rewşa heyî de dewleta Tirk artêşeke nêzî 600.000 li Kurdistanê bi cih kiriye. Artêşa Tirk ji xeynî vê jî, bi şerê modern yê teçhîzatê ve hatiye arastin kirin. Li hemberî vê heke hêza PKK'ê ya gerîla deh hezarî hebe, wê li hember artêşa Tirk bibe mijara serkeftina leşkerî? Ger hûn dibêjin wê bibe hûn ê çawa bigihin wê?

---: Em ji destwerdanên leşkeri zêdetir bi riya îdeolojîk, siyasî û heta bi têkoşîna çandî ve pêşketinê bi dest dixin. Têkoşîna leşkerî weke destpêkeke bingehîn a têkoşînan derdikeve holê. Lewre hem bi hêjmara deh hezar gerîla ve û hem jî ji hêla leşkerî ve, li hember vê hêza mezin a mêtîngeh em hema ne li benda serkeftinê ne. Lê yê ku ji hêla leşkerî ve jî serkeftin nîşan daye em in. Me ji sifrê dest pê kir û li gorî wê em gihiştine vê serkeftinê, jixwe diyar dike ka kî gihiştiye serkeftinê.

**Volkszeitung:** Yanê hûn dibêjin wê 10.000 gerîla li hember hêzeke leşkerî ya 600.000 serkeftî be?

---.: Na! Em ne li benda serkeftineke hêsan in. Lê em dikarin hêza xwe ya leşkerî xurtir bikin. Hedefa me ya îsal, heta havînê çêkirina 10.000 gerîla ye. Emê di dema pêş de ji vê hêjmarê zêdetir

jî hedef dikin.

**Volkszeitung:** Çi qas?

---.: Heya 50.000'î. Heta di yek-du salên pêşiya me de bi mîlîsan re em dikarin heya 100.000'î bibin.

Volkszeitung: Ji bo serkeftinê, wê ev bes be?

---.: Em tenê ji hêla leşkerî ve serkeftinê bidest naxin. Aliyê têkoşîna me ya herî zêde siyasî ye. Dema ku ev bi têkoşîna leşkerî re bibe yek, em ê bikaribin serbikevin.

**Volkszeitung:** Hûn serkeftina polîtîk çawa fêm dikin, hûn vê weke dawiya kemalîzmê dinirxînin.

---.: Hê ji niha ve hêza dewletê ya siyasî ber bi wundahiyê ve diçe. Hemû rêxistinên kemalîzmê yên hatin û çûyîn hemû heliyan e. Bi rastî jî pêşketina gel ya siyasî ji bo serkeftinê ji parastina çek bi bandortir e.

**Volkszeitung:** We da diyarkirin ku wê di navbera salek, du salan de hêza leşkerî biçe 100.000'î. Piştî ev navenda leşkerî zêde bû û şûnde wê di têkoşîna leşkerî de pêşkeftinên bi çi rengî çêbibin?

---.: Xwedî bandoreke yekgirtî ye. Têkoşîna min a leşkerî û siyasî vê dide diyarkirin. Heke yek çênebû, lewre ya din pêşkeftinê bi dest naxe. Ger bi sedema dewleta Tirk têkoşîna min a leşkerî nebûya, wê di demeke kurt de hemû destkeftiyên siyasî ji holê rabûbûya.

**Volkszeitung:** Em dikarin wiha fêm bikin: Hêzeke zêde

leşkerî, hêzeke zêdetir destkeftiyên siyasî.

---.: Li gor pêşkeftinên heyî wisa dibe.

**Volkszeitung:** Hûn dibêjin divê: “Kurdistanî dê ji niha û şûnde her roj Newrozê bijîn.” Wê ev bibe weke întîfaya (raperîna) ku Filistînê li hember Îsraîlan kirî? Yanê hûn li Kurdistanê her tim û her roj li benda întîfayê ne?

---.: Jixwe heye û tê hesepkirin. Ji ber zextên dewleta Tirk zêdebûn, derfetên pêşxistina wê zêde çênebû.

**Volkszeitung:** Lê piştî întîfaya li Cizîr û Şirnexê bêdengiyek heye. Wê ev întîfade her roj bên jiyîn?

---.: Tabîkî wê di bin dorpêçkirina tang û topan de bêdengî hebe, lê divê bivê neyên xapandin.

Volkszeitung: Bi gasî ku em dibinin, întîfaya li Şirnax û Cizîrê cihê xwe ji bêdengiyêye re hêla. Lê întîfaya li Filistinê jî her roj didome.

---.: Bi zexta zêde pêşketineke biçûk, bi teroreke zêde bêdengkirin. Terora Tirkiyê gelek ji terora Îsraîlê tundretîr e. Ji ber vê dibe ku bêdengiyeke demî be.

**Volkszeitung**: Hûn dikarin bajarê Kurdistanê yê ku niha întîfa lêye, mînak bidin?

---.: Li Sîlvanê heye. Îro radyo qal dikir. Heye yanê. Ne kêmî Fîlîstînê ye.

**Volkszeitung:** Em carek din dixwazin li ser peyva întîfayê bisekinin. Tişta ku me li Şirnax û Cizîrê dît meşek bû. Lê tişta em ji întîfayê fêm dikin cudatir e. Gotina întîfayê li hember vê rewşê hinek piroleye, ne wisa?

---.: Piştî bi tangan êrîşkirin û şûnde ev meş di bin întîfayê de ye.

Volkszeitung: Li gor we wateya helwesta hukûmetê çî ye?

---.: Di desthilatiya Tirk de ev her wisa ye û rêbazeke hovîtî ye. Ev hukûmet weke ku layîqê bav û kalên xwe derbikevin rêbazên hovane bi kar tînin. Bi vê rêbazî dema dîtin gelên din kirin bin venêrîna xwe dihesibandin ku wê Kurdan jî bi vî rengî bixin bin venêrîna xwe.

**Volkszeitung:** We di daxwiyaniyeke xwe yê sala borî de gotibû ku; “ bi dewleta Tirk re diyalog guncav e.” Wê armanc û hedefa vê hevdîtinê çi bibe?

---.: Dema ku em dibêjin gengaz e, min negotiye di wateya ku dê milê dijber jî, xwe nêz bike de ne. Me her tim gotiye ku em ji dîyalogo re vekirîne.

**Volkszeitung:** Belê ger ku milê dijber jî ji vê re vekirîba we yê li ser çi guftûgo bikiriba?

---.: Me yê hewl bidabûya ku têkiliyên Tirk û Kurd di her qadê de sarerast bikiriba.

**Volkszeitung:** We yê di van axiftin û guftûgoyan de qala

çareseriya federalî jî bikiriba?

---.: Me yê baxiviya.

Volkszeitung: Ma piştî komkujiya dawî ya ku li Şirnax û Cizîrê çêbûyî, hûn ji hevpeyvîneke bi vî rengî re amade ne?

---.: Ev rêgezeke me ya bingehîn e, lewre ji bo her demê jî derbasdar e. Ger ku aliyê dijber nêzakatiyek demokratîk esas bigire, em her tim amade ne. Yanê yê ku nêzî çareseriya siyasî nabe komara Tirkiyê ye. Pîrsgirêkê qebûl nake. Heta xweseriyê jî qebûl nake. Heta dibêjin ku ev “950 salin me xistine dest xwe.” Bi vî rengî nêz dibin. Rastiya Kurdistanê qebûl nakin.

**Volkszeitung:** Ma serxwebûn ne armanca PKK’ê ya bingehîn e?

---.: Serxwebûn armanca her kesî ye. Ger gelên roja me ya îro serxwebûnê nefikirin, nikarin bijîn. Weke her gelekî, gele me jî serxwebûnê difikire û hewl dide ku bijî. Lê ev nayê wê wateyê ku ev qonaxên navber federe û federesyonan jiyan nake, ev jê re ne astenge jî.

**Volkszeitung:** Piştî ku hûn gihiştin çareseriyeke federe, ma wê şerê çekdarî hîn bidome?

---.: Bêguman, ger rêbazên siyasî bikevin dewrê wê çek rawestin.

Volkszeitung: Baş e, armanca têkoşîna siyasî ya bingehîn çiye?

---.: Li ser bingihê ku bi gelên din re wekhev û azad bijîn, wê ji serxwebûnê re jî vekirîbin.

**Volkszeitung:** Yanê hûn ji çareseriyeke federatîf re dibêjin erê. Ma wê rewşa artêş, polis û dibistanan çawa be? Ma ev hemû neçarin ku Kurd bin û bi Kurdî bin?

---.: Bêguman wê saziyên netewî çêbin. Wê parlemantoya netewî, yêkîneyên parastina netewî, yêkîneyên mihafiz, saziyên çandê yên netewî û hukûmeta netewî çêbe. Ancax em ê li ser vê bingehê ji çareseriya federalî re bibêjin erê.

Volkszeitung: Ev tê wê wateyê ku wê artêşa Kurdistanê ya serbixwe çêbe.

---.: Ji bo her gelekê hêzên parastinê pêwîst e.

Volkszeitung: Ma ev tiştên ku hûn dibêjin, ne serxwebûn e?

---.: Bêguman em li ser bingêhê serxwebûnê, federalîzmê difikirin.

**Volkszeitung:** Ma wê ji bo gelê Tirk yê ku li kurdistanê dijîn mafeke hebe?

---.: Weke ku dixwazin dikarin jiyana xwe bi rêk û pêk bikin.

**Volkszeitung:** Gelo, ma wê ev rewşeke weke Yugoslavya nede jiyankirin?

---.: Li pêşiya vê girtin û girêdayî vê ye ku her kes mafê xwe bi awayeke azad bi kar bîne ye.

Volkszeitung: Baş e, wê demê dê Kurdên li Kurdistanê bikaribin biçin dibistanên Kurdî?

---.: Bêguman…

Volkszeitung: Li Tirkiyê di rewşa heyî de berpirsiyarî di destê artêşê de ye ango di destê hukûmet ê de ye? Di vê mijarê de nerînên we çi ne?

---.: Bêguman ev zelal e, desthilatdarî di destê artêşê de ye. Hukûmet maske ye. Pela dara mêwê ye. Ji bo şerma xwe veşêre amûrek e. Di pergala Tirkiyê de artêş her tim hêza bingehîn e.

**Volkszeitung:** Hûn li ser çi bingehê ewqas jixwe bawer daxivin?

---.: Hemû siyasetmedar ji hêla saziya ewlehiya bilind ve tên diyarkirin. Biryarên ku ji vir tên girtin weke fermanek, hukûmet û parlementoyê girê dide. Ev tim wisa bûye.

Volkszeitung: Di vê rewşê de pirsek wiha derdikeve holê. Madem ku berpirsiyarî di deste artêşê de ye hûn çima hewl didin bi hukûmetê re hevdîtinan çêbikin? Ma hûn ê bi hevdîtinên hukûmetê re bikaribin encam bigirin?

---.: Li gorî min jî pêwîst e hevdîtinên bingehîn bi fermandarê giştî û derûdora wî re çêbibe. Hukûmet formalîte ye. Piştî ku fermandarê giştî neyê hevdîtinan, hevdîtinên ku bi hukûmetê re bibin jî zêde wateya xwe nîne.

**Volkszeitung:** Yanê hûn dibêjin ku ger Demirel destûra

artêşê negire, xwe nêzî vê nake?

---.: Ev ne gengaz e.

Volkszeitung: Beriya meşên li Cizîrê, Demîrel got; “dibe ku meş çêbibin.” Lê hema piştî du rojan daxwiyaniya ku meş hatine qedexekirin da. Li gorî we di vir de jî para MGK’yê (Saziya Ewlekariya Netewî)heye?

---.: Bêguman heye. Di vê mijarê de hukûmet gelek bê bandor e. Bi taybet di mesela Kurd de wiha ye.

**Volkszeitung**: Ez dixwazim carek din li ser mijara armanca polîtîk rawestim. Gelo armanca we bi şêwazeke sosyalîzmê ye?

---.: Armanca me û tişta herî zêde em ser disekinin, qebûlkirina rejîmeke ya mirovên hemdem e. Ne dibe weke sosyalîzma heyî, ne jî weke kapitalîzma heyî…

**Volkszeitung**: Welatên Rojava (Ewrûpa) û DYE we her tim weke Stalîn dinirxînin. Hûn vê şipandinê çawa dibînin?

---.: Mane min nasdikin?

Volkszeitung: Ji ber Tirkiye welateke NATO yê ye, we baş nasdikin.

---.: Hinek ji bo min dibêjin; “peygemberê sedsala 21’an.” Ez bawer nakim ku min dinasin.

**Volkszeitung**: Na, ew nasdikin. Ez bawer nakim ew qas bê xeber bin. Îdîaya we ya ku hûn dibêjin NATO yek ew qas mezin,

PKK’ê û serokê PKK’ê nasnake min dibehetîne(şaşırtmak).

---.: Ez bawer nakim min nasbikin. Yanê weke kes dinasin, lê rastiya keseyeta min bixwe çiye nizanin. Ancax dema ku nivîskar û fîlozofên xwe yên herî xurt rêkirin û me bi hev re nîqaşeke meşand dibe ku wê demê min fêm bikin. Mînak, di cîhanê de tişteke em bêjin ku Stalîne nemaye. Stalînizîm bi temamî xilas bûye. Herî dawî di Arnavutê de hebû, ji wir jî çû. Lê ez neçûm. Yanê weke ku fêm dikin heke Stalînizm hebûya, em ê jî ji zûde hilweşiyabûna. Lê tevî ku wan dewlet avakir jî hilweşiyan. Li vir diyar dike ku em cûreyeke cuda ne.  Di vê mijarê de DYE û Ewrûpa neçarin ku rastiyê fêm bikin.

Volkszeitung: Stalînîzm çima hilweşiya?

---.: Ji ber hinek şaşitiyên xwe…

**Volkszeitung**: Wan gelek xeta kirin. Hûn bi hilweşandina Stalînîzmê kêfxweş bûn?

---.: Tabî. Yanê heke em weke Stalîn bûbûbana ango bi temamî wisa bûbûbana em pêş nediketin. Mînak, em gihiştin asteke demokratîk ya ku kes negihîştiyê. Ev asta demokratîk ya ku em gihîştinê ne li Ewrûpa û ne jî li DYE’ê kes bidest nexistiye. Em ji wan zêdetir demokrasiya jor dijîn. Mesela Hollanda hesab dike ku demokrasiyê bi kar tîne, lê li gorî min gelek xeternak e. Hemû di bin otorîteyek de teşe girtine. Di vê qonaxê de dikarim bêjim ku demokrasiya di serokatiya PKK’ê de, demokrasiya cîhanê ya herî pêşketiye. Divê bê lêkolînkirin. Ji bo ku fêr bibin divê lêkolîn bikin. Sedema pêşketina me ya herî bingehîn ev e. Encama bidestgirtina demokrasiya herî jor e.

**Volkszeitung:** Her tişt tarîfkirinek giştî ye.

---.: Kurd gelekî mirî bû, vejîner kir. Ger demokrasî neba ango demokrasiya herî jor nebûna ma gelo wê ev gengaz bûbûya? Hemû cîhan ji Kurdan hêviya xwe şkandibûn. Ew vê ya baştir dizanin. Lê rêbazên PKK'ê yên demokratîk ev gel ji nû de zindî kir. Ne sosyalîzma pêkhatî, ne jî kaptalîzma lîberal karî gelê Kurd ji mirinê rizgar bike, berevajî dibirin mirin ê. Tenê PKK'ê karî vejîne. Ev jî çespandinek û heqîqetek e. Kê Cizîrê bêdeng kir? Bi tangên Almanên Rojava û Rojhilatê Cizîrê dorpêçkirin, hewl dan ku demokrasiyê bikujin. Lê serneketin. Yanê ew tang çi didin diyarkirin. Demokratîkbûyîna me û antî demokratîkbûyîna Almanan. Yanê dibe ku tang û demokrasî wekhev bin? Lê yê me, em bêjîn gel tenê darek yê wan jî tine bû. Ev dide nîşandin ku di me de demokrasiya rast heye, ne di Almanan de.

Volkszeitung: We qala rêyek sêyemin kir. PKK rêxistineke Marksîst-Lenînîst e.  Baş e, Marksîzm-Lenînîzm li gel we xwe çawa dide nîşan?

---.: Ez dikarim bêjim ku demokrasiya herî pêşketî. Tabî ev jî li gorî me sosyalizm e.

**Volkszeitung**:  Lê mirovan vê li Yekîtiya Sovyet, Arnavutê û li Romanya yê jî gotin.

---.: Na, em bi temamî ji wan cudatir in. Netewîperest,ew bi temamî netewîperest in. Em hûmanîst in.

**Volkszeitung:** Ger em carek din vegerin Stalîn, we got xeta kiriye, hûn dikarin di vê mijarê de çend mînakan bidin?

---.: Vekirîbûnê dîqat nekir. Rêgeza vekirîbûnê dîqat nekir. Nerînên xwe bi otorîteyê hewl da ku bixe bin venerîna xwe. Di encam de rewşeke wisa derket holê. Ne mirov, dewlet bixwe bihêz kir. Em bi temamî berevajiyê vê pêk tînin. Em ne dewletê, mirovan bihêz dikin. Ne otorite, em azadiyê xurt dikin. Heta li Ewrûpayê jî dewlet ji mirov bihêztir e. Otorite ji azadiyê xurtir e. Di PKK'ê de berevajî vê mijara gotinê ye.

**Volkszeitung:** Mabesta we welatên kaptalîst yên li Ewrûpayê ne?

---.: Hemûyan.

**Volkszeitung:** We behsa mirovê bihêz kir. Li gorî we divê ev mirovê xurt çawa be. Hûn bi kinahî dikarin bigirin dest?

---.: Yên ku li hember dewletê stuyê xwe xwar nakin û li hember dewletê li ser lingan diminin. Li gorî min hîna jî hemû mirov di bin teşe û parastina dewletê de ne. Wê di me de jî berevajî pêş bikeve. Yanê wê di ser dewletê re bin. Bi rastî jî herdu pergalên ku bi canavarên atomê xwezayê hildiweşînin, bi canavarên sanayî ve mirovan dixin bin bandora xwe û ji bo mirov tiştek din vegotin nakin. Di vê mijarê de divê bê lêkolînkirin.

Volkszeitung: Mirov dikare ji keseke ku li hember dewletê stuyê xwe xwar nake û li kolanan xwepêşandan dike re bêje miroveke bihêz e?

---.: Aliyê dewletê yê ku mirov xira dike bihêztir e. Bi giştî em bi rexnekirina otorîteya dewletê ya siyasî re pêş dikevin. Li gorî me mirovê demokratan ew e, yê ku bêyî otorîteya dewletê hebe, xwe

dide jiyankirin e.

**Volkszeitung:** Ev nabe anarşîzm?

---.: Na,na. Otorîte wê di bingeha manevî de pêşbikeve. Em giranî didin otorîteya manevî. Em ê hêza maneviyetê pêş bixin û valatiyan bi vî dagirin. Em ê hêza daringî bigihînin navenda wê. Mînak, heke niha rejîma heyî ya li Îranê jiyan dike jî, ev tê wateya ku di warê darengî de bihêz e. Ji ber ku navenda Sovyetê ya manevî nînbû, hilweşiya.

**Volkszeitung**: Ev dîktatoriya moral hinek xeter nabe?

---.: Na. Divê wisa neyê fêmkirin. Ji ber ku her tim li hember hêza madî ye û zordestiyê bi kar nayîne xeter nabe. Mîsoger li hember hêmana şîdetê ye. Ger serî li amûrên şîdetê bide, jixwe wê ji dîktatortiya moral derbikeve û veguhere hêza madî.

Volkszeitung: Li cihê ku dîktatoriya moral hebe, wê fikrê mirovan bê guhertin?

---.: Wê hewl bidin bi fikir û nîqaşan her tiştî çareser bikin. Bê ku li hember pirsgirêkan zextê bikar bînin, wê bi riya nîqaş, fikir û dayîna bawerkirinê hewl bidin ku çareser bikin. Ev cewherê demokrasiyê ye.

**Volkszeitung:** Marksîzm-Lenînîzm ji bo we çi vegotinê dike?

---.: Di wateya rojava de dibe ku em ne Marksîst-Lenînîst bin. Di vê mijarê de nêrînên wan bi xwe çi ne?

Volkszeitung: Na, wê mercên welatê we yê heyî, vêya diyar

bike.

---.: Ji ber vê, dibêjim me nasnakin.

**Volkszeitung:** Tenê ne li Ewrûpa, li Asya û Afrîka yê jî mirov ji Marksîzm-Lenînîzmê re dibêjin na. Tenê hûn di vir de bi îda ne.

---.: Yên li Asyayê jî di nav de, min di yek ji wan de Marksîzmê nedît. Dibe ku bi Ewrûpayiyan re nêzîkbûneke wan hebe, lê nêzbûneke wan qet ji min re nîne. Yanê ji dêla ku me weke kilîseyeke binirxînin zêdetir, pêwîstiya Ewrûpayiyan bi naskirina rastiya me heye. Ji bo ku me fêm bikin, neçarin ku me zêdetir lêkolîn bikin.

**Volkszeitung**: Piştî xweserîbûna Kurdistanê, hûn ê destûra hilbijartinan serbest bikin?

---.: Bila her roj hilbijartin bikin.

**Volkszeitung:** Weke Rojava, hilbijartinên azad…

---.: Ev ji bo me rewşeke paşverû ye. Em ê demokrasiyek wisa bi kar bînin ku hata tiştên weke hilbijartinên şeklî jî pêwîstî pê namîne. Ne tenê hilbijartinên ku salê carek tên çêkirin, ger pêwîst bike wê her roj nîqaş weren kirin û pirsgirêkên heyî bi awayeke lez û bez werin çareserikin. Di her kêlî û saet ê de heke pêwîst bike wê girseya hemwelatî li hev kom bibin û di mijarên pêwîst yên dixwazin de hilbijartinên xwe çêbikin. Li gorî me heta çêkirina destûrnameyan tişteke paşketiye. Yanê hilbijartinên ku çar salan carekê tên çêkirin jî paşketîne. Dema ku hemwelatî bixwazin dikarin di her dem û cihî de hilbijartinan bikin. Di demokrasiyên rojava de qadên vîna gel tên sînordarkirin. Hem jî bi awayeke cidî. Li gorî min

ev demokrasi gelek paşketî ye. Em di vê mijarê de gelek li pêş in. Lê mixabin me nasnakin.

**Volkszeitung:** Ne gengaz e ku we nasnekin.

---.: Me nasnakin. Mêzekin me weke terorîst dinasin. Ev sextekariyek mezin e. Ji tevgerekî herî demokratîk re tu bêjî terorîst xetayeke ku nayê efukirin e. Heta li Cizîr, Şirnexê û gelek deverên Kurdistanê yê ku demokrasiyê qetil dike NATO'ye.  Û li pişt NATO jî Rojava heye. Pêwîst e ku mirov vê bibîne.

Volkszeitung:  Dema ku we dîmenên Cizîr û Şirnex dîtin hûn matmayî neman?

---.: Ez ecêba wê dijîm. Hem jî roj dijîm. Ew faşîzma berderiyê Rojava ya Tirk, wehşîbûn û wehşiyeta wan mirovên me hê di lendikê de qetil kirin. Heya roja meya îro her wisa hatiye.  Pêwîstî bi dîtina dîmenan nîne, heke wujdana Rojava hebe wê ji ber rejima xwe ya ku xwedî kirî xwe bide ber lêpirsînê.

Volkszeitung: Gelo, welatên Rojava li hember pêkanînên ku li Kurdistanê têne meşandin berpirsiyar e?

---.: Nîv nîv î.

**Volkszeitung:** Heya niha dostên gelê Kurd qet çênebûne. Hûn kîjan welatan ji xwe re weke dost dibinin?

---.: Sedema nedîtina dostan ji ber ku cîhana me di cerxeke berjewendîparêz de ye. Em ji cerxeke berjewendîparêz hêviya dostaniyê nakin. Lê em dikarin hinek têkiliyên taktîkî pêş bixin.

Dostanî nîne, lê têkiliyên taktîkî dibe.

**Volkszeitung:** Di cîhanê de dostên PKK'ê nîne…

---.: Bi vê şênaz in. Ez bawer nakim ku gelên cîhanê bi awayeke tendurîstî bi hev re dostanî deynin. Hemû jî ji ber berjewendiyên xwe nêzî hev dibin û hewl didin hev bixapînin.

**Volkszeitung:** Dibe ku di asta welatan de têkiliyên me nebe, lê hûn ji Kurdên li Bakurê Ewrûpa dijîn destek digirin.

---.: Kes azad in, dibin dost. Em nikarin ji vê re sînoran daynin. Li Ewrûpayê jî gelek dostên me hene. Ji bo me pere nepirsgirêke. Ya din jî, ji bo alîkarî kirinê azad in.

**Volkszeitung:** Bêguman her kes di alîkarî dayînê de azad e. Lê em dixwazin bizanin ku asta alîkariya madî çend e?

---.: Em baş nizanin, lê alîkarî baş didin.

**Volkszeitung**: Gelo pereyên tên em bi hezar, an jî bi mîlyonan bihesibînin?

---.: Hûn dikarin bi mîlyonan hesap bikin.

**Volkszeitung**: Hollanda ji bo we çendî girîng e? Hûn çi qas alîkarî ji wir digirin?

---.: Tam ne di aqilê min de ye, lê bawer im zêde nînin.

Volkszeitung: Ji metrepolên Tirkiye û Bakurê Ewrûpa, ji PKK'ê re tevlîbûn çêdibin. Hûn vê çawa dinirxînin?

---.: Rastî gelek kes tên. Niha jî gelek kesên ku dixwazin tevlî bimin hene.

**Volkszeitung:** Tevî ku tevgerên Kurd yên din jî hene, lê tevlîbûn ji PKK'ê re çêdibe. Gelo sedama vê çî ye?

---.: PKK rêxistineke gel e. Li kû derê gelê Kurd hebe, li wir tevlîbûn heye.

**Volkszeitung**: Em dikarin bêjin Kurdên ji metrepolan tevlî dibin, ji ber diskrîmînalizê ye?

---.: Ew jî bandor dike. Lê bawerî, şeref û rûmetê di PKK'ê de dibinin.

**Volkszeitung**: Kurdên ku em weke modern dihesibênin, yên ji metrepolan tevlî dibin û yên ji gund tevlî dibin, di navbera wan de pirsgirêkên bi çî rengî hene?

---.: Zêde nîne. Heye, lê em derbas dikin. Em bi avakirina kesayetên nû ve derbas dikin. PKK keseyetên nû dafirîne. Yanê yên ku tên û tiştên bi xwe re tînin nikarin esas bigirin, di bingeha pîvanên xwe de kesayetek nû ava dike.

Volkszeitung: Kesên ku ji qadên cuda tên, ji bo wan pirsgirêkên bi çî rengî derdikevin?

---.: Pirsgirêkên wan yên tevlîbûnê heye. Weke mozaîkeke civakbûn û siyasîbûnê dibe.

**Volkszeitung:** Di sala 1987'an de li Pinarcikê 31 mirov ji hêla PKK'ê ve hatin kuştin. Ji wan jî 19 kes zarok bûn; hûn vê çawa

dinirxînin?

---.: Me van çalekiyan bi awayê derveyî xetê nirxand û yên ku tiştên derveyî xetê ferz dikin hesap xwest û wan tine kir. Ev bûyer, yên kesên ku nabin PKK'yî û derveyî PKK'ê jiyan dikine. Dema ku em bi PKK'ê ve serde çûn, xilasiya xwe di revê de dîtin. Ev kes yan rasterast, yan jî nerasterast dibin bandora TC'ê de bûn. Divê em bi vê ve bidin girêdan.

Volkszeitung: Hûn dikarin navê wan kesan bidin?

---.: Mesela Hogir. Yê ku ji sedî not ev katliam pêk anî ew bû. Berpirsiyarê wê jî ew e. Hogir revî, li Saddam stirî. Saddam piştre berda. Niha jî li gel KDP'ê ye. Li gel Barzanî ye. Di bin emrê wî de pêşmergetî dike.

**Volkszeitung:** Her em hatin ser Barzanî, we demek bi KDP'ê re li hev kiribû. Piştre Barzanî got; "ji ber we şîdet bikar aniye we îtîfaqê xira kiriye." Hûn dikarin di vê mijarê de agahî bidin me?

---.: Direwan dike. Îtîfaq ji ber vê ne berda. Ji ber ku ji Tirkan re sîxurtî dikirin nekarîn zêde bi me re bimeşin. Ne ji ber ku şîdet hebû. Tirkan emir kirin û ji ber li hember PKK'ê sîxurtiya Tirkan esas girtin qut kirin. Mesela, Barzanî bi zimanê xwe dide vegotin ku 30 sal sîxurtî kiriye. Bavê wî wesiyeta xwe lê kiribû û gotibû; "divê hûn ti caran li hember Tirkan neravin û her tim bi wan re bin."

Volkszeitung: Hûn dikarin garantî bidin ku di roja me ya îro de çalekiyên mîna ya Pinarcikê neyên dubarekirin?

---.: Ger Tirk bixwe provokasyon pêşnexin û provokasyon nekin. Hinek jî bi hêza Tirkan ve girêda ye. Heke em hinek hêza wan

lewaz bikin wê çênebe. Mînak, hêjmarek zêde li Şirnexê jin û zarok kuştin. Ez bawerim nêzî 60'î bûn. Xwestin bixin stuyê me. Baş e gel jiyan dike û bi xwe dîtin ji ber vê ser neketin. Yanê dikarin bi navê me komkujiyên bi vî rengî çêbikin û bikin malê me. Weke ku li Şirnexê bûyî.

**Volkszeitung:** Ger Tirkiye provokasyonek wiha biceribîne, gelo hûn ê bi heman şêwazî bersiva wan bidin?

---.: Bersivdayin na, lê dibe ku bi navê me bikin. Dibe sîxuran bixin nav me. Dîsa kesên ku cil û bergên gerîla li xwe dikin her roj viya dikin. Ev cinayetên nediyar bi vî rengî dikin. Yanê ev xeterî heye. Mesela li Kibrisê jî kirin. Niha ev winda ne. Ev dîlên şerê Tirkiyê yê taybet in. Hê jî nayê zanîn ku Rum li kîderê ne. Di vê mijarê de Tirk gelek hosta ne. Divê ev bê fêmkirin. Tevî ku di dîrokê de hêza terorê ya herî mezin e, ji cîhanê re jî propagandeya me dike ku em terorîst in û di vir de jî ser dikeve. Ji dîrokê gelek gel tine kiriye. Weke hêviya herî dawî me dest avêt xilasiya gelê Kurd, me weke terorîst ji cîhanê re lanse dike. Bi taybet jî hewl dide Rojava bixapîne.

Volkszeitung: Lê belê di vê propagandeya xwe de serkeftî jî dibe. Di çalekiyên ku '84 '85 û 87'an de çêbûyîn, roleke xwe ya girîng lîst. Wê demê hûn sekreterê PKK'ê Abdullah Ocalan bûn. Niha jî. Wê demê çima dewleta Tirk di vê de serkeftî nebe?

---.: Ji ber ku dostê Tirkan bûn. Em bûn terorîst an jî me zarokan kuşt. Çima ev du car bû ku cudatir çênebû. Ev bû du car KT (Komara Tirkiyê) li ser navê me provakasyon pêşdixe. Heta em leşkerên birîndar jî nakujîn, leşkerên birîndar yên li gel me dimînin em weke xwe li wan dinêrin.

Volkszeitung: Her ku roj derbas dibe, li bajaran çalekiyên PKK'ê pêş dikeve.

---.: Tevgera gel e. Gel li kûderê be, wê PKK li wir pêşbikeve.

**Volkszeitung:** Ev tarîfkirinek giştî ye. PKK dixwaze têkoşînê bibe bajaran jî.

---.: Bêguman. PKK tenê tevgereke çiya nîne. Destpêkê li bajaran pêşket.

**Volkszeitung:** Gelo şêwaza têkoşîna bajaran çawa ne?

---.: Dewleta Tirk li bajaran bi sazî bûye. Wê serhildanan pêşbixîne.

**Volkszeitung**: Wê cî bide çalekiyên weke suikast-sabotaj yên weke ÎRA li Îrlanda yê kirine?

---.: Ji ber em tevgereke nû ne, ev çalekî zêde bi îtîbar nîne.

Volkszeitung: Lê beriya niha ji aliyê PKK'ê ve li Stembolê li hember maxazeyek çalekiya bombayî pêk hat. Di vê çalekîyê de 8 kes mir in. Çima PKK çalekiyek bi vî rengî kir?

---.: Ew qas pirsgirêk nîne. Wê li otele agir derkeve û mirov bimirin. Bi taybet li hember gelê medenî tiştek nîne. Deriyê xwe nevekirin, tertîbata wê nîne ji ber vê çêbû. Bi taybet li hember kesên medenî tiştek nîne…

**Volkszeitung**: Çalekî PKK'ê kir?

---.: Aligirên PKK'ê madeya agir avêtin maxazaya birayê walî.

Lê ji ber ku derî nevekirin kesên medenî mirin. Ger mirina kesên medenî nexwestibana diviyabû deriyan vekiribana. Kesên medenî ne hedef bûn. Heke kesên medenî hedefbûyana her roj wê li kolanan hezar kes bimirin.

**Volkszeitung:** Berê Talabanî îda dikir ku PKK rêxistineke terorîst e, lê weke tê dîtin dev ji van nêrînên xwe berda ye. Piştî vê qonexê û şûnde têkiliyên we yên bi Talabanî re di çi astê de ne?

---.: Têkiliyek wisa bi îtîbar nîne.

**Volkszeitung**: Têkiliya we bi Talabanî re heye?

---.: Ez wî nabînim.

**Volkszeitung:** PKK li Kurdistana Iraqê, bi riya PAK'ê (Partiya Azadiya Kurdistanê) re dixwaze bigihêje çî?

---.: Ji bo ku em gelê xwe yê li wir bê hêz nehêlin.

**Volkszeitung**: Ma wê pirsgirêkên we bi Talabanî re dernekevin?

---.: Girîng nîne. Ya girîng ew e ku gel bê rêber nehiştin e.

**Volkszeitung**: Wê ev bi xwe re dabeşbûnê kûrtir neke?

---.: Nexêr. Li gorî em bi gel re bûne yek, berevajî wê di pêşengatiya rêbertiya PKK'ê de bibin yek.

Volkszeitung: Lê bi avabûna PKK'ê re li hember Talabanî her çendî ne fereh jî be, şerek hatiye destpêkirin.

--.: Ji vê re pêwîstî nîne. Gelek zelarê dan gel. Hem bê welat û hem jî bê gel hêlan. Bi temamî hewl dan ku gel tasfiye bikin.

**Volkszeitung**: Ger hûn hem li hember dewleta Tirk û hem li hember Talabanî û Barzanî şer bikin wê hêza we têr bike?

---.: Şereke siyasî ye. Şereke îdeolojîk û siyasî ye. Em dixwazin bên wê mertebê.

**Volkszeitung:** Gelo, wê bedelê şerê azadiya Kurdistanê çi qas bibe?

---.: Ji niha de hêjmar nayê dayîn.

Volkszeitung: We di axiftineke xwe de gotibû ku dibe; “100.000 mirov divê riyê de biçe.” Ma gelo ev ne hêjmareke tirsnak e?

---.: Min wê di wateya ku çi qas ji bo serkeftinê pêwîst bike, em amedene ku ew qas bidin, bi kar anîbû. Bedêlê azadiyê çend be, em amadene ku bidin.

**Volkszeitung:** Gelo, şerê we yê ku hûn hem li hember KT (Komara Tirkiyê) û hem jî li hember Talabanî dimeşînin ji bo we ne zêde ye?

---.: Nexêr. Yê li hember Talabanî ne şer e. Li hember hevkariya wan û ji bo em pêşî li bazirganiya wan ya li ser Kurdan bigirin parastinek e.

**Volkszeitung**: Bêguman ne şerek e, lê rageşiyek di navbera

we de heye.

---.: Tirk dixwazin. Ji ber ku ew jî di nav hevkariyek de ne, neçarin ku tevlî bibin. Yan ne, em dijminahiya wan naxwazin.

Volkszeitung: Têkiliyên we bi Suriyê re di çi astê de ye?

---.: Qet nîne.

**Volkszeitung:** Ma we got nîne?

---.: Ji ber zextên Tirkiyê bi temamî cemidiye.

Volkszeitung: Hûn dibêjin cemidiye, ev tê wê wateyê ku heye.

---.: Na, di van demên dawî de em dikarin bêjin ku bi temamî qut bûye. Yanê cemidiye. Têkiliyeke me wisa cidî bi Surî re nîne. Têkiliya me bi Kurdên li Suriyê re heye. Ev şaş tê fêmkirin. Heta dewlet li hember me ye.

Volkszeitung: Lê wargeha li vir, ji hêla Surî ve piştgirî tê dayîn.

---.: Em dijminahî nakin.

**Volkszeitung**: Di van demên dawî de dewleta Tirk bi Surî re têkiliyên xwe yên dîplomatîk pêş dixe. Yek ji daxwazên wan yên bingehîn ew e ku sînorê Tirkiyê û Surî bê girtin û ketina nav wargehên we yên li geliyê Bekaayê ye. Di meha Nîsanê de wê wezîrê karê derve yê Tirkiyê, Surî ziyaret bike. Gelo ev hewldanên Tirkiyê yên dîplomatîk PKK'ê natirsîne?

---.: Em natirsin. Em bêy vir jî dikarin şerê xwe bi her awayî xurt bikin. Di welatê me de bi dehan û sedan wergehên me hene.

Volkszeitung: Awantaja herî zêde ya wergehên we yên li vir ew e ku li hember êrîşên ku ji hêla Tirkiyê ve têne kirin xwe parastin e?

---.: Belê. Lê ev deh salin em bikar tênin û fonksiyona xwe dîtiye. Weke berê girîngiya xwe nemaye.

Volkszeitung: Herî dawî tişta min bihîstî Tirkiye, bi tehdîtike şiyariya dawî li Surî kiriye. Hûn wê çawa dinirxînin? Ev, tê wateya ku wê bi firokan êrîş bikin?

---.: Her tişt dibe.

**Volkszeitung:** Dibe ku Tirkiye êrîşî ser xaka Surî bike?

---.: Jixwe şantaj dike. Car caran êrîş dike.

Volkszeitung: We bi Hafiz Esat re hevdîtin çêkir?

---.: Nexêr, ez naxivîm. Min qet nedît û têkiliyên me yên siyasî nîne.

Volkszeitung: Em difikin ku Surî, PKK'ê ji ber pirsgirêka avê li hember Tirkiyê bikar tîne. Ger pirsgirêka avê ya di navbera Tirkiye û Surî de çareser bibe, gelo PKK wê desteka tê xwestin ji Surî negire. Baş e, em dikarin di vê mijarê de nerînên we bigirin?

---.: Ez nafikirim ku fikreke wisa taybet hebe. Em dikarin riyeke wisa bêy ku alîkariya Surî hebe jî vekin. Li gorî min ev ne

pirsgirêk e.

**Volkszeitung:** Her ku diçe Abdullah Ocalan dibe semboleke mîtos. Em dikarin wê bi fêmkirina rastiya gelê Kurd re bidin girêdan?

---.: Em her tim girêdana mirov ya bi nirxan re esas digirin. Ji ber ku ez li hember hemû nêzîkatiyên ku mirov ji cewherê wê derdixe disekinim û ji bo ez di bûna miroveke mezin de bibiryarim û li hember cîhana me ya ku bi derew û xapandinê tê îdarekirin derdikevim û hêza xwe ya berxwedanê didim nîşan re dibêjim girêdayî ye.

Volkszeitung: Hûn di kîjan merheleyên temenê xwe de ketin ferqa van?

---.: Her tim. Ji kêliya ku min xwe naskirî û vir ve. Ez dikarim bêjim ku di dehsaliya min a di nav malbatê de û heya niha. Heta dikarim bêjim di heft saliya min de. Min demek dirêj li hember otorîteya malbatê li ber xwe da. Min her tim li hember xirabî, nexweşikî û xeletiyan têkoşîn kir.

**Volkszeitung:** We bi çi şêwazê têkoşîn kir?

---.: Fêmkirina vê zehmet e. Min her roj di wêneyan de vedigot. Heta yên me jî fêm nakin. Ez bi vegotineke kurt re nayêm fêmkirin. Wê kes min fêm nake, ne şêwaza xebata min û ne jî jiyana ku ez dijîm. Fêmkirinên serensere, nefêmkirina cewher e. Ez miroveke cuda me. Cîhan li aliyek, ez li aliyek im. Yanê ez miroveke wisan im. Şekleke ruhê min cuda heye.

**Volkszeitung:** Hûn dibêjin em li hember otorîteyan in, lê hûn

bi xwe otoriyek in.

---.: Nexêr, ez li hember otorîteyan, otorîteyek im. Otorîteya min otorîteyeke wisaye ku otorîteyê ber bi tinebûnê ve dibe. Dikare bê gotin ku li hember hemû otorîteyên klasik, otorîteya ku otorîtetiyê dibe, cara yekem di min de dest pê kir. Ez ji otorîteyê nefret dikim û biçûk dixim, lê ez nikarim bêjim ku ez di karê xwe de jî ne serkeftî me. Kes bi qasî min li hember otorite û lewazkirina otorite nesekinî. Yê min ne otorite ye, divê weke bandor bê nirxandin. Weke kesek ne bi desthilatdar, weke kesek bi bandor. Mesela hûn niha bawer dikin ku hûn li pêşberî desthilatdarekî ne?

Volkszeitung: Nexêr.

---.: We li vir qet vê hîs kir?

**Volkszeitung**: Na, lê bi rastî jî me aliyê we yê bi bandor dît.

---.: Dibe hûn li Hollanda xwe li hember desthilatdariyê bibînin. Yanê hûn hatin nehatin we hema fêmkiriye ku li vir desthilatdarî nîne.

**Volkszeitung**: Yanê em dikarin we ji rêza dawî ve yekemîn bihesibînin?

---.: Rast e. Ez di dawiyê de yekemîn im. Piştî Spartakûs, cara yekem ez serdikevim. Ez bawerim hûn li vir, ji dema ku hûn li Hollandayê diman, xwe zêdetir azad hîs dikin. Tevî ku vir serê çiya ye jî.

**Volkszeitung**: Rast e, xwarin jî li vir xweş bû.

---.: Tenê ne xwarin, bi rastî jî hewaya vir lewazbûna desthilatdariyê dide nîşan. Hûn hinek din bimînin, hûn ê baştir fêm bikin. A rast we zincîr kirine. Hûn hinek din bimînin, dibe ew zincîr bên avêtin.

**Volkszeitung:** Ez jî hinek ji vê bawer im. We di ciwaniya xwe de bawerî bi têkoşîna çekdarî danî?

---.: Min ti cara çek negirt destê xwe. Di dinyayê de kes bi qasî min ji şerê çekê û pevçûnê direve nîne. Lê tevî vêya jî şerê herî mezin ez didim. Ji neçarî û ez bawerim erkê şerê herî mezin û yê herî dawî ji min re ketiye. Pevçûn ji bo min bûyera herî bi xeter e.

Her kes şer dike, lê ez nakim. Herwiha ji bo ku ev pevçûna di nava gel de bi dawî bîbe, divê ev pevçûna dawîn jî bê dayîn. Ji ber vê dibe ku min qebûl kiribe. Bi rastî jî wateyeke vê pevçûnê heye. Ji bo ku ez mirovek jî tehl ango birîn nekim, gelek bi baldarî tevdigerim. Dema ku ez gulek jê dikim zehmetiyan dikişinim, heta dema ez goştê ajalan dixwim jî zehmetiyan dikişim.

**Volkszeitung:** Lê hûn goştê ajalan dixwin.

---.: Lê ez zehmetiyan dikişînim.

Volkszeitung: Ev rewşa we herî zêde rewşa yêke ku têxe bîra mirov e.

---.: Dibe ku hinek min pasîfîst bizanin. Mesela, M. Barzanî ew roj daxwuyaniyek da. Dibêje, “ew li kûderê şer li kûderê, ma qet çû li welat şer kir.” Û didomîne, “ji şer ditirse û di şer de eleqeyeke min bi şer ve nîne.” Lê şêwazeke din yê pevçûna min bi awake kûr jiyan kir. Min da çespandin ku çek ne titişt e. Artêşa herî dijwar ya

cîhanê artêşa Tirk e. Min çekên wî artêşê anî astek wisa ku êdî kêrî pênç qiruşan neke. Ji ber vê yekê kes nikare di hûnera şer de bigehe min. Di dîrok û di roja me ya îro de kes nikariye li hember terora Tirkan bisekine û ser neketine. Yên kirine tine bûne. Yanê min bandora çekên Tirkan şikand. Ya girîng ev e, tu di şerê xwe de bidî nîşandin ku çek kêrî tiştek nayên. Ev kar serxistin bûyerek mezin e. Tabî NATO li hember min serkeftî nebû. Bush bi taybet Almanya şiyar kir, dibêje,“newe lîstika Apo, şiyar û xwedî rêgez be.” Yanê aqil dide Almanya û wezîrê karê derve yê DYE’ê, li hember me daxwuyaniyan dide. Em bi mirovbûna xwe, xwe diparêzin. Yanê ji bo em xwedî li nirxên mirov derdikevin û xwe dispêrîne ser dikevin. Li hember canawarekê ez şerê mirovbûneke rast didim!

Volkszeitung: Yanê bêy ku alîkariya DYE’ê hebe hûn bawer dikin ku serkeftîbin?

---.: Ew min eleqedar nake. Ya girîng şerê mirovbûnê ye. Ez ne li benda alîkariyê me, ez li pêşiya edalet, mirovbûn û li pêşiya nirxên pîroz im. Di wateya klasîk de ez ji polîtîkakirinê hez nakim.

**Volkszeitung**: We ciwantiya xwe li kû derê derbas kir?

---.: Min hinek li Tirkiyê derbas kir, hinek li Enqerê û heta dikarim bejim deh-pazde sal li Tirkiyê derbas bû. Ev danzdeh salin jî ez li vir im.

**Volkszeitung:** Hûn li kûdera Kurdistanê man?

---.: Ez digeriyam.

Volkszeitung: Zextên li Kurdistanê we bandor kir?

---.: Tabî, tabî. Ji mirovbûnê derxistine û wêran kirine.

**Volkszeitung**: Ger ne şaş bim hûn salek çûn zanîngeha Stembolê.

---.: Ez salek çûm zanîngeha Stanbolê.

Volkszeitung: We li wir çi kir?

---.: Qeyd bûm û min dewam kir.

**Volkszeitung**: Berê niha we qala daxuyaniya Barzanî kir. Bi qasî ku dizanim Barzanî ji bo we dibêje, hûn gelek ji şer dûr in. Hûn wê weke pêşderêzî dibînin?

---.: Tabî. Dixwaze min bikişîne wir û bi TC'ê re bixeniqîne. Lê ez dizanim çawa biçim. Bêy ku kes çiya bifikire, beriya 20 salan hedafa min ya yekem çûyîna çiya pêkanîn bû û me derxistina çiya pêk anî. Ev 13 salin ez li vir im. Min hemû gel derxist. Ez bawer dikim ku ez ê jî vekirinek bişeml bidim çêkirin. Beriya 20 salan kes çiya nedifikirî. Heta kes ne fikirî, ne jî cesaret kirin bifikirin. Me ji bo vê her tişt peyda kir.

Dema ku dibêje, "gelek ditirse û min weke pasîfîst suçdar dike, wan rojan yekî Iraqî hatibû vir, digot "ji te ditirsin. Hemû serokên Kurd yên li Iraqê gelek ji te ditirsin." Bi rastî jî wisa ye. Niha di nava tirsek de ne, ji ber vê jî Tirkan digirin gel xwe. Diqehrin ji Tirkan, dibêjin; "hûn çima newêrin wan." Heke me tine bikin wê gelek kêfxweş bibin.

**Volkszeitung:** We got me li Kurdistana Iraqê tevgera gel ava kiriye. Baş e, wê rewşa Kurdên li Surî çawa bibe? Ji bo van xebateke

we heye?

---.: Heye, li wir heye. Yanê Kurdên li Surî ji sedî not piştgitiya me dikin.

**Volkszeitung:** Baş e, ev xebatên we nabe sedema pirsgirêkan ya di navbera we û dewleta Surî de?

---.: Em li ser esasê dostaniyê pêş dixin. Em ê li Suriyê, bi pêşxistina demokrasiyê û bi pêşxistina roleke civakî-demokratîk re vê meselê çareser bikin.

**Volkszeitung**: Ez bawer dikim. Lê di rewşeke ku Kurdên li Surî û Kurdên li Tirkiye bên gel hev re, gelo wê pirsgirêkên we bi Şamê re derbikevin?

---.: Kêm e. Kurdên li Surî kêm in. Bi qasî ku problem derxin nîne. Li Kurdistanê bi qasî Kurdên li Surî Ereb jî hene. Yanê bi qasî Kurdê Surî Erebê wê jî li Kurdistanê heye.

**Volkszeitung:** Ev tê çi wateyê?

---.: Wateya vê, ger pêwîst bike ew çawa muamele dikin, wê ew jî li wan bi heman rengî muamele bikin. Em ê bidîn û bigirin. Em ê bi hev biguherîn. An jî wê rola pirê bilîze. Bi vî rengî wê rê li ber nêzbûnê veke.

Volkszeitung: Xebatên PKK'ê li Îran'ê jî heye.

--.: Li Îranê dostanî pêş dikeve. Hem di navbera Kurdan de û hem jî bi rejîmê re. Yanê ew li Kurdistanê dixebitin û bandor dikin em ê jî bandor bikin. Em di asta jor de sentezeke nû derdixînin holê.

Di navbera me de kişkişîn heye. Lê em dikarin bigihîn xalek hevbeş.

**Volkszeitung**: Hûn dixwazin Kurd hemû bêne bahev?

---.: Ez behsa hatina Kurdan ya li gel hev nakim. Mesela pergala Îslameke fireh tê fikirandin. Di nava pergalê de avakirina têkiliyên nû gengaz e.

**Volkszeitung**: Ma di arenaya polîtîk de, kesên ku hûn ji xwe re mînak digirin hene?

---.: Em nikarin bigirin, ji ber ku şert û mercên me cuda ne.

**Volkszeitung:** Mînak; hinek aliyên têkoşîna Kubayê dişibe şêwaza we ya têkoşînê. Wan jî mîna we bi komên biçûk ve destpêkirin. Di vê wateyê de hûn Chê yan jî Castro çawa dinirxînin?

---.: Ez bawer nakim ku aliyên me yên zêde dişibin hev hebin. Em ji Castro pêşdetir in. Gumana hilweşandina Castro heye. Lê rewşeke me wisa nîne. Hilweşandina min ne gengaz e. Bandora min heye û xwe naspêre zorê. Ruxmê ku NATO ew qas li ser me disekinî jî lê nikarî pêşkeftina me asteng bike. Ev jî cewazbûna me dide diyarkirin.

**Volkszeitung**: Ma ji şoreşa Kuba û Castro re qet sempatiya we nîne?

---.: Ji bo min ne şoreşek bê hempa ye. Şoreşek pasîf e, ya rastî Castro di nav sosyalîzma pêkhatî de bi gewde bû, yê me jî berevajê wê, ji der ve û heta li hember wê pêşket. Yanê wê fêmkirina me bi van mînakan ve zehmet be. Ne gengaz e ku ez karibim xwe bi asta çanda Rojava ve bînim ziman. Sifata ku di nava

yên herî jêr de bûna yekem girîng e. Bûna yekem çi ye gelo? Ger bikaribin vê binirxînin, dibe ku bikaribin wateya rast jî bidinê.

Volkszeitung: Baş e, sedema di dawiyê de bûna yekem û ew qas bi navbag bûyîn çî ye?

---.: Ji bo min zehmetiyeke. Ji bo ji min sûd wergirin her kes wisa dike. Bêguman weke ku min bikujin dixwazim bihêz bibim… Bêguman dixwazin ji bo ku min wekî bikuncirînin bidin hêzkirin…

**Volkszeitung: ...**

---.: Na, lê ji bo ku pir ji gel re pêwîst e, li hember dernakevim. Weke kes, tevî ku di rewşeke zehmet de dimînim jî lê ji bo ji gel re pêwîst e û ji bo ez jî gel esas digirim li hember dernakevim. Ger wêneyên min biqetînin jî ez ê bikenim. Min dixwest tiştek wisa. Li gorî min wisa bi wêne û şekil re pirsgirêk çareser nabe.

Volkszeitung: Ji bo gel hezdike hûn li hember dernakevin?

---.: Wê demê ez ê li hember gel derbikevim. Di rêgezên min de li hember gel derketin suç e.

**Volkszeitung:** Em dixwazin di derbarê malbata we de hinek agahiyan bigirin. Mesale di nav refên we de birayeke te heye, gelo niha rewşa wî çawa ye?

---.: Rast e, yek heye. Birayeke min yê di nav refên me de zehmetiya dikişine heye. Yanê ji bo biraye, yan jî ji bo keseke zehmetiyan dikişine hûn dipirsin, ji van zêdetir rastiya wê girîng e. Li

gel min girêdana malbatê zêde girîng nîne.

**Volkszeitung**: We got bIraqe min di nav şer de zehmetiyan dikişine heye…

---.: Na, yanê bi giştî heval zehmetiyan dişikînin. Li gorî tempoya me nameşin. A rastî ez miroveke li hember malbatîbûnê derdikevim e.

**Volkszeitung**: Her me qala malbatê kir, gelo birayê we yê din çi dike?

---.: Heta ez naxwazim fêm jî bikim, feqîreke Xudê ye. Feqîrek e.

**Volkszeitung**: Çima wisa ye?

---.: Bi erdê re dixişike.

**Volkszeitung**: Bi awayê moral ne baş e?

---.: Di her alî de. Di cîhanê de malbata herî belengaz malbata me ye.

**Volkszeitung:** Hûn çiyê malbata xwe şaş dibînin?

---.: Malbatek bê hêz e. Belengaz e. Ti taybetmendiyên malbata min nîne. Ger taybetmendiyeke wê hebe, ew jî bêhêzbûna wê ye.

**Volkszeitung**: Malbata we niha li Tirkiyê jiyan dike. Tirsa we heye ku dewleta Tirk malbata we li hember we dîl bigire?

---.: Ger bi kar bîne wê bixwape. Yanê malbateke ew qas bê hêz e ku mesrefa lê bê dayîn wê li barember KT’ê bi encam bibe. Min planeke wisa çêkiriye ku hema dest bavêjinê wê di aliyê me de bi encam bibe. Yanê bi qasî ku rehîn bigirin nirx îfade nake. Wiha rastî ev e.

**Volkszeitung:** Li vir ez bi şervaneke ku ji Hollanda hatî re axivîm. Dibêje; piştî min zarokeke min çêbûye, nizanim keçe an jî kur e, lê zêde mereq jî nakim. Li gorî we ev nêzîkatî, nêzîkatiyek ji derveyî mirovahiyê nîne?

---.: Zarokeke şaş çêkiriye. Ew têkilî li ser bingeheke şaş avabûye. Tişta ji derveyî mirovahiyê rewşa wî ya berê ye. Rewşa wî ya niha rastir e.

**Volkszeitung**: Gelo dibe ku heya dawî zaroka xwe nebine?

---.: Ma pir girîng e!

**Volkszeitung:** Zarokên we hene?

---.: Na, ew qas zarokên me hene ku tenê li Şirnex û Cizîrê deh hezar zarok heye. Ma gelek girîng e bûne xwedî zarok? Bi mîlyonan zarok hene û hemû jî dayîk û bavê xwe zêdetir bi min ve girêdayîne.

**Volkszeitung**: PKK li hember malbat û têkiliyên kevin yên civakê ne. Li hember van têkoşînkirin pir zehmet nîne?

---.: Gelek zehmet e, lê bi awayek din jî wê Kurdistan negihe xweseriya xwe. Malbat li pêşiya me asteng in. Ji ber vê divê malbat bê tinekirin. Yanê em ê li ser malbat zêde nîqaş bikin û bigihînin

asteke jor. Di dema pêş de malbat çawa be, me destnîşan kiriye.

Volkszeitung: Pirsa herî dawî, hûn bawerin wê Kurdistan kengî serbikeve?

---.: A rastî em tenê ji bo Kurdistan azad bibe şer nakin. Ev netewîperestiya teng e. Şerê me bi azadkirina mirovahiyê re girêdaneke xwe heye. Ji bo di Kurdistanê de valahî heye, em destpêkê wê ava dikin. Rexmê ku mirovên Kurd pir belangaz in, rêbertiya wê jî di destpêkê de di rizgariya mirovî de dibe. Tevî ku şoreşa me li dawiya hemû şoreşan hatiye jî, wê bi destkeftiyên xwe ve biçe pêşiya hemû şoreşan. Dibe ku di sedsala 21'an de ji bo mirovahiyê bibe tevgereke bêhn vedanê. Em ê girîngiyek mezin bidin vê. Em ê wê bînin rewşa şoreşa mirovahiyê. Di vê rewşê de, ji rizgariya Kurdistanê zêdetir, ji bo min rizgariya mirovahiyê girîngtir e.

**Volkszeitung**: Gelo, wê ev şoreş heya 2000'î pêk bê?

---.: Li gorî me tevgera ku me bingeha wê avêtiye, wê ji pirsgirêkên hemû civakê re bibe bersiv. Bi asta xwe ya guherînê re wê heya 2000'î bibe. Pirsa we ya dawî dibêje, ger we jiyana xwe ji dest da wê PKK'e çi bibe? Herî zêde bi baweriya ku ez ê di demên bê de jiyan bikim bawer dikim. A rastî min jiyan nekir û bawer nakim ku jiyan jî dikim. Belkî di demên pêş de ez bigihîjim derfetên jiyankirinê. Me jiyan nekir ku bimirin. Mirin ji bo yên jiyan dikin derbasdar e. Cîhaneke min tenê di asta hêvî û îdeayan de heye. Ez ê bi van re derfetên jiyankirinê bibînim. Pirsgirêkeke min yê ez jiyan bikim an jî ez ê bimirim nîne.

Volkszeitung: Hemû mirovên li vir, we serokeke rast

dinirxînin. Ger tiştik ji we bê, wê rewşa wan çi bibe?

---.: Ez ne li hember bêriyên van mirovan im. Ez dixwazim bersivek rast jî bidim. Lê rastiya min jî ev e. Rêbertî di wateya xwe de mehkûmyetê vegotin dike. Ji bo ez bûn rêber ez ti car xwe mehkûm nakim. Ger ez azadiya xwe mehkûm nekim, wê ev ji bo min bibe serkeftineke mezin.

Ji bo xatirê berjewendiyên giştî mirov nedana fetisandin jî rêgeza min ya bingehîn e. Li ser vê bingehê hewl didim ku jiyanê pêş bixim.

**Volkszeitung:** Hûn çend salî ne?

---.: Dîroka wê baş nizanim lê, dikarim bêjim di navbera salên 1947-'48-'49 de ye. Yanê nîvê vê bigirin hûn ê nêzî rastiyê bibin.

**Volkszeitung:** Ez ji dil we spas dikim.

---.: Ez jî ji bo hatina we ya vir we ji dil spas dikim. Ya din jî ez ji hemû dost û kesên ku li hember me eleqe didin nîşan re silav û hezkirinên xwe pêşkêş dikim.

**8 Nîsan 1992**

# HEVPEYVINÊN ROJNEMEVANÊN FRANSI YÊN BI RÊBERTÎ RE

---.: Di demeke wiha zehmet de hatina we ya vir hêz daye me û me gelek kêfxweş kiriye.

F.G.: Em jî gelek kêfxweş in.

---.: Tirkan me tene hişt. Lê me wan neberdaye. Em ê hê nû bi hev re hesaban bigirin. Bêguman gelek dostên min jî li Tirkiyê hene. Ez rewşa wan ferq dikim.

F.G.: Ji ber ku ev demek dirêj e me dixwest bi we re hevdîtin çêbikin, lewre naxwazim vê firsetê ji dest berdim.

---.: Ev mantiqê Ewrupa ye, li vir jî ji wî mantiqî re  eser nîne. Yên ku tên vir hema weke ku filmek hembêz bikin, lê tên.

F.G.: Hinek lîderên Kurdan me anîn lîstokê. Em yek du demjimêr axivîn me dizanî ku em ê carekdin baxivin lê, piştî du demjimêran gotin hevdîtin xilas bûye. Ji ber vê me hinek ecele kir. Ji ber ku dema tên Ewrûpa zêde wextê wan çênabe.

---.: Li gel me ne wisa ye.

F.G.: Wê demê em îro li nîqaşên we guhdar bikin.

---.: Em ê bername çêkin û pirsan amade bikin. Em hinek li ser bixebitin û dest pê bikin.

F.G.: Beriya niha me li Parîsê bi Hatîce re hevdîtin çêkir. We

bi hev re xwendiye.

--.: Em dinasin bi xwe li Parisê ye?

F.G.: Nerînên we yên di derheqê vê jinê de çi ne?

---.: Em bidin diyarkirin ku tevger avanekirin û di 12’ê Îlonê de tine bûn.

F.G.: Min axiftinên Hatîce bi suprîz pêşwazî kir. Di nav lîderên Kurdan de ji min re wisa hat ku tenê di derheqî PKK’ê de ew baş axivî ye.

---.: Piştî ku bi Yekîtî (YNK) re axivî û şûnde dibe ku wisa axivîbe. Ji ber ku kadroyê Yekîtiyê ye.

F.G.: Na, di derheqê Yekîtî de fikreke wê zêde baş tine bû. Nerînên wê jî yê beriya protokolê bû.

---.: Dostê me ye, ev heşt sale me hev nedîtiye. Dostaniyeke me wisa heye.

F.G.: Dema ku em bi serokên rêxistinên din re hevdîtinan çêdikin her dem di derheqê PKK’ê de gelek tiştan yanê…

---.: Ew dizane ku PKK’ê tevgereke gelek mezin daye avakirin, em dikarin binirxînin. Ne fanatîke û dikare nirxandinên abjektîf bike.

F.G.: Hûn çima wê nakişînin nav rêxistinê?

---.: Êdî em ê ji niha û şûnde xwedî li rojnemevanên bi vî rengî derbikevin. Beşên bi vî rengî gelek belav in.

F.G.: Mirovên ku li hember yekbûna PKK'ê dernakevin jî hene.

---.: Çêdibe.

F.G.: Di derbarê PKK'ê de li Ewrûpa dîteneke wiha baş nîne. Heya niha kes bi berpirsiyarê PKK'ê re hevdîtin çênekiriye. Dema ku bi lîderê tevgerekê re hevdîtin neyê çêkirin, em wî/ê cuda dibinin. Yanê me serok nedîtibû. Dîmenên we jî baş nehatibûn kişandin. Me serok li vir dît. Bi rastî jî hûn pir cuda û cihêreng in.

---.: Hûn cuda dibînin?

F.G.: Hûn çiwa tên dîtin?

---.: Li gorî we ez çend salî me?

F.G.: Dibe ku 35.

---.: Na,ez 40 salî me.

F.G.: Bi rastî hûn 40 salî ne?

---.: Lê di bin bareke evqas giran de her kes şaş dimîne. Dibêjîn ecêp, "hûn çawa evqas ciwan mane." Tirkiye bi sê artêşan ve li ser me şer dide meşandin. Em ê piştre dîroka Tirkiyê û ya dewletê vebêjin. Serhildanên ku li Kurdistanê hatine meşandin li hember dewleta Tirk ji derveyî du-sê mehan li ber xwe nedane û bi awayeke hovane perciqandine.

F.G.: Dibe ku ji du-sê mehan zêdetir be.

---.: Na, bi ti awayî. Kêliya herî girîng ya destpêkêye. Ya piştre

îdam û girtine. Serhildana herî dijwar şeş mehan dewam kiriye. Ya Şêx Seîd di 15'ê Sibatê de dest pê dike heya 15'ê Nîsanê didome. Yanê du mehan li ber xwe dide. Şerê wan yê bi Yunanan re salek û nîv domand. Wê demê bi şêwazeke hovane ve du hezar hêz bikar anin. Di têkoşîna şerê me de çar salên herî dijwar derbas bûn. Ev nêzî deh salin şerê leşkeri tê kirin û her ku diçe jî pêş dikeve. Asta ku niha gihiştiyê jî pir girîng e. Hûn di van demên nêzîk de qet çûne Kurdistanê?

F.G.: Beriya niha ez çûbûm, ez ê vê havînê jî biçim.

---.: Ger derfeteke wisa hebe biçin. Rewşa Kurdan gelek reben e. Cara yekem e ku ji bo hatina rojnemevanekê me bersiv daye. Nîha ji Emerîka û Îlgîntere jî gelek rojnamevan dixwazin bên û pêşketinan bişopînin. Tirkiye di vê mijarê de pir lewaz e.

T.G.: Ji ber ku li herêmê pevçûn pir zêde ne, ji ber vê jî em neçûn.

---.: Ma dibe wisa, hinek kêrhatî bin û hûn ê biçin. Mêze bikin ew mirinê didin ber çavan û tên.

F.G.: Dizanim, lê artêş gelek hişk e.

---.: Herî kêm hewceye erka rojnemevanekê bê kirin. Kêm bûn hene.

T.G.: Yanê mirov dikare bi nasnameya rojnemevaniyê ve biçe herêmê?

---.: Qedexe ye.

F.G.: Em çûn.

---.: Rastî, ew çûnê. Rojnemevanên wêrek ew in. Bi karanîna kart û cil û bergên cuda ve divê mirov bikeve navendê. Mirov dikare bikeve gundekê.

F.G.: Ger ku rojnemevanên Tirkan nivîseke bi vî rengî binivîsînin gelo ji bo wan xeter nabe?

---.: Ez bawerim ku pêşketinên pir balkêş hene. Ez vê gavê sedemên wê nizanim, lê hemû rojnemevanan nerînên me weşandine.

F.G.: (Rojnemevanên Fransî ji rojnemevanê Tirk dipirse) Ger ku hûn rewşa li Kurdistanê di rojnemeya xwe de biweşînin, wê ji bo we astengiyek derbikeve? Yanê hûn di weşanên xwe de qala sepêhatiya xwe ya ku hûn têre derbas bûne bikin û binivîsînin wê ji bo we astengiyên çawa derbikeve?

T.G.: Ez niha di lebetên (organên) weşanê de dixebitim. Ji bo ku ez bêm vir, ez bi taybet bi Hûrîyetê re axivim, min ewlahiya ku peyveke tenê jî di nivîsan de neyê guhertin girt.

F.G.: Ev pir baş e.

---.: Em temaşe bikin. Êdî tiştên ku nayên veşartin hene. Neçarin ku qebûl bikin. Dema ku şer neyê dewisandin, raya giştî diheje. Tabî li dijî wan çêdibe. Dixwazin navendeke nîqaşê avabikin. Em temaşe bikin, ev tiştên nû ne.

T.G.: Yıldırım Akbulut vê qebûl kir. Got ku “em şeqê wê nayên der.” Hayri Kozakçıoğlu û Turgut Ozal jî bi heman rengî

diyarkirin.

---.: Şer wê pêş bikeve û Fermandariya giştî jî wê asteng neke. Ji Tirkiyê nûçeyên nû hene?

T.G.: Hûn agahiyên çawa dixwazin?

---.: Em dûr in, dibe ku hinek agahiyên siyasî yên ku em pê nizanin hebin.

T.G.: Di rojeva Tirkiyê de du tişt hene. Ya yekem, hilbijartin; ya duwen jî, çûyîna  Ozal ya Atîna yê ye. Ji ber ku ANAP dizane ku wê di van hilbijartinan de dengdaneke baş negire…

---.: Di 89’an de dibe ku guhertineke desthilatdariyê çêbibe. Dibe ku Ozal neçar bimine berde.

T.G.: Ozal wê bibe Serok-Komar.

---.: Baş e ew diyar bû. Yên ku li baremberî vê têkoşîn didin hene.

T.G.: Rast e, Necdet Ûruğ hebû. Lê ...

---.: Wî teşhîr kirin.

T.G.: Gelek raboriyên wî hebûn. Rapora MÎT’ê, di aliyê din de jî Evren naxwaze Serok-Komariyê berde.

---.: Wê ber bi hejandinekê ve biçe. Me vê bi hinek nivîskaran re nîqaş kir. Dewleta Tirk bê serkêş e û di rojeva wî de jî enternatîfeke nîne. Em li ser van mijaran daxivin.

F.G.: Gelo neçûyîna we ya li Kurdistanê, rê li ber qutbûna we ya ji gel re naveke?

---.: Ev kar bi rêxistinî tê kirin. Yanê gel tê.

F.G.: Hûn bi riya mirovên ku tên vir re girêdanê çêdikin?

---.: Riyên cûr be cûr hene.

F.G.: Rêyên çawa?

---.: Cuda ne. Ya din jî têkiliyên me qet bi welat re qut nebûne. Em dikarin di Îran, Iraq û Ewrûpa re bikevînê. Ez herî zêde di hûndir de me. Zêde der nakevim. Car heye ku ez hefteyeke dernakevim.

F.G.: Peymana ku par di navbera Tirkan û Surî de çêbûyî, gelo li gel we guhertinek da çêkirin?

---.: Bêguman da çêkirin. Di sînor de gelek tengasî da avakirin. Ji bo ku rewşa me bê fêmkirin, pêwîst e hevdîtinên pir berfireh bêne çêkirin. Gelek tiştên ku bêne gotin hene.

F.G.: Çima li vir?

---.: Li gel me dema ku gel bi tiştek bawer kir, bi hezar salan bawer dike. Dema ku hinek bandora manevî çêbû zû bi zû naşike.

F.G.: Nûçegihanê Tirkiyê Le Monde di rojnemeya Fransî de nivîsek nivîsandibû, gelo ew nivîs gihişt destê we?

---.: Rast e, gelek kêmbûnên wî hebû.

F.G.: A rastî ew, PKK'ê û ARGK'ê baş dinase.

---.: Kurdologên Rojava û derûdorên ku bi pirsgirêka Tirkan re mijûl dibin ji tiştên baş sûd werdigirin. Ya yekem çapemeniya Tirkan; ya duwem jî, serokê tevgerên li Başur yên ku mercên heyî asteng dikin. Mîsoger ew jî ne di rewşeke ku rastiyên me vebêjin de ne.

F.G.: Mîsoger e ku hûn Michel Pere bênin vir û rastiyan jêre bêjin. Michel Pere, Tirkolog e, ew jî weke hemû Tirkologên Tirkan li hember Kurdan e.

---.: Ew gelek zelal e. Rastiya Kurdistanê ji hêla serdema me ve rastiyeke ku hatiye mehkûmkirin. Hem li Rojava hem jî li Rojhilat bi vî rengî ye.

F.G.: Na, tenê metotên PKK'ê têne tinekirin. Ev ne fikra me ye, em dîtinên derûdor vedibêjin.

---.: Sîh, çil parlementer têne tevlî mehkema Haydar Kutlu dibin û doza wî weke serdemeke îlan dikin û piştre bi balefirekî diçin û teslîm dibim. Bi faşîzmê re ketin nav hevkariyê. Wiha ev doz kirin doza serdemekê. Serê sîh hezar mirovên me jêkirin, sîh hezar di îşkenceyan de mirin, ji dused kesan re îdam xwestin. Lê girîngiya ku dihat xwestin nedanê, ev bi aweyeke vekirî di holê de ye.

F.G.: Lê qala çalekiyên PKK'ê dikin.

---.: Wê demê jî qala "çalekiyên terorîstan" dikirin.

F.G.: Gotina "Terorîst" her dem di wateya xirab de nayê

bikaranin. Gelo Filistînê jî bi terorîzmê dest bi kar kirin.

---.: Xweziya me jî li hember artêşa Tirk terorîzmê bikiriba. Di vê mirov artêşa Tirkan baş binase. Ewrûpa nizane, tenê terorîzma Osmaniyan dizane. Fêrbûneke wan heye ku gelan ji kokê rakin. Ermeniyan jî vê dîtin û jiyan kirin.

F.G.: Belê, lê di meha Hezîrana ku derbas bûyî de di çalekiyên we kirin de jî gelek mirov hatin kuştin. Mirov nikare li pêşiya van jî bigire.

---.: Rastiyên şer cuda ne. Li hember me yêkîneyên taybet, tîmên taybet û cendirme didin şerkirin? Bi taybet jî li Îngiltere û Almanya yêkîneyên komandoyên taybet, cerdevan û MÎT dixebitin. Hemû rêxistinên sifîl, muxtar, weşanên çapemeniyê li hember me di nava şereke de ne û me jî heya dawî wehşî, bêhest û yên ku taybetmendiyên mirovahî li gel wan nînin didin pejirandin. Li hember me propagandeyên pir dijwar tên meşandin. Yanê propagandeyên reşkirinê sînor nasnake. Şerê ku tê meşandin divê baş bê nasin. A rastî heke ji raya giştî re tiştek bê dayîn divê taybetmendiyên şerê ku tê meşandin bê dayin. Ji ber ku rêgezên şer hene, ew rêgez di şerê heyî de tên binpêkirin. Servîsên MÎT’ê ji bo bidin xapandin li Ewrûpayê gelek xebitin. Gelek mînakên balkêş hene. Raya Ewrûpa ya giştî jî jixwe du saziyan eleqedar dike. Mînak, ji bo ku rejîma Tirkiyê mafdar derbixin ji Papa dest bi kar kirin. Her kes dizane ku M. Alî Ağca zilamê dewletê ye. Hesap dikirin ku bi lêdana Papa re wê raya giştî li hember terorîstan derbikevin. A rastî artêşê wî ji girtîgehê derxistibû. Nurettin Ersin alîkarê Evren e. Bûyera Palme jî pir vekiriye. Wî jê ji bo ku raya giştî ya fireh li hember me bide bikaranin pêş xist. Weke din jî gelek çalekiyên biçûk yên mîna vê hene. Ev, pîsîkolojiya ku polîsên Tirk didin

meşandin û wê her tim bikin. Me heta vê nehilda cidiyetê jî.

(....)

Ji ber ku berjewendiyên wan têde heye ku rejima Tirk diparêzin, di vê mijarê de berjewendiyên hemû cîhanê têde heye. Berjewendiyên kesê zêde di azadiya gelê Kurd de nîne. Mirov dikare tenê çendekan destnîşan bike. Di rastiya Kurdistanê de ne di Rojava de, ne jî di Rojhîlat de zanebûneke wan heye. Şemartek e, mîsoger pîvan di vir de cuda ne.

F.G.: We bi Talabanî re protokoleke mohr kir. Beriya hingê Talabanî li Îsveçê di rojnameyeke de we rexne kiribû, gelo we xwend? Talabanî mirovekî xatirê wî tê girtin. Di rojnameyan de wêneyên wî derketin we dîtin? Bi Talabani re têkiliyên we yên baş çêbûn? We çend car hevdîtin çêkir?

---.: Di sala 80'î, 81'an de û niha.

F.G.: Talabanî her tim nêrînên xwe dide guhertin, gelo ev we tengav nake?

---.: Rast e, ev taybetmendiya wî, nav û deng e.

F.G.: Hûn di navbera xwe de daxivin?

---.: Ger ne pir hoşta bûya wê nebaş bûya. Ji ber vê yekê pêwîst e ku em vê mijarê baş îdare bikin. Ger pêwîst bike li xweşî Talabanî çi bê em ê wê bikin. Ji bo ku em wî di riya rast e bigirin.

F.G.: Min di meha Adarê de li Londrayê bi Talabanî re hevdîtinek çêkir. Got ku min ji bo aşitiyê ji Kemal Burkay re agahî

rêkiriye, rast e?

---.: Me got ku em amade ne. Kî dixwaze têkoşînê bike em bi hemû derfetên xwe ve li gel in.

F.G.: Ez bawerim Kemal Burkay red kir.

---.: Me venexwendibû, kesê ku dixwaze bi me re hevdîtin çêbike dikare bê. Baweriya me bi me heye.

T.G.: Di Kanûna 87'an de hevdîtenek çêbû.

---.: Ew ne ez bûm nûnereke me bû.

T.G.: Li baremberî hev gelek merc danîn holê.

---.: Di navbera me de mercên bi vî rengî nîne… Katîlê zaroka dewlet e. Di destpêka dîrokê de heya niha ev wisa ye.

F.G.: Talabanî dibêje; "protokola bi PKK're ez encex li ser şertan dikim. Ger ku rexnedayîna xwe bidin…"

---.: Talabanî her tim wisa daxive. Di navbera me de tiştek wisa nehatiye nîqaşkirin. Ev lîstikên dewletêne. Ger Talabanî wisa bike, wê weke ku pileyan (puan) kom bike lê bê? Ya girîng ew e ku bi rastî jî derfeteke me wisa heye, em bi hev re tevbigerin an na?

F.G.: Wê demê we çima beriya niha nekir?

---.: Sala 82'an çû bi rejîma Iraqê re lihevkirinek çêkir. Ancex dema hat û şûnde çêbû. Fermanên Îranê bi cî danî. Dema ku Îran destûr da û şûnde karîbû derbikeve. Ji ber hevkariya Îran, Tirkiye û

Iraqê pir xurt pêş diket destûr danê.

F.G.: Ma têkiliyên Talabanî bi Îranê re baş e?

---.: Piştevaniya xwe hemû ji Îranê digire.

F.G.: Hûn bi vî rengî erê dikin?

---.: Şer e , taktîke û mîsoger pêwîst e. Yanê di cîhanê de Talabanî balkêş e. Li Emerîkayê wiha gotiye: “Min ji Ozal re nûner rêkiriye da ku têkiliyên xwe ji Iraqê qut bike, ez ê jî têkiliyên xwe ji PKK’ê qut bikim.” Ev nivîs di Cumhuriyetê de derket. Kengê mecbur mane bi me re têkiliyan dînin? Têkiliyên Tirkiyê û Iraqê ji ber ku li Îranê jî kete rewşeke nebaş hatin gel me. Têkiliyên wan yên bi me re ji wan re hêz dide avakirin. Ji ber vê hatin.

F.G.: Ez bawerim ji ber vê jî ne baş in.

---.: Bêguman.

F.G.: Weke ku bi KDP’ê re bûyî, sibe bi Talabanî re jî bibe wê ji bo we nebaş bibe.

---.: Dibe ku bikin. Lê me jî ev rewş diyar kiriye. Dema ku li hember me helwest girtin em ê jî girseyê bixin navbera wan. Nikarin gav bavêjin. Tedbîra ku me girtiye ev e. Em têkiliyên bi Tirkiyê re qebûl nakin. Bi Kurdistana Iraqî re jî heman rengî bû, yanê tişta ku hêla ew bi me re têkiliyan daynin gel e.

F.G.: Hevdîtinên ku geh bi vî dewletê re, geh bi dewlateke din re danin, li derve bandoreke xirab dide avakirin.

---.: Bêguman wisa ye. Ti Kurd nikare ji derveyî me bi vîna xwe ya azad gaveke bavêje. Pêwîst e vê bizanibin.

F.G.: Dema ku min di meha Adarê de pê re hevdîtin çêkir, ji min re got ku problemên Kurdan ne li Tirkiyê û ne jî li Îranê heye.

---.: Vekiriye ku dixwaze bi Tirkiyê re têkilî deyne. Ev jî Îran ferz dike. Ya din jî dixwazin têkiliyên Tirkiyê û Iraqê xira bibe. Me gelek bi vê hesandin. Ji bo xatirê Tirkiyê xwestin ku me tecrîd bikin. Lê me vê vala derxist. Sedema nakokiyên di navbera me û KDP'ê de ev bû.

F.G.: Tirkiye dixwaze navbera PKK'ê û KDP'ê xira bike?

---.: Niha taktîk ev e: Îran dixwaze Tirkiyê bikişîne gel xwe. Ji bo qezenckirina şer ev pir girîng e. Ji ber vê dixwaze ji rewşa me ya heyî ya bi Tirkiyê re sud wergire. Dibêjin "ger ku hûn têkiliyên xwe yên bi Iraqê re qut nekin, em ê jî piştvaniya PKK'ê bikin û pê re têkilî deynin." Tirkiyê jî têkiliyên xwe ji Iraqê qut nekir. Weke ku qut nekir, herî zêde alîkarî dayê. Bêguman ev bû sedem ku têkiliyên me ji nû de xweş bibin.

F.G.: Sedema li hevkirina PKK'ê û Yekitî ji bo ku nêzî Îranê bibin bû?

---.: Dê vê jî hêsan bike.

F.G.: Heya niha Kurd neketine nava lihevkirinên bi vî rengî. Herî dawî PKK'ê…

---.: Em hinek fêrî nakokiyên herêmê yên ku li ser pişta kêra tûj dimeşin bûn. Me nakokiyên Erabîstanê, şerê Îran-Iraq û têkiliyên

Tirkiyê yên bi welatên herêmê re nirxand. Gelek zehmet tê, lê bi sînor jî be, me vê ser xist. Di dîrokê de cara yekem çêdibe û bûyereke nû ye.

F.G.: Yanê baş e?

---.: Ger ku em xwe baş bigirin, hêza xwe kom bikin û li ber xwe bidin dibe.

(...)

---.: Ji derveyî welat jî wargeh têne avakirin.

G.Z.: Yanê lî wergehê ji derveyî Kurdan, ma Tirk jî hene?

---.: Tirk jî hene, komên dostan jî wê bên.

G.Z.: ....

---.: Dibe ku giştî be.

G.Z.: Li vir hûn çend kes hene?

---.: Tê guhertin, lê nakeve jêrî sedî.

G.Z.: Di roja me ya îro de çend mîlîtanên PKK'ê li Kurdistana Tirkiyê şer dikin.

---.: Ne diyar e. Lê têkiliyên tevgerê bi awayên cûr be cûr mijara gotinêye. Serî kêlî tê guhertin. Bingeha wê ya gel pir fereh e. Dikarim bêjim ku di 50 şûnên ku em lê dimînin de komên me yên berxwedanê yên bi çek hene û hema bêje gihîştine hemû herêman. Hêjmara wan her tim zêde dibe, hêjmara koman wê 50'î derbas

bike. Her tim di tevgerê de ne, bi tiştek ve nayên girêdan. Wê her roj bikevin nava sedan gunda. Wê dem dem bikevin bajaran jî. Wê li gundan civînên vekirî çêbikin û wê tevlîbûn zêde bibe. Jixwe her roj tevlîbûn zêde dibe. Şervanên ku hêjmara wan hezarî derbas kirine hene.

G.Z.: Yanê Peşmerge?

---.: Na, ev ne şagirt in, kadro ne.

G.Z.: Niha li Tirkiyê çend mîlîtanên PKK'ê girtîne?

---.: Nêzî hezar mîlîtanên me yên girtî hene. Ji dusad û pêncî kesî re îdam dana. Her roj bi sedan girtin çêdibe. Her tim girtin û berdan çêdibe. Di oparasyona herêmekê de hema bêje hemû tên girtin. Ji van girtinan, hinekan dixin hundir û hinekan jî berdidin. Ev rewş hemû parçeyek ji jiyanê ne. Heya niha ez bawerim tenê di Kurdistanê de, yên girtine û piştre berdane jî têde, nêzî dusad û pêncî hezar kes di girtîgehan re derbas bûne ango hatine girtin. Her tim oparasyon hene û şevê jî ji gund derketin qedexeye. Tim û dayîm tên nufûsan destnîşan dikin. Her roj mirov tên li qerekolan hebûna xwe îsbat dikin. A rastî ev jî girtinek û serweriyeke nû tê hesabkirin. Jixwe rewşeke şer mijara gotinêye.

G.Z.: Têkiliyeke PKK'ê bi tevgera Ermeniyan re û taybet jî bi ASALA'ê re heye?

---.: Na. Berê hinek hatin, xwestin nîqaş bikin. Ji derveyî dostaniya kesan bi ti rêxistinan re têkiliyên me nîne. Jixwe ASALA bixwe jî niha nîne. Lê mijara ku dîroka Ermeniyan di qetlîamê re derbas kirine rast e. Hemû ji welatê wan derxistine û li her çar aliyan belav kirine. Dema ku bixwazibin têkoşîna vê bidin em ê li

hember wan rêzdar bin. Pirsgirêka Ermeniyan ya netewbûyînê heye, lê ev jî ne pirsgirêkeke xakê ye, pirsgirêka ku Tirkiyê vê katlîamê binase ye. Em ê dawazên wan yên bi vî rengî destek bikin. Em nêzîkatiyên wan yên kesî û terora wan ya li hember sivîlan jî rast nabînin. Ji ber ku pir zêde zerarê didin.

G.Z.: Di demên dawî de li Kurdistanê hinek çalekiyên ku jin û zarok jî tê de bûn çêbûn. Yanê em wan fêm nakin.

---.: Dewleta Tirk ji bo ku gel bi hev bide kuştin pergala cerdevaniya gundan pêş xist. Bi rastî jî di dîrokê de heya niha hewldanên wan yên bi vî rengî çêbûne. Ji vê polîtîkayê re tê gotin ku, "Kurd' bi Kurd bide şikandin" ango bi awayeke din "bi dehfdanê bişkîne" dibêjin. Ji vê re ev nav lê dikin. Mînak; artêşa TC'ê, ya ku mîlyonek heye û hemû cûreyên teknîkê di destê wî de heye li hember komên me yên biçûk herî kêm nêzî deh hezar kes derdixe. Balefir û sîstema hemû cûreyên bombabaranê li gel heye û bikar tîne. Ev têr nabîne ev car sivîlan jî dixe nav vî karî. Dîsa li Kurdistanê dozên xwînê hene, ev rewş dibin sedema kuştina jin û zarokan. Ji vê re jî tê gotin ku tolhilanîna gundîtî. Bêguman ev şêwe, ne şêweyê şerê me ye. Dema ku hinek vê li ser navê me dikin, em qebûl nakin û ser wan de diçin. A rastî ev jî provokasyoneke ku dewlet dixwaze pêş bixe. Me xwest ku vê siyasetê jî vala derbixin. Valaderxistina polîtîkayên dewletê yên tinekirinê gelek girîng e. Di hemû serhildanên ku li Kurdistanê pêş ketin de ev bi awayeke vekirî hatiye dîtin. Bi hezaran jin û zarok kuştine. Mînak netewa Ermeniyan wisa belav kirin. Çapemeniya Tirkan vê mijarê bi zanebûn berevajî kirin. Politikayeke rêxistina me ya ku jin-zaroka bikuje nabe. Lê dewlet jî di vê mijarê de pêşkariyan dike. Carna jî dixwaze şerê gund û eşîretan jî bike malê rêxistinê. Jixwe niha ev tişt nayên rojevê. Talîmatên me yên ku hûn nikarin van tiştan bikin heye. Ger ku ji

niha û şûnde tiştên wisa bibin, divê bi van sedeman ve bê destgirtin. Heta ku ji destê me tê em leşkerên Tirkan jî nakujin. Em hinekan digirin û cardin diberdin.

G.Z.: Heya niha PKK'ê di navenda leşkerî de têkoşîn kiriye. Ji derveyî vê navendên we yên çandê hene, yanê dibistanên we hene?

---.: Her çendî têkoşîna me di dîtinê de wisa be, lê di cewher de têkoşîneke siyasî ye. Têkoşîna polîtîk rê li ber azadiya çandî jî vedike. Li gel me têkoşîna leşkeri, ji ber pêşxistin û parastina politikaya şoreşgerî ye. Armanca wê ya bingehîn jî ev e, ger ku pêşkeftinên polîtîk çênebin, pêşkeftinên çandî jî çênebe. Bi rastî jî ji bo rakirina qedexeyên li ser ziman jî têkoşîneke dijwar a siyasî dixwaze. Heta ev zîndîbûneke çandî pêş dixe. Çanda Kurdan di wateya xwe ya rast de politikayeke şoreşgerî ye. Di bingeha xwe de ji nû ve dide afirandin e. Mesela, li Ewrûpa hinek dibistan hene, di wan dibistanan de tenê xwendin û nivîsandin heye, yan jî yek-du xebatên pir lewaz dixwazin pêş bixin. Bi awayeke eşkere derket holê ku ti sûdeke xwe nîne. Rizgariya çandê bi rizgariya siyasî ve girêdayî ye. Bi taybet jî, xwe dana qebûlkirin bi vî rengî dest pê kir. Rastiyên ku me derxistine holê resen in. Tiştên ku İsmail Beşikçi dikir ev bû: Hewl dida ku hebûna Kurdan bide îzbatkirin. Kurd ancex dikarin hebûna xwe, bi riya şer re bidin nîşandan. Bi xwe revî. Lê wekî îlimdarekî nirxê wî heye

G.Z.: Ez texmîn dikim, niha ne şoreşger e.

---.:Na, li Anqerê rûdine. Li Kurdistanê nexweşiyeke wisa heye: Ji ber ku her tim hatiye perçiqandin, dema ku yek xebateke çandî an jî îlmî dide meşandin ew kes hema weke keseke siyasî ango rêxistinekê tê nirxandin. Ev jî ne rast e.

G.Z.: Têkiliyên we niha qet bi Lîbyayê re hene?

---.: Na, lê kom û alîgirên me di nav karkeran de hene. Lîbya hemû tevgerên di cîhanê de destek dikir, lê me destek nekirin. Herî zêde Kurdên li Iraqê destek kirin.

G.Z.: Di vê rewşê de Lîbya hebûna Kurdên li Iraqê qebûl kiriye.

---.: Qebûl dike. Hebûna me jî qebûl dike, heta dibêje; “bila dewlet ava bikin.” Di televizyon û rojnameyan de qala van dike. Lê ev ne bûye destekeke pratîkî. Ez bawerim di vir de rola Tirkiyê heye. Dibe ku di vê mijarê de hevpeymaneke wan diyar hebe.

G.Z.: Dibe ku hinek pirsên me din jî çêbibin.

---.: Mînak; di derbarê Sovyetan de...

G.Z.: Belê, li ser wan...

---.: Em serbixwe ne. Di vê mijarê de bi ti awayî alîkariyeke wan ya madî ji me re çênebûye. Ji ber ku naxwazin navbera xwe û Tirkiyê xira bikin, ya din jî polîtîkayên wan yên aşitiyê hene. Dibêjin, em naxwazin di herêmê de şemeteyeke nû derbixin. Nêzîkatiyên wan herî zêde cemidandin e. Yek din jî rewşa TKP’ê (Partiya Komûnîstên Tirkiyê) heye. Ji ber van sedeman li hember têkoşîna me sar in. Lê dixwazin ji têkoşîna me jî sûd werbigirin. Naxwazin navbera xwe û Tirkiyê xira bikin, ji ber ku dixwazin ji nûkleer-fûzeyên di Kurdistana Bakur de bi cîh nekirinê re sûdê werbigirin. Ez bawerim hinek mijarên din jî mane. Terora li Ewrûpayê û weke bûyara Palme Ağca…

G.Z.: Rast e.

---.: Ew jî herî zêde rêxistinên îstîxbaratê; yên Emrîka, Ewrûpa ne, ev provakasyon ji bo rêxistinên îstîxbarata Tirkiyê û xebatên wê bişkînin pêşxistine. Yê ku li Papa xist, M. Alî Ağca bû, ew jî zilamê rejîmê bû. Lê wan bi vî dane kirin, qaşo dibêjin Tirkiye “li hember terorîzmê ye,” û “terorîstan paqij dike” lanse dikin, loma di raya Ewrûpa de nîqaşên ku piştgirî didin wan hene. Palme, yek ji serokên demokratên civakî bû. Bi lêdana wî re xwestin ku PKK’ê ji girseya gel ya sosyal demokrat qut bikin. Bêguman sedema van çalekiyan ew bû ku xwestin li Ewrûpayê partiyê tehşîr bikin. Niha ev baştir tê fêm kirin. Her kes dizane ku ev senaryoya ku dibêje “li PKK’ê hat xistin” MÎT’ên Tirkan derxistiye. Li gorî me hin jî provakasyonên biçûk hene. Ti têkiliyên rêxistina me bi terorîzmê re nîne. Nikare çalekiyên terorîzmê bike. Li Ewrûpa de li hember Avrûpiyekî/ê qet tevgereke me ya terorîzmê çênebûye. Ne balefîr, ne jî zilam revandin, ti niyet û pêşnûmeyên me yên bi vî rengî nîne. Di destpêkê de heya niha polîtîkaya me bi vî rengî ye.

G.Z.: Min ji bîr kir ku bêjim...

---.: Bi rastî jî raya Îtalya li gorî welatên Ewrûpa yên din ji rastiya me bêxeber e. Girîng e ku ew jî bêne ronîkirin. Ez bawerim di mijara Kurdastanê dayîna naskirinê de wê roleke wî ya diyar çêbibe. Bi navbertiya wî re me hewl da ku rastiya we hinek fêm bikin. Weke ku min duh jî anî ziman, rastiya Kurdistanê ji hêla hişmendiya serdema me ve bêyî ku maf kiribe hatiye jibîrkirin û heta hatiye mehkumkirin. Ev rewşeke bêmafî ye. Tevgera me jî dixwaze vê daraziya bêmafî bide guhertin. Di vê mijarê de hewl dide ku hişmendiya mirovên pêşwazîxwaziyekî bike, di pratika xwe de, di nava gelê Kurdistanê de wateya xwe bigire, dixebite û hişmendiya

mirovên pêşwazîxwaz dixe bin xizmeta gelê Kurdistanê. (....)

Bêguman, ji bo ku raya rewşa me baştir fêm bike, ez ê bi mînakeke kurt gotinên xwe bi dawî bikim. Ez dixwazim di derbarê pirtûka Gromovskî ya bi navê “Hikûmdar” şîroveyeke biçûk bikim. Pirtûka “Prens,”Makyavel. “Prens” dibêje ku, “wê demê ji bo yêkitiya Îtalyan tişta ku Makyavel xwest dirûv bidiyê, mîlîtan û rêxistina roja îro bû. Wê demê civaka Îtalya paşketîbû, ji bo yêkitiya wan pêwîstî bi Prensek mezin hebû û divê Prensek baş bûya. Divê çawa bimeşîne? Bi rewşa me ya niha ve gelek tiştên dişibin hev hene. A rastî hewldana lêhûrbûna me ya ku em li ser tevger û mîlîtanan didin çêkirin jî ev e, gelo em ê meseleya têkbûnê bi kîjan mirovî re pêk bênin? Wiha PKK ev e. Şibandineke wiha wê rê li ber mirov baştir PKK’ê, binase veke. Bi vê şibandinê re bi tevgerên çepgir û heta rêxistinên têkoşînên netewîyî re neyên tevlîhevkirin. Di wateya ku min ji bo Kurdistanê bi kar aniye de wiha ye. Rêber ev e. Ez di wê baweriyê de me ku wê raya Îtalya li ser vê bingehê me binase. Li ser vê esasê ez rêzdariya xwe didim nîşandin.

GZ. : Ez jî...

---.: Ger çêbibe em dikarin ji niha û şûnde hinek kom bikin, ger ku piştre pirsên we hebin em ê bersiv bidin.

G.Z.: Ji bo em we bibînin, me gelek hewl da û em naxwazin vî şansî ji dest berdin. Divê em vê baş…

---.: Tabî, em ê alîkar bibin.

G.Z.: A rastî Kurd dikarin gelek tiştên baş bikin. Nivîskareke nivîsandiye û dibêje ku zimanê Kurdan ne  zaravayeke, zimanek e.

---.: Ew nêzîkatiyeke bihêz e.

G.Z.: Marko Polo jî qala Kurdistanê kiribû...

---.: Tabî, di bîranînên wî de hebû.

G.Z.: Ez herî zêde qala Îtalyayan dikim. Li gorî ku tiştên li Sîcîlya nivîsandine, parçebûna Îtalya jî şibandiye Kurdistanê.

---.: Ji bo şibandinê min Makyavel mînak da. Rewşa PKK'ê mirov dikare bişibîne rewşa Îtalya ya di salên 1860'î de. Dikarin bişibînin raboriya Îtalyayê.

G.Z.: A rastî ez ê tiştên ku rojnemavanên din gotine bibêjim. Çêbûna we...

---.: Ez tiştik lê zêde bikim. Dikarin ji hev sûdmend bin. Gelo tiştên ku min negotine bêjim, wê baştir nebe?

G.Z.: Ji ber ku ez tenê hatime, dibe ku ez nûçeyên xwe nedim guhertin.

---.: Baş e çêbû. Fransa hilbijartinan çawa dide dest?

G.Z.:Xemgîn im, lê ez li benda wê bûm.

---.: Çima, hûn çima xemgîn in? Ma hûn Sosyalîst in?

G.Z.: Ji ber ku me ser nexist. Me ser xist, lê tenê bi serê xwe nayê meşandin.

---.: Baş e, dîsa ji bo Fransa bixêr e. Paşketina çepan mijara

gotinê ye.

G.Z.: Pêwîst e em hinek zêdetir bixebitin.

---.: Dibe ku ji baweriya wan zêde bi wan hebû, kêm xebitîbin. Ger ne wisa bûya, mîsoger wê hêjmara zêde bigirtiban.

G.Z.: A rastî ne ji bo ku zêde nexebitîn, ji ber şandinên virde wurde û hêjmareke zêde ya sosyalîstan ji bo komûnîstan deng bi kar anîn.

---.: Hinek ji rast ê sîgorte kirin. Komûnîst evya fêm nekirin. Ew texmîn dikin ku hêjmara dengên wan zêde bûye.

G.Z.: Lê belê pirsgirêk ev e ku wê komînîst, di nava me de ji bo serkeftina rêveberiya sosyalîst ya partiyê asteng bikin.

---.: Rast e, wê komûnîst...

G.Z.: Di vê rewşê de partiya Sosyalîst dê hewl bide ku xwe nêzî navenda rastgir bike, ev ê jî baş nebe.

---.: Dibe ku tê de xapandin hebe û bi wan re têkilî jî pêş bixin. Lê dîsa jî baş e, li gorî ChIraqê baş e.

G.Z.: Tevî her tiştî winda kir.

---.: Tabî baş e. Bi Tirkan re jî ket nava têkiliyên erzan.

G.Z.: Lê ev nayê wê wateyê ku dê sosyalîst nikaribin van têkiliyan biparêz in.

---.: Wê bidomînin, jixwe ev ne pirsgirêke, lê wê dîsa jî

pêwîst bi demokrasiyê çêbibe. Ez bawerim wê bi qasî wan bê pîvan tevnegerin.

G.Z.: Îhtîmale ku serokê komîsyona têkiliyên derve li milê rastê bîmîne. A rastî dibe ku rewşeke balkêş derkeve holê.

---.: Çî ye, ma di hundir de tiştên bêrêzik heye?

G.Z.: Di navber de hevsengiyek baş heye.

---.: Gelo, em dikarin bêjîn ku hevsengiya di navbera wan de bi biryar e?

G.Z.: Hevsengî wê hinek bidome. Ji ber ku navendparêzî herî zêde di rewşa parastina civakê de ne. Navendparêz nikarin tiştek bikin.

---.: Weke ku li Almanya bûye...

G.Z.: A rastî navendparêzên ku niha li Almanya dikarin di vî alî û wî alî de biçin. Mitterand girêdayî politikaya ABD'ê ye. Halbûkî Fransa di vê mijarê de serbixwe ye.

---.: Rola Fransa ya navnetewî ji ya Îngîltere baştir e. Polîtîkaya Îngîlîzan berbat e. Di dîrokê de gelên ku ABD'ê di aliyê xirab de bikar neaniye nehiştiye. Yek ji berpirsiyarê yekem yê rewşa me ya îro jî ew e. Di belavkirin û parçekirina Kurdistanê de rolake wan gelek mezin e. Hin jî em nikarin vê birînê bigirin. Sedema ku kirin du parçe, ji ber petrola Musul-Kerkûk bû. Ew bi qedera netewan gelek lîstin. Ermenî jî di vê dîrokê de tine bûn. Yanê rola Îngîlîzan pir cuda bû.

G.Z.: Em carek din dest bi pirsên min bikin. We duh got ku ez çil salî me.

---.: Civaka Kurd zêde pêş neketiye. Ez li Rihayê hatim dinê û di gundike feqîr de.

G.Z.: We perwerdeya huquqê dît?

---.: Na, siyasî.

G.Z.: We perwerdê xilas kir?

---.: Di refa dawî de min terikand. Sedema wê jî ger me xilas bikiriba em ê biçûbûna leşkeriyê. Me çar sal hem ji bo leşkeriyê pişt xist û hem jî ji bo xebatên siyasî terikand. Ji bo me serbûxwebûn bêyî ku bi netîceyeke ve girêdayî be, di wateya ramanên îdeolojîk û siyasî de xwe sererastkirine. Yên ku di destpêkê de xwe neyînin rewşeke serbixwebûyînê û fikir û keseyeta xwe serbûxwe neke, wê ber bi serxwebûnê ve neçe, wê pêş nekeve û pêş nexin. Wiha me gelek girîngî da vê rêgezê. Ev rêgez cudahiya me ya ji komên Kurdan yên din bi awayeke zelal danî holê û her ku diçe pêşkeftinên riya me ya ku em tê de diçin bi awayeke zelal derdixe holê.

G.Z.: Di ajansa nûçeyên Îranê daya TAS'ê, de wiha dibêje; di encama hevkirina protokola ku di navbera PKK'ê û Yekitî de çêbûyî, ev hêz polîtîkaya xwe diyar kirine. Dibêjin wê herdu rêxistin ji bo serbûxwebûna netewî şer bikin. Didin diyarkirin ku pêwîst e herdu alî bi hev re berxwedana şoreşgerî bilind bikin. Ez dixwazim li vir vê bizanibim, artêşbûn baş e ango ne baş e. Ji ber ku min cara yek bihîst ku Celal Talabanî û Barzanî qala serbûxwebûna Kurdistanê dikin.

---.: Niha pêwîst e ev hevgirtin weke nêzîkatiyeke feresetê bê destgirtin. Me beriya niha jî û di salên 80’î de jî tiştek wiha kir. Wê demê em hinek nêz bûn. Lê piştî ku bi rejîma Iraqê re ketina nav pêvajoyeke lihevkirinê û şûnde ev qut bû. Dema ku xwestin carek din li hember Iraqê têkoşîn bikin, pêwîstî bi têkilî danînê dîtin. Jixwe em li ser bingeheke rast amadene ku bi hemû Kurdên welatparêz re hevgirtinê çêbikin. Ew jî niha qala serxwebûn û azadiyê dikin. Mafê çarenûsa netewan ya destnîşankirinê dike armanc. Lê diyar dibe ku li ser esasê armancên pratîkî nêzî hev dibin. Mînak daxuyaniyeke ku li Washingtonê dayîne heye. Dibêjin; “ger ku Tirkiyê bi Iraqê re têkiliyên xwe berdewan bike, em ê jî bi PKK’ê re bidin domandin.” Ev dide diyarkirin ku ev têkilî li ser pêwîstiyên pratîkiye. Tişta ku herî zêde derdikeve pêş ev e. Tabî bingeh û hêza tevgerê heye. Li wan cihan yekbûna feresetê zêdetir bibandor dibe. Dema ku bi TC’ê re dikevin nava têkiliyê, weke ku beriya niha jî bûyî sînordar dibin. Bi xwezayî bigihin armanca xwe ya pratîkî û negihin jî xizmet ji yekbûnê re dikin. Daxwaza yekbûnê hilbijartin ji bo ku di nav gel de rûmeta xwe bidin qezenckirin e. Ger ku têkoşîn pêş bikeve û ew jî bixwazibin berxwedanê pêş bixin, wê ev yekbûna bi hev re xurt bibe. Heta dibe hêzên din jî tevlî nav wan bibin. Wê destpêkirana hevgirtineke nû derbikeve holê û wê xizmet ji hevgirtinên giştî re jî bike. Ji ber ku du feresetên bingehîn in. Di vê wateyê de dibe ku rê li ber pêşkeftinan veke. Lê heke tenê berjewendiyên taktîkî li pêş bêne dîtin, dibe ku zêde berhemdar nebe. Heya ku ji destê me bê, em ê wan li ser têkoşîneke rast, di riya serbixwebûnê de kaşbikin.

G.Z.: PKK’ê bi hêzên Barzanî re têkilî daniye lê di encam de wê veder kiriye.

---.: Weke ku min gotî, dikarin li ser feraseta ku min qal kirî lihev bikin. Di destpêkê de wan jî xwestin xwe bi awayeke xwedî hêz

bidin nîşan. Ya din jî lîdertiyeke wan a feodal û eşîrtî ya çil salî heye. Di vê mijarê de ev demek dirêj e ku xwe serwerê Kurdistanê dihesibînin. Li gorî xwe xeteke taktîkî û stratejîk diyar kiribûn. Dixwestin her kes ji xeta ku diyar kirine re xizmet bike. Heya ku bi me re ketin nav têkiliyê jî rewş hinek bi vî rengî bû. Weke demên derbasbûyî, xwestin me di nav xwe de bihelînin û bawer dikirin ku wê me ji bo xizmeta xwe bi kar bînin. Feraseteke wan ya din jî ev bû; Kurdistana Iraqê kirina navend, heye ku hukmê zatî neyê bidestxistin, pêwîst e ku rêxistinên parçeyên din qet dengê xwe dernexinin. Ji lewre diviya her kesî ji wan re jî xizmet bikiriba. Lê piştî ku wan meseleya Iraqê fêm kirin û şûnde zanîn ku piştî Iraqê wê parçeyên din bên. Weke ku min gotî, demek dirêj bi vê ferasetê re tevgeriyan. Yên ku li gorî wan neçûn perçiqandin. Me jî vê got: Erdnîgarî, nifûz û ji hêla pêşkeftinên civakî ve jî Kurdistana Iraqê nikare hemû parçeyên din yên Kurdistanê temsîl bike. Berevajî Bakurê Kurdistanê bi erdnîgarî, nifûs û pêşkeftinên xwe yên civakî ve ji bo tevgereke modern yê têkoşîna netewîyî zemîneke herî baş yê objektif e. Di destpêkê de wan bawer nekirin ku em ê li hember Tirkiyê ew qas li ber xwe bidin û li ser lingan bimînin. Lê piştî ku têkoşîna çekdarî hate destpêkirin û şûnde, di cîhanê de nêzîkatiyên wan yên polîtîk hemû serî bînî hev bûn. Herî zêde jî berjewendiyên wan yên çînî serûbinê hev bû. Jixwe piştî hingê jî destûr nedan ku em li Kurdistana Iraqê bîmînin û ji me re qedexe kirin.

G.Z.: Peymana di navbera Iraq û Tirkiyê de ev bû ku artêşa Tirkan biçe Iraqê li hember hêzên PKK'ê û Barzanî şer bike û kampên PKK'ê bombebaran bikin. Di heman demê de gotin ku kampên Barzanî jî hatine bombarankirin.

---.: Ne rast e, Tirkiyê xwest ku çavên wan bitirsîne û wan bi xwe ve bide girêdan û bi rastî jî ser jî xistin. Piştî 85'an û vir ve li ser

hinek tirs û hinek jî berjewendî îtifaqên wan çêbû. Bêguman piştî hingê rewş xirap bû. Bi ketina 85’an re ji bo ku em nekevin herêma sînor Tirkan bi KDP’ ê re hevkarî kir. Piştî hingê jixwe em neçûn Başurê Kurdistanê. Destûr nedan ku em bikevînê. Loma em li Bakurê Kurdistanê biçî bûn. Lê bixwe ziyanê dîtin. Destpêkê hevkariya bi Tirkan re qebûl nekirin, lê piştre bi awayek vekirî kirin. Di radyo û rojnameyan de gotin ku “em bi Tirkan re dost in û bavê me vê ji me re wesyet kiriye” anîn ziman. Ez bawerim di dawiya ev fereseta hevgirtina ku em bi Talabanî re dikin û şûnde wê têkiliyên wan hemûyan asayî bibin.

G.Z.: Beriya we, gelo li vir baregeh hebûn?

---.: Beriya ku serweriya dewleta Surî jî hebe, li vir baregeh hebû. Filîstînî hebûn. Têkiliyên me yên bi Surî re ev in: Surî ji bo xilasiya tevgera Ereban hêzeke girîng e. Tabî nakokiyên wan hem bi Tirkan re û hem jî bi Îsraîlê re heye. Ji van nakokiyan zêdetir, bi Kurdan re dostaniyeke wan heye. Li Surî Kurd kêm in û ne civakeke wisaye ku fikara wan jê çêbibe. Ya din jî pirsgirêkên Kurdên li Iraqê hene. Kurdên li Iraqê li hember Saddam in û Surî jî li hember Saddam e. Ji ber vê sedemê ji mayîna me ya li vir re tiştek nabêjin, ji ber ku mayîneke taktîkî ji bo wan ne xusarê, berevajiyê vê hewayeke dostaniyê derket holê. Bêguman ev ne veguheriye alîkariyeke siyasî û leşkeri. Alîkariya wan a herî mezin ji me re ev e; her çendî bi sînor jî be ji xebatên me re azadiyeke dide naskirin. Li ser sînor mayîna me gelek asteng dikin. Lê li vir derfetên ku hinek serbest tevbigerîn heye. Tabî ev jî polîtikayeke Surî ye. Tenê ne ji bo me, ji bo hemû komên din bi vî rengî ye. Lê dîsa jî girîng e. Weke ku Tirkan jî gotî li Surî kampên me yên perwerdê hene. Lê weke ku dibêjin alîkariya çekan ji me re tê dayîn, ne rast e.

G.Z.: Beriya çend rojan ez bi Kurdên li Qamişlo re axivîm. Gotin ku ev bajar hema hema bêje, bajarê Kurdistanê yê herî mezin e. Kurdên li Iraqê jî li hember rejîma faşîst têkoşîn dikin û gotin ku li Surî wargehên Talabanî jî hene. Pêwîst e dema ku Kurdên herdu parçan li Qamişlo hatine gel hev li hember Surî cephe nedin avakirin.

---.: Rast e, pêwîst e neyê kirin.

G.Z.: Beriya niha Barzanî kir ku Kurdên li Îranê serî hildin… di dema bê ya nêzîk de wê rola Kurdistanê bibe çî?

---.: Li Surî û Qamişlo lêhûrbûnek heye. Pêwîst e ez di destpêkê de tiştek bibêjim, rola Kurdên li Surî piştevanî kirine. Hêjmareke wan ya zêde li Kurdistana Bakurê Rojava ye. Ji ber zilma Tirkan revîne niha di rewşeke îltîcayê de ne. Niha jî ji sedî nod dostên rêxistinêne û piştgiriyeke mezin didin. Berê piştgirî didan Kurdên li Iraqê yanê KDP’ê. Ji salên 84’an û vir ve li gel me cî digirin. Ev jî nêzîkatiyeke rast e, min qala Barzanî kir. Ew ji bo ku ji parçeyên din piştevanî bigirin, mesela wiha dikin, pêwîst e ku Kurdên li Îranê dengê xwe dernexînin. Dîsa heman tişt ji bo Kurdên li bakurê Kurdistanê jî dikin. Yanê hewceye bi ti awayî dengê xwe dernexînin. Bêguman em jî li hember vê derdikevin. Em li gel hemû Kurdên ku tevlî nav têkoşîna azadiya Kurdan dibinin. Ev, ji bo Kurdên Iraq û Surî biçin federasyonekê jî quncav e. Li gorî me û dema ku em rewşa şer didin ber çavan, herî kêm ji bo ku ji ber zextan rizgar bibin, ji bo weke qirkirina li ser Helepçe hatî kirin, ew jî di qirkirineke bi vî rengî re derbas nebin, hewceye bi taktîkên baş tevbigerin. Di mercên heyî de ger bi Îranê re bikevin nav têkoşîneke biçek, wê jê xusarê bibînin. Hinek jî, di destpêkê de şans û derfetên ku ketine destê wan bi kar naynin. Heke ji bo mafên netewîyî

têkoşîn bikin wê baş bibe. Em dibêjîn ku divê rola sereke Kurdistana bakurê rojava bileyîze. Tişta ku em jî bikin ew e ku em ev rola xwe bileyizin. Niha di vê qadê de tevgereke modern ya têkoşîna netewîyî pêş dikeve. Beriya niha jî netewîperestiyek seretayî (îlkel) hebû. Xweseriyê derbas nedikirin. Yê me radîkal e. Bi girêdayî gelê kedkar, şerê gel ê bi taktîkên şoreşgerî tê bi kar anîn, heta xwe dispêre çalekiya raperîna gel.Gerîla jî amûreke vê ye û ev teza me jî bi pêşkeftinan re tê erênîkirin. Di dema bê ya nêzîk de pêşkeftinên heyî hinek jî bi bilindkirina berxwedana yêkitiya Kurdan ve girêdayî ye. Bi taybet heke di warê leşkerî de têkiliyên me bi Kurdên Iraqê re pêş bikeve, yan jî bidome, bêguman em ê tevgera xwe mezin bikin. Gengaz e ku Tirkiyê nêzî lihevhatinê bibe. Alternatîfeke Sosyal demokrat dikare vê lihevhatinê biceribîne.

G.Z.: Sosyal demokrat! Yanê Ecevit ?

---.: Na, lê SHP dikare vê biceribîne. Ger hilbijartinên Serok-komarî Evren-Ozal yên sala 89, dîsa hilbijartinên Serok-komarî û hetanî hilbijartineke din ger ev têkoşîn bidome û pêşbikeve wê bi xwe re guherînên ber bi çav bidest bixwe. Ji bo dema bê ya nêzîk ne dewleteke serbixwe, wê federasyoneke bê avakirin, ev jî di awayeke pratîkî de wê bê bi kar anin. Ev wê beriya dewletê bibe gavek ya pêş in.

G.Z.: Bi dewleta Tirkan re federasyon?

---.: Heke îqtîdareke demokratîk pêşbikeve, tiştek wisa bi Tirkiyê re dibe. Heke pêşkeftinek wisa çêbibe, em ê hewl bidin ku binirxînin. Ev, nayê wê wateyê ku em li hember her tiştî ne.

G.Z.: Di navbera PKK’ê û komên din de têkilî çawa ye?

---.: Di destpêkê de heya niha me xwestiye têkiliyên rast bi hev re daynin û bimeşînin. Ew jî di destpêkê de heya niha di nava ferasetekê de bûn û mercên ku wan bandor dikir û dimeşand hebûn. Du tişt wan bandor dike, yek li Kurdistana Iraqê komên di bin serweriya wan de derketine holê, ya din jî bi navbeynkariya hinek dewletên li Ewrûpa û TKP'ya li Tirkiyê xwe li ser lingan digirin. Di bin serweriya wan ya îdeolojîk û sîyasî de ne.  Berde di hundir de hinek tiştan ango şer pêş bixin, nikarin bi îradeya xwe belavokeke tenê jî belav bikin. Niyeteke wan wisa jî nîne. Piştî rejîma 12'ê Îlonê û şûnde li Ewrûpayê ketin rewşeke penaberiyê. Me têkoşîna çekdarî da destpêkirin ew li hember derketin. Hesap dikirin ku têkoşîna leşkerî li hember wan e. Ji ber ku armanca wan hemû parlamento bû. Mînak; weke yêkîneyeke rast li ser bingeha ku têkoşîna leşkerî tine bikin teslîmê Tirkiyê bûn. Haydar Kutlu yê ku serî TKP'yê dikişand teslîm bû. Ev beşên Komkar, Pêşeng di heman demê de dibe teslîmiyet ê. Jixwe KurdistanPressbi gotina KDP'ê bi Iraqê ve girêdayîne. Rewşa yên din jî bi heman rengî ye. Lê heke em bi Kurdên li Iraqê re hinek têkiliyan çêbikin, ew jî neçar in bên. Derfetên me hene, yên ku baweriya wan bixwe heye wê bên navenda têkoşînê. Ger ku pozîsyona wan jî nebe, em nabêjîn em ê gazî bikinê. Jixwe propagandayên dijberiyê yên ku wan li Ewrupayê di derheqê partiyê de dikirin, têr kir. Beriya ku em derbikevin, ew li wir rêxistin û hêzeke girîng bûn. Hebûn û tinebûna hemûyan yek bû, lê me li vir pêşiya gelek pêşkeftinên mezin vekir. Ev vê dide nîşan: Ew di destpêkê de ji bo avakirina tevgereke xilasiyê ne amadebûn, dîsa Talabanî jî got, "navbera xwe xweş bikin," em ji bo rastkirinê amade ne, hem di warê siyasî de û hem jî di temsîlkirinê de, yanê em ji bo hemû têkbûnan amade ne. Bê şart em li gel yekbûnê ne. Ne lihevkirinên di navbera me de, wê çareseriyên tundî bi xwe re neyîne. Dubendiyên ku di navbera me de hene, em ê bi şêwazên tundî nêz nebin û em ê bi wan şêwazan çareserî jê re

neyînin. Bes e! Werin em ji yekbûnê re xizmet bikin, bila bên gel we û em bi hev re têkoşîna vê bidin. Wî jî got “baş e.” Min van pêşniyarane bir, ev ji bo wan şansê dawî ye. Ger qebûl nekin, wê xilas bibin. Yanê em li vir in, li welat in, bila her tim bên û em bi hev re têkoşîn bikin. Heqîqata me bi vê nêzîkatiyê hemû gel kişand li gel xwe. Cewherê wan çawa be, wê wisa jî tine bibin. Ne di rewşeke ku yek şehîd bidin ango yekî/ê feda bikin de ne. Jixwe ez bawarim yek jî di hundir de nîne. Li Ewrûpa hinek spekûlasyonê dikin.

G.Z.: Hûn dikarin di derheqê têkiliyên di navbera PKK’ê û çepgirên Tirkan de hinek agahî bidin?

---.: Hûn dizanin, piştî 12’ê Îlonê û şûnde beşên çepgirên Tirk yên şoreşger tasfiye bûn. Me di 82’an de xwest li hember Faşîzmê cepheyê berxwedanê bidin avakirin. Lê ji ber îxanetkaran neket fermiyetê. Xwestin ji bermahiyên TKP’ê di bin navê yekgirtiyek çepgir de carek din bihêz bibin û komên cuda bînin gel hev û bidin avakirin. Di wateya reformîst de yanê armanca wan ew bû ku vebijêrka me ya şoreşgerî bixin ango tine bikin bû. Di bin re bin re dixwestin vê bi Tirkiyê re pêş bixin. Ev di çapemeniyê de jî dan peytandin ango diyarkirin. Herî dawî ji bo têkîliyek wisa çûn Tirkiyê. Bêguman dema ku tinekirina me çênebû ango em tine nebûn, rejîmê îtîbar bi wan neanî. Têkiliyên me jî bi wan re pêş neket. Ji ber vê jî bandora me li ser pêşkeftina hêzên demokratên şoreşger, gelek mezin e. Komên dostan pir in. Partî ji muhalefeta Tirkiyê re jî rêbertî dike. Di wateyekê de yanê di kevin de çepên Tirkan li hember me rola biratiyê dileyst. Lê em niha vê rolê dileyîzin. Rewşa me niha gelek bihêz e. Bi têkildariya Kurdistanê re tevgera şoreşgerî serî dikişine.

G.Z.: Bi komên Filîstînê re têkiliyên we di çî astê de ne?

---.: Têkiliyên me dostaniye. Dostaniyeke bi sînor e. Jixwe rewşa wan jî diyar e. Ti alîkariyeke wan ji bo me nîne. Li vir em bi hêza xwe hemû tiştên xwe ji xwarinê bigire, heya çek çêkirinê bixwe çêdikin. Bi taybet ji Tirkiyê hinek daxwazên wan çêbû. Dema ku Tirkiyê li Enqerê bûro da wan, têkiliyên me bi wan re bi sînor bû. Yanê têkiliyên me bi vî rengî ne. Ne ew xwe têkilî me dikin ne jî em xwe têkilî wan dikin.

G.Z.: Alîkariya El Fetih (Arafat) çêbû?

---.: Na, ti alîkariyeke Arafat nîne.

G.Z.: Tevî ku ew qas derfetên PKK'ê hene çima hat Lûbnanê?

---.: Vir ciyê perwerda leşkerî ye. Şûnên din dikevin sînor û heya dawî bixeter in. Yanê ger ku bêjî Îran, Îran nahêle hêzek din bikeviyê, Surî, Surî jî wisa ye, Iraq KDP û hêzên din bi heman rengî ne. Ji ber vê jî vir ya herî quncav e.

# HEVPEYVÎNA BI ROJNEMEVANÊN ÎTALÎ Û FRANSÎ RE

T.G.: Partî çawa dikeve nav cephe û artêşê? Komek siyasî çawa ava dibe. Komîteya merkezê çawa ava dibe, çend kes hene û çend endamên we hene?

---.: Partî, cephe û artêş bûyereke di nav hev de ye, yanê pêşkeftineke di nav hev de ye. Di derketina vê ya ji destpêkê de heya niha di cephe de pêşkeftiye. Siyasî, polîtîk û girseya wê wisa ji xwe de birêxistin nabe. Yanê em dikarin bêjîn ku serî rakirina miletek ya bê partî, cephe û artêş wê destpêkirineke amator be. Di destpêkê de bûyereke polîtîk, yanê di koma yekem de bi taybet ji 73’an heta 88’an de ne mijara gotinê bû. Di destpêkê de heya niha komeke di bin beralîkirina min de pêşkeftiye. Tê guhertin, gelek endamên vê hatine guhertin.

FG.  We çawa bi nav kir?

---.: Em bi kesên ku bixwesteka xwe, beriya her tiştî jî yên ku dixwezin derbikevin re dimeşin.  Bêguman her tim endamên me yên rêvebirinê jî hene. Hinek hevalên me yên ku bi vî rengî tevdigerin hene. Ev ne endamên ku wisa fermî hatine tayinkirin û hilbijartin.

F.G.: Niha di komîteya merkezê de çend endam hene?

---.: Beriya ku em derbasî vê bibin, em qala hinek civînên ku di dîroka partiyê de çêbûne bikin. Di van civînan de endamên merkezê tên hilbijartin. Civîna ku di 1978’an de ya ku bi awayeke fermî partî îlan kirî hebû. Di salên 81’-82’an de konferans û

kongreyên berfireh, di 86’an de jî Kongreya III. hate çêkirin.

F.G.: Di 81’ê de!

---.: Di 81’ê de Konferans, di 82’an de Kongre hate çêkirin. Tabî 78 herî zêde dibe îlankirina partî û damezirandina kongrê. Konferansa 81’an jî dibe civîna xwe ji nû de komî serhevkirinê. Kongreya 82’an jî piranî li ser hatina welat sekinî. Sala 86’an xeta partiyê xistina pratîkê, sedemên vê yên civakî danîna holê û girîngî dide pergala wê ya hundirîn û xeta partiyê rast danîna holê hedef dike. Merkezên ku kar bimeşînin tên hilbijartin. Deh, yanzdeh, pazdeh û bîst kes. Di van civînan de xwestin ku navendên berfireh yên xwe bigihînin vê hêjmarê çêkin. Nîviyê wan şehit ketine. Ji sisê yek derveyî xetê dimîne. Hêjî hêjmareke kêm yên ku dixwazin vî karî bimeşînin û xeta partî bi awayeke baş bixin pratîkê heye û pêş dikeve. Di roja îro de merkezeke bihêz dana avakirin ferz dike. Ji ber ku pratîkeke pir xurt tê jiyîn. Wê ev di hundir û derve de me weke pirsgirêkeke xurt derbixe holê. Her wiha di Kurdistanê de di wateyeke giştî de pêşxistina serokatiyeke şoreşger û siyasî dana avakirin e. Cephe û artêş piştî 84’an û şûnde hinek ji hev hate cudakirin û pêş ket.

F.G.: 84’an navê artêşê HRK (Hêza Rizgariya Kurdistanê) bû, niha jî bûye ARGK. (Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê)

---.: HRK (Hêza Rizgariya Kurdistanê) hêza çekdarî bû. Niha jî artêş tê gotin.

F.G.: We çima nav guhert?

---.: Ji ber pêwîstî bi vesazbûneke hebû. Qabîliyeta şer pêş ketibû, di cephe de jî heman tişt mijara gotinê bû. Hîna di destpêka

rêxistinkirinê de ne.

F.G.:Di nava cephe de ci hene?

---.:Bi temamî alîgirên partiye ne, hêzên partiyê û ji hemû çîn û tebeqan, ciwan, rewşenbîr, gundî û beşên cur be cur pêk tên.

F.G.: Yê ku şefitiya cephe dike kî ye?

---.: Kadroyên partiye ne. Şef nîne. Têkoşîna çekdarî, partî û cephe hemû di nav hev de ne.  Ji hêla heman yêkineyan ve tên birêvebirin.

F.G.: Gelo em dikarin ji PKK, ARGK û ERNK'ê (Eniya Rizgariya Gelê Kurdistanê) re heman navî bêjîn?

---.: Cuda ne. Mînak yê herî girêdayî wê serok bibe. Têkoşîna çekdarî jî yê ku zêde zanabûna wê ya îdeolojîk nîne, dibe ku li ser hêzên leşkerî bisekine. Xebatê cephe jî bi taybet wê ji hêla kesên ku di nav gel de xwedî çalekîne bêmeşandin. Delîl e ku bi artêş û partî be. Ev cudabûn her ku biçe wê pêş bikeve.

F.G.:  Ji bo ku Komîteya Navendî bê tayinkirin hilbijartin çêbû?

---.: Di kongre de çêdibe. Sala 78-86'an de yên ku hatin hilbijartin li welat berpirsiyariyên cur be cur didin meşandin.

F.G.: Kongreya dawî di 86'an de çêbû? Artêş di Kongrê de hatibû îlankirin.

---.: Guhertina nav çêbû.

F.G.: Politbûro nîne?

---.: Em di wê de zêde naçin guhertinan.

F.G.: Li derve nûnerên PKK'ê yên fermî hene?

---.: Belê hene.

F.G.: Em dikarin bi çi rengî berpirsiyariya wan a fermî bibînin?

---.: Yên ku bi navê partiyê tevdigerin, hema hema li hemû navendan hene. Herî zêde bi navê partî-cephe tê tevgerandin.

F.G.: Nûnerên Yekitî û Barzanî li Londra yê hene.

---.: Yê me jî heye.

F.G.: Em dikarin bi wan re bikevin nav têkiliyan?

---.: Jixwe ew bixwe di nav têkiliyan de ne.

F.G.: Rast e, lê dema ku em ji wan dipirsîn, dibêjin "em ne ji partiya PKK'ê ne."

---.: Ha, wisa? Dilnimzî kirine.

F.G.: Çend wîlayetên Kurdan rewşa şer dijîn?

---.: Li Kurdistanê hejde wîlayet hene. Sê ji wan tevlîhev in. Pazdeh ji wan girêdayî walî ne. Li van cihan rewşa şer heye.

F.G.: Gotine yazde ne.

---.: Na, beriya ku ew rawe bikin, lê zêde kirin.

F.G.: Birêz Serokê min, berê heşt bû, piştre sê wîlayetên din lê zêde kirin.

---.: Belê rast e, piştre sê din lê zêde kirin.

F.G.: Bi awayeke fermî di kîjan demê de rast tê.

---.: Piştî pênc-şeş mehan.

F.G.: Ev piştre lê zêde kirin.

---.: Ev cewazî zêde girîng nîne. Ev sînor bi fermanên rojene re dikare bê zêdekirin. Ya din jî hêza me ya leşkerî niha li Agirî, Qers, Riha, Maraş, Dîlok hinek li Erzîngan, Sîvas û Erzerom jî hene. Tevî hemû hewldanên wan, berde li wan cihan astengkirina faliyetên komên me, nikarine pêşî li ber pêşkeftina wan jî bigirin. Wisa di sînor re bikevê-derkeve jî ne mijareke ya gotinê ye. Ji destpêkê heya niha ev xebat di nava welat de hene. Bi taybet ev çar salin bi pişt re gav nehatiye avêtin. Em dikarin bêjîn ku li gorî destpêkê paşdemayînek nîne. Hem di warê civakî de û hem jî di warê hêjmar de pêşkeftin heye. Tevî tedbîrên artêşê yên ew qas xurt, nikarîne pêşiya vê pêşkeftinê bigirin. Lê ev tevger hêjî ne veguheriyaye serhildanên gel. Her roj komên me yên biçek dikevin bi sedan gundan. Em dikarin bêjîn ku ketina gundan a her şev serxistine. Di hinek herêman de serweriya me ji ya artêşê zêdetir re. Heta artêş diketinê de bi fikar re. Ancax bi şêwaza oparasyonên mezin ve êrîş dike. Pevçûneke wiha pêşdikeve. Di pevçûneke ya sê rojan li Şirnaxê domandî de deh hezar leşker tevlîbû. Hejde ji wan mir in. Ji me jî

windahî nîne. Piştî sê heftan û şûnde hatin termê leşkerên xwe dîtîn. Ji çalekiyê zêdetir pêwîst e behsa muhaberê bê kirin. Niha rewşeke muhaberê heye.Ev tê wateya ku şer zêdetir pêş ketiye. Kom dikarin bi awayeke pêncî kesî tevbigerin. Îhtîmala zêdekirina vê jî heye. Rewş ev e, ez bawer im fêm dibe.

F.G.: Gelo herêmên ku bi dest xistine hene?

---.: Min beriya niha hewl da ku bidim vegotin.

F.G.: Bi awayeke fermî herêmeke ku we xilas kiriye heye?

---.: Di gelek navendan de serweriya me bi awayên cur be cur heye. Navendên ku bi temamî hatine xilaskirin nîne. Lê di hinek navendan de yêkîneyên me yên leşkerî dikarin bi awayeke rihet tevbigerin, yanê navendên bi vî rengî çêbûne. Mînak; di rojnemeyan de tê nivîsandin ku mezra di bin serweriya me de ne. Li cihê mezrayên biçûk yên ku berxwedaniya çekdarî û li hemû şûnên ku hêviyên partiyê lê heye, divê bê gotin ku li vir serwerî, rêz û otorîteya partiyê zêde û serwer e. Bi taybet artêş di rewşeke parastinê de ye. Rojê jî li çiyayên bilind bi heman rengî ye. Bi awayeke vekirî rayadarên wan yên fermî dibêjin. Ji gotina navendên rizgarkirî zêdetir, li vir tişta herî girîng ew e ku otorîteya partiyê ji hêla gel ve çendî hatiye naskirine. Ez bawer im ji otorîteya dewletê zêdetir, di asta jor de otorite mijara gotinê ye. Yanê otorîteya wan a li ser gel li partiyê dizivire.

F.G.: Di encama lihevkirina we ya bi Talabanî re li navendên ku Talabanî lê dimîne de dibe  ku kurmaya jor hebe?

---.: Ev, lihevkariya ku di pratîkê de bê pêşxistin ve girêdayî ye. Lê pêwîstiyeke me wisa zêde jî nîne. Me derfetên xwe bicîkirinê

ji wan baştir daya avakirin. Jixwe di destpêkê de KDP'ê ji ber ev lewaziya me ser me de hat. Me vê vala derxist. Me navêndên xwe yên otorîtê da avakirin, lê dibe ku em ji bo moral bidin wan biçin. Li vir jî wisa bû. Em li vir moral didinê.

F.G.: Dema ku we bi Talabanî re hevdîtin çêkir, hûn li ser van mijaran axivin?

---.: Tabî, me got em ê piştgiriya hev bikin.

F.G.: Hûn xwe li vir zêde bi ewle dibînin, yan jî li gel Talabanî?

---.: Pirsgirêkeke girîng e. Li vir tişta herî diyarker, mercên pêşxistina siyasî dana avakirine. Di xebatên çiya de desteserkirin çêdibe. Ger derfet hebûna jî ji ber girîngiya xebatên siyasî –ji bo şikilî- bi taybetî pêdiviya bi qadên ku têkiliyên hevsengî bên pêşxistin daxwazî tên kirin.Lê di demên pêşiya me de hêjaya ku mirov li ser bifikire. Li çiya dibe ku biryargeheke bê avakirin. Ez bawer im mirov dikare biryargeheke bi hev re bide avakirin.

F.G.: Ji bo yekbûna Kurdistanê dibe ku bibe gavek yekem.

---.: Wê baş bibe. Pêwîst e hinek yêkitiya siyasî pêş bikeve. Di dema pêş de dibe ku Ewrûpa navendeke ewlahiyê bide?

F.G.: Bawer nakim, nizanim.

---.: Dikare navendeke weke vir bide?

F.G.: Kurdistan ne wisa?

---.: Em ê amadekariyan bikin.

F.G.: Hûn dikarin bên çiyayên Fransayê.

---.: Wê bibe ceribandinek.

F.G.: Biryargehên Talabanî yên leşkerî ji Kurdistanê ne dûr in. Ketina wir destdayîtir e.

---.: Na, yên me jî wisa hene. Ji yên Talabanî cudatir in.

F.G.: Herêmeke Talabanî heye, her tiştê wî heye.

---.: Tabî cihên wisa heye. Tenê ne yê wî, yên rêxistinên din jî hene. Gelek windahî dan.

F.G.: Min got hûn li gel Talabanî ne. Ji ber ku we peyman çêkiriye.

---.: Me ji wan re jî got. Hûn dikarin bên gel me. Yanê yek…

F.G.: Li Kurdistana Iraq û Îranê dibistan çêbûne. Ev dibe hinek amadekariyên çandî. Ji bo Tirkiye tiştek wisa heye?

---.: Heya ku li Tirkiyê çareseriyek siyasî çênebe, tiştek wisa nayê gotin.

F.G.: Nêzîkatiyên çepên Tirkan ji çepên Kurdan re çawa ye?

---.: Dema ku bi hêz bûn ji me re nêzîkatiya pêwîst ne didan nîşan. Em gihiştine wê astê heya niha me ji wan ti eser nedît. Li ser lingan neman. Bi ti awayî ne gihiştin asta ku îqtîdarê bi dest bixin.

F.G.: Nêzîkatiyên çepên Tirkan ji pirsgirêka Kurdan re çawa bû?

---.: Ger ku bi rastiya netew ve bidest bigirin, di nêzîkatiya wan ya li hember pirsgirêka Kurdan de bandora netewa serdest pir hebû.

F.G.: Netewîperestiya Tirk.

---.: Bandora Kemalîzmê zêde ye.

F.G.: Çawa dibe ku çepên Kurdan û çepên Tirkan li hev dikin?

---.: Yêkîneya çepgiran ji hêla TKP'ê ve hate meşandin.

(...)

---.: Min ji Talabanî re jî viya got: Deh ji me, yek jî ji dijmin bikuje.

F.G.: Têkiliya wî bi serokên kevin re heye?

---.: We dît? Heştê saliye çawên wî nabînin. Ger ku me ji Îsveçê anîbaya vir, wê ev bi serê xwe bûbûya şoreşek.

F.G.: Têkiliyên we yên dostaniyê hene?

---.: Dostê min e, ew xwe li PKK'ê digire.

F.G.: Tenê vê ji bo we dibêje?

---.: Wisa ye, tenê partiya me diparêz e.

F.G.: Beşeke zêde Kurd li Surî hene, lê bê nasnameya Surîne, gelo ev we nabihetîne?

---.: Li Ewrûpayê jî hêjmareke zêde Kurd hene. Ma nasnameya hemûyan ya Fransî heye?

F.G.: Surî ji hemû Kurdan re, yanê ji derveyî Kurdên li Îranê, ji Kurdan re mafê penabertiyê dide. Lê ne kaxezên wan, ne jî xwedî mafên demokratîk in.

---.: Xweseriyeke ku nasname nede Kurdan nîne, jixwe nasnameya hemûyan heye. Dayîn û nedayîna Surî ya nasnamê, tiştek nade guhertin. A rastî wisa baştir e. Wê bi nasnameya xwe ve bimînin.

F.G.: Yên ji Suriyê tevlî nav PKK'ê dibin û şer dikin hene?

---.: Ji navenda Ereban tevlî dibin. Hêjmera wan ya zêde jî weke Ewrûpa dost in. Lê wisa rêxistineke me ya mayînde nîne. Rêxistineke me ya dostanî heye.

F.G.: Li gorî we zagona otonomiyê pêşketiye?

---.: Tasfiyekirina tevgera Kurd e. Ger ku rejîm bihêz bibe, ez di wê baweriyê de me ku dê vê qanûnê betal bikin. Ti gelê ku girêdayî rêxistinbûna xwe nebe, wê demdirêj nejî û bi mîsoger wê penabertiyek nivçe bijî. Car heye salek, car heye jî deh sal bidome. Di dawiyê de jî wê ji înkarkirina polîtîkayê rizgar nebe. Ceribandinên vê hene. Cumhuriyata Mahabat û şerê xilasiya Tirkan di salên destpêkê de weke ceribandin têne qebûlkirin. Ev di rojnemeyan de jî derdiket.

F.G.: Têkiliya PKK'ê bi hêzên Lûbnan yên din re heye?

---.: Dost in, me baş dinasin. Em li vir bi awayek hêsanî bi nasnameya xwe ve digerin.

F.G.: Kîjan hêz?

---.: Hemû hêzên çepgir, Partiya Komûnîst û Partiya Sosyalîst dost in. Partiya Sosyalîst hin jî nêzîktir in û xwediyê vir jî gundiyeke. Em dost in û dinasîn, tenê ew dikarin bikevin nava ava me. Ne hêzên dewletê, ji hêza gel xwe dana avakirin wesfdariya PKK'ê ye. Filîstînî jî bi heman rengî ne.

İ.G.: Hîn jî têkiliya we bi Filîstîniyan re heye? We jî bi wan re şer kir, yanê şehîdên we hene?

---.: Mercên wê demê bi hev re mayînê zehmet dikir. Wê demê wargehên me yên serbûxwe nîn bûn. Em niha bi ked û hewldanên xwe ve gihiştine derfetên bidestxistina wargeh û xaniyan. Beriya niha pergala me ya xwe bicîhkirinê nîn bû. Em tevgereke ku di nav gel de xwe ava dikin. Ew qas zehmetî nakişîne. Mînaka wê jî li Ewrûpa ye. Tevî polîsên Almanan ew qas tên ser me jî, nikarine me li wir tine bikin. Ji ber ku bingeha gel hatiye avêtin. Ev ji bo welat jî derbasdar e. Ji bo ku tevger di nav gel de hatiye rûnişkandin nayê tinekirin.

İ.G.: Lûbnan welateke ku hatiye parçekirin e. Di her parçeyeke de jî hêzek heye, ev çarde salin serdema parastina mîlî hatiye jiyîn. Dibe ku li vir parçeyek Kurdistanê bê rizgarkirin?

---.: Na, vir wargeheke ya PKK'ê ye. PKK li vir dikare parçeyeke Kurdistanê biparêz e. Ev jî bingeha xwe ji rêveberiyek

rast digire. Me vir aniye rewşa navendeke rast ya baweriyê. Ez her tim ji hevalan re dibêjim. Bi rastî jî hêzên bijare jî nikarin xwe bigihînin xwedî derfetên bi vî rengî. Her kes dixwaze bên, lê derfet sînordar in. We jî dît. Vir navendeke stratejîk e. Di heman demê de navendeke ya Lûbnanê ya stratejik e, yanê zû bi zû nayê perciqandin. Tirkiye gelek caran ceriband. Lê ser nexist. Xwest bikeve nav û tine bike. Li gel me jî gelek têkoşîn li hember vê hate dayîn. Bi vê polîtîkayê ve neçare ku polîtîkaya xwe ya netewîyî di ber çavan re derbas bike. Yanê pêwîst e ku xeta Surî bê guhertin. Ez ne bawer im ku Serok Hafız Esat xetê bide guhertin. Mayîna me ya li vir bi vê xetê ve girêdayî ye.

İ.G.: Ma di navbera Tirkiyê û Surî de nakokî hene?

---.: Bi nakokiyên bendavan re, nakokiyên din jî hene. Lê mayîna me ya li vir dibe ku ji bo Surî baştir be. Me vê tedbîrê girtiye: Ger ku çûyîna me ya li vir bibe mijara gotinê, yanê “bêjîn ku biçîn” em ê biçin. Venêrîna wan xurt e. Di mayîna me ya vir de berjewendiyên wan çendî hene ew bixwe hesap dikin. Me bi esas girtina dostaniyê re xwest li vir bijîn.

İ.G.: Ger ku hûn jî Surî derbikevin, hûn ê biçin kû derê?

---.: Di vê mijarê de çeperên ku em biçinê gelek in. Bi taybet jî di roja me ya îro de Yunanistan, Kıbrıs, İran û Iraq... ya din jî sînor bi awayeke xurt ji hêla partiyê ve tê parastin. Tenê dibe ku pirsgirêka ciheke ez lê bimînin çêbibe, ez ê jî di navendeke ku dixwazim lê bimînin bi cîh bibim. Di vir de jî mijareke ku em wisa pêve girêdayî bimînin ne mijara gotinêye.

İ.G.: Di peymana 1987’an de ya ku di navbera Tirkiyê-Surî de

çêbûyî ji bo we tangasiyeke da avakirin?

---.: Bêguman, di sînor de rewş tangav kirin. Em ne li Şamê, li cihek din diman. Di sînoran de tangaviyek zêde dan çêkirin. Yanê tişteke nehêjayî bû. Hezaran PKK'yi li derveyî welat in. Ev helwesta Tirkiyê ya bê bingeh wê nejêhatiya wî bide nîşan. Wargeh ne di rewşeke ku penabertiyeke siyasî de ye.

İ.G.: Li vir rewşeke we ya penabertiyê hebû?

---.: Em di rewşa hemwelatiyên cîhanê de ne. Cihê min heye. Ger ku bixwazim dikarim biçim rojava, rojhîlat û heta dikarim li Îranê jî bimînim. Min rewşeke bi vî rengî daya afirandin. Tabî rewşeke wisa dana afirandin girîng e. Ev jî giraniya te ya siyasî dide diyarkirin. Lê ev jî bi nazikî di hevsengiya cîhanê de bi hevsengiyek polîtîk re ancax dikare quncav bibe. Ez bi taybet li ser van gelek sekinim. Hûn çi dibêjin?

İ.G.: Min jî gelek penaberên Tirkan dît. Gelek Kurd hene, gel pir hez dikin.

---.: Xwîngermiya gel zêde ye, lê ya hukumetê nîne.

İ.G.: Ji Kurdên li Tirkiyê re alîkariya polîtîk tê kirin?

---.: Komîteyên Kurdistanê hene. Kurdên ku ji kevin de li vir bi cîh bûne hene. Kurdên Xiristiyan hene hemû jî li wir rûdinin.

İ.G.: Çavkaniya xeberan dibe Atîna?

---.: Na. Ewrûpa û Atîna bi hev ve girêdayîne. Heke bixwazin

em dikarin bi hêsanî mirovên xwe li wir û Qibrisê bi cîh bikin.

İ.G.: Min têkiliyên we yên bi Qibris û Yunanistanê re pirsî.

---.: Me li Yunanistanê bi rayadaran re têkilî pêş xist. Tabî ev rewşeke rewa ye. Em nikarin bêjîn ku ne di ferqa hebûna me de ne. Lê em tam weke têkilî jî nikarin binirxînin, em nikarin giranî bidin têkiliyên wisa yên fermî, herî zêde em giranî didin têkiliyên gel.

İ.G.: Ez ji bo dema pêş dipirsim. Gelo xweserbûna Kurdistanê xewn e? Mijara federasyonê tenê bi Tirkiyê re yan jî bi Îran ango bi Kurdistana Iraqê re jî dibe?

---.: Min sernivîseke ya rojnameyeke dît; wiha dinivîsand “ ji bo Kurdan xewnek e, ji bo Tirkan jî kabûsek e.” Ma ne bersiveke xweş e?

İ.G.: “Got; ger ku ji bo me xewnek be, ji bo Tirkan jî kabûsek e.”Ma ne bersivek xweş e?

---.: Ez ne muxatab im. Ji bo we ne kabûsek e lê ji bo îqtîdarê kabûsek e. Bêguman şiyarbûna yekem a her netewekî xewnek e. Mesela ew demên dirêj yên li Îtalyayê dema ku yêkitiya neteweyî û rizgariya wê çênedibû jî dibû xewnek. Yê me bi serê xwe xewnek e. Avaniya hukumdaran xewnek e. Yanê xewn xeyal e, divê lome lê neyê kirin. Di destpêkan de xewnên wiha dibin. Gotineke ya Lenîn heye.“divê di şoreşan de mirov ji xewn dîtinê nereve. Lê divê xewnên me têkildarî zanistiyê be.” Heya ku ji destê me bê, em ê jî hewl bidin ku xewnên zanîstî bibinin. Di demekê de Engels hinek tişt digot; Çekî, Slavî, ev ji bo Ewrûpa û netewên biçûk digot: “Ev dê ji dîrokê tine bibin.” Yanê Macar, Slav û hwd. Lê niha hemû jî netewên serbixwe ne. Kurd jî netewa Rojhîlata Navîn a herî kev ne.

Dîroka wê ya çar hezar sal heye. Care yekem li ser erdê bicîhbûn û xwedikirinê min wê rojê di ew ê de dît. Yekem car çem beriya hevde hezar sal berê, ev jî li çiyayên me yên Torosê çêdibe. Ev hewaya Erganî Firat bi rastî jî jêre lendika şaristaniyê tê gotin. Tevî ku Kurd di dîrokê de paşketî jî bûn, lê dîsa netewek in. Ji bo ku gelên Rojhelata Navîn bikevin nava serdema netewên azad, ev serdem jî ji ber serdema navîn û bermahiyên împaratoriya emperyalizmê maye. Yek Îngilîz, weke ku Fransa demek ketibû nav hinek polîtîkayan, mîna mozaîkan tine kiribûn. Împaratoriya Osmaniyan a çaxa navîn, Împaratoriya Farsan, Împaratoriya Ereban û feodalizm jî heya bêjî hate parçekirin, ruxmê bê pargalbûneke zêde jî bi awayeke lezgînî têne derbaskirin ango hilweşandin. Heman dişibe Ewrûpaya navîn a sedsala 19'an. Em vê dizanin. Yanê di dawiya sedsala 20'an de dibe ku ev tablo bê guhertin. Dema ku netewên azadtir çêbûn, netewên serbûxwe û azadtir derketin cihê Kurdan jî wekî min diyar kiriye. Bêguman em ji pêşerojê bi hêvî ne.

İ.G.: Li gorî ku di destana Ehmedê Xanî, Mem û Zînê de hatiye nivîsandin, ti caran şefên Kurdan çênebûye, her tim hatine birêvebirin. Di roja me ya îro de jî ti guhertin çênebûye. Ez dixwazim rastiyan fêr bibim. Ez qala parçebûna Kurdan dikim. Yanê ne qala parçebûna Soranî û Kurmancî dikim. Di navenda polîtîk de yanê li Iraqê gelek rêxistinên Kurdan heye, heman tişt li Îran û Surî jî heye.

---.: Yanê hûn dibêjîn ziman û çand di warê siyasî de pir zêde hatiye parçekirin ev rast e.

İ.G.: Du Kurd bêne gel hev hema li hev dixin.

---.: Ew bi nav û deng e. Heke du Yahudî bêne gel hev, wê rêxistinek bê avakirin. Lê heke du Kurd bêne gel hev, wê şer çêbibe.

Belê, em bi wan re gelek mijûl dibin. Yek ji taybetmendiyên PKK'ê yê herî sereke ev e ku dubendiya di navbera lehçe, mezhebên baweriyan, cudahiya çandan, heta cudahiya civakî û siyasî ji holê rakirin, heta rewşeke wê ya ku serkeftinê bidest dixwe heye. Ev çareseriyek e. Ev îhtîmal gelek girîng e. Nasnameya ku PKK'ê di nava xwe de dayî avakirin, wê di asteke bilind de pêwîstiya yêkîtiya natewan bêne cî ango derbas bike. Hema hema di hemû Kurdan de endam hene. Ji hemû eşîret, bawerî, mezhep, dîn û heta ji hemû parçeyan tevlîbûn heye. Ev rêveberiyeke gelek mezin e. Bi rastî jî berê ne tenê du Kurd bihatana gel hev ango kêleka hev, ev erkên wisa zehmet bi hev re dana meşandin gelek zehmet bû, lê bi avakirina partiyê re hûn jî dibinin ku em gihîştine asta mîlyonan tevlî nav tevgerê bikin. Di vê wateyê de îtîfaqa herî dawî ku ji bo yêkîtiya neteweyî ya bi Talabanî re hatiye kirin lê zêde bikin, em dikarin bêjîn ku em gihîştine asteke jortir in. Ev yekgirtin dê ji armancê re xizmetê bike.

İ.G.: Bi hemû rêxistin û bi her kesî re yekgirtinî çêdike. Ji wê re çi tê gotin?

---.: Lê niha hêza wî nine ku tiştek wisa bike. Tevî ku dixwaze hinek pêldanan bike jî, lê dîsa jî rewşa xizmet ji yekgirtina feraseta wan re kirinê dernakeve. Ev yekgirtina ku em pêş dixin, ne hevgirtineke wisa ye ku hema xira bibe ye. Hêjmareke zêde hêz û dewletê ceribandin. Ger ku em bilançoyek bidin, xwestin bira bi bira, aşiret bi aşiret, mezheb bi mezheb û parça bi parça bidin şerkirin. Heta xwestin di nava tevgerê de jî hizban bidin pêşxistin.

İ.G.: Nîha Talabanî destê xwe dirêjî we dike, gelo hûn wê bi lewazbûna Talabanî re girê didin?

---.: Bi baweriya ku wê bi me re bihêz bibe tê.

İ.G.: Ji hêla Talabanî ve îtîrafa bêhêzbûnê çêdibe!

---.: Rast e nêzî ketina nava feraseta yekgirtinê dibe. Dizane hawirdoreke din yê wî nîne, wê di vir de riyekê vekirinê bibine.

İ.G.: Talabanî carînan hêrs nêzî we bûye?

---.: Bi aqil tev geriya. Di vê mijarê de têkiliyên me ew qas xirab nîn bûn. Di her dema ku em têkilî pê re datînin, cudatiyeke wisa nine. Lê ew jî heya dawî taktîker e. Ez bawer im wê ji niha û şûnde hinek girantir, bi berpirsiyarî tevbigere û wê di nava hewldanên ku ji yêkineyê re xizmet dike de be. Mînak; weke nirxandinên ku dibêjin “bila Tirk wisa bikin da ku em jî wisa bikin” ev nirxandinên bi vî rengî ji min re weke nirxandinên cidî nayên.

İ.G.: Ji derveyî dewletan, hûn ê bixwazibin nêzî Komelaya Îranê bibin? Gelek dişibe we.

---.: Bi awayê objektîf wisa ye, lê ji ber sedemên pratîkî pêwendî pêşnakeve, wê pêş jî nekeve. Ji ber ku navendên tevgera wan gelek cuda ye, lê di navbera me de nêzîkatiyeke dijminayî nîne.

İ.G.: Ma pantagonîzme ye?

---.: Na. Yek jî Kurdistan di rewşa du herêmên giştî de ye. Li Başur Soran hebû, yêkîneyên ku me pêşxistine bi giştî li qada Bakur in, ew jî li qada başur in. Ez bawer im li ser wan herî zêde giraniya Yêkîtiyê heye.

İ.G.: Li Şamê nûnerên Riya Azadiyê hene?

---.: Hene.

İ.G.: Yên Kurdistana Iraqê ne? Têkiliya we bi wan re heye?

---.: Hene. Têkiliyên me yên bi wan re dostanî ne. Herhal wê di dema pêşiya me de pêş bikevin.

İ.G.: Hûn bawerin ku hêzeke wan heye?

---.: Na, lê dîsa jî hene. Tevî ku lewazin jî dîsanî hene.

İ.G.: Baş e, Samî Muhammed Abdurrahman?

---.: Ew pir lewaz in, min bihîst ku entelektûel in.

İG.. Li Şamê?

---.: Ez bawer nakim, li Îranê ne.

İ.G.: Min Abdurrahman di girtîgeha Berlinê de dîtibû.

---.: Sami Abdurrahman kesayeteke pasîf e. Herî zêde ew yekî îstîxbaretvan bû. Li ser navê gelek hêzên cur be cur îstîxbaret pêş dixe. Kesayeta wî wisa ye.

İ.G.: Hemû dostên we hinek bêsebir dibin.

---.: Herhalde hemû pirsên we xilas dibe. Heke xilas bibe tatbîqat heye, em ê biçin tetbîqatê.

İ.G.: Roj bi roj em dixwazin dîroka çêbûna we fêr bibin.

---.: Sê dîrok heye. ’47-’48-’49. Me yekî lêkolîn kir, ger xwestin biriya wê mirov dikare dîrokê mîsoger bike. Ji ber ku di nifûsê de 47 nivîsandibûn, pişre du temen biçûk kirine, bûye 49. Îhtîmala 48 herî zêde ye. Li gel me dema zarok çêdibin heft, heşt sal û şûnde qeyda wan çêdikin.

İ.G.: Hûn ji kû derê ne?

---.: Riha Halfetî ji gûndê Omeryan im.

İ.G.:  Al û marşa we ya neteweyî heye?

---.: Ala me ya neteweyî heye. Yekî diyarî bidin wan.

# HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA BI ROJNEMEVANÊN FRANSÎ RE

G.Z.: A rastî gelek pirsên ku ez bikim hene. Li vir ez ê pirsên giştî bikim.

…..: Destpêkê em çarçoveyeke deynin.

G.Z.: Em dixwazin di derbarê jiyana we de hinek agahiyan bigirin. Hûn kengê hatine cîhanê, mercên we yên jiyanê çawa bû, ez li vir herî zêde rastî ansîklopediyan hatim. Di binê wan de jî îmzaya PKK'ê heye.

...: Ez di sala 1948'an de li Rihayê, girêdayî navçeya Halfetiyê gûndê Omeriyan hatime cîhanê. Malbata min gundiyeke xizan e. Di nava zeviyan de dixebite, min jî gelek caran li bajarên weke Çukurova û Edenê karkerî û xeparî kiriye. Ji ber ku di gûndê me de dibistan nîn bû min pênc sal di dibistana gûndeke din de xwendiye. Zarokatiya min ev e. Pirseke we yê din heye?

G.Z.: Hûn dikarin gala xwendekariya xwe ya dibistanê bikin?

…..: Piştî dibistana navîn û şûnde min di dibistana Kadastro ya Pîşesaziyê de xwend. Min mamurtiya Kadastro kir, piştre qeyda min dan û ez di sala 1971'an de bi qeyd derbasî Fakûlteya Zanistên Siyasî bûm. Di dibistanê de bi temamî ez bi tevgera şoreşgerî re eleqedar bûm. Heya 78'an min di nav tevgera ciwanan de cîh girt. Piştî ku em ji wir qutbûn û şûnde, me jiyana partî ya veşartî hilbijart. Di sala 1979'an de derketim derveyî welat. Ev neh sale em di

rewşeke qacax de dijîn. Di qada Rojhilata Navîn de jiyaneke min siyasî heye. Destpêkê ez ji ramanên olî bandor bûm. Heya 68 rewş wisa bû. Piştî 68’an û şûnde bi fikrên çepgir re tamasa me çêbû.

G.Z.: Hûn Elewî ne?

….: Ji Elewîtiyê zêdetir, ez îsyana Îslamiyetê ya li pişt tê tercih dikim. Mînak; li Îranê giranî didin aliyê îsyana Îslamiyet ê. Rast e, ez giranî didin aliyê çalekiyên Îslamî, ez Sûnnitiyê başketî dibînim. Yanê di şêwaya mezhebi de Elewîtiyek nîne. Min hewl da hemû hêza xwe bidim pirsgirêka neteweyî. Bi taybet piştî salên 70’an min hewl da ku serbixwe bidim dest.  Her çendî destpêkê bi çepên Tirkan re têkiliyên me hebe jî, her ku çû nevbera me vebû. Di bingeh de çepên Tirk a di rewşeke pirsgirêka neteweyî înkar dikirin de bûn. Helwesteke wan ya şovenîst hebû. Me hewl da em bingeha tevgera xwe di salên 72-73’an de bavêjin. PKK di rewşeke pir lewaz û sist de bû. Piştre me hewl da tevgera ciwanan a şoreşgerî ava bikin. Me piştî 74-’75’an ji bo Kurdistanê koma serbixwe û azad da avakirin. Di sala 75-76’an de me peytandina xwe li welat da çêkirin.

Çalekiya me ya herî dijwar di sala 1977’an de bi serdehatina dewleta Tirk ya li ser me de dest pê kir bû. Ji bo ku em jî xwe biparêzin, em ketin nava rewşeke parastinê. Di sala 78’an de me gaveke pêşdetir avêt û me partîbûnê îlan kir. Ji ber vê jî li Tirkiyê rejim hat guhertin. Rejîma 12’ê Îlonê dest pê kir. Ji bo ku em hebûna xwe biparêzin, em neçar man ku biçin derveyî welat. Destpêkirina di welat de destpêkirineke amator bû. Di derveyî welat de jî xet bi pêşxistin û kadrobûn bû. Rêxistinbûyîn bi vî rengî çêbû. Piştî 84’an û şûnde me têkoşîna çekdarî pêşdetir bir. Ji vê rojê heya roja îro bi temamî di rewşeke şer ve didome. Têkoşîna me ya ku bi

Tirkiyê re dihat meşandin bi awayeke temamî ket rewşeke şer.

G.Z.: Di demên dawî de bi taybet hukumeta Ozal di polîtîkaya xwe ya di derbarê Kurdistanê de hinek vekirin anî. Bêguman, lê ez ji hatina rojnemevanên Tirk ya li vir hinek şaş mam. Ji ber ku ev rewş du-sê sal beriya niha bi ti awayî nedihat fikirandin. Li hember vê rewşê helwesta PKK'ê çî ye?

….: Pêşkeftinên bi vî rengî di bin çavdêriyê de ne. Bi rastî jî ketine nava hewayeke lihevkirinê yan jî lîskeke em hewl didin ku vê rewşê fêm bikin. Bi qasî agahiya ji me re hatiye dixwazin navenda diyalogê vekin. Lê wê dawiya wê bigihe kû derê? Ev çendî ji vê re vekirine? Mîsoger wê têkoşîna me wê rewşê diyar dike. Hinek rastiyên ku têne zanîn hene. Dema me têkoşîna xwe ya 84'an dest pê kir, di 85'an de jî plana ji bo tasfiyekirina me, ya bi 'tevgera plana Gûneş' re amadekirin.

Li kêleka vê hemû yêkîneyên xwe yên hilbijartî û bi tevlîbûna du-sê yêkîneyên artêşê yên hilbijartî re dest bi tevgera tinekirinê kirin. Di vê navberê de qanûna poşmaniyê derxistin. Yên mayîn jî ji bo teslîm girtinê bû. Bi ti awayî peyva Kurd nedihat pejirandin û hewl didin ku me weke 'eşqiya û terorîst' bi awayeke reş ji raya giştî re bidin nîşan. Ev bi awayeke giştî plana tinekirinê bû. Lê heya 87'an ev plan negihiştin serkeftînê. Li gorî plana bi Iraqê re hevpeyman çêkir, xwest bi Îran û Surî re jî çêke. Di vê mijarê de gelek tawîz hat dayîn. Li Ewrûpayê jî tiştên dişibin vê xistin meriyetê. Li gorî hukûmeta Ozal mîsoger pêwîst bû em biçûbana. Ji ceribandinên derbasbûyî cesaret digirtin. Ji ber hemû komên çepgir yên din îmha bûbûn. Di vê navberê de jî li Başur bi Kurdan re hevkariya xwe pêş xistibûn. Di serî de PDK (Partiya Demokratê Kurdistan) ev tiştên dihatin kirin hemû ji bo tinekirinê bû. Bi sala

88’an re vê fêmkirin. Xerckirineke gelek û bi awayeke zêde tawîz dan derve. Em dikarin bêjîn ku di welatên Ewrûpa de yê tawîz nedabû nemabûn. Di vê navberê de dît ku tevger jî xwe nû dike. Dema wisa bû, pêwîstî bi helwesta xwe ya kevin di ber çavan re derbas kirinê dît û hebûna têkoşîneke demdirêj qebûl kir. Diviya bû me xwe li hember van êrîşan biparastiba û bi hêztir bikiriba. Wisa jî bû. Ev bûyereke gelek mezin e. Wiha ev li pêşiya nirxandineke nû vedike. Di vê navberê de peyva Kurd û PKK’ê bi awayeke xurt ked rojeva çapemeniyê. Hewl dan ku weke rastiyeke civakî qebûl bikin. Bêguman li vir bandora berxwedana girtîgehan jî gelek hebû. Bizat Ozal li hember girtîgehê tawîzek da. ‘Serbestkirina Kurdî’ weke qezenceke ji mirinê re be. Yek din jî bi rastî xezineya wan hat rewşa ku îflasê bike. Êdî rewşa artêşê ya ku nedikarî xwe rêve bibe dîtin. Di dîroka komarê de ti carî ew qas windahî nedabûn. Heta di şerê wan yê bi Yunan re jî ew qas zehmetî nekişandin.

Ya din jî partiya me di nava girseyan de bingeh girt, weke tevgereke ku di nava girseyan de bingeh dibîne hat fêmkirin. Têkiliyên wan yên derve jî hene. Ji der ve jî tên xwedîkirin. Fêmkirin ku ev nayê qutkirin. Bi bandor jî bû. Gelo ev wê ber bi çareseriyeke demokratîk ve biçin? Ger ku ji vê pirsê re bersiv bê gerandin, mîsoger bi têkoşîna me ya ku em ji niha û şûnde pêş bixin re girêdaye. Ji aliyeke ve şerê gerîla, ji aliyê din ve jî ger em bikaribin di bajaran de raperîn belav bikin ez bawer im wê daxwaza wan a lihevkirinê zêdetir bibe.

G.Z.: Heya roja îro çend leşker û milîtan mirine?

…..: Belê, bidim diyarkirin. Ji bilançoya ku ji çapemeniyê re hatiye peytandin re cudatir e. Demîrel bixwe dibêje; roja ku li leşker, polis û subayan neyê lêdan nîne. Dibêje; ‘ hin ji niha ve

windahiyên artêşê pênc hezar (leşker-subay) derbas kiriye' û li 'pênc hezar sivilên hevkar jî' hatiye xistin. Ev tesbîtên wan in. Bizat ev hêjmarên wan yên ku bixwe dayînin. Hêjmarên permî yên li gel Demîrel yên di çapemeniyê de hatine peydandin e. Lê li gorî tesbîtên me, mesela herî kêm di çalekiya Nisêybînê de sê helikopter, sê amûrên zirhli, 225 leşker hatine kuştin û bizat ev di nava şer de hat nirxandin. Bêyî ku em hêjmara windahiyên çalekiya 1'ê Nîsana 1988'an bizanibin, em dikarin bêjîn windahiyên artêşê yên wê çalekiyê du hezar in. Hêjmara sivîlên hevkar jî dibe ku di navbera 2500'î de bin. Destpêka şer heya roja me ya îro hêjmara windahiyên me di navbera 500'î de ye.

G.Z.: Yên hevkar jî?

---.: Hevkar, cerdevan û sivîlên sîxûr.

G.Z.: Bi mûdûrê Kurd re heman wext bû?

---.: Axayên Kurdan û cerdevan in. Ew jî arteşek in. Hêjmara wan niha nêzî 12 hezarî ye. Ger ew nebin artêş nikare nefes bigire. Ji artêşê zêdetir wê windahî çêbibin. Ev dibin alîkarên artêşê yên herî mezin. Ev bilançoya şer ji mîlîtan û alîgiran pênsed bê gotin wê di cîh de be.

G.Z.: Niha em ji Kurdan pirsek bipirsin. Heya niha cudahiya tevgera ku li Tirkiyê pêş ketiye li gorî tevgera parçeyên din, rasterast xweserbûnê dixwazin. Li Iraq û Îranê otonomî dixwazin. Yanê niha şartên ekonomî û polîtîk ji bo Kurdistaneke xweser gihayî ye?

---.: Pirsgirêk ev e: Di destpêkê de her tevger ji bo xwe armancên herî li pêş destnîşan dike. Armanca serbûxwebûnê armanceke stratejîk e. Mirov behreyên xwe ancax li ser bingeha

rêgezên serbûxwe û azad dikare bixe tevgerê. Di destpêkê de xwe mahkumê otonomiyê kirin, ev jî tê wateya gelek derfetên têkoşînê dixe ye. Yanê ji armancên siyasî bê par mayîn, tê wateya ku ji îdeolojiya partiyê bê par mayîne. Slogana me ji bo pêşîvekirina fikrê şoreşgerî û çalekiya wê nêzîkatiyeke stratejîk e. Heke çalekiya fikir çênebe, negengaz e ku mirov bigihe otonomî û xweseriya çandî. Her wiha şîar û armanca me ew qas stratejîk e. Di pratîkê de em ji mafên çandî, heya otonomiyê sûd wergirtin esas digirin wek federasyonê. Pêwîst e em bi ekonomî, mercên sosyal, navendên siyasî yên rojane û yên hundir-derve re tayîn bikin.

# HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA BI ROJNEMEVANÊN ÎSVEÇ RE KIRÎ

---.: Em bi dîtina we kêfxweş in. Ya din jî ji ber hatina we ya vir a bi zehmet jî em careke din we sîpas dikin. Serpêhatiyeke me ya bi Îsveçê re ku em ne li bendê bûn çêbû. Vê mijarê bi awayeke rast vekirin û bi taybet jî derfetên me yê ku em bersivek rast jêre bidin çêbû. Ji ber vê ez careke din kêfxweşiya xwe raber dikim.

G.Z.: Gelek baş e, gelek xweş e.

---.: Dil dixwest ku bi gelê Îsveç re têkiliyên jidil û samîmî pêş bixin ku pêş diket, bi awayeke bêbext qetilkirina demokratê mezin Olof Palme çêbû û di nav bûyera qetilkirina wî de navê me tevlîkirin me gelek xemgîn kir. Bi awayeke ku me heq nekirî, em bûn mijara kampanyaya reşkirinê.

G.Z.: Birêz serok li gor dîtina we çima navê PKK'ê, ji hêla SAPO'ya Îsveç ve têkilî bûyera Palme kirin?

---.: Heman dikevin mijarê û ez texmîn dikim.

G.Z.: Ger hûn bixwazin em hinek nîqaş bikin û piştre dest pê bikin.

---.: Min got, em hinek nîqaş bikin piştre em ê bikevin mijarê. Ger ku hûn hinek min agadar bikin, bersiv wê bibe kitekit (detaylı) û baştir bibe.

G.Z.: Tabîî.

---.: Rewşa dawî çiye? Rewşa kampanyaya dawî ya ku di

derbarê me de hatiye destpêkirin çawa ye?

G.Z.: Herî dawî wezîrê dadê (Adalet Bakanı) necar ma ku îstifa bike. Ji ber wî lêkolîneke taybet dabû destpêkirin. Ne bî wesiteya SAPO. SAPO dev ji PKK'ê berda. Ji bo carek din navê PKK'ê di encama lêkolîneke taybet de derxin, skandalek ava bû û Wezareta Dadê neçar ma ku îstifa bike. Li Îsveçê agahiyên dawî yên di derbarê PKK'ê de ev in.

---.: Mîsoger ev bi agahiyên dawî ve girêdayîne? Îhtîmaleke mezin Olof Palme, di encama şirîk ango hevpariya komploya demokrasiya nav netewî û dijminên aşitiyê de çûye. Agahiyeke min pir zêde nîne. Lê hemû pêşkeftinên siyasî bi vî rengî didin diyarkirin.

Bi taybet piştî salên 80'î di serî de DYE (Dewletên Yekgirtî Yên Emerîkayê) li hember serdehatineke muhafazakarên paşketî ku derbikeve holê de û li hember pêşkeftinên aştî û demokrasiyê nerihetiya ku dijiyan û di vê mijarê de li hember hemû tevger û kesên li hember xwe asteng didîtin bingeha xwe ji polîtîkayên wan derdikeve holê digire. Dema ev polîtîka dikete jiyanê bûyera Palme derket holê. Bi taybet hilbijartina wan a Palme ji ber dema Vîetnam şer dikir, li hember pêşxistina helwesteke li hember şerê Vîetnamê rola wî hebû. Piştî salên 80'î bi taybet li hember polîtîkaya nûklerê seroktî kiriye. Tevgereke wan sûwariyan hebû. Di vê demê de jî Îsveç xistina nav NATO'yê mijara gotinê ye. Lewre Partiya Sosyal Demokrat û Palme astengeke cidî bûn. Ev mijarên girîng in, yanê ev pêşkeftinên siyasî yên di bin de ne. Dema ku em ser sedema ku Kurdan û PKK' ê çima têkilî vê bûyerê kirine bên: di raya nav netewî de yê ku yekem car di derbarê Kurdan de nêzîkatiyeke dilgermî daye nîşan Îsveç e. Ê ku seroktî ji sosyal demokratan re kirî Palme ye. Yanê qebûlkirina Kurdan weke gelek ya di raya giştî de rola

Palme girîng e. Bi taybet Îsveç bû yek ji welatên ku Kurdên ji ber zilma Tirkan direviyan xwe lê digirtin. Ji Kurdan re cara yekem deriyek bi vî rengî vebûn girîng e. Piştî salên 80'î, yanê piştî darbeya paşîzma 12'ê Îlonê û şûnde hêjmareke zêde rêxistinên Kurdan û penaberên kadro stirîn Îsveçê. Ev hêla ku tevgera Kurdan xwe ji nû ve komî ser hev bike. Di vê navberê de hinek hêmanên partiya me piştî salên 80'î ji bo mafê penaberiyê bidest bixin serî li Îsveçê dan. Heta mavê min jî derbas bû. Di demekê de serlêdana min hebû, weke çûyîna Îsveçê. Yanê serlêdanake çûyîna wir û li wir bicîbûn çêbû.

G.Z.: Ev maf hat dayîn?

---.: Na, ev xaleke pir girîng e. Di cîhanê de cara yekem ev maf ji min re nehat dayîn û ev jî SAPO asteng kir. Mîsoger yê ku asteng kir, baskeke di nava SAPO'yê de bû. Wê demê di holê de ti teror jî nîn bû. Li Ewrûpayê jî nebû. Di derbarê terorê de ji bo me yek gotin tenê jî nîn bû.

G.Z.: Dîrok çi wext bû?

---.: Dîroka serlêdana min 84'an bû. Yanê beriya bûyera Palme bû. Di salên 82'an de jî dest pê kir. Ez bawer im ev serlêdana min di 84-85'an de çêbû. Belê ez bawer im 85 bû. Di salên 84-85'an de li Îsveçê ti çalekî nebû. Lê bi taybet li derûdora me mîsoger çemberek hebû. Biryara ku em li wir bicîh nebûn hebû. Pêkanîneke vê biryarê jî heye. Bi vî re dixwazim we bidin rizandin. SAPO dide diyarkirin ku yê herî zêde li hember çalekiyên me yên 'terorîst' helwest daye diyarkirin ew e. Ji bo rizandina vê îsbat bibe dibêjim. Yanê di destpêkê de li vir biryareke heye û ji hêla derûdora ku bi wî re di nav têkiliyan de bû û tabî li pişt wî jî dibe ku siyasetmedar jî

hebin.

G.Z.: Ger ku min rast fêm kiribe, ev çengê di nava SAPO de, gelo hatina we û Kurdan ya Îsveçê asteng dikirin?

---.: Bûyereke bi vî rengî heye. Bi taybet beşek Kurdên ku dixwazin li hember Tirkan berxwedana xwe bidomînin dikin hedef. Ne Kurdên lihevkirî û ji xeteriyê derketine. Derdora yên li ber xwe didin û yên dixwazin şer bikin teng dikin. Ev pir şêmber û vekiriye. Lewre pir girîng e. Yanê bi taybet çima polîtîkayeke bi vî rengî li dora me bê meşandin? Vê demê ecêb e, heya nêrîneke ku li ser min jî ferz dikirin hebû. Digotin ku, “hûn jî bi Komkar re li hev bikin!”

G.Z.: SAPO, wî got?

---.: SAPO zext dikir û digot, “hûn jî weke Kurdistana Tirkiyê neçar in ku bi partiya sosyalîst Kemal Burkay re li hev bikin!” Li vir biryarek heye. SAPO cara yekê di sala 1981’an de di derbarê me de PKK tevgereke, raporekî dide hukumetê. Hukumet destpêkê vê raporê qebûl nake. Rapora duwemîn jî sala 84’an dide. Gelek vekiriye ku di mijara meseleya me de hukumetê tangav dike. Û di sala 81’an de ti tişteke me li Îsveçê nebû. Lê tevî vê jî SAPO, ew qas hukumetê tengav dike. TKSP di sala 1982’an de li Şamê ji min re vê digot. “Ger hûn dev ji têkoşîna çekdarî berdin em ê bi we re îtifaq çêkin.” Ev dîteneke. Yanê bêyî ku li ber xwe bidin devjê berdan û her ku me qebûl nekir zêdetir ser me de hatin.

G.Z.: TKSP, ango SAPO?

---.: Bi hev re.

Wergervan: Me rapora 1984'an pirsî bû, hat qebûlkirin?

---.: Hatiye qebûlkirin.

G.Z.: Heya 84'an bi çavên "terorîst" li PKK'ê hate nêrin?

---.: Lewre wê didin qebûlkirin. Her ku diçe vê ji hêla Ewrûpa ve pêş dixînin. Divê neyê jibîrkirin ku armanca li Papa xistin ev bû: Papa, di demake hêjmareke zêde mûlteciyên Tirkiyê li Ewrûpa tijî bibûn û di parlementoya Ewrûpa de li dijî Tirkan di sibeha heman şevê de biryara ku derbikeve de lê hat lêxistin. Çima? Wiha Tirk û komên Tirkan yên li Ewrûpayê wê li kesên weke Papa bixin û terorîzmê pêş bixin… Zilamê ku li Papa xist jî zilamê TC'ê bû. Artêş wî ji girtîgehê derxist û şandin Ewrûpayê. Ev gelek vekiriye. Ağca çawa ji girtîgehê derxistine ji hêla generalan ve hatiye şandin gelek vekiriye.

G.Z.: Birêz serok, li gorî we li pişt katlîama Palme kîjan kom hene?

---.: Ez henek din vê mijarê vekim. Gelo çima me têkilî vê bûyerê kirin, hewl didim ku ji vê re vekiribûnê bînim. Di vir de bi kevirekî li çend cihan xistin tê armanckirin. Tenê beriya niha texmîn dikim ji navendeke cidî tên. Li gorî vê Palme weke ku destekê dide tevgerên rizgariya netewîyan, bi polîtîkayên aşitiyê re girêdayî mayîn û ji ber yek ji rêbertiya wî ya ku di mijara çekên kîmyayî de dihat destnîşankirin, di asta herî jor de di derbarê wî de rê li ber biryara mirinê vekir.

G.Z.: Yanê ji teşkilata îstîxbaretê, hûn qala wê dikin?

---.: Mesele di vê demê de lêdana Indira Gandi hebû. Papa

bû mijara vê rewşê jî. Ji ber ku Ağca misilman bû li Papa xist. Rolake Indira Gandî ya navnetewî heye. Rola Papa û Palme heye. Ew jî di arasteya dîrokê de wekhev e. Lêdana Ağca ya Papa yê biryareke asta jor e. Ev bûyer jî nehat zelalkirin. Heya van bûyeran jî, yanê beriya ku ABD dest bi bendavên xwe yên bi Sovyetê re bike, paşverûtiya di qada navnetewî de bi awayeke tund li ser kesên bi vî rengî, yên aligirên aşitiyêbûn diçûn. Ev jî rastiyeke. Heya van bûyeran, yanê li gorî min çarçoveya navnetewî mirov dikare bi vî rengî dayne. Di vê çarçovê de mirov dikare bigire dest. Biryara lêdana Palme û Papa pêwîst e bi pêşkeftinên navnetewî ve bê spartin. Ev gelek girîng e. Ev ji bo lodana Papa û Palme pêşgahiyeke pir baş e û xaleke pir girîng e. Mesela Ağca bi Bulgaran re weke hevkar hat destnîşankirin. Çima? Ji bo ku hemû welatên sosyalîstan li hember cîhana Hirîstiyanan derbixin hat kirin. Kî dê vê mebestê bişopîne?  Û kê xist pratîkê? Ji girtîgehên ku çûk nedikarin bifirin generalan çima Ağca derxistin? Çima vê li Ewrûpa bikin? Ji ber ku bi hezaran sebebên wî hene. Ma bila bikin, panaberên Tirk bi qasî ku li Papayê bixin terorîst in, ji bo ku wî nehewînin dixwazin hinceteke bafirînin, ma ev daxwaza kê ye? Ez ê balê bikişînim ser xaleke din, wê demê nediyar bû ku em ê tenê bi serê xwe berxwedanê pêş bixin. Hemû kom rewşên dişibin hev dijiyan. Ji ber vê Papa tê hilbijartin. Piştre me tênê berxwedanê domand û armanc digihîje heya me.

G.Z.:  Yên li Palme, Papa xistin heman polîtîka û heman kes hebûn?

---.: Li gorî min wisa ye. Heman navendên polîtîk hene. Dibe ku organîze bê guhertin, lê heman polîtîka ye.

G.Z.: Di vê mijarê de hizirandineke we heye. Ev rêxistineke

Tirkan e, an jî CIA bû, yanê kîjan bû?

---.: Îhtîmaleke mezin rêxistinên îstîxbaratê di navenda navneteweyî de, jixwe têkiliyên MÎTA Tirkan û CIA gelek zêde bûn. Dîsa têkiliyên îstîxbarata Alman û MÎT'ê hene. Dibe ku CIA bi yên di binyeta NATO'ê de cîh digirin komployek hevpar bimeşînin. Îhtîmaleke mezin di nava SAPO'ê de jî baskeke heye. Bi taybet yên di nava vê hevkariyê de, yên ku dixwazin Îsveçê jî bikişînin nava NATO'ê, hêzên ku di nava SAPO'ê de wan temsîl dikin hebin. Nehilbijartina me bi mîsogerî ne tesedûfî ye. A rastî di destpêkê de hukumeta Îsveçê ew qas ne li hember me bû. Heta di derbarê me de ji Palme re dibêje ku "naxwazim ew têkilî meseleyê bibin." Ev gelek vekiriye ne wisa? Vekiriye. Di nûçeyên televîzyonê de, di êvara 26'ê Tebaxa 1985'an de vê dibêje. Diyare ku hinek dixwazin têkilhev bikin. Gelek tevlîhevkirin jî heye. Ji bo ku em bi Îsveçê re bên rewşeke dijminahiyê, tevlîhevkirineke polîsan zêde hebû. Ev gelek girîng e. Me çima bi israr têkilî vê dikin?

G.Z.: Navê PKK'ê têkilî katlîama Palme kirin, berê kiribûn yan jî hema piştî katlîamê navê we têkil kirin?

---.: Na, gelek berê. Yanê ji sala 1981'an ve, ev pêş dikeve. Her ku diçe lêhûr dibe. Navendeke navnetewî bi taybet vê lêhûrbûnê dide çêkirin. Heta dixwezin daxwaza min ya penaberiyê jî asteng bikin û tê astengkirin jî. Bi awayeke vekirî, hinek hêz dixwazin Îsveçê ser PKK'ê de bibin. Heta polîsekî carek gotibû ku "hûn çima li Palme naxin?" Rojnameya Aftonblate di dîroka 26'ê Tebaxa 1985'an de û SAPO weke çavkanî dide diyarkirin û dibêje wê PKK lî ser Palme şîdet bikar bîne. A rastî biryara kuştinê heye û yê vê dide nivîsandin jî têkiliya wî bi SAPO re heye.

G.Z.: Ez navê yê nivîsandiye dizanim.

---.: Ji kêderê dizane ku em ê şîdetê bikar binin. Pêwîst e îsbata xwe deyne holê, beriya qadlîamê 5 rojan vê dinivîsîne. Lê belê ev polîtîka ji nîvşkê ve hev digire. Di vir de provakasyonek heye. Jixwe li ser vê Palme dibêje ku “ez naxwazim têkilî bûyera PKK’ê bibim”.

G.Z.: Nizanim çendî rast e, li gorî agahiyeke ku min ji çavkaniyên Îsveçê girtiye û ji min re gotine; di organên weşanê yên PKK’ê serxwebûn de, Palme dijminê Kurda ne, ji ber vê jî pêwîst e bê perciqandin hatiye nivîsandin.

---.: Na bi ti awayî tiştek wisa nîne.

GZ. : Min bixwe rojnameya Serxwebûn nedît, nizanim. Lê ji min re wisa hatiye gotin.

---.: Nexwe ev derdikeve holê: Di hilbijartina Palme de hinek sedem derdikevin. Di dema desthilatdadariya wî ya sîh salî de, polîtîkayeke wî ya aştî û xwebêçekkirinê dida meşandin hebû. Bi sempatî nêzî tevgerên rizgariya netewîyan dibe; dudu jî bi taybet dijminê polîtîkaya DYE ya li hember Vîetnamê û hukumeta Reangan a ku piştî 80’an li Emrîkaya mezin pek hatiye. Ev mijareke gelek vekirî û tê fêmkirin e. Ketina Tirkiyê ya navenda navnetewî jî, ji ber vê ye: Palme di Tirkiyê de bi rêyeke sosyal demokrat re ji meseleya Kurdan re pêşengatî dikir. Yanê ji polîtîkayên TC’ê yên derve re quncikek vedikir. Ev jî rê li ber TC’ê vedike ku dijminahiya Palme bike, ev pir girîng e. Di vir de her ku diçe wateya xetên pêşkariya (kışkırtıcı) MÎT’ê Tirkan derdikeve holê. Di vê demê de di nava Îsveçê de jî hinek derdor ji Palme tangaviyên xwe hebûn, polîtîkayên wan yên alîgirê NATO’ê hebûn. Daxwaza têkiliyên xwe bi

hukumetên rastgir re pêş bixin hebû.

G.Z.: Delîleke ku têkiliyên SAPO û MİT'ê Tirkan bi hev re heye, di destê we de heye?

---.: Pir delîl hene, gelek raporên wan yên di derbarê me de ku malûmatên xwe ji MÎT'ê digirin hatine weşandin. Ew rapor hemû ji Tirkiyê hatin girtin. Yanê gelek diyar e, di vê mijarê de ji SAPO zêdetir, gelek kes diçin Tirkiyê, gelek bi baldarî civînên berfireh pêk tînin. Ev agahî digirin û diweşandin. Di vê mijarê de heke çapemenî bê temaşekirin gelek mînakên wê hene û ev jî tê zanîn, her ku diçe têkiliyên wan bi hev re xurt dibe. Herî dawî raporeke veşartî ku ji hêla Palme ve dihat venêrtin pêwîst dibû ku ji komîsyona parlementoyê re hatibana pêşkêşkirin, lê SAPO ev rapor neda. Lewre ev têkilî tê tesbîtkirin, lê nayê ravekirin. Hemû têkiliyên SAPO di rapora komîsyonê de tê tespîtkirin. Niha jî komîsyon rapora ragihandina di navbera SAPO û MÎT'ê de dixwaze, lê SAPO nade. Ji ber vê jî komîsyon îstifa dike.

Sedema ku qetilkirina Palme xistina ser me ji ber vê ye. Di 85'an de Tirkiye di rewşeke pir tangav de bû. Ewrûpa jî neçar bû ku partiyê "terorîst" îlan bike. Neçar bû ku hemû komên 82'an "terorîst" îlan bike. Piştî 1985'an û şûnde mecbûr ma ku me "terorîst" îlan bike. Ev vekiriye, ger bûyera Palme bikin malê me, ev dê bê wateya ku li Ewrûpa em partiyeke "terorîst"in. Wê demê ev dibe îflasa hemû polîtîkayên me yên rizgariya netewî. Piştî em terorîst îlan kirin bîst roj û şûnde, li Palme tê xistin. Bi mîsogerî di navbera bûyera kuştina Palme û PKK'ê "terorîst" îlankirinê de girêdaneke heye. Palme bixwe me terorîst îlan nekiriye û di vê mijarê de zehmetî dikişine. Îdîaya terorîstiyê ji sala 81'an ve pêşdikeve. Lê nagihîje serkeftinê, loma divê demê de rewşeke pir

şênber derdikeve holê. Ew bixwe vê peyaneriyê (girişim) hîs dikin. Muhtemel e hêmaneke bêteraz e(dengesiz), dikaribû Kurdekî bikar bînin. Di vê mijarê de ez hin jî şaş mame. Di qetlîameke bi vî rengî de çima Kurdekî bikar neanin? Hem jî dikarin ew kes weke ku “PKK'yi ye derbixin.” Lê hevsera Palme kujer dibîne. Tabî îdayeke bi vî rengî heye: Çeka ku Finliyek di qetlîamê de bikar anî didin Kurdekî. Tiştên bi vî rengî gelek in. A rastî ev tengezariyeke, her tim dixwazin Kurdan, bi taybet jî PKK'ê teşîr bikin.

G.Z.: Li Îsveçê îdîaya herî dawî, ya di derheqê PKK'ê de ev bû: Ji ber ku “Palme, firotina çekan li ser Îranê da qutkirin, dibe ku PKK ji hêla Îranê ve hatibe bikaranin.” Min vê nûçeyê di rojnameyeke de xwendibû.

---.: Diyar dibe ku ev hawirdor gelek xebitine. Li gorî min eşkirekirina ev hawirdot wê pir zehmet nebe.

G.Z.: Dê çawa bên dîtin?

---.: Ger ev pêşveçûn baş bên şopandin, dê ev zilam yekser di nav SAPO de bê derxistin. Di nava vê komê de dibe ku fanatîkên Îsveçê derbikevin. Ev dibe şebekeyeke fanatîk jî bin. Têkiliyên Îranê bi me re ne mumkûn e. Baş dizanim, heya niha têkeliyeke Îranê tenê jî li Ewrûpa çênebûye. Heman senaryo, erkdarekî qasîda Almanya dema ku li Parîsê lê tê xistin, di berîka wî de belavokek sexte yê aîdê me derdikeve. Dîsa li Hamburgê torbeyeke tijî dînamît datînin derikê û dibêjin waye di malên PKK'ê de dînamît hatin dîtin. Ev provakasyon di dema pîrozkirina salvegera pêngava 15'ê Tebaxê de tê kirin. Hevkariya polîsên Alman û polîsên Tirkan gelek vekiriye. Heta niha di destê me de polîsekî Tirkan heye, me girtiye. Li Ewrûpa bi pêşxistina provakasyonan re, ji bo ku me bixin nava pevçûnên

biçek çendî hewl didin, datîne holê. Teleîzyona Alman kişand û hevpeyvîn çêkir.

G.Z.: Alman bû?

---.: Na,Tirk.

G.Z.: Li vir e?

---.: Rast e.

GZ. : Têkiliyên wî bi SAPO re heye?

---.: Na, na. Polîsekî Tirkan e. Di konsoloseke Tirkan de erkdar e. Lê ya girîng terorê pêş dixin.

G.Z.: Çalekiyên terorê di Almanya de pêş dixist?

---.: Li Almanya û Hollanda.

G.Z.: Ev çalekiyên terorê hemû dixwestin bikin malê PKK'ê?

---.: Li hember PKK'ê dikin û PKK'ê neçarî pevçûnên biçek dikin. Dixwazim vê bijim: Xebatên MÎT'ê Tirkan yên bi vî rengî li Ewrûpa gelek hene. Li gorî min rewşa Palme zelal e.

G.Z.: Birêz Sekreterê Giştî, tam netaybet jî be, lê ez ê pirseke hinek taybet bipirsim. Dema ku Palme kuştin û xwestin bavêjin ser we, dema ku we vê rewşê bihîst reaksiyona we çibû?

---.: Min di heman êvarê de ji hevalan re telefon vekir, min got ev komploye û min xwest li ser vê belavok belav bikin. Didiliyeke min bi qasî misqaleke jî nîn bû. Helwesta min a polîtîk ev bû. Tabî di

bûyera Palme de, di wateya hestî de xemgîniya xwe anîna ziman ango bilêv kirin, bawer im pêwîst nake. Ger yekî me têkilî vê bûyerê bûbûbaya me yê wî bi awayeke vekirî mehkeme bikiriba. Di vê mijarê de didiliyeke min herî biçûk jî nebû.

G.Z.: Dibûya ev rewş ji hêla yekî PKK'yî ve ango yekî ku ji nava PKK'ê revî ve bê destûr hatibûna kirin?

---.: Dibû, yên ku vî karî plan dikin, wê bixwazibin karekî bi vî rengî pêş bixin. Ger serkeftî bûna niha ji zû de derxistibûn. Lê ew di xaleke de xirap şelipin. Hêvî dikirin ku em ê xetayeke polîtîk bikin û em ê bêjîn ku baş bû, xweş bû! Vê bi awayeke taybet emade kiribûn. Ji ber ku tahrîbeke pir mezin hebû. Bi vî mijarê ve girêdayî ez ê xaleke din jî destnîşan bikin. Çi zilamên ku xusarê dabine partiyê hebin, ji salên 80'an ve gelek musahama ji wan re hate dîtin û ji bo wan derfetên mezin ji wan re hatin dayin. SAPO gelek nirx ji van re dide. Vekiriye ku dixwaze dijminahiya partiyê bi awayeke vekirî pêş bixe û ti asteke wan ya siyasî jî nîne, bi polîtîkayê re mijûl nabin. Tenê bi riya van dijminahiya me dan kirin. Ev jî hinek rastiyan vedibêjin.

G.Z.: Gelo reşkirina Îsveç SAPO a li hember we û pirsgirêkên li Îsveçê, ji PKK'ê re derxistin, doz û rêxistina we reş kir?

---.: Xusara wê ev bû: Hîn jî li Ewrûpa kampanyaya reşkirinê mijara gotinê ye.

Gelek gumanên mezin çêkiriye. Desteka ku pêwîst bû em bigirin asteng kiriye. Ya din jî tişta herî girîng, heya wê demê li vir rewşeke min gelek krîtîk hebû. A rastî li welateke azad bicîhbûna min wê gelek wateyeke xwe polîtîk hebûya. Ji ber ku li vê qadê mayîn, Tirkiyê kedeke mezin serf kir. Dikaribûm biçim Îsveçê, ew jî

hate astengkirin. Bi vî rengî çembera tecrîda dinyayê temam dibû. Yanê mecala li wir girtin dan. Ev girîng bû. Herî dawî dema ku em li vir man, em bi gelek zehmetiyan re rû bi rû hatin. Ev di rojnemeyan de jî hate peytandin. Di dîroka 1984-’85-’86’an de li vir komplo hatin pêşxistin. Ev sal, salên rêxistinê yên herî xeternak bûn. Mimkûn bû partî di van salan de fetisîba û heta bihatibana fetisandin. Ji ber di van salan de me zilamekî avêtibû. Mesela komployên ku çawa li min hatiye xistin di rojnemeyan de hate peytandin. Mîsoger êdî dibûya ez biçûbama şûnekî, rewşeke wisa hatibû afirandin. (...) Piştî van mercan û şûnde çûyîna min a Ewrûpa zehmet bû.

G.Z.: Hin jî çûyîna we ya Ewrûpa bifikar e?

---.: Zehmet e, bifikar e, yên ku ev qas tişt derxistine dev ji me naberdin. Yên ku Palme qetil kirin dev ji me naberdin.

G.Z.: Di vê wateyê de yên ku li Palme xistin û navê PKK’ê têkilî wê bûyerê kirin, di wateyeke din de em dikarin bêjîn di mijara birêz Sekreterê Giştî û rêxistinê tengavkirinê de serkeftibûn.

---.: Bêguman, zehmetiyeke gelek mezin bû…

G.Z.: Di kîjan salê de we xwest biçin Îsveçê?

---.: A rastî ger ku navend gihaştîba, xebateke rehet û azad hebûya, dibûya ku ev çûyîn di salên piştî 80’an de çêbûbaya. Ger ev kampanyaya reşkirinê di salên 81’an de destpênekiribaya, dibûya ku daxwaza ziyaretê pêş biketibana. Bi vî kampanyayê ve me veciniqandin. Ya din jî dibûya di salên 81-82’an de çêbibûya. Dibûya piştî 84’an dema ku me dest bi çalekiyên leşkerî kirin û şûnde jî

bibûya, lê vê jî b ivî rengî asteng kirin.

G.Z.: Serlêdana we kengiye û we kengî bersiva neyînî girt?

---.: Serlêdana min di navbera salên 84-85’an de bû. Di van salan de diyar bû ku ji bo me derxistina tangasiyên polîtîk gelek zêde bû. Ev jî kêm zêde gihişt asta ku dixwestin bidest xistin.

Dibe niha navend ber bi nermbûnê ve diçe. Heta rojnemevanên DYE dixwazin bi min re hevdîtin çêkin. Dûh sefareta (elçi) DYE civîneke çapemeniyê çêkir. Got: Pêwîst e Kurdên li Tirkiyê mafê xwe bigirin. Ev civîna çapemeniyê ya alîkarê Wezareta Karê Derve bû. Çima? Ji ber ku têkoşîna me tine nekirin. Tiştek din jî heye. Rojnemevaneke Tirk li Washintonê vê dinivîse. Yanê dixwazin dîtineke din pêş bixin: “Ji meseleya Kurdan re erê, lê ji PKK’ê re na!” Ji vê re dibêjîn nêrîna Washington. Niha gelek vekiriye. Hêzên ku dixwazin ji me xilas bibin, gelek zelal e. Niha jî dixwazin xetayeke lihevhatinê bidin afirandin. Ev hinek rastiyan tîne bîra mirov. Heya 1987’an bi mîsoger em “terorîst”bûn û diviyabû “em hatibana tinekirin!” ev dîtina Tirkan û DYE’ê bû. Niha jî ev nêrîn tê guhertin

G.Z.: Li Tirkiyê jî ev nêrîn tê guhertin?

---.: Tabî, encamên ku derdikevin holê vê dide diyarkirin. Daxwuyaniyeke alîkarê mûsteşarê MÎT’ê Hiram Abbas di rojnemeyê de heye. Wiha dibêje; “PKK tenê rêxistineke terorîst nîne, di heman demê de tevgera Kurd a têkoşîna netewî ye jî”. Yê ku operasyonan rêve dibe jî ev e, yanê ew ê MÎT’ê ye. Li ser me dibêje; “min projeya Ewrûpa pêş xistiye.” Lewre projeya wî ser nakeve. Li Ewrûpa vê jî dibêje; “min tam nexist pratîkê”. “Teqawîtiya min derket ez neçar mam ku veqetim.” Tişta ku dixwazim bêjim, heya 87’an tevgerê tine nekirin û nikarin tine bikin. Gelek helwdan hene, di asteke jor de

didin meşandin. Lê tevger nehat xeniqandin, piştre çi dibe? Wiha niha jî rewşeke cudatir derdikeve holê. Ez ê wê bi baldarî binirxînim. Beriya ku mijarê bigirim,bi rastî jî di vê xalê de ez di wê baweriyê de me ku gelê Îsveç di alî wijdanî de zehmetiyan dikişîne û di heman demê de bi gelek pirsnîşanan re rû bi rû ne. Xwe weke ku îxanet lê hatiye kirin dihesibînin. Ji ber ku rola Palme di jiyana Îsveç a niha û di avakirina demokrasiya wê de rolakî wî pir mezin hebû û van pêşkeftinan bi Palme re dida jiyîn. Weke ku wan bixwe qetil kirine, lê hatine. Ev bûyereke ku ti car ne li bendê bûn. Di vê mijarê de rexneyeke min ev e ji gelê Îsveç û raya giştî re. Bawer nedikirin ku hewirdorên paşverûyên netewî, wê her tim qatlîamên bi vî rengî yên ev qas xedar bikar bînin û Palme jî daxil. Ev hêz dijminê aştî û demokrasiyê ne, lê ev jî rastiyeke, rastiyeke cîhana me ye.

G.Z.: Ez dixwazim pirsek bipirsim. Hûn bawer dikin ku wê qatîlên Palme bên girtin? Hûn tişteke bi vî rengî difikirin?

---.: Katîlên Palme wê neyên girtin. Ji ber ku Îsveç lewaz e û yên ku Palme qetil kirine gelek xurt in. Barê aştî û demokrasiyê bi qasî ku nikarine rakin giran bû. Dibe ku keseke derbixînin holê. Heta dibe yê ku mermî lê xistiye jî bibinin. Lê mîsoger wê ew ne qatîl be, qatîl wê yeke din be û wê ti car jî neyê dîtin. We fêm kir ez dixwazim çi bêjim?

G.Z.: Tabî, min fêm kir. Ev karê rêxistinekiye?

---.: Ev karê rêxistinekiye. Dikarim bêjim ez li hember gelê Îsveçê rêzdar im. Tevî rexneyên me jî em li hember armancên Palme yên mezin jidil rêzdar in. Civaka ku pêş xistiye wiha îzah dikim; Avaniya mirov bi rastî jî muxetabê hezkirina me ye. Dema ku ez vê bixemgînî tînim ziman, dixwazim vê bêjim: Dijminên aştiyê gelek

bihêztir in û di vê mijarê de li hember wan sekinin jî biryarbûneke xurt pêwîst e. Hewceye saf nebin. Parasvaneke tenê jî xeta ye. Ez jî li vir ti caran çek nagirim, lê dil dixwest ku her roj tenê bi serê xwe li vir bigeribam. Lê rastî van daxwazan negengaz dike. Dîsa dibêjim; bi rastî jî ez li hember Palme, gelê Îsveçê û nirxên wî yên jiyanê heya dawî rezdar im û van nirxan bi hezkirin bibîr tînim. Ev e tiştên ku dixwazim bêjim û bi hemû vekiribûna xwe ve dibêjim. Ez hesabên biçûk nakim. Ji ber ku her kêlî û her demjimêr ez di bin xeteriya mirinê de dijim.  Ez vê jî bêjim,  dibû ku Îsveç demek ji bo me roleke bileyîstiba lê ev rol nehat lîstin, xemgîniya min hinek ji vê ye.

G.Z.: Hîn jî li Îsveçê PKK terorîst tê lansekirin, hûn li hember vê xemgîn dibin?

---.: Êdî ji bo min Îsvêç bi temamî girîngiya xwe winda kiriye. Me li wir xebatên rêxistinê ji çav derxistiye. Piştî ku emniyet tevlî vî kar bû êdî tiştekî em bikin nema.

G.Z.:  Lê hin jî PKK li İsveçê ye.

---.: Ew alîgirin, dikarin bimînin. Ez vê di warê siyasî de dibêjim. Wê roleke wî girîng çêbibûya û rol jî girt, ew rol hate tinekirin. Mesela Palme nebûya, dikaribû navbertiyeke baş di navbera Kurd û Tirkan de bikiriba, girîng jî bû. Erkên Palme yên wisa navnetewîyî hebû. Ji bo têkiliyeke wisa di rewşeke herî baş de bû. Zilamê ku îro vî rola bigire nîne. Desthilatdariya Tirk û dewleta Tirk baş dizanîn ku yê ku wî rola bigire tenê Palme bû. Wiha, li vî rol tê xistin û tê tasfiyekirin. Niha li wir ABD heye û wê ABD de çiqas bi edalet nêz bibe. Wê Alman çiqas bikaribin bi edalet nêz bibin. Li vir diyar dibe ku Palme dikarîbû roleke baş bileyîze. Diyare ev ji bo me jî dibe windahiyek mezin. Yanê xemgîniya me ev e.

G.Z.: Beriya qetilkirina Palme, di navbera Kurdan de li Stockholmê yanê beriya komkujiyan, bi qasî tê bîra min hinek bûyerên kuştinê yên ku PKK di nava Kurdan de tevlî bûne hene. Di nava rêxistinekê de li yekî hatibû xistin. Ev di nava gel de çavdêriyek hêla. Piştî vê û şûnde bawer im ji bo SAPO, gotina ku PKK têkilî qatlîama Palmeyê bûye ya van hêzan bû.  Birêz Sekreter, ji bo kuştinên di nava Kurdan de dokomentara we çi ye?

---.: Di vê mijarê de nêrîna me ev e: Bi mîsogerî weke rêzîk (kural) em li ti xerîban naxin, ABD jî di nav de di rojeva me de tiştek wiha nîne. Ne berê hebû ne jî niha heye. Ez baş dizanim. Di polîtîkaya me de li xerîban xistin nîne. Li hinek Kurdên di nava me de hatiye xistin, têkiliyên van heya MÎT'ê Tirkan diçû.Yanê ev beşên ku lê hatine xistin, herî kêm kesên ku darbeya herî mezin lê hatine xistinin. Ger em mînakeke bidin, keçek ez bawerim niha li Îsveçêye- Seher, navê wê Cemile Merkite di TV'yê de derdikeve. Navê wê yê din Cemîle Kaytan, li Amedê bi MÎT'ê Tirkan re hevkariyê dike, li ser hevalên me yên di girtîgehan de hemû îskence, qetlîam jî têde tesfiyekirinê hedef dike. Bi alîkariya subayên Tirkan li Ewrûpa telefonan dike…

G.Z.: Hate cezakirin?

---.: Na, tişta ku dixwazim bêjim ev e: Yanê ji bo partiyek tine bikin, birehetî bi Tirkiyê re dixebitin. Bi hezaran kes û mirovên bi vî rengî hene em ji wan hez nakin, em ê ji wan hesab bipirsin. Lê nêzîkatiyeke ku îlahî em ê li Îsveçê terorîzîm bikin, nakin. Yan jî wê bi ti awayî têkiliya wê bi Îsveçê re nebe. Jixwe li Ewrûpayê yekser nabe. Niha û di zemîneke wiha de tişteke bi vî rengî çênabe û nayê fikirandin jî. Ev derketin holê û hatin teşîrkirin. Lewre ev jiyan bikin jî ji bo me ne girîng in. Pirsgirêkeke me ya tundiyê nîne. Lê divê ev jî

bê famkirin. Yanê em li vir jî tên girtin, endamên MÎT'ê Tirkan dikarin bên. Ger em wan tasfiye nekin wê ew me tine bikin. Em rêxistineke şer in, bûyerên bi vî rengî pêş dikevin.

G.Z.: Ma şandina wan a vir diceribînin?

---.: Hêjmarek zêde.

G.Z.: Çiqas?

---.: Ji pênciyan zêdetir. Me gelekan ceza kir, ji ber ew bên birêxistinkirin û derfet bibînin wê wargehê bifirînin ezmanan ev jî rewşa şer e.

G.Z.: Ji wan hin jî li vir hene?

---.: Hene, me da rojnemeyên Tirkan jî. Wê tiraja wê derkeve. Yanê yê ku ji derve de terorîzmê bilind dike dewlet e. Îsbata wê heye,bixwe jî dikare bibîne. Em neçar in ku xwe biparêzin, berûvajiyê vê dê ev dawiya me bînin. Ew dewleteke, lê em bi zorî hebûna xwe didomînin.

G.Z.: PKK çiqas bi hêz e, hêza wê çend e û çiqas leşkerê wê heye?

---.: Ez bawerim ev pirs jî girêdayî pirsa dine. Ez vê jî bêjim. Li Ewrûpayê tiştên bi vî rengî çêbûn. Hinek hêman şîdet bikar anîne. Ti agahiyeke min ji van nîne. Ez dikarim vê bêjim. Ev dibe Enver Ata, Semîr, li Almanyayê gelek kesên bi vî rengî hene, ji ber vê hinek bûyerên wisa çêbûne. Tabî bêyî ku agahiya min jê hebe, yên di rewşeke alîgir de nekirine. Di Kurdan de ev taybetmendî heye. Yanê li hember hev tolhildêr in. Hinek alîgir û çalakiyên wan yên bi vî

rengî hene, nikarin bipejirînin. Tiştên dixwazim bêjîm di nav welatê ku vedibêjim de jî ev tişt çêdibin. Hinek çalekiyên ku me nikariye zelal bikin hene, yên ku van dikirin em jî erk digirin. Dixwazim vê bêjîm, ez di rêveberiya xwe de vê weke rêbazekê bikar nayînim û wê ticar nebe mijara gotinê jî. Ger polîtîkayeke bi vî rengî hebe, wê rojê sed kes bidin kuştin. Nemaze ji aliyê polîsan ve weke delîl terorîstî ev pêde ajotina wan rast e. Ev heya dawî bûyerên awarte ne. Wê li Îsveçê tiştên wisa çênebin. Lewre wê tiştên bi vî rengî û heya ji destê min bê çênebin.

G.Z.: We got êdî PKK xwe li Îsveçê bi rêxistin nake, ji kengê ve wisa ye?

---.: Piştî van pêşkeftinan. Ti nûnereke rêxistinê yê fermî nîne. Mîsoger ger tiştên wisa çêbibin, hinek li ser navê PKK'ê bikin jî nerast e. Jixwe ji hêla dewletê ve ev ne guncav  e. Nûnerê me yê fermî qebûl nakin. Alîgir hene, ew jî bi awayeke nefermî kom in, çalekiyên wan jî me eleqedar nakin. Bi qasî ku ji dest me bê em ê hewlbidin bi awayekî durist we weke kom bi cîh bikin. Em ê her tim bêjîn bila tiştên xirap nekin.

G.Z.: Dibe ku di dema pêş de hinek guhertin çêbibin? Ma wê bikaribe bibe rêxistineke fermî?

---.: Bêguman ger ev kêmahî bên tinekirin dibe. Ji ber di raya giştî de li ser me zextek zêde heye. Heke ev rewş ji holê rabe, rastî û mafdariya PKK'ê ji raya giştî re baş bê peytandin, raya giştî baş îqna bibe, dibe ku rewşeke din derkeve holê. Ji bo çapemeniyê jî rexneyeke min heye. Ji bo ku me xirap bidin nîşan, hinek kes nivîsên ji derveyî rastiyê dinivîsin.

G.Z.: Mînak...

---.: Gelek hene. Yê ku serî dikişîne Rojnemeya Ekspres e. Gelek nivîsên kêrnehatî hene, bi temamî ser armaca reşkirinê ne. Ji bo me weke rêxistinek“kujtar-canilik,” “tarî,” mêrkuj-katil” bide nîşan her tişt kirin. Bêguman ev lîstikên SAPO yên teşe girtine. Ev rewşeke gelek bêmafî ye. Ger ev nêzîkatî ji holê rabin, wê nûnertiyek fermî çêbibe. Di vê mijarê de bi taybet ji bo ku bikaribin xwe baş bipeyîtînin, vê didim diyarkirin. Karê di vê derbarê de bikeve ser milê me em ê…Mîsoger li hember raya giştî erkên me hene, hewceye em rastiyan derbixin holê. Ji bo me carek din di vê mijarê de derfet bidest xistiye gelek xweşhalim û spasiya xwe raber dikim.

G.Z.: Ez dixwazim nerînên we yên di derbarê rewşa Kurdistanê û hêza PKK’ê wê di dema pêş de çawa be bibihîzim. Ger hûn bixwazin baxivin dema pirsên min çêbibin ez ê di navberê de bipirsim.

---.: Di pêşangatiya PKK’ê de dîroka Kurdistanê hatiye qonaxeke dîrokî. Niha tiştên ku di Kurdistanê de pêşdikevin rastiya şerê rizgariya netewîye û ev şer şerê taybet e ku ji aliyê KT ve li ser Şerê Rizgariya Netewî ku tê ferzkirine. Bi taybet ev saleke şerê taybet xwe bi cîh kiriye. Ev cara yekem e di dîrokê de rêveberiyeke şer a deh salan vala hatiye derxistin. Di Kurdistanê de niha di bin navê waliya mêtîngeh de dibêjin waliya taybet, wê rêveberiyê pêş dixin. Bixwe 12 wîlayetan rêve dibe. Niha li wîlayetên weke Amed, Mêrdîn, Sêrt, Colemêrg, Wan, Elezîz, Çewlik, Dersim, Kars, Agirî, Bitlîs, Riha, Semsûr, Maraş û Dîlok komên me yên çekdarî şer dimeşînin hene.

G.Z.: Ez dikarim pirsa hêza PKK'ê ya çekdarî çend e bikim?

---.: Ev hêjmar ewqas ne girîng e, lê di hemû herêman de hebûna komên me yên çekdarî mijara gotinê ne. Hêza me ya leşkerî ji hezarî jortir e. Hêjmar nayê dayîn, lê hêzeke wê ya gel pir mezin heye. Em dikarin bêjin ku hêzeke wê ya gel bi sed hezar û mîlyonan heye.

G.Z.: Ev wargeha perwerdê ya niha di destê we de, ji derveyî vê wargehên din yên perwerdê hene?

---.: Wergehên me li vir jî hene. Ya esasî di derveyî welat de hêjmareke zêde hene.

G.Z.: Li Bakurê Rojavayê Kurdistanê ye.

---.: Tabî di pêncî cihan de hêzên me yên leşkerî herêman di bin kontrola xwe de digirin. Şereke tê meşandin. Car heye şer sê rojan didome û hêjmareke mezin pevçûn çêdibin. Rojên bê pevçûn nîne. Bi sansûrkirina van hemûyan ve ji hêla gel ve jî tê zanîn ku şerek tê jiyîn.

G.Z.: Di derbarê êrîşên PKK'ê yên li ser gund û gundên cerdevanan de hinek rexne çêbibûn, di vê derbarê de nerînên we çine?

---.: Na, hemû rojnemevanan di vê mijarê de pirs pirsîn. Şerê taybet ê ku TC'ê xwest pêş bixe, sivîlan derxistina pêş e. Dixwaze Kurdan bi Kurdan bide kuştin. Ev bi temamî mijareke ku şerê taybet dixwaze bide pêşxistine. Em hewl didin ku li pêşiya vê bigirin. Yên ku serdemeke gelên Anatoliya ji holê rakirine, hin beriya du rojan Ermeniyan ji holê rakirine û li ser me jî qatlîamê ferz dike hêzeke.

Gel tine û parçe dike. Gund, gundên me ne, em ne êrîş berûbajî wan gundan diparêzin. Di gundan de hinek kesên sîxurên dewletê hene bi gel re ne. Car heye ew bên cezakirin. Polîtîkayeke me li jin û zarokan bixe nabe. Ev rêbazeke dewleta Tirk bû ji bo me li Ewrûpayê weke “terorist” bide nîşan pêş xistiye. Gelek xwestin li dijberî me bidin bi kar anîn. Weke ku min gotî ger armanceke me bi vî rengî hebûya me yê rojê bi hezaran mirov bikuştiba. Yanê tiştên dibêjin hemû derew in…

G.Z.: Ji kijan welatan hûn dikarin hevkariyê bigirin.

---.: Hevkarî sînordar e. Ji welatan zêdetir em xwe dispêrin hêza gelê me yên li derveyî welat. Kedkarên Kurdan li gelek derên cîhanê belav bûne. Di hemû aliyan de em xwe dispêrin hêza wan. Xebatên me yên derve xwe dispêre hêza wan.

G.Z.: Di vê rewşê de hukumet an jî welatên ku alîkarî bidin we nîne?

---.:Na, alîkariyên di vir de tenê serbest tevgerîn e, ji derveyî vê ne siyasî ne jî di warê leşkerî de em ti alîkariyan nagirin. Em xwe dispêrin hêza xwe.

G.Z.: Birêz Serok, hûn her tim li vir dimînin?

---.: Na, dem deman. Ti carî zêde li cihekî namînim.

G.Z.: PKK di  Başurê Rojhilat de dixwaze dewleteke serbixwe damezrîne.?

---.: Hîn zêde li Kurdistana Tirkiyê yêkitiyeke siyasî ya ku gel xwe dispêre hukumet û meclîsan heye û di Tirkiyê de di bin sîwana

federal de hatina gel hev dikin armanc.

G.Z.: Bîrdoziya PKK'ê Marxîst-Lenînîst e, ne wisa?

---.: Na, na di wateyekê de ne weke sosyalîzma pêkhatî ya Marx e. Sosyalîzmeke zanistî ya li gorî taybetmendî û xweseriya me mijara gotinê ye. Yanê di vê mijarê de em bi ti navendê ve ne girêdayîne. Ji hemû aliyan ve xeteke me ya bîrdozî û polîtîk ya serbixwe heye.

G.Z.: Hûn çêkên xwe çawa dikirin?

---.: Bi temamî di hundir de di pevçûnên ku bi artêşa Tirkan re tê kirin em bidest dixin. Di vê derê de jî bazirganî tê kirin, li Libnanê jî tên peydakirin, yanê bi riyên bazirganî em dikirin. G.Z.: Tevahî mirovên ku li vir perwerde dibînin ji bo şer diçin Tirkiyê?

---.: Beşek ji wan.

G.Z.: Ji bo Tirkiyê we cara yekê qala çêkereke federatîf û îhtîmala dewletêkê kir. Ev kengî dikare gengaz bibe, sala pêşiya me, yan deh salên din?

---.: Mîsoger, berxwedaniya gelê me ya ku pêş dikeve mijara gotinê ye. Bi rastî jî ev berxwedanî gihîştiye asteke girîng. Berxwedaniya gelê me wê di çend salên pêşiya me de, ger li beramberî binkeftineke cidî rûbirû nemîne, ji niha ve pêşkeftinên bi vî rengî gengaz e. Ne piştî deh salên din. Di têkoşînê de çend salên ku pêwîst e em bidest bixin, em dê bikaribin çareseriyê ferz bikin.

G.Z.: Nêrîna Enqerê, yan jî di Enqerê de çawa li PKK'ê

dinêrin, di nav van çend salan de ti guhertin çêbûne?

---.: Di van demên dawî de, bi taybet di çapemeniyê de nermbûnek heye. Mînak: Beriya we em rastî gelek pirsên rojnameyên weke Cumhuriyet, Mîlîyet, Huriyetê yên herî mezin ên Tirkiyê hat. Gotin ku em ê tevahî agahî û zanyariyên we weke xwe biweşînin û diweşînin jî. Salek beriya niha rewşên bi vî rengî nedihat fikirandin. Heta ji me pirs kirin û gotin: "Hûn agirbestê dixwazin" Me jî got ku; ger rêyên çareseriyê vekirî bên hiştin, ewlehî tam bê dayîn, em ê agirbestê bikin. Eşkereye ku ya herî girîng daxwuyaniya ji aliyê Wezirê Karê Dervê yê DYE'ê ve dûh hatî dayîne. Dibêje: "Em aligirê vê ne ku Tirkiye mafê Kurdan bide wan" helwesteke giran raber dike. Mîsoger wê ev nerînên Enqerê biguherîne. Nemaze mirov dikare li benda pêşketinên nû be.

G.Z.: Zemîna ku bingehê wan pêşkeftinan çêdike çi ye?

---.: Têkoşîn heta salên 87'an nehat linav birin. Niha jî şerekî dijwar pêşdikeve. Wê pir xwîn birije. Weke wan gotî salê tirîlyoneke mesref tê kirin. Ji niha ve şer çar sal li şûn xwe ve hişt. Li Tirkiyê di dîroka komarê de dibe şerê herî mezin. Ji ber ku dizane êdî wê nikaribe bi şer linav bibe, ji bo vê serî li rêbazên polîtîk dide.

G.Z.: Li Ewrûpayê di nav PKK'ê de hinek cudabûn çêbûn û hinek kesên ku di derbarê têkoşînê de nerînên wan ên cuda hebûn veqetiyan. Di vê mijarê de nerînên wê çi ne?

---.: Na, tiştek bi vî rengî nîne. Tenê di nava rêxistinê de yên ku xetê rast pêknayînin û di vê mijarê de hinek bûyerên ku zirarê bidin me derketin holê. Em vê rexne dikin. Yanê ev ne cudabûna nêrîna ye, bi awayekî baş weke pêkanîna xetê mirov dikare

binirxîne. Hinek pirsgirêkên pêkanînê hene, lê cudabûna taktîk nîne.

G.Z.: Ger ji bo min tiştekî hûn bêjin nebe ev hevpeyvîn ji bo min têr dike.

---.: Bawer im dikim ku hinek xalên ku pêwîst bûn derketin holê, bihatibana ronîkirin me bersiveke têr da. Şerê me yê şoreşgerî gihîşt asteke girîng. Di raya giştî ya navnetewî de her ku diçe deng vedide. Hinek kêmasî bilez tên derbazkirin û kamil dibe. Ev, pêşketineke girîng e. Îsveç jî zêde bi pirsgirêka Kurd re mijûl dibû. Di vê mijarê de welatê herî kevn, lê ya di helwesta xwe ya erênî dimond bû. Di vê mijarê de weke ku me xwest hinek rêxistinan li Îsveçê vekin, westin rêxistinê nerênî bidin nîşan. Lê, bi rastî jî ev helwesteke ne rast bû. Hinekan tenê ji bo berjewendiyên xwe yên kesî bi hinek polîsên paşverû re peywendî pêşxistin. Tenê ji bo berjewendiyên xwe ev kirin. Nemaze alîkariya îhtîmal ya dewleta Îsveçê nerênî bû. Ne alîkarî, berevajî helwestekî dijberî me pêşxist. Mîsoger ev ji bo demokrasiya Îsveçê ne baş bû. Pêşengatiya PKK'ê îro di Kurdistanê de mîsoger bûye.

(....)

---.:Lihevkirineke me ya bi vî rengî bi Talabanî re çêbû. Me rêzehevdîtin çêkirin û gihîştin lihevkirinên bi vî rengî. Di be ku rêxistinên din jî bên protokoleke bi vî rengî çêbikin.

G.Z.: Protokoleke çawa?

---.: Di mijarên weke yên leşkerî, siyasî û hwd. de dibe ku alîkarî û şêwirmendî pêşbikeve.

G.Z.: Kengî hat mohr kirin?

---.: Di 1'ê Gulanê de. Bêguman lihevkirina du hêzên mezin e. Hêzên din ên di Kurdistanê de jî wê vê bişopînin. Alîkari dayîna vê wê di cih debe. Hêzên din jî û yên Ewrûpa jî ez bawerim wê vê gavê di wateyeke erênî de bibînin û piştgiriyê bidinê. Wê helwest û feraserteke ji yên berê baştir pêş bikeve. Texmîn dikim ku, welatên sosyalîst jî vê gavê erênî dibînin. Hinek mercên DYE'yê hene. Wê zêde li dijî vê dernekeve. Ger derkeve jî ji ber ku dizane hêza wî têrê nake, ji bo ku têkoşîneke aştiyane pêş bikeve dê biparêze. Herî kêm wiha diyar dibe. Nemaze di qada nawnetewî de têkoşîna Rizgariya Gelê Kurdistanê ji her demê zêdetir wê biselmîne. Vê jî dizanim, hêzên Îsveçê çi Kurd bin, çi jî hêzên Îsveç wê erênî nêzî vê pêngavê bibin. Dubare spasiya xwe diyar dikim.

G.Z.: Ji ber ku we dem ji me re veqetand û eleqeya we ez we spas dikim.

## GUFTÛGOYÊN BI ÇAPEMENIYA BIYANÎ RE

G.Z.: Pêwendiya PKK'ê niha bi Îranê re heye?

---.: Di kîjan wateyê de pêwendî?

G.Z.: Di wateya alîkarî de.

---.: Na, kes rasterast bi me re alîkarî nake.

G.Z.: Ger ji Îranê YNK ji bo we vîze bixwaze wê bide? Ji bo çûyîna Tirkiyê?

---.: Çi di vê qadê de be, çi jî di qada Îranê de be, tevgereke me bi sînor heye. Gelek bi sînor e. Lê me guftûgoya esasî bi gelan re pêk anî. Gelê li ser sînor bi me re ye. Ya herî girîng jî ev e: Di dîrokê de gelê Kurd girtine nav çembera tecrîtê. Lê niha ev çember şikestiye. Ev çember bi pêşkeftinên şerê Îran-Iraq re qismî hat şikandin. Yanê hemû gihiştin hev lê nikarin me bixeniqînin. Cudahiya ji berê ev e. Em ji vê sûd werdigirin û dinirxînin. Ev derfet tektîkeke bi sînor da avakirin. Ji derveyî vê ne alîkariya çek, ne jî alîkariyeke di warê siyasî de çênebû. Tenê me negirtin û îmha nekirin, ev qas.

G.Z.: Ev tevger dibe tevgereke bê alî?

---.: Tabî, polîtîkayek bê alî.

G.Z.: Hûn bi awayeke fermî dikarin biçin Îranê?

---.: Na, ez dikarim biçim hemû cihan, lê bi ewlehî nabe. Bi sînor jî be dikarim biçim hemû welatên sosyalîstan. Dikarim biçim hemû welatên Rojava jî. Lê wê çi bê serê me? Her kes dixweze girê bide. Lê şerê min yê herî mezin serbixwebûyîna xwe dayîna parastin bûye. Û ez bawerim mirovê Kurd yê ku yekem vê serxistî jî ez im. Serbixweyîbûna xwe ya îdeolojîk û siyasî pêşxistin gelek girîng e. Li vir kes kesê serbest naberde, mîsoger wê bixwazibin bidin girêdan. Wiha Îran mirovan direvîne, heya ku nekişîne polîtîkaya xwe serbest bernade.

G.Z.: We vê ji bo Talabanî got?

---.: Na, ger çûyîna Îranê çêbibe, dibe polîtîkayeke wiha ser te bide pêşxistin. Wê bêje "were" piştre te bide girtin.

G.Z.: Ji bo we ne wisa?

---.: Tabî.

G.Z.I.: Baweriya we nîne.

---.: Çawa, ti ewlekarî nîne. Dibêje li jor xwedê, lê wê xwedê kîjan ewlahiyê bigire. Baweriya wê bi xwedê tê, bixwe jî nizane. Min li mantiqê wan mêze kir, me got dibe hinek zehmet bê. Ji bo bê fêmkirin divê hinek xwe biêşîne.

G.Z.: Lê divê bê zanîn ku raya giştî ya Ewrûpayê vê qebûl nake. Yanê weke ev rewşên bi vî rengî fêm nekirî û ji nefêmkirina wê dihat.

---.: Dibêjim ya fêm nakin.

G.Z.: Fêm dike, lê qebûl nake.

---.: Yanê bawer dike wisa ye?

G.Z.: Bizanebûn dike. Ji pêwendiyên virde û wirde fêm dike, lê qebûl nake.

---.: Ji bo Kurdistanê wê mantiqê wan gelek zehmetî bikişîne. Yanê wê nikaribin pîvanên siyaseta derbasdar, polîtîka netewî ya derbasdar, tevgera çandî û exlak bi me bidin sepandin. Zehmet e, dê neyê fêmkirin.

G.Z.: Bi hinek dîplomatan re hevdîtin çêdibe. Ev li ser pirsgirêka Kurd diaxivin. Çavdêriyeke wiha derdikeve holê. Pêwendiyên bi vî rengî nebin, wê şansê wan yê alîkarî girtin zêde be. Yanê heke pêwendiyên wisa cuda cuda çêne be.

---.: Mesela kî?

G.Z.: Yên weke Maksim Renaldson û Spesîalîst Kurdan nagir in.

---.: Baş e, dizanim.

G.Z.: Bixwe pirsê baş dizane, lê destek nake.

---.: Çima?

G.Z.: Ji ber ku ew vî karî cidî nagirin. Dema pêwîstiya hevdîtina bi we re hat gotin, got; “ma tu dînî.”

---.: Ya wisa?

G.Z.: Henek kiriye.

---.: Ma me dinase? Min pirtûka wî hinek xwend. Bûye misilman ne wisa?

G.Z.: Di derbarê misilmantiyê de gelek nivîsandiye.

---.: Ew oryantalîst e ne wisa? Li gorî texmîna min wê ew bi awayeke baldar pêşkevftina me bişopîne. Pêşkeftina me Sovyetan jî gelek tangav dike. Niha jî Îranê tangav dike. Neteweperestiya Ereban tangav dike. Yanê xeteke nû ye. Ger têkoşîna me hinek din gav pêşde bavêje, dibe ku li pêşiya pêşkeftinên girîng veke.

G.Z.: Niha li vir, tiştên ku li Tirkiyê dibin bi rastî pêşkeftinên girîng in.

---.: Niha meseleya Tirkiyê ya bingehîn ev e. Dibe ku sibe du sibe bixwazibe bi me re lihev bike.

G.Z.: Hûn ê qebûl bikin?

---.: Tabî. Wê hesabên me jî çêbibin, di destpêkê de mirov xwe nêzî lihevkirinan dike.

G.Z.: Civîneke çapemeniyê hatibû lidarxistin. Wê demê yêkî li Parîsê vê gotibû: “Ger mafê çandî bê dayîn, tevî vê jî wê têkoşîn bidome?” We gotibû “rast e.”

---.:Tenê ne çandî.

G.Z.: Yanê xweseriya çandî ji we re bê dayîn hûn ê bes bikin, yan jî hûn ê bidomînin?

---.: Nêzîkatiyên me yên berfereh hene. Em ê destpêkê gavên

biçûk ser bixin. Mesela ji berdana girtiyan bigire heya şer sekinandinê. Dîsa bûyerên tûnd bisînorkirin, rêbaza polîtîk esas bigirin. Li vir gelek tişt hene.

G.Z.: Dibe ku hûn van bixwazibin?

---.: Na, ji bo kirina van hemûyan, girêdayî rabûna gel e. Heya ku em gel ranekin ser lingan em kirina van guncav nabînin. Yanê li pişt geleke şerker nebe, wê ti lihevkirin li ser berjewendiyên gel bi encam nebe.

G.Z.: Pêwendî û nêzbûna we ya ji Tirkiyê re, bi serîhildana we ve girêdayî ye?

---.: Tabî, jixwe ger serîhildan çênebe, wê me biqeniqînin. Mesela niha rewş li baremberî wî diçe. Di xezîneya wî de gelek xûsarên madî û manevî çêbûne. Ger rewş wisa be wê di artêşê de şer nede qezenckirin.

G.Z.: Hûn alîgirê ku Tirk gava yekemîn bavêjnin?

---.: Bêguman em di rewşa bergirî lixwekirinê (nefsi müdafaadayız,) û parastina rewa de ne.

G.Z.: Mesela em bêjîn ku gava yekem ji hêla Tirkan ve hat avêtin. Lewre niha girtî dikarin bi Kurdî biaxivin?

---.: Ev dişibe çi? Dişibe azadiya deng derxistina mehekê. Li gorî pîvana Rojavayan ji vê re dibêjîn azadî?

G.Z.: Lê beriya du-sê salan tiştek wisa nedihat fikirindin.

---.: Yanê ez ê vê weke heqereteke li gel kirin qebûl bikim. Ev asta suçdariya wan dide diyarkirin. Azadî ne girêdayîna ji gelan

re, ev sînorên wan ên di çewisandin û qedexekirina xan ya polîtîkayê de dide diyarkirin.

G.Z.: Ji ber ku girtî ji bo vê li ber xwe didan. Ev maf jî girtin.

---.: Lê berxwedaneke mezin e. Ew cuda, yanê ew maf ji bo TC'ê bêguman windahiyek mezin bû. Lê ne mafeke ku ji bo me hatibû diyarkirin bû. Em wê weke mafeke qebûl nakin.

G.Z.: Bi awayeke xwezayî hesabên Tirkan yên biçûk û ji rêzê ne.

---.: Lê belê pênc hezar mirov di rojiya mirinê de razan û şehîdê yekem jî hat dayîn. O M. Emin YAVUZ, hevalê min yê herî nêz bû. Ev tişteke pir wehşiyene ye. Jineke çil saliye û Tirkî nizane, ma çi bike! Ewrûpa qet bi vê re eleqedar nabe. Îsraîl jî li ser Ereban ew qas terorê dide meşandin. Lê dikarin bi zimanê xwe biaxivin, nivîs, dibistan û radyoya wan heye. Lê Tirk gelek wehşîne. Rojava di vê mijarê de suçdar e.

G.Z.: Lê daxwiyaniyek çêbû. Ev daxwiyanî Tirkiyê mehkum kir.

---.: Ev gelek seransere ne wisa? Ma ev tenê nabe prestîja xwe parastin? Baş e çi ji hukumetê hat? Berevajî hemû alîkariyên leşkerî dikin.

Ev şeşesed sale Tirk xwe dispêrin Îslamiyetê û hewl didin me tine bikin. Niha jî ev dused sale xwe dispêre Ewrûpa û hewl didin me îmha bike. Ger Ewrûpa nebe, wê nikaribe rojek li hember me li ber xwe bide. Polîtîkayeke NATO'ê, tenê ji bo tehdîta Sovyetê Tirkan heta xaneyên laşê wê bi mertalan girtin. Yek din jî tişta herî trajîk ev e: Ji bo tenê Sovyet fûzeya nûkleer nedêne, ew jî destê xwe

dirêjî Kurdan nake. Tenê ji dilê Tirkan xweş bike. Ev rewşeke pir eceb e. Li Kurdistanê qetlîam jî di nav de ji her tiştî re dibêje temam, wiha bi çekên kîmyawî qetlîaman çêkirin. Kê deng derxist? Çi sûd kir?

G.Z.: Ger Talabanî ne gotiba “me Halepçe girt, bila Îran jî bê bikeviyê” dibûya ku bandoreke baştir bidabûna çêkirin. Ev xetayeke tektîkî bû.

---.:Rast e, xetayê Talabanî bû, lê ji ber ku xeta kir nayê wateya ku çav ji bikaranîna çekên kîmyawî re bê girtin.

G.Z.: Tabî rast e.

---.: Di vê mijarê de haya Sovyetê ji bayê felekê nîn bû. Yanê cudahiya pergalê nîne. Hin jî gelê Kurd înkar dikin.

G.Z.: Ewrûpa di ferqa hemû tiştên çêbûyî de ye. Rast e, Ewrûpa nikare vê bike. Hewceye Kurd bixwe van bikin.

---.: Rarst e, derfet pir sînordar in. Nahêlin em behn bigirin.

G.Z.: Herî kêm hûn ê bixwazibin di navbera xwe de nêzbûneke bidin çêkirin, Ewrupa jî wê vê baş bide dest. Mesela kêmahiyên di navbera we û riya azadiyê de baş nayê destgirtin. Tê gotin ku; “Di navbera xwe de lihev dixin.”

---.:Ev piroleye (abartma). Riya azadiyê têkoşînê nake ku!

G.Z.: Hinek dixwazin bikevin nava pêwendiyan.

---.: Ne gotin, pratîk nîşa mirov dide.

G.Z.: Mijareke din jî ger Tirkiye Iraqê îşgal bike wê helwesta

we çawa be?

---.: Em li heber îşgala ku Tirkiye li ser Iraqê bikeye. Lê ger îşgaleke wisa çêbibe, em ê yêkitiyê pêş bixin.

G.Z.: Dibe ku ev ji bo Kurdan weke şanseke be?

---.: Ger ji bo Tirkan bibe gaveke nebaş, wê ji bo me jî bibe şansek. Lê tişta bi xeter ev e: Hinek Kurdên li Iraqê bi Tirkan re tevkariyê dikin û ev jî zerarê da me.

G.Z.: Ev kîjan Kurd in?

---.: Herî zêde KDP'ê kir.

G.Z.: Ev di kîjan demê de çêbûye?

---.: Ji 85'an heta niha.

G.Z.: Bi rastî jî Kurd, ketina nav nokeran?

---.: Gelek hevdîtinên wan hebû. Rojnemeya wan nivîsandibû. Gotibû: "Em dixwazin bi Tirkan re bibin dost, ji ber ev wesiyeta bavê me ye."

G.Z.: KDP ji me re got: "PKK hewl dide polîtîka û armanca xwe li ser me bide ferzkirin."

---.: Na. Ji me re gotin: "Hûn li ser sînor naxebitin û ne wextê çalekiyane." Hewl dan ku me di bin venerîna xwe de weke firsetekê bidin bikaranin.

G.Z.: Gelo, tevkariya Barzanî bi Tirkan re ji bo we xirab

dibe?

---.: Tabî, ev pir vekirî bû. Em di vê mijarê de gelek agahiyan dizanin. Bi hêjmarek mezin nûnerên leşkerî re hevdîtin çêkirin. Heta her kes dizane, operasyonên hevbeş kirin.

G.Z.: Mayîna Talabanî di cephe de wê nêrînên we çawa û di çi astê de bandor bike?

---.: Me ev wek merc danî: Ger ev bidome, em ê li hember cepheyê we derkevin.

G.Z.: We vê got. Bi Talabanî re lihevkirineke we hebû. Talabanî di nav vî cepheyî de bû.

---.: Me ji Talabanî re nameyek rêkir û got;“ Bi PKK’ê re nekevin nav pevçûnek.” Bixwe temînat da.

G.Z.: Li Behdinan wergehên Talabanî nîne.

---.: Lê cepheyên wan hene. Neçare gotina me hilde cidiyetê. Divê ku ew jî têkiliyên xwe bi me re xweş bikin. Bi qasî min bihîstiye, KDP jî daye diyarkirin ku dixwaze ji nû ve li protokoleke kevin vegere.

G.Z.: We bihîst?

---.: Hat gotin.

G.Z.: Weke Kurdên li Iraqê.

---.: Na.

G.Z.: Hûn hinek dişibin Komalayan?

---.: Na, gelek ji me dûr in.

G.Z.: Şêweya wan a jiyanê û tevgera wan gelek dişibe we.

---.: Em bingehê wan hemûyan davêjin. Em, hemûyan hem di hundir de, hem jî di herêmên derve de digihînin hev. Yanê îdeolojî û polîtîkaya me pêş dikeve. Li Iraqê jî pir pêşdikeve. Di vê mijarê de bandora partiyê gelek zêdeye. Dibe bişibe hev, lê têkiliyên me bi hev re nîne.

G.Z.: Hemû partiyên di Kurdistana Tirkiyê de xwe weke Marksîst-Lenînîst binav dikin. Cudahiya we ji wan çî ye?

---.: Na, pir zêde ne wisa ye. Em weke wan ne Marksîst-Lenînîst in. Heke ew Marksîst-Lenînîst bin em ne ew in. Em li hember Marksîst-Lenînîstiya wisa ne.

G.Z.: Cudahiya Marksîzm-Lenînîzma we çi ye?

---.: Wiha cudahiya me ji pratîka me diyar dibe.

G.Z.: Çawa yanê?

---.: Wê bi pêşkeftinan re derkeve holê. Ji ber ku ew bi temamî xerîp û li beramberî vê pêşkeftinê ne. Heke ew jî Marksîst-Lenînîst bin tê maneya dijber derdikevin.

G.Z.: Weke partiyên din yên biçûk, demokratên Tirkan û Rizgarî…

---.: A rastî ev encama propagandayekê ye. Lê rastî ne wisa

ye.

G.Z.: Hîn jî mirovên wan li Kurdistanê hene?

---.: Na, na, berde li leşkereke artêşa Tirkan û cendirmeyeke wan xistin, nikarin xwar jî li wan mêze bikin.Tirk hebûna Kurdan qebûl nakin. Ev li hember me ji bo ji TC’ê re xûlamî bikin bi hev re di nav pêşbirgê de ne. Ev gelek vekiriye. Ger mirov pêşkeftinên di Tirkiyê de vekole dîtina wan wê zehmet nebe. Bav û malbatên van nûkerên Tirkan yên vekirine. Lê binyada wan a civakî miriye û rizî ye.

G.Z.: Herî dawî cudahiya di navbera ramanên Kurd û Tirkan de çi ye? Ramanên Kurdan di nava Tirkiyê de çawa û li kîjan herêman bicîh bûye?

---.: Tabî bicîh dibe, bi pêşxistina demokrasiyê re bicîh dibe. Ev bi taybet gelek baweriya ku didin artêşa Tirkan heye. Heya niha hemû îsyanên ku di dîrokê de derketine ji hêla artêşa Tirkan ve hatiye perçiqandin. Mayîna me ya deh salan ya di nav têkoşîneke leşkerî de jî, lêdaneke mirinê li artêşa Tirk a efsanevî daye. Her ku artêşa wî ya ku ew qas bawerî pê tînin dikeve, hebûna Kurdan jî qebûl dike. Lê wê nivîskî bi ti awayî qebûl nekin. Rêya vê tenê, ev lêdana ku em li artêşa Tirkan dixin, yekane amûra ku Kurd hebûna xwe bidin îspatkirine. Ev gelek girîng e. Diyar e, her ku artêşa Tirkan paşde diçe Kurdên li Tirkiyê qebûl dike. Wê demê wê zimanê her kesî vebe. Ji ber ku gotina artêşê li ser avaniya çandî û siyasî diyarker e. Îtîrafa bê encamiya rêveberiya xwe ya leşkerî ya deh salan kirin. Ev îdîa li Tirkiyê bû destpêkirineke polîtîk û ji parlamentoyê bigire heya asta herî jêr hat axiftin. Ger di nav çend mehan de me bitepisandiban, bêguman wê ev pêşkeftin derneketibane holê. Yanê tişta çêbû ev bû.

G.Z.: Pirseke ku hûn bixwazibin ez bipirsim heye?

---.: Hûn dixwazin çi bipirsin?

G.Z.: Ez îdeolojiya PKK'ê dinasim…

---.: Me jî di rewşa heyî de bersiv da. A rastî bi xatên qalind ji pirsan re bersif hat dayîn.

G.Z.: Niha hûn dibêjin ku wê di demek nêz de dewleta Tirkiyê hinek mafê çandî bide û em ê wisa bidomînin. Di vê rewşê de hûn dibêjin piştî ku hinek mafê çandî hat dayîn û şûnde wê ev têkoşîn bidome. Di vê rewşê de wê derdora Ewrûpayê bihêle alîkariyeke kêm ji we re bê. Ji ber ku di vê rewşê de wê li hember we be.

---.: Na, min wan mercan diyar kir. Tenê ne çandiyekî, li gel çareseriya demokratîk bûyîn, mesela parlementoya yerel dana avakirin, li gel çareseriyê bûyîn û hukumeta yerel, bila van qebûl bike, em ê pêwendiyê bi awayeke polîtîk eyar bikin. Ewrûpa wê çawa van qebûl neke, bêyî ku Ewrûpa van bibîne wê çawa xwe bi awayeke demokratîk bihesibîne.

G.Z.: Tiştên ku hûn dibêjin otonomiyeke, ne federasyon e?

---.: Na, federasyon e.

G.Z.: A rastî Tirkiyê otonomiyeke bide we ji federasyonek hêsantir e. Hûn ê otonomiyê qebûl bikin?

---.: Rastî di navbera otonomî û federasyonê de zêde cudahî nîne. Di mercên roja me ya îro de wisa ye.

G.Z.: Rast e, cudahî heye. Federasyon dewlet e, otonomî jî di

nav devletê de mayîn e.

---.: Na, ew merc derbasdar nebûn. Di pratîka Iraqê de jî wisa ye. Çil sal di oxira otonomiyê de şer kirin, lê di pêşketina dîktatoriyê de ev daxwazên wan bingeha xwe ji sextekariya wan digirt. Ger di destpêkê de hêmanê baş bikar banîbana wê baştir bûbûna. Em di vê mijarê de ji wan gelek cuda ne. Bêyî ku derfetên vê bafirînin û serê navê vê jî demokratîzme. Bêyî ku ev bibe, em otonomiya li ser bingeha dîktatoriyê weke teslîmiyetê dinirxînin. Halbukî, Kurd di çarsed salên dawî de xwedî otonomiyek baş bûne. Heya hukumeta wan ya xwecihî jî hebû. Lê di dawî de hemû heliyan û di nav Tirkan de tine bûn. Komara Tirkiyê hemû tine kir. Otonomî bi temamî ji bo Kurdan nabe çareseriyek pêşverû û mayînde. Kevin têne bîra mirov û axatî bihêz dike. Avaniyên kevin bihêz dikir. Heya ku em wan neşkînin ê nikaribin demokratîzmê. Loma di vê mijarê de feraseta partî ya federasyonê, ferasetên otonomiyê derbas dike. Hûn ramanên me çawa dinirxînin?

G.Z.: Ev îdeolojiya we îdeolojiya Marksîst-Lenînîst e. Ji bo Fransa jî nayê rojevê.

---.: Na, hûn ji kêderê dizanin ku em Marksîst-Lenînist in?

G.Z.: Ji weşanên we.

G.Z.: Gelek cuda ye. Lê pergala sosyalîst, me weke Marksîst-Lenînîst qebûl nake.

G.Z.: Wê demê îdolojiya we çi ye?

---.: Hûn dikarin biçin bipirsin, yanê vekiriye.

G.Z.: Em nirxandinên we yên di derbarê azadî û serxwebûnê

de mafdar dibînin.

---.: Ez di warê îdeolojîk de dibêjim, me weke Marksîst-Lenînîst qebûl nakin.

G.Z.: Mesele weke kîjan?

---.: Welatên sosyalîst.

G.Z.: Yanê bi awayeke rast, kes Marksîst-Lenînîst nîne?

---.: Ew rast e. Ez jî li gel wê nerînê me. Gelek kêm Marksîst-Lenînîst hene.

G.Z.: Marksîzm-Lenînîzma weke zibilxane.

---.: Di hundirê wê de her tişt heye. Bi awayeke zelal Marksîzm-Lenînîzm li ti cihan nîne. Misilman û Hirîstiyan jî wisan in. Hirîstiyanên rastî hene? Gelek kêm, yanê çendik.

G.Z.: Wê demê îdeolojiya PKK'ê kîjan raz e?

---.: Demokratîzm heye, welatparêzî heye. Mafê mirovan û di heman demê de îdeolojiyek wekhev e. Ev jî dibe Marksîzm-Lenînîzmê.

G.Z.: Dişibe sosyalîzma Fransiyan?

---.: Sosyalîzm wisa ye, yanê feraseteke me ya sosyalîzma serbûxwe heye û em di vê mijarê de hesas in.

G.Z.: Wê demê we weke Marksîst-Lenînîst qebûlkirin şaş e.

---.: Di wateya klasîk de ne wisa ye, wisa nabe.

G.Z.: Komaleya Îran dibê em “Marksîst-Lenînîstin.”

---.: Ew, dogmayên şematîk in.

G.Z.: Dema dibêjin meyla partiyê ya Marksîst-Lenînîst e û PKK bi vî rengî destgirtin rast nabe.

---.: Bêguman kêm e. Lê nerast e. Dibêjîn partiya ortodoks, ev ne rast e.

G.Z.: Na, dibêjin sosyalîst.

---.: Ji vê re, dikarin bêjîn ku rewşa sosyalîzma îlmî ya ku me li gorî mercên xwe eyar kiriye û em sosyalîzmê dibin tekela kesî de nabînin. A rastî me heya niha serbûxweyîbûna xwe parastiye.

G.Z.: Lê di vê navberê de hûn di nav şerê çînî de ne?

---.: Bêguman heye. Hewceye şerê çînî hebe. Heya ku fikrê demokratîzm û serbixwebûnê bigire nava xwe wê bibe. Ji ber hinek beşên li hember serbixwebûn û demokratîzmê derdikevin hene. Gelek ferasetên ku serbixwebûn û demokratîzmê înkar dikin, qet nizanin û najîn hene.

G.Z.: Mesela di têkoşîna Fransa ya sosyalîzmê de mirov zêde têkoşîna çînî nabîne.

---.:Çima? Ji ber ku li wir pirsgirêka netew û demokrasiyê nehatiye çareserkirin. Em jî nû abeceya wê fêr dibin.

G.Z.: Hûn weke TKSP’ê sekter nînin.

---.: Ew dogmatîk û şeklî ne. Şematîk in û ne xwedî fikreke serbûxwene. Baweriya wan kêm e.

G.Z.: Heya niha PKK'ê herî zêde...

---.: Na, hinek kes dixwazin sekretîzm û dogmatîzmê di nava me de bidin jiyîn. Di jiyana min de sekterîzim nîne. Bi awayeke awerte bi gel re bûna yek heye. Ger hêza min a awarte ya ku bi gel re dibe yek nebûya, min ê nikarîba di bin terora dewleta Tirk de nefes bigirtibana. Lê hêjmareke zêde ferasetên ku vê asteng dikin hene. Ji ber vê ez nikarim baş mêla xwe bidim ser. Bi taybet çi di nav têkiliyên gel de dibe, çi jî di nav jiyana rêxistinê de dibe…

G.Z.: Dema em di weşanan de dixwînin bi temamî ji derveyî rastiyê ye, lewre di wir de sekneke we ya îdealîst derdikeve holê.

---.: Weşan bi sînor in, bi awayeke giştî heya wir nayê peytandin. Yek din jî divê ev baş bê dîtin. Yanê ev çêkera civakî ya ku ez pêre mijûl dibim, beriya niha çar hezar sal berê gelek caran fosîl bûye. Ev avanî dahûrînkirin kedeke pir zêde dixwaze. Di vê neyê jibîrkirin ku cara yek pêkhatiyeke wisa ava dibe. Gelek ferasetên çepgir yên ku xwe Marksîst dihesibînin hebûn, lê bi qasî hejandina pelek jî ji cihê xwe nelivîn. Di vê mirov PKK'ê baş binase

G.Z.: Çavdêriya ku îdeolojiya we ne li gor civaka Kurdistanêye heye.

---.: Cara yek PKK'ê rastiyek serxist, ne wisa? Ev gelek girîng e. Derxistina berxwedanek mezin serxist, mîsoger ev bi îdeolojî û siyaseta wê ve têkiliya xwe heye. Hemû Kurd, heya niha ne di hêza ku du gotinan bênîn gel hev de bûn. Ewrûpa li hember Tirkan kêm dimîne. Tiştên ku ez li vir bêjim, bi rastî jî nêzîkatiyeke tejî çewtî dibe. Ez di baweriya ku ev nêzîkatî bên derbaskirin de me.

Nêzîkatiyên şematîk in. Ev nêzîkatiyên qalibî, ji rastî û dîroka Kurdistanê gelek dûr in. Ya din jî rastiya Tirkan nas nakin. Rojhilata Navîn jî taybetmendiyên aîdê xwe hene. Ger ev baş bên fêmkirin, em ê di herêmê de bibin hêza şoreşgerî an jî azadîxwaz a yekem di herêmê de bên naskirin in.

G.Z.: Çapemeniya Tirkan PKK'ê bê destek dide nîşan?

---.: Na, niha desteka gel girtin meseleya şer e. Hûn bi rastiya gelê ku bilêvkirina navê xwe ditirse bifikirin. Ev rewş gelek cuda ye. Dîsa ti rêxistin mîna rêxistina me nebûye xwedî hêza alîkariya gel. Rêxistina ku xwedî vê hêzêye jî tenê rêxistina me ye.

G.Z.: Hûn ê çawa destnîşan bikin ku hûn hêza gel digirin?

---.: Ev qas şer çawa dimeşe, kî pîştgirî dike, kîjan dewlet? Emrîka li hember me, Sovyet li hember me. Dîsa Îran, Iraq, Tirkiye li hember me. Tabî Îran hinek weke ku agirbest çêkiriye ewqas.

G.Z.: Sedemeke ku êrîşî we bike nîne?

---.: Na, ez dixwazim wê bêjim. Tevî wê, tevî ew qas kêmahî, îro artêşa Tirkan di cîhanê de artêşa pêncemîn a mezin e, li pişt wê NATO heye, heta polîtîkaya Sovyetê ya aştiyê heye. Ev girîng e. Yanê TKP'ê ji hev xistin kêm nîne. Ev jî cewherê ku sosyalîstan hilbijartiye yanê şerê me pêşdikeve. Her wiha tişta li vir bê selmandin, girêdana gel a li ser esasê berjewendiyên wan e. Îfadeyeke vê bi awayeke din nîne.

G.Z.: Heya niha we hevdîtinên bi rojnemevanên xerîp re red dikir. Baş e tişta ku îsal we ber bi hevdîtinan ve bir çi bû?

---.: Ji bo wê niha rojnamevanên xerîb hinek rastîbûn ji ber wê. Wê demê pirsgirêk hinek kamil nebibûn, ya din jî hewcebû em li

ser xwe jî hinek lêhûrbûnan bidin çêkirin. Herî kêm diviyabû em li pêşiya îmhayê bigirin. Yanê tevgereke ku tine bibûna hevceyî hevdîtinan nedikir.

G.Z.: Hûn heya îro veşartî man, niha bi awayeke vekirî xwe dana nîşana ev we bandor neke? Ez dibêjim wê encameke baş nede.

---.: Min pir xwe neda nîşan, ev cara yekem e.

G.Z.: Divê ev her tim neyê berdewamkirin.

---.: Ez carek din nakim. Dibe piştî salek an jî piştî du sal din.

G.Z.: Ji derveyî me ne wisa? Em dikarin bên?

---.: Qet ne diyar e. Ne diyar e ku em ê sibe jiyan bikin an na. Welateke min hebû. Weke ku ez ê sibe bimirim hewceye ez îro hemû karê xwe bixim bin ewlayiyê. Weke ku qet namirim jî heya dawî jiyan bikim jî difikirim. Yanê ev herdu tişt alî dide hemû jiyanê.

G.Z.: Wê kurê min di meha Tebaxê de bê Şamê. Gelo dikare bê wargehê roportajekî bike? Pirsgirêka Kurdan baş dinase. Dikare bê bi we re hevdîtinek çêbike?

---.: Em ê diyar bikin. Bi derfetan ve girêdaye. Dostanî li ser bingeha rastiyan dikare pêş bikeve. Ji pêşkeftinên bi vî rengî re, yê ku baş nêzî rastiyê bû wê derkeve holê. Ez ji têkiliyên dîplomasiyê hez nakim. Miroveke ji rêzê jî be dema li hember rastiyan rêzdar be, ez ê jî rêz li hember wî bidim nîşan, kî dibe bila bibe. Ez gelek nirx didim dostaniyê. Tişta ku dixwazim bêjîm bi mîlyonan dostên me hene.

Em dizanin dostanî bi dostan re bikin. Kes jî nikare vê

hilweşîne, pêşî lê bigire. Li Fransayê jî dostaniyên bi vî rengî pêş bikeve wê baş bibe.

G.Z.: Tabî, divê hevdîtinên bi vî rengî bêne kirin. Gelek dîplomat û hwd. qala we dikin.

---.: Ji ber nêzîkatiyên ku yên ji Sovyetê tên basît in, nirx nadimê. Yek jî dema ez nêzîkatiyên wan yên ji rêzê tespît dikim qet hevdîtinan çênakim. Heta vexwînin jî ez rêz nadim nîşan. M.Alî Brand ji min re got; “hûn pir tenê ne” lê ez jî dibêjim yê herî dewlemend ez im. Dîsa em di nav xwe de gelek dewlemend in. Ya din jî gel min pir hez dike.

G.Z.: Rojnemevanê Tirk di derbarê mijara Kurdan de çi difikire?

---.: Dibêjin em alîgirê pirsgirêk bi riya demokrasiyê bên çareserkirin de ne.

G.Z.: Çawa yanê?

---.: Bi riya polîtîk.

G.Z.: Ev di rojnameya xwe de dinivîse?

---.: Hevdîtina ku bi me re kirî got; ez ê bi awayeke berfireh biweşînim. Rojnemevanê Mîliyetê bû. Di heman demê de di nav TC’ê de weke rawêjerekê ye (kesê ku mirov pê dişêwire). Ji bo Evren-Ozal weke rawêjerekê bû, weke elçiyek taybet bû, nivîskareke ji derve de dihat nasîn bû. Gotin ku em ê di rojnemeya Hûriyet û Cumhuryetê de jî biweşînin. Ez bawer im yên ku bi min re roportajan dikin, alîkariya herî mezin bi rojnemeya xwe re dikin. Bawer im hêjmara rojnamê wê biçe du qadan. Ji ber vê fedekartiyên

bi vî rengî dikin.

G.Z.: Divê hûn ji sedî ji wan bixwazin.

---.: Na, berevajî me hemû mesrefa wan pêkanî. Tenê tişta em dixwazin bila durist bin, bila neleyîzin.

G.Z.: Neduristbûna wan ez bawer im wê nekiribin bikin.

---.: Ez jî texmîn dikim, lê ger bikin jî ez ê carek din neaxivim. Ger zararê bidin jî, ez ê jî bidim. Dibe lê, em di vê mijarê de gelek cidî ne.

G.Z.: Nêzîkatiya we ya li vir ji ya serokên din gelek baştir e.

---.: Rewşa min cuda ye.

G.Z.: Hûn jî naxwazin weke Talabanî bikin? Bi taybet di mijara enstitûyan de. Ji bo enstitû bide guhertin çar-pênç mirov bi cîh dike.

---.: Ji pêşxistinê zêdetir ger guncav be, pêwîst e bixin riya rast. Hewceye ji rewşa zerar dayînê bên derxistin. Bi qasî ku ez fêm dikim hinek vê saziyê li hember gelê Kurd bikartînin, divê ji vê re destûr neyê dayîn.

G.Z.: Min di derbarê Enstitûyê de sê rûpel nivîs nivîsand, we xwend? Di rojnemeya rêxistineke hûmanîst de derket. Enstîtû hatiye avakirin, ev enstîtû li hember belavkirina çanda Kurdan erkdar e. Hûnermend û nivîskar jî pê ve girêdayîne. Hûnermendan têde hevpartiyek avakirine û dixebitin. Lê, ji derveyî PKK'ê û Komala, rêxistinê Kurdan yên din pir cuda bû, hinek di destpêkê de li hember bûn. Di xebata enstitûyê de kêmbûn çêbû. Gelek entelektûel û lêgerîner ji enstitûyê qut bûn. Ev tiştek wisa bû ku rêziknameya

enstitûyê ji hêla rêxistinên din ve nedihat nasîn. Rêveber jî bi awayeke demokratîk nehatibûn hilbijartin. Yanê dibe navenda klanan.

---.: Tabî zelal bû û wê wisa bibe. Hele ev kom ger ji bo berjewendiyên xwe yên kesî bijî, wê vala biçe.

G.Z.: Di roja me ya îro de rêveberiyên enstîtûyê pergala vekirina ji derve re dimeşînin û di nav tangaviyên madî de ne.

---.: Ti avakirinên ku xwe li ber berjewendiyên gelê Kurd bigire û li pey berjewendiyên kesî bibeze nikare bijî.

G.Z.: Ev rewş li Ewrûpa ji bo enstîtûyê ji Talabanî pere distandin, di heman demê de ji sempatîzanên wî jî alîkarî digirtin. Bixwe digotin ku em bi polîtîkayê re mijûl nabin, lê ev rewş dide diyarkirin ku ji hawirdorek polîtîk in. Ev li gorî Kurdistana Tirkiyê di rewşeke kêm de ne. Di aliyê din de jî ji ber aktîfbûna PKK’ê didîtin, lewre Kurdên ku bikaribin di enstîtûyê de bixebitin nagirin û enstîtûyê ji bo berjewendiyên xwe bikar tînin. Yê ku ji bo kar amadeye, hemû Kurdên ku bikaribin di enstîtûyê de kar bikin asteng dikin û dixwazin bikişînin xeta xwe. Nahêlin Kurdê baş di enstîtûyê de cîh bigire, lewre heya ji destê wan tê hewl didin ku asteng bikin. A rastî ketina PKK’ê ya wir asteng dikin

---.: Tabî rêveberiya enstîtûyê erka xwe nelîst. Hewl dan ku PKK nekeviyê. Ev rewşa min ferq dikin.

G.Z.: Bi awayeke zanebûn alîgirên PKK’ê nagirin.

---.: Tabî asteng kirin (...) Niha li Almanyayê jî DM pênç hezar deyn hêlaye. Ez bawer im yên me wir girtîne. Lê deny hêlane. Wiha dikin, piştî ku didin îflaskirin direvin.

G.Z.: Ez li hember gelê Kurd rêzdar im.

(...)

G.Z.: We di salên xwendevaniya xwe de dest bi şoreşgeriyê kir?

---.: Tabî. Ez niha qala wê bikim. Ez diçûn dibistaneke sê demjimêran dûrî me bû. Dibistan li gundeke din bû. Li gundê me dibistan nebû. Dema ku min dixwend li gundê me kesê ango kesî dibistan nexwendibû. Di malbata me de ji feqîriyê zêdetir nakokî pir zêde bûn. Hîn jî tê bîra min, car caran min li sûkê paletî dikir. Di salên min yê zarokatî de, dîsa di dema dibistana amadeyî de bandora olî li ser min hebû. Di salên 68'an de bi tevgera ciwanan re têkiliya me bi tevgera çepgir re çêbû. Ev me ber bi fêmkirina pirsgirêka netewî ve bir. Sedema hilbijartina min a siyasî jî ji bo çareseriyeke bingehîn ji pirsgirêka netew re anîn bû. Ger qedexeyeke wisa taybet jî nebe, ketina yên weke me jî ne hêsan e. Gelek asteng hebûn, di warê aborî û siyasî de jî bêderfetî gelek bû.

G.Z.: Dibêjin di hinek dibistanên bilind de xwendina Kurdan qedexe bû. Di vê mijarê de hûn çi dibêjin?

---.: Dibistanên leşkerî qedexebûn. Dîsa dibistanên bilind û fêrbûna zimanê xerîp qedexe bûn. Siyasî jî dibe. Dema min dixwend, mesela di herêma ez lê bûm de kes nînbû. Min hinek jî mamurtî kir. Ji ber ku dereceya min a xwendinê baş bû, ez di dereceyeke jor de derbasî dibistana leylî (cihê ku bi şev jî mirov lê dimîne) bûm.

G.Z.: We ji kîs dewletê xwend?

---.: Rast e, hîn jî deny dimînin. Min bi trîlyonan zararê da

dewletê.

G.Z.: We deny dan?

---.: Na min neda. Deynê ku hatibû dayîn diviyabû li Fransayê nehatiba dayîn.

G.Z.: Piştî hingê zeviyê we girtin?

---.: Jixwe malbat nema. Bêguman wê dest deynin ser. Nikarin ji dayîka min tiştek bigirin.

gelek pîr e. Lê daxuyanê digirin. Yanê kesekê me yê ku malbata me biparêze nîne.

G.Z.: Rewşa dayîka we çawa ye? Ma li Tirkiyê ti problemeke wê nîne?

---.: Gelek pîr e, çi ji wê re dibêjin dike. Xwendina min di mercên gelek awarte de çêbû. Di avakirina siyaseta me ya niha de, avaniya civakî ya ku ez xwe dispêrimê pir girîng e. Yên di rewşa min de bidestxistina wan a xwendinê gelek zehmet bû. Di Kurdistanê de herî zêde zarokên axa û eşîretan dixwînin. Di avabûna tevgera me de bandora avaniya çînî û civakî gelek mezin bû. Neçare ku ji pirsgirêkan re çareseriyeke radîkal bîne. Yek jî rastiyan û rastiyên welat bi awayeke baş nizanin.

G.Z.: Di dibistana amadeyî ya ku we dixwend de zarokên gundan hebûn?

---.: Na. Gelek kêm. Bi rastî jî em îstîsnayekin. Dibistanên din bixwînî û bibe mamoste. Mamostatî hêsan e.

G.Z.: Partî di 1978’an de hat avakirin?

---.: Ez di 12’ê Adarê de hatim girtin. Heft mehan di girtîgehê de mam.

G.Z.: Kîjan sal bû?

---.: 1972. Heft meh di girtîgeha Mamakê ya leşkerî de mam. Tevgera ciwanan a şoreşger wê demê hatibû perçiqandin. Denîz Germîş, Mahîr Çayan û çepên Tirkan… Me ji wan girtinan encam girt. Me encama mîsoger neketina dest, rêxistin avakirin derxist. Me bingeha tevgera xwe di 78’an de avêt. Cara yekem me got Kurdistan metîngere, Kurdistan ancax bi riya têkoşîna netewî re dikare bê rizgarkirin. Li ser wê bingehê derketineke me çêbû. Heya wê demê ti fikreke bi wî rengî nebû.

G.Z.: Bi taybet ji bo Kurdistanê bû?

---.: Tabî,cara yekem ez dibêjim. Bi qasî gotina girîng ez dibêjim “Kurdistan metînger e, pêwîst e xweserîbûna gelan ji wan re bê dayîn” û ev gotin jî di dîrokê de çeka herî mezin e. Dikare bê gotin ku di dîrokê de di fikrê kesî de tiştek wiha nebû. Ev me ber bi têgeha welateke serbixwe, rêxistin û têkoşîneke xweser ve bir. Ger em di nav cepgirên Tirkan de bimabana, em ê negihîştibana têgeha xweserîbûna welat. Cepgirên Tirkan jî rêxistinbûna xweser û têgeha Kurdistanê qedexe kiribû. Weke hebûneke hindek digirtin dest. Wiha me di van salan de li hember van ferasetan têkoşîneke îdeolojîk meşand.

G.Z.: TİP di dawiya salên 60’î de tenê qala mafê çandî dikir.

---.: Tabî, digot “gel e, heye û mafdar e.” “Lê digot pêwîst e em hinek mafên çandî binasîn,” ji vê zêdetir tiştek din nedigotin. Ya

din jî di 12’ê Adarê de hat girtin.

G.Z.: Hûn dibêjin ku me di nav tevgeran de xebat daya meşandin, ev tevger kîjan in?.

---.: Tevgera Ciwanên Şoreşger. Ez neketim DDKO yê. Piştî 1970’an û şûnde ez ketim nav înşaya artêşa serbûxwe.

G.Z.: Hûn tevlî DDKO’yê bûn?

---.: Jixwe hema hat girtin, beriya bê girtin di demek kurt de ez hatim girtin. Lê hin jî di wê demê de ez li hember feraseta wan bûm. Hîn di wê demê de gelek rexneyên me li wan hebûn. Me wan gelek kêm didît. Weke xilasiya rêxistineke serbixwe gelek kêm bû. Ji ber ku nedikarî navê xwe jî bêje.

G.Z.: Têkiliya we bi partiya gel re çêbû? Û ji ber çi?

---.: Em komeke serbixwebûn. Li hember xeta wan jî têkoşîna min a îdeolojîk û siyasî hebû.

G.Z.: Muhafazakar bûn?

---.: Bi rastî jî gelek. Me gelek xeter didîtin. Wê demê ji me re digotin şûrê demokrasiyê yê li ser Kurdistanê. Di 75’an de vê ji min re gotin. Taybetmendiyên netewîperestî li gel wan hebû. Taybetmendiyên me yên dîrokî derbas dikir. Vê baş dizanîn.

G.Z.: DDKD, ji partiya demokratîk baştir bû. Bi wê re têkiliyên we çênabe?

---.: Har dernekeke bû, siyaseta wê nîn bû. Dernekek di nav fikrê Har de cîh digirt û armanca partiyê nînbû.

G.Z.: Destûra vekirina partiyê hatibû dayîn?

---.: Me jî di sala 74’an de fikrê ku dernekên bê armanc wê nikaribin têkoşînê bikin diparast. Rexneyên me hebûn. Ew ji ber vê parçe bûn. Em her ku çûn mezin bûn. Ev sal dihat wateya têkoşîna koma me ya îdeolojîk. Dema ku koma me mezin bû û ketin nava girseyê, me îlana partiyê kir. Lê di van salan de jî dewlet bi awayeke hovane ser me de hat, cara yek wan ji me zilam kuşt in. Li gel me jî feraseta şîdetê li ser bingeha xweparstinê di salê 77-78’an de dest pê kir. Me di 78’an de biryara îlana partiyê da. Piştî hingî bêguman xebatên îlegal şart bû û ev tevgera me rêveberiya heyî ber bi tasfiyê ve tangav kir. Hatina rêberiya leşkerî ya li ser kar, bi pêşketinên ku têkoşîna me rê li ber vekiriye ve girêdaye. Herî zêde ji vê bandor bû. Tabî bi riya rêveberiya awarte (sıkıyönetim) ve îdare kir û her ku çû girtin dest pê kir. Em neçar man ku di sala79’an de derbikevin derve. Berevejiyê vê em ê tine bibûbana.

G.Z.: Di kîjan dîrokê de?

---.: Tîrmeha 79 guncav bû. Tam 9 sale ji Kurdistanê dûr ketime.

G.Z.: Hûn qet nevegeriyan Kurdistanê?

---.: Ez ber bi sînor ve çûm, lê neketimê. Me li vir şerek mezin pêş xist. Yanê dema em şûnde çûn lewre bûn xwedî tecrûbeyên girîng. Çûyîna min a welat çênebû, lê me li vir nêzî hezarî mirov rêkir.

G.Z.: Heya demezirandina partiyê çend çalekî çêbûn?

---.: Bi xebatên îdeolojîk re pênç sal.

G.Z.: Wê demê we têkoşîna leşkerî çawa dimeşand?

---.: Herî zêde me li ser bingeha xwe parastinê dida meşandin.

G.Z.: Beriya demezirandina partiyê, li hember dewletê we çawa li ber xwe dida? Wê polîtîkaya xwe çawa belav kir?

---.: Di her alî de çalekiyên serkeftî çêbû.

G.Z.: Çalekiyên çawa çêbû?

---.: Pevçûn bûn. Lê heya 79 ne leşker û ne jî li subayan nehat xistin. Herî zêde li MHP'yî yên faşîst (Türkeş), axa û noker hatin xistin. Bi sala 79'an re bi hêza artêşa dewletê re dest bi pevçûnan hat kirin.

G.Z.: Heya sala 1980-82-85'an ti tiştek çênebû?

---.:Na, heya di dema darbeyê de jî em bihêz bûn.

G.Z.: Heya çalekiya15'ê Tebaxê?

---.: Bêdengiyek hebû, lê bi ti awayî komên me kêm nebûn.

G.Z.: We di 15'ê Tebaxa 1984'an de dest bi çalekiyên xwe kir?

---.: Tabî, li vir jî amadekariyên me hebûn.

G.Z.: Di dîroka 1980-84'an de çalekiyên we çêbûn?

---.: Çêbû.

G.Z.: Wê demê çima qala çalekiyên 84’an tê kirin?

---.: Ji ber ku êdî wê demê bi temamî komên me çûbûn welat û biçek bûn. Me jî biryar da. Di vê em vê jî bibîr bixin, rejîmê dizanî ku derbasî demokrasiyê bûye, yan jî dizanî ku serkeftî bûye. Ji ber ku wê bê serkeftin bihê, îmhaya li girtîgehan bidin sekinandin, girtîgeh wergerandibûn navenda îşkenceyekî bê eman.

G.Z.: Ji we re çi dibêjin, dibêjin Apoyî?

---.: Apoyî, Artêşa Rizgariya Netewî ye.

G.Z.: Di avakirina partiyê de hûn bi tenê bûn, yan jî hûn komek bûn?

---.:Her tim komek hebû. Lê bi awayeke giştî nadin meşandin. Bi awayeke giştî min dida meşandin. Heya 73’an giştî bi vî rengî bû, yanê di warê îdeolojîk-polîtîk de ne didan meşandin.

G.Z.: Yên din hîn jiyan dikin?

---.: Hejmareke mezin şehît ketine, yên jiyan dikin jî hene. Hinek ji hevalên şehît di destpêkê de bi me re tevdigeriyan.

G.Z.: Heya sala 79’an hîn jî yên li Kurdistanê diman hebûn?

---.: Hebû. Jixwe ew jî di sala 1980’an de derketin, me heya sala 1981-83’an sad û şêşt heval kişandin vir. Li vir hêjmara me gihişt dusedî. Ger ew nebûya me yê nikarîbûya carek din tevgerê birêxistin bikin û jixwe TC jî bawer nedikir ku em ê ji nû de xwe birêxistin bikin. Bixwe vê îtîraf dikin, Kurmayê giştî vê îfade dike, “Em ti car li hember PKK’ê nebûn xwedî nêzîkatiyek baş.” Lewaziya wan a herî mezin jî têkoşineke wiha ji me nehêvîkirinê bû.

G.Z.: Sala 1979’an dema hûn hatin Filîstînê ma destûr girtin pêwîst dikir?

---.: Na, bêyî ku têkiliyeke tenê jî hebe ketim rê, tenê bi alîkariya Kurdên li Suriyê hatim Şamê, ji Şamê jî hatim vir, kesê nedizanî ka ez kîme. Li Surî jî nedizanin. Yanê ez destpêkê derketim, beriya du salan. Wê demê kes ji Tirkiyê derneketibû. Ger ev nebûbûna û em sê mehan dereng bihatana wê tevger derneketiba holê.

G.Z.: Hatina we ya sînor ji bo hûn biçin Kurdistanê bû, têkiliyên we hebûn?

---.: Na, ez dostên xwe dizanim. Ji ber ku hemû mirovên hev in.

G.Z.: Ma derfetên wê yên fînans hebûn?

---.: Alîkariya aborî hebû.

G.Z.: Ji Kurdên Tirkiyê?

---.: Em jixwe komek biçûk bûn, wê demê zêde mesref nînbû.

G.Z.: Çekên we hebûn?

---.: Çekên ku bi me re bûn ên gel bûn.

G.Z.: Çekên Lîbya, Suriye û yên Sowyetê hebûn?

---.: Na, qet çênebûn. Bi ti awayî. Ji Sowyetan bigire heya yên din.

G.Z.: Stara we çawa çêbû?

---.: Tenê me nasname girt. Niha jî em bi nasnameyên xwe ve dimînin.

G.Z.: Kî bi we re alîkar dibû?

---.: Xwarin, vexwarin hemû malzemeyan em bi xwe dikirin. Lê, li vir piştgiriya herî mezin ji kedkarên derveyî yên li welat digirin. Bi rastî jî çavkaniya hatina aboriya me ji alîkariya kedkarên-karkerên kurdên li Tirkiye, Lîbya û Ewrûpayê ne.

G.Z.: Gelek hatina aboriyê heye?

---.: Çawa, gelek kampanyayên mezin çêdibin. Salê, yek mîlyon dolaran derbas dike. Ji kampanya me ya Elmanyayê û giştî li Ewrûpayê pişrtgiriya gel a salekî gelek zêde ye. Mînak; wekî din jî geleke lê belê, li vir di nava Kurdên Surî de dema em vesazbûna kampanyayê dikin, bi diravê Suriyeyê ve deh mîlyon Lîre alîkarî didin. Hûn dizanin, li Ewrûpayê jî nêzîkî du mîlyon Dolar alîkarî derdikeve. Gel her tiştî dide. Gelên Lîbyayê pir girêdayî ne.

G.Z.: Li Tirkiyeyê we qet banka şêlandiye?

---.: Na, li welat jî niha alîkariya aborî gelek e. Ji her herêmekê, di her gavê de alîkariyên ku dikarin mesrefên xwe derbixin gelek e. Mînak; niha otorîteya partiyê gelek mezin e, bi mîlyaran alîkarî heye. Jixwe partî ne tenê ye. Tevgera gel e, rêxistinên din nikarin gavan jî bavêjin.

G.Z.: Gelo wargehên wekî din jî hene?

---.: Li Başurê Kurdistana Iraqê di sala 84’an de kamp hebûn. Lê, piştî çalakiyan têkiliyên wan jî xirabûn. Wan, çalakiyan nepejirandin. Têkiliyên wan xirabûn. Niha hemû hêzên me li Welat in. Di nêzî pêncî cîhan de bîrimên me yên çekdar xwe bi cîh kirine.

G. Z.: Ev çawa çêdibe? Ji ber ku leşkerî her kesî dikşîne lêpirsînê.

---.: Ragihandinek gelek mezin e. Wê her roj di rojnameyan de nûçeyên pevçûnê derkevin.

G.Z.: Pêşketinên çawa ne, çi ne, rewşa axayan çawa ye?

---.: Bingeha civakbûyîna dewletê bi temamî lewaz bûye û xwe dispêre beşên zengîn, tirsa gel ji dewletê heye. Bandorbûna me jî ji niha û şûnve gelek giran dibe. Ev pêşkeftinek gelek girîng e. Mirov dikare bibêje ku, qezenckirina gel serkeftina me ya herî mezin e. Xîzanîbûn, bê kar mayîn gelek giran e. Niha, ji aliyê aboriya civakî ve gelek lewaz e.

G.Z.: Niha dîsa gel feqîrin?

---.: Mirov dikare wisa bibêje. Avaniya eşîreta berê jî hîn zêdetir hatiye perçekerin. Ji ketina me re derfetan ava dike. Ji ber ku eşîrtî, li pêşiya Tevgera Rizgariya Netewî astengî derdixe holê. Bingeha şoreşa civakî pêşkeftiye. Ev bîst salên dawiyê ye (ku ev hîn zêdetir bingeha objektîf ya şoreşa pêşkeftîbûnê ye) rewşa Kurdistana Tirkiyeyê, ji ya Iraq û Îranê hîn zêdetir pêşkeftiye. Belê, perçeyeke mezin e û xwezaya wê jî guncav e. Ji her alî ve di nava heremên dinyayê de herêma herî guncav e, heke mirov hinekê şert û mercan amade bike, rêxistinkirinê kûr bike, wê Kurdistan ji zû ve

bûbûya welateke raperîn.

G.Z.: Kurdistana Tirkiyeyê pir di destê xwe de digire lê belê, bi rastî jî Kurdistana Iraqê zêde di destê xwe de nagire.

---.: Rast e, lê erdnîgariya wan û qadên çiya li gel wan gelek hindik in. Nufûsa wan biçûk e. Lewre mafên wan yên civakî zêde tine ye. Paşketiye, ne nûjen in.

G.Z.: Iraq ji aliyê aborî ve çawa ye?

---.: Zengînbûn di qadên petrolê de ye. Aliyek din jî ji ber şer gelek gerîla hene. Rast e ji aliyê aborî ve zengîn e. Asta jiyankirinê bilind e lê, ji aliyê zanistiya civakî ve nebaş e. Xwedî mejiyê dema navîn e. Rêxistinbûyîna wan ne li ser çîniyan e, xwe dispêre eşîrtiyê. Teqez wisa ye, vê derbas nekiriye. Di destpêkê de, hêza rewşenbîriyê jî li hember eşîrtiyê hatiye şikandin. Çîna karkerî tine ye. Eşîrtî serdest e. Dîsa, hişmendiya olî gelek bi hêz e. Bi hinek aliyên xwe ve dibe ku pêşketî bin. Li pêşengên rêxistinê, li kadroyên xwe nanêrin.

G.Z.: Ez, li Kurdistana Tirkiyeyê geriyam. Min dît ku kapîtalîst tine ye.

---.: Feqîrin, lê belê bandora eşîrtî mîsoger e, lewaz e, ew yek jî hîn zêdetir TC'yê şikandiye. Ji ber ku serhildan çênebûn, TC bi serkeftî derket.

G.Z.: Serdestiya axatiyê hîn jî zêde bûye?

---.: Ew bi temamî helwestên dewletê ye.

G.Z.: Lê, ev nayê wê wateyê? Tevger…

---: Na, ji ber ku li wir kedkarên berfireh hene. Gelek bi tirs e. Li pişt axayan kesek tine ye. Eşîreta Barzanî li ser gelek tiştî serwer bû. Eşîreta Talabanî jî wisa bû. Lê belê, ji me ti axa nikare deh zilaman bigire pişta xwe… cuda ye. Erê, çavkaniya xwe ji karektera rejîmê digire. Iraq jî, rast e bi her awayî nêvenga wergehan nedît. Ji ber vê yekê hinekê serbixwebûn, hinekê din zanebûna wan heye. Di wateya serbixwebûnê de dibêjim. Ev nayê gotin ku zanebûna netewîbûn pêşneketiye, di vê wateyê de nabêjim. Mînak, eşîreta Barzanî jî li ser linga ye. Ew ne weke rêbereke netewî; mînak ji malbata min û heya ji gundê min yek kesek tine ye. Sê zilam nikarim derbixim. Lê yên wan bi hezaran e.

G.Z.: Rêxistinên Iraqê ji rêxistinên Kurdistana Tirkiyeyê paşketîtir in.

---.: Belê, di wateyekê de bandora gelek dewletan şikandine. Lê, ev ne rizgariya neteweyeke modern û di şêweya rêxistinkirina civakî de ye. Ev yek rê li ber hêzgirtina eşîretan vekiriye. Lewaziya dewletê, xweseriya eşîretan hîn zêdetir xurt kiriye. Li vir pêwîst dike ku mirov dikare behsa serxwebûna eşîretan bike. Ev rastiyek e. Li gel me jî tiştek wisa tine ye, berevajiyê vê eşîretî li pêşiya me astengiyeke mezin e û dema em vê avaniyê bişkînin pêşdikevin. Her wiha, bingeha me ya civakî û bingeha civaka wan gelek ji hev cuda ye.

G.Z.: Di nava civakê de bandora Talabanî û Barzanî bi rastî jî heye? Bandora we jî li Bakurê Kurdistanê heye?

---.: Pêwîst dike ku hûn vê pirsê ji rojnamegerên Tirk bipirsin. Hûn Mam nasdikin? Vê yekê digot: “Gelek balkêş e, bandor gelek

mezin e” Talabanî vê bixwe digot.

G.Z.: Ma Talabanî her tiştî bawer nake?

---.: Bandora wî tine ye. Dizane ku bandora wî çiqas lewaz e. Ji bo ku vê yekê hema bibêje dikare biçe Qamişlo jî. Na gelek baş dizane. Îro li ser Kurdistanê dîsa li ser Kurdistana Iraqê bandora me heye. Her ku diçe pêşdikeve. Heke hûn bikaribin biçin Qamişlo hûn ê bibînin. Em dikarin we bişînin wêderê.

G.Z.: Suriye dihêle?

---.: Têkîliyeke xwezayî nikare asteng bike. Gel çalakiyan dizane. Yanê, gel wateya çalakiyên ku li hember TC'yê tê meşandin dizane. Di dîrokê de cara yekemîn e ku wisa demdirêj û her ku diçe pêşdikevin bûye mijara gotinê. Pêşketineke baş e, bi awayeke radîkal ve di bingehek xeta modern de pêşketin bû çavkaniya hêviya gelê Kurd û ji vê hêviyê re jî rê vedikir. Ji ber ku Kurdên Iraqê rewşa komkujiyan derbas nakin. Mijareke din jî ew e ku rewşa girêdayî şerê Iraq û Îranê wan dibe ber bi komkujî û tinebûnê ve. Hêviya rizgariya netewî yanê, tevgera me şerê demê tîne û ev gelek bi giranî derdikeve holê. Pêşiya pêşketinên me nikaribûn bigirin. Tevî ku gelek hewldan jî dan diyarkirin. Bi taybetî jî îsal wê veguhertineke bi çawaniya mezin ve hewldan bên çêkirin. Artêş bi hemû hêza xwe ve vê yekê asteng dike. Tevî ku di vê de serkeftî nabe jî nizane ku wê ev yek vegere serhildana gel û di asta herî jor de wê pêşbikeve, vê yekê gelek baş dizanin. Lê, vê yekê ABD jî gelek baş dizane. Ji bo ku tedbîrên xwe bigirin bi hev re li ser xebatên gelek mezin dixebitin. Serokvezîrê derve yê ABD' yê jî van mijaran aniye ziman. Dibêje: “Li herêmê serhildaneke çekdarî heye” ji niha û pêve her tişt girêdayî pêşketina me ye. Em îsal jî bi serkeftî derbas

bikin wê rastiya gelên ku rabûye li ser piyan û rastiya şerê gelekî derkeve holê.

G.Z.: Şêwe û avaniya zehmetî û zordariyên ku li Kurdistanê çawa ye?

---.: Gelek şêweyên şerê taybet heye. Her roj operasyon heye. Bi taybetî jî dema tevger gelek çêdibe, di navbera sedan jî pênsed de komando derdikevin holê. Şev derketina derve qedexe ye, tenê di qezayeke biçûk de û di mintiqayekê de di nava çend mehan de sêhezar û pênsed kemîn tê avêtin. Di qezaya Mêrdîn-mahsertê sêhezar û pênsed kemîn tê avêtin. Yanê di rojê de bi sedan kemîn davêjin. Bi navbêniya tîmên taybet ve bi helîkopteran ve daketina li ser erdê tê kirin. Tîmên taybet li serê çiyayan bicîhkirine. Şerê kontra ya vêderê ji ya Salvadorê hîn zêdetir û xurtir e. Yanê Nikaragua li gel wan gelek lewaz dimîne. Di rastiyê de pêwîst e ku ew bi xwe vî şerî binirxînin.

G.Z.: Heke PKK nebe wê yek ji wan jî tinebûya?

---.: Na, di çapemeniya Tirk de jî ev derdikevin pêş. Şerê rizgariya netewî ji şerê taybet re rê vedike.

# HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA BI CIVATA

# YUNAN RE LI SER ŞAGIRTÊN AKADEMIYÊ KIRINE

H. Y.: Em vê destnîşan dikin: Çawa ku di cîhana hûnerê de Yilmaz Gûney hebû û hûnera vê heremê danî ziman, em jî di kesayeta birêz Serok Abdullah Ocalan de Ortega û Sandinistayên nû dibînin. Niha Sandinista û Ortegayan tinê ji bo şoreşa Nîkaragua na axivin. Ji bo hemû welatên Emerîka ên navîn daxivin. Em jî weke mêvanên we li vir amade ne. Me destnîşan kir ku tekoşîna Serokê we birêz Abdullah Ocalan, ne tekoşîna damezrandina şoreşeke cûda ye. Yanê tinê ji bo Kurdistan û Yunanîstanê nade. Tekoşîna we ya rizgariyê ji bo rizgarkirina hemû gelên heremê tê dayîn. Tevî ku ji salên dirêj ve ev zanabûn çêbûye, lê mixabin nû kete meriyetê. Kesek nikare vê zanabûnê rawestîne.

Wergervan: Ez weke erkeke xwe dibînim ku van mêvanan bi we bidim naskirin. Ev mêvan general e û vî hevalî li gireva Qibrisê fermandariya artêşa Yunan kiriye. Li giravên Derya Spî jî heman erk domandiye. Di demên dawî de ji bo nivisvaniya(Sekreter) wezîrxana giştî ya Derya Spî hatiye erkdarkirin û piştî wê dev ji kar berda ye. Ev heval dibe sembola şoreşa gelê Yunan. Gelê herêma Derya Spî li ser erka ku di qada Derya Spî de rêvebirî van gotinan dibêje: “weke ku hûn li dij dijmin şer dikin, bi heman rêbazi dixwaze li dij dijmin şer bike.’’

H .Y.: Ger em şehristaniya Kurdan înkar bikin, ev jî tê wê watayê ku em şehristaniya cîhanê înkar dikin. Ez di Derya Spî de

dixebitim. Ev ji bo şahristaniya gelê me, gelê Yunan û gelên din bû.

---.: Kerem bikin.

H.Y.: Min bi salan xebat da meşandin. Min di gireva Qibrisê û Derya Spî de fermandariya artêşa Yunan kir. Ez di sala 64’an de li Qibrisê mam. Hûn wê demê dizanin ku hinek bûyer derketibûn. Di dagirkirina sala 1974’an de ez weke fermandar li Qibrisê bûm. Di van heft salên dawî de jî min li Derya Spî erk da meşandin. Min di destpêkê de hest û nêrînên dewleta Tirk pir ji nêz ve şopand û nas kir. Teqez hewceye em paşde nemînin, em biawayeke tund li dijî Tirkên dijmin rawestin. Lazime ku em êdî bi awayeke kirdarî gotinan derbaz bikin. Ji ber ku ji gotinan zêde encamek dernakeve. Ji bo wê jî lazime em kirdarî li dij wan derkevin û dem wundan nekin. A rastî ez li hember hin derûdoran nêrînên xwe tim diparêzim û ji her kesî re jî eşkere rava dikim. Hin derûdorên paşverû min jî weke paşverû binav dikin. Kesên ku van bêbextiyan li min dikin nedurust in. Ji ber dema ez li Qibrisê bûm, hin leşkerên Tirk ketin destê min lê, min destê xwe neda yekî jî. Li gor nêrîna min herdu civatên li Qibrisê jiyan dikin, hewceye bi hev re wek hev û di nava aşîtiyê de jiyana xwe bidomînin. Ez, di demên dawî de weke heman rojê li Qibrisê bûm. Dema ku ez li wir bûm li dijî dagirkirinê meşek hatibû lidarxistin. Di navbera cihê mirov lê disekinin û xaniyên lê ji dayîk bûbûn navbereke pir kurt hebû. Lê tevî şûn û warê wan jî bû, nikarîn bikevinê û hatin qewitandin. Hinek bifikirin! Di navbera wan û xaniyên wan de navbereke kurt heye, lê bi ti awayî nikarin bikevin xaniyên xwe. Nikarin serdana mezelên malbatên xwe jî bikin. Ti menavrayên dîplomatîk wê nikaribe me û nêrînên me paşde gav bide avêtin. Beriya hezar salan gelê me li Derya Spî dima. Gelê Tirk hîn nehatibûn. Piştre welatê me ji hêla Tirkên dagirker ve bi hêjmareke mezin ve hate dorpêçkirin. Ji niha û şûnde em nikarin

dorpêçkirineke din bipejirînin. Li ser van mijaran nêrînên me ev in:

Em piştgirî didin têkoşîna we ya berxwedan, tevger û nêrînên we. Têkoşîna we û hunera we ya berxwedanê dibe dilxweşiya gelê me. Ji aliyê din ve jî tola me ji dewleta Tirk heye û em nikarin vê rewşê bipejirînin. Ji ber rêza min a li hember we û tekoşîna we, hestên xwe tinim ziman. Ji ber vê yekê debêjim, hewceye herdu gel bi hev re li ber xwe bidin. Ez ê hewl bidim ku sonda xwe bînim cî. Ji ber ku leşker zêde naxivin. Lê min li vir hinek tişt zelal kirin. Ez dixwazim wan fam bikim. Dema ez cara destpêkê hatim vir, min tevgera rêhevalên gerîla ya li ser çiya ango giran dît. Min nêzîkatiyên wan yên li hember Rêbertî dîtin û min ev nêzîkatiyên wan pir ecibandin.

Tespîtên ku min ji ceribandinên xwe derxistîn ev in: Partiya we xwedî gerîlayên pir baş hatine rêxistinkirin û perwerdekirin. Ez ji wan bawer im, bila birêz Serok jî ji wan bawer be, wê bi gerîlayên bi vî rengî ve mîsoger tekoşînê ser bixe û bi encam bike. Wê bigihin armacên teqez. Bawer bikin, ez ê piştî vê serdanê cardin hewl bidim werim vir û ez xwe weke ku ji nû ve ji dayîkbûyî li vir hîs dikim. Dema ez vegerim Yunanîstanê, ji her demê zêdetir ez ê li dijî Tirkiyê têkoşîna xwe hîn mezintir û tundtir bidim meşandin. Ji ber ez ji têkoşîna we bawerim wê bigihe encamên baş.

Dixwazim xaleke din bidim diyarkirin: Em duh hinek bi Serokê we yê rêzdar re derketin meşê. Ji min re got ku “we jî weke kes li Yunanîstanê tekoşîneke mezin da meşandin, lê encamên ku we dixwest we nikarî bidest bixin.’’ Ez jî dixwazim vê bêjim: Hûn çendî tundî û zehmetiyan bibinin û bijîn, hûn van zehmetiyan li pêşiya xwe nakin asteng û ti caran gav şûnde navêjin. Paşde gav avêtin tê wateya radestbûyîn û qedandina jiyanê. Pêşde gav navêtin

jî tê wateya domandina jiyanê. Divêhûn ti caran paşde gav navêjin. Bi qasî min dîtî û fêmkirî hûn gerîlayên tund in. Di çavên we de ev diyar dibe.

Ceribandineke min jî heye. Ez dikarim wan fêmbikim û perspektîfan bînim. Ez di wê baweriyê de me ku hûn ê rojekê li dijî dagirkeriya Tirkan li çiyayên Kurdistanê ala Tirkan deynin, li şûna wê jî ala Kurdan rakin. Wê demê ez ê jî weke temaşevan werim wir û we pîroz bikim…

H.Y.: Dema em vegerin, em ê bi coşeke mezin erkên xwe pêkbînin. Em ê weke wekîl (milletvekili) vê mijarê bibin parlamento yê. Herî kêm ji bo hebûna gelê Kurd nasbikin. Ez nizanim, ma tişteke hûn bêjin heye? Ger hebe hûn dikarin bêjin. Li Atîna bîroya enformasyonê ya hev şopandinê ango hay jihevbûnê hatiye damezrandin. Gelo pêşniyar ango xwestekeke we din heye? Li ser vê bingehê em dikarin tiştekê bikin. Ya yekem, em ê hewl bidin ku di parlamentoyê de hebûna gelê Kurd were naskirin; ya duyem, em ê xebata mijûlgeheke (bîro) nîv fermî were damezrandin bidin meşandin. Yanê nizanim fermî, an jî nîv fermî dibe. Ger tiştek cûda hebe em weke wekîl…

---.: Di lezdayîna xebatan de faydeyek mezin heye. fersendeke dîrokî ketiye destê me. Lewre fersendeke bi bedelên giran biha ve hatiye bidestxistin. Ez bi taybetî dixwazim vê bêjim: Rojeke jî tekoşîn birêvebirin hêsan nîne, pir zehmet e. Şert û mercên me hinek cewaz in, ji bo wê van xalan dibêjim. Dayîna jiyankirina vê têkoşînê herî kêm bi qasî me ji bo hêviyên we yên dîrokî jî guncev e. Lazime gumanên polîtîk jî zêde nebin. Jixwe di milê polîtîk de jî negengaz e, zêde xusara wê çênabe. Li dijî vê, ji bo rojane encamên polîtîk yên biberhemtir werin girtin, bi meşandina

vê tekoşînê re wê gelek tişt bide qazenckirin. Ev çarçovaya ku min di porlamentoyê de danî wê bi berfirehî we re guftugokirin. Mînak; yek jî palamentoya Tîrk, ji bo berjewendiyên kêm netewîke biçûk yê Tirkiyê li Trakya û Qiprisê bi sedan hevdîtîn pêk tînin û biryaran digre. Heta biryara şer jî digre.

Ger mirov ji vê jî encam derxe, tinê di parlamentoyê de ev mijar anîna ziman, destgirtin, naskirina û derfetên ku hîn zêdetir kar were kirin dide. Madem ku ev qas bi awayeke bê maf xwe tevlî karê gel dikin, ger hewldanên wan yên demokratbûnê jî nebin, berûvajiyê vê ev nêzikbûneke netewîperwer a teng û netewîperestî ye. Belê, Kurdên li Tirkiyê bitemamî mafdarin ku parastina mafên gelên bindest û destekirina wan jî esas bigirin. Ev nêzîkatiyeke dimokratîk û mirovahî ye. Bêguman dikare were nîqaşqirin û bîryar werin girtin.

Bi qasî ku ez dibînim hinek tirs heye, hinek jî ew dîrok berevajî kirin heye. Belê dema wê derbaz bû. Ji bo demeke nû vebe, di nava gel de pêwîstî bi meşandina nîqaşên mafdar esas bê girtin heye. Ez bawerim me cehwerê vê mijarê bi awayeke berfireh vekir. Ez hêvî dikim tişta ku ji destê we bê hûn ê bikin. Heta weke ku min gotî, di destpêkê de ji bo berjewendiyên gelê Yunan û xwestekên wan e jî. Nûnertî fermî an jî nîv fermî dibe. Dibe ku qezenca wê hebe. Niha ji bo vebûna nava raya giştî a navnetewî dikare bibe pêşeng.

H . Y.: Di asta Enformasyon, an jî nûnertî de.

---.: Em niha amadene bikin. Tam di asta fermiyetê de nebe jî, di dema pêş de divê mirov wergerîne nûnertiyeke fermî. Weke nûnertiya ERNK'ê. Amadeyiyên nîv fermiyetê niha dikare were kirin,

bînayeke baş, têkiliyên baş. Em ê rêveberiyekê pêşxin û bidin naskirin. Yanê amadeyiyek wisan dibe. Di demeke kurt de, di fermîkirina wê de dibe sod hebe.

H. Y.: Yanê destpêkê  wê di asta enformasyonê de be?

---.: Belê, agahdarkirin, di astekê diyar de naskirin û piştî  wê jî teqes were fermîkirin.

H. Y.: Baş e.

---.: Ez bawerim biawayeke fermî berdevkê eniya siyasî çêkirin, wê guncav be. Kar û barên ji bo danasîna raya giştî wê bidome. Jixwe li wir hevalên me jî hene. Civîn û xwe pêşandanên curbicur wê bidomin. Hewceye mirov biawayeke zanistî pirsgirêkê li parlamentoya Ewrupayê bide peyîtandin. Ji ber li wir hin wekîlên Ingîlîzan yên muhafazakar hene. Lewre nêrînên Tirkan biawayeke pir paşverû ferz dikin. Li gor min parlamenterên Yunanî, di vê mijarê de dikarin pêşengî bikin. Gelek ji wan kesên paşverû ji hêla Tirkîyê ve bi dirav hatine kirin. Hewceye li dijî wan di nava tekoşîneke pir çalek de cî bigrin.  Divê werin bêbandorkirin. Tirkîyê ji bo di vê mijarê de nêrînên xwe yên paşverû bide qebûlkirin, kesên taybet girtin û xistin nav tevgerê. Wê jî bi peran, derfetên siyasî û berjewendiyên aborî ve dan meşandin. Di vê mijarê de weke min gotî, ne tenê dema erk tê danin hewceye ev li ser bingeha dildarîbûnê bê kirin.

# HEVPEYVÎNA BERIYA ÎLANKIRINA ŞERÊ GIŞTÎ

# 3-7/06/1993

## HEVEYYVÎNA MUHABÎRÊN ALMAN YÊN ROJNAMEYA DER SPİEGEL DI ROJA 03.06.1993'AN DE BI RÊBERTÎ RE DAYÎN ÇÊKIRIN

---.:Di pêvajoyeke wiha girîng de, wê hevdîtineke balkêş be. Ez wisa dihizim ku ev pirsgirêka Kurd, li Almanyayê jî gihiştiye rewşeke cidî. Lê belê pisgirêk tê çewtkirin. Ev tam dused sale polîtîkayeke durû tê lîstandin. Pêşketinên li Kurdistanê hatiye asteke pir girîng ku xwe spartiyê, em di rewşeke nihek nêzî Almanyeyê jî têkildar dike de dijîn. Li ser vî bingehî em ê pirsên we bibersivînin.

G: Beriya her tiştî, ez jî di derbarê agahiyên ku ji destpêkê de digirim dest, ez ser navên hevalan keyfxweş dibim. Di heman demê de pêşketinên li Kurdistanê, wê rewşa polîtîkaya Almanyayê jî bide diyarkirin. Di vê wateyê de agahiyên ku ez di destpêkê de bigirim dest pir girîng in. Em di rewşeke gelek girîng de ne. Piştî ku nasîna min a bi Barzanî û Talabanî re wek takekesî bi kesayetiya Serokatiyekî sêyemîn re nasîna min, heta bê xwestin, ez bi kêfxweş im. Ez dixwazim vê bidim diyarkirin.

---.: Spas dikim.  Me yê civîneke çapameniyê ya berfireh çêkiribûna. Ji ber vê yêkî hinek beriya wê hatin. Em jî neçarbûn ku daxwazên wan neşkînin. Her wiha daxuyaniyên destpêkê yên ser

pêvajoyê ji wan re pêşdixin. Erê li benda pirsa me.

G: Bi rêz Ocalan, beriya kêliyekê we polîtîkaya Tirkan a durû li Almanyayê dabû diyarkirin, we di kîjan wateyê de diyar kir? Hûn dikarin hinekê ji me re rave bikin?

---: Ez "Polîtîkaya Koçberiyê" xeternak dibînim. Yanê berteka Almanyayê ya ji Tirkan re jixwe di rastiyê de dibe ku bi nakokî bê dîtin lê, belê ez asayî dibînim. Di bingeha vî karî de armancên ne di berjewendiya gelan de heye. Li dijberî gelan, nêzî du mîlyon mirov kişandin Almanyayê. Bi taybetî ev piştî darbeya faşîst a 12'ê Îlonê zêde bû. Li gor çespandinên min, valekirina Kurdistanê, bi hevkariya polîsên Tirk û Almanan re pêşket. Bi hinek nêzîkatiyên qirêj ve dîlgirtina gelekî heye. Min li Hamburgê bihîst ku bi seden zarokên biçûk yên ji Çewlikê girtîne. Ev hemû bi firotina eroînê tên girtin. Ev hemû jî polîsên Tirkan yên ku kişandine Almanyayê ne. Û derûdorên polîsên Alman yên bi wan re di nav hevkariyê de ne hene. Sedemên wê jî ev in: Bila Çewlik ji ciwanan bê valakirin, tevlî PKK'ê nebin.

Ev ketin nava eroînê, wê ti carî îfleh nebin û bidin diyarkirin ku "ev derûdorên PKK'ê ne" di ser de jî vî qulpî lê didin, dibêjin; "PKK dest bi bazirganiya eroînê kiriye" yek jî qulp lê didin. Ev qas ciwan kê bêqanunî ew kişandin Almanyayê? Dikarim bijmêrim, pir zêde herêm hene, bi vî rêbazî hatine valakirin. Almanya welateke venihartî pir asê ye, çawa wisa hêsan karîn herin Almanyayê? Ev polîtîkayeke pir bi qirêj e û wê gelek xusarê bidin gelê Almanyayê. Min ve nêrîna xwe di sala 1988'an de diyar kir. Partiya me li welat dikeve ku derê, ew der tê valakirin. Hemû jî dişînin Almanya û hinek welatên dîn yê Awrupayê. Pêwîst e ev polîtîka bê sekinandin. Pêwîst e ew mirov ji nû ve vegerin welatên

xwe. Divê bi vî rêbazî welat neyên valakerin. Ez vê dibêjim.

G: Bi taybetî ya ku me têkildar dike, di danûstandinên navbera Tirk û Kurdên li Tirkiyê yên ku li Almanyayê de dijin, bi têkildarê vê polîtîkayeke partiya we daye ragihandin heye? Ger hebe, mijara van a di tevlîbûna şerê serxwebûnê de, tiştên bên xwestin hebin, lazime di kîjan astê de bibe? Ji bo welatê xwe, ji bo niştîmana xwe…

---: Li gor dîtina me, ew mirov bê şik û guman bo welatê xwe weke vegereke hem manewî, hem jî fîzîkî bingeh bigirin. Ev xal girîng e: Di navbera hukumetên Almanya û hukumetên Tirkan de pirsgirêka karkeran a koçberan di asteke xeternak de girtin dest. Ji bo hêsanî rêve bibin, ev polîtîka pêşxistin. Hukûmeta Tirk ew qas mirov bi rêkirina Awrupayê re, di rastiyê de hem pirsgirêka bêkariyê îhracatî Awrupayê dike, hem jî heta bê xwestin dovîzê qezenc dike. Bi vî awayî bi hêsanî dikare rêve bibe. Ev, sedemeke girîng e. Ji bo ku hêsanî rêve bibe, ev polîtîka pir girîng e. Hukûmeta Almanyayê jî hêza karkirina erzan û hinekê jî kurkirina şovenîzmê, dihizire ku krîzan sergom bike û bi vî awayî bi kar bîne. Em dikarin bêjîn ku têkiliyên di navbera gelan de jehrkirin li karê (berjewendiyên) hukumetê tê. Ez bi awayeke din bawer nakim, yanê ev pirsgerêk tevî hukûmetan pêşdikevin, bawer nakim.

G: Min ev xal fêm nekir.

---: Yanê ev ne pirsgirekeke koçberan a awarte ye. Li gor min têkiliyên qirêj û tevlîhev hene. Ez vê, di polîtîkayên hinberî me de fêm dikim. Di rastiyê de ev li Almanyayê sergom tê kirin. Ez nizamin, ger niha ev pirsgerêk Almanyayê tevlîhev kiribe, sedemên wê kesek bi awayeke rast nedanîne holê. Hatina pirsgerêkan ya vê rewşê piştî

12’ê Îlonê, mîsoger rola polîtîkaya Tirkan heye. Ev pêwîst e, bê lêkolînkirin. Pirsgirêk hatine wê astê ku êdî nayên tehemulkirin, hewceye têkiliyên di navbera hukûmetên KOHL û hukûmeta Tirk a piştî 12’ê Îlonê de bên lêkolînkirin. Her tim polîtîkayên li ser me bi awayeke veşartî û qirêj hatin meşandin. Em balê bikişînin ser vê; ev bûyera şewitandina vê dawiyê, me li Bonnê dîtbariyeke nezî sedhezar kesê ku tevlî meşê bûyî da çêkirin, li rastî wê rojê hatibû. Ew ji berxwe ve nabe. Ji ber hîn berê bûyera şewata sê kesan jî çê bibe, beriya wê rojekê wiha Festîvala Bochumê hebû. Bila herdu bûyer bên lêkolînkirin, girêdaneke zêde bi hev re heye. Me alayan rakirin, yanê alên Kurdistanê hatin rakirin, niha li Almanyayê alên Tirkan dihejin. Ev girîng in. Hûn rojnamegerin, lê belê hûn bûyeran lêkolîn nakin. Pêşketinên dawiyê provokasyon in.

G: Pêşniyara we di vê xalê de çî ye? Pêwîst e Alman çi bikin ku pê bawer bin?

---: Îftîrayeke wiha jî hat kirin: PKK piştgiriya rastgiran digire, bi Neo Naziyan re tev digere. Ji bo ku suç tawanên xwe sergom bikin pêşdixînin. Ez, di çewisandinaTirkan, bi taybet bi têkoşîna me reçewsandinawan,dixwazim bêjim ku hukûmetên Almanya di nav risteke pir xeternak de ne.

G: Di vê xalê de ji hukûmetên me yên Almanyayê çi daxwaziyên we hene?

---: Pêwîst e têkiliyên xwe yên bi Tirkan re li ber çav re derbaz bikin. Bi rastî jî Tirk Almanyayê xirab bi kar tînin. Bi taybetî di pêvajoya dawî ya Kohl de, wiha pir sivik, qerêj;  bi Tirkên Asyaya Navîn re tevger kirin, nizanim êdî bi Rojhilata Navîn re… hinek pêşniyarên wiha ji hukûmetan re kêfxweş were, her tim dixwazin

Almanyayê li dijî me di destê xwe de bigirin. Tirkan her tim vê qurnaziyê kirin; mesala têkiliyên geh bi Almanyayê re, geh bi Îngilîzan re, gehbi Fransiyan re, geh bi Emerîkiyan re didin pêşxistin, daku li hemberî me bidin girtin. Herî dawî Almanya bû navenda vê. Ger ev polîtîkaya kaçberiyê dewam bike, wê hîn şerpize rewşeke hîn zêde şerpize jî bigire.

G: Bi qasî ku ez di hizirandina we de têdigihîjim, hûn alîgirên Kurdên ku li Almanyayê vegerin welatên xwe, we hizirandineke wiha da diyarkirin?

---: Helbet, bi rastî jî li gor min ev qas Kurd, Tirk li Almayayê mayîn ne xwezayî ye, pir zêde ye.

G: Daxwaziya we ya ku Kurdên li Almanyayê dijîn, vegerin welatên xwe heye.

---: Helbet, hizra min a ji berê de ev e. Heta min ev revandina ji der ve, weke valakirina Ermeniyan nirxand. Yanê ev ne bûyerek asayî ya karkeriyê ye. Encama polîtîkaya qirkirina civakîke bêrehm e. Pêwîst e Almanya vê rastiyê bîbîne. Bikaribe helwest nîşan bide. Lê belê ez dibêjim van tiştan sergom kir. Çavkaniya pirsgirêkê jî ev e. Tawan avêtina li ser rastgirên Almanyayê ne rast e. Ji ber ku gelê Alman ji vê ne aram e û dixin rewşeke zehetiyê. Ev vekirî ye, lê belê pirsgirêk rast danaynin. Li Almanyayê rondikên ne jidil dirijin, merasîm tên kirin, gişt qelp in.

G: Bi deh hezaran Kurdên ku li Almanyayê dijîn, ji bo PKK’ê erkekî wan yê girîng nabin?

---: Ew asayî ye, helbet wê bibe. Bi awayekî giranî alîkariyê didin partiyê. Me bi giyanê ew vegerandine welat. Bi azadbûna

Kurdistanê re beşekî mezin dibe ku bizivirin. Dîsa di şert û mercên karkerên asayî de, beşeke diyar yên kêm dikarin bimînin, ev zêde pirsgirêkê dernaxîne. Pirsgirêk, çavkaniya xwe ne ji koçberiya asayî yan jî penaberiya asayî digire. Ne tenê Çewlik (Bingöl), ji sedî not Pazarcik li Almanya û Awrupayê ne. Bi tamamî Dêrsim, Karakoçan hatine valakirin. Mesela me roja derbazbûyî bihîst; Wê qaşo heft hezar kesî ji Rihayê bigirin Berlînê, sedemên wê ev e; Em nû nû dikevin Rihayê. Vê carê jî, dora valakirina Rihayê tê. Bila rojnamevanek lêkolîn bike, koçber ji sedî not zêdetir ger ne li ser vî bingehî derbazî Awrupayê bûbûn, çi dibêjin bila bêjin. Bi rastî ez li hember vê polîtîkayê bi hêrs im. Du hukûmet, gel anîne rewşa amûrên bazirganiyekî pir xirab. Bazirganiya koledariyekî hemdem heye. Di girtîgehên Hamburgê de bi hezaran zarokên Çewlikê –Tev di navberên dezdeh, pezdeh salî de ne- ev bûyereke çawa ye? Lêkolînên min hene, hinek ciwanan jî ji gundên me digirin, tev tînin rewşa çeteyên eroînê. Bi yek kevirî du çûkan dixin. Hem girseya me, têkildarî rêyên wiha yên ji derveyî rewa dikin, ji têkoşîna me dûr dixin, hem jî ji pişta wan pereyan qezenc dikin. Yek jî ev îftîra tê pêşxistin; “Di bazirganiya hişbirinê de rist dilîze.” Her wiha bi rastî li gel me ez dikarim bêjim ku, yek kes tenê jî bi yek gram eroînê re nelîstiye, yek gram bixwe. Lê belê ew wisa bawer in ku ev îftîra, bi ewşekariya Tirk û hinek derûdorên li Ewrupayê avêtin ser me. Li gor min ev lîstokeke pir girîng e, dibe ku Almanyayê pir bê sebir ango tangav dikin. Mîsoger ev lîstokeke. Bê sebir dike, pêwîst e li ser vê bê sekinandin. Pirsgirêk, beriya 1980’an tinebû, di ‘70’an de tinebû, heta beriya ‘85’an de jî tinebû. Piştî pêvajoya çalakiya me pêşketiye. Mîsogerî girêdana wê heye. Em li beramberî provokasyoneke mezin in. Ez dikarim vê dadgeha Almanyayê wekî îspat nîşa bidim. Bûyera Palme wek îspat dikarim bidim. Wê bûyera Papa wek îspat dikarim bidim. Ağca, wî li (Papa) xist, Ağca ajanê rejîma 12’ê Îlonê ye.

G: Di mijara hevdîtina bi hukûmeta Tirk re bi awayeke yekser yan jî neyekser, fermî yan jî nefermî hêmayeke bi çi awayî be, we girtî ye?

---:Me xwest ku pêşketina agirbestê, têkiliyên bi Talabanî re bidin pêşxistin. Bi taybetî ji bo ku dîsa ew sextekariya terorîzma hukûmeta Tirkiyê vale derbixînin û ji bo ku propagandeya em aştiyê naxwazin vala derbixînin çêkir, me ev gav avêt. Vê pêvajoyê ev da îspatkirin ku; Hukûmeta Tirk ji polîtîkayekî teslîmiyetê wêdetir ji me re naspêrin. Her roj rojname dinivîsin, berpirsyarên dewletê her roj daxuyaniyan didin, “Pêwîst e PKK teslimiyetekî bi şeref bipejirîne.” Yanê wekî ku têgeheke teslîmiyeta bi şeref heye dihilberînin (îcat dikin)! Tam jî têgekekî li Tirkan tê. Di armanca siyaseta me de di mijara gavek tenê jî avêtinê de nîne. Daxwazeke me ya ji rêzê ya şêwaza çewisandinên li ser ziman, çand bênrakirin jî bersiv jê re nayê dayîn. Kemal Burkay deklarasyoneke bi xwe nivîsî hebû, Serokê Partiya Sosyalîst e. Bernameyeke nerm û pir bi aştîxwaz bû. Yên ku ji wî re jî gotine; “Tu dikarî werî Tirkiyeyê.” Wê demê hatibû gel me. Ji bo ku hatina me ya li gel hev asteng bikin, ev tavîz dan. Her wiha bi rêz Kemal Burkay ji min baştir dizane ku ev xapandine. Wî jî got; “Ya girîng armancên me yên siyasî ne, ne hebûnên me yên takekesî ne.” Bi rastî nasnameya me ya Kurd jî nepejirandina wê mijara gotinê ye. Ozal, yek du gotin xwest bêje, ew jî mir, hate kuştin, ew jî wiha çû. Ji ber ku got; “Em pirsgirêka Kurd nîqaş bikin” ew tecrîd bû.

G: Hûn pê bawerbûn, hewldaneke Ozal ya di aliyê modela federasyoneke dem dirêj de hebûya?

---: Ozal, deh salan zêdetir bi me re bi dijwarî şer kir. Koordînatorê Şerê Taybet bû, lê belê baş têgihîşt ku wihanayê

çareserkirin. Li ser çareserkirina siyasî serê xwe westand. Yekem car hinek peyvên wêrek bikaranin. Dijbertiya Ozal jî li ser vî bingehî pêşket. Heta sedema dûrbûna Mesut Yılmaz ji wî jî ev bû. Li gor min mirina wî bixwe jî bi guman e. Dema ku dikeve li gel wî bijîşk nîne. Piştî nîv seat şûnde banî ambulansê dikin. bijîşkê wî taybet li gel wî nîne, dîsa weke dixwastin ku dewlet ji wî rizgar bibe. Ji ber çi? Ji ber ku yek du gotin li ser Kurdan gatiye. Bi rastî, li gor min, di vê mijarê de çend peyvên wêrekî gotin. Durist e ne duriste ew ew qasî negirîng e. Dixwest rast be, ew qas.

G: Birêz Ocalan, ya ku ez dixwazim bizanibim, daxuyaniyeke S. Demîrel ya 'realîteya Kurd dinasim' hebû. Dîsa derbarê vê meseleya efoya di dawî de, xwest hinek hewldanên zaginî bide çêkirin. Di bingehê van têkiliyên çareserkirina siyasî de nabe ku bêne pêşxistin?

---: Xapandin bû, mesele jî, meseleya wê çawa me dîl bigirin. Baweriya wî ji diyardeya Kurd re nîne, ya Demîrel jî ya Înonû jî. Bi mîsogerî bernameyeke wan ya Kurd fîlanbêvan nîne. Sîh sale Demîrel li nav polîtîkayê ye, her tim dayîne çewisandin. "Ev îsyana bîst û nehemîn e, emê vê jî biçewisînin" gotiye. Yên ku dikin vekişînêntaxtîkî ne. Ji Ozal hîn paşdetir in. Lê belê bi pêşketina têkoşîna me re dibe ku ew jî di neçariya rastiyê de bimîne. Nemînin benda pêşketineke aştîxwazî ya demokratîk ji Tirkan. Mirov polîtîkaya cumhuriyetê ya 70 salî binêre, nêzîkatiyeke di îmhakirina Kurdan wêtedir ti tiştekî din nîne. Ger hinek li çapemeniyê, wiha girêdayî Kurdan nîxaş, guftûgo dibin jî, ew jî di bin sedema bandora giran ya têkoşînê de ye. Bi tevayî nîqaşên ser Kurdan encamekî yên têkoşîna me ne. Têkiliya xwe bi demokratîkbûna Tirkiyê re nîne.

G: Birêz Ocalan, di encama ev qas fikrên we yên niyet nebaş

(kötümser), gelo hûn dixwazin têkoşînê hîn zêdetir, şer hîn zêdetir pêşbixînin yan jî wê wiha pêk were?

---: Ma derfeta-hilbijartina rêyeke dîn heye? “Ji teslîmiyeteke bi rûmet” wêdetir!..

G: Wê demê çima we pêşniyara vê aştiyê kir, we banga aştiyê kir?

---: Ji bo ku hinek rastîn bên fêmkirin…

G: Ev nêzîkatiyeke taktîkî ye? Daxwaza rewşê ji raya giştî re dayîna fêmkirin bû?

---: Lê belê aliyê pêşber durist nêz bûbûna, wê nebûbaya taktîkeke erzan. Ger bi niyêtên baş bûbûna, dibe ku wê bûbûya destpêkirina niyetên girîng. Yanê ev di polîtîkaya Tirkan de ji îmha û teslîmiyetê wêdertir ti tiştekî din di fikra wan de nîne. Em polîtîkayeke firdewsî ango milayîketî (melek) jî bînin, ev ti tiştekî din nade îfadekirin, pir hişk e.

G: Têkoşîna çekdarî! Tamam ev heta li ku derê?

--- Wellehî… Ji teslîmbûneke xirab hîn baştir e. “Ji teslîmbûneke bi rûmet” hîn baştir e.

G: Bûyera Çewlikê, mirov dikare bêje, encama vê banga aştiyê ye?

---: Bûyera Çewlikê ne bûyereke mirov bigire cîdiyetê ye. Ew her roj pêk tê.

G: Ji vê serbixwetir, yanê banga aştiyê ya ku yekalî hatî îlankirin bi encam bûye?

---: Tişta ku diyar dibe em di wê xalê de tên dîtin.

G: Bi mîsogerî deriyên diçin ji hevdîtinan re hatine girtin?

---: Me di ti demî de negirt. Aliyên hember bi min re hevdîtinê napejirînin. Yek jî wê aliyê Kurd jî napejirînin. Yek carê Kurd bûna aliyek nayê pejirandin. Min got; “Ez bi xwe jî dikarim ji navberêderbikevim.” Ya ku tê fêmkirin niyetên wî fîlan-bêvan nîne. Ne federasyon, li ser mafên çandî, bixwe jî lihevhatin derî vekirî nahêlin. Me got; “Em radyoyek, televîzyonek Kurdî bi pêşbixînin” nêzîkî vê jî nebûn. Em bêjin; “Meclîsên Kurd ên herêmî bidin çêkirin” nêzîkî vê jî nabin. Hema em ê bêjin ku em ê niha cuda bibin, em ne di nav ti zextek wiha de ne jî, vê pir baş dizanin. Ez dibêjim; “Werin em hevdîtina di nav tixûbê Tirkiyê de statûya Kurdistanê bibînin” vê napejirînin. Wek peyv “Kurdistanê” napejirînin. Yanê weke têgeh jî. Em li hemberî rastiyekî bê eman in. Nîqaşên ser Kurdistanê jî vê têkoşînê anî vêderê, yanê ji vê zêdetir ti tiştekî din nîne. Mixabin, di vê mijarê de, di hinek raya giştî ya Awrupayê de û heta giştî di qada navnetewî de bi propagandayeke pir zêde, Tirkan rastî çewt kirin. Mînak ji bo sed hezar Tirkên li Kibrisê wekheviya siyasî dixwaze, lê belê ji bo bîst mîlyon Kurdan mafên çandî yan jî çewisandinên li ser çandî rakirinê jî nêzîk nabe. Bi rastî jî ez şaş dimînim. Vê nakokiyê Awrupa çawa nabîne û helwesta xwe nadîne holê. Ne gengaz e ku ez rast bibînim. Pir eşkereye, polîtîkaya Tirkan îmhakar e. PKK terorîst e, ne terorîst e ev qet ne girîng e. Me got, em li vê derê Burkay bixin dewreyê, mirovekî pir aştîxwaz e, bila bixwazin bi wî re li hev werin. Ji wî re na. Ev derketiye holê, hukûmeta Tirk di qirkirina netewî de bi israr e. Di vê mijarê de li

Awrupayê gelek provokasyan hatine pêşxistin. Hinek derûdorên hukûmetê jî bûne şirîkên hemû yan. Niha li Kurdistanê her roj bomberankirin heye. Îro me nûçeyên bombebarankirina deh-pazdeh cihan girt. Tê gotin ku helîkopterên kobra yên bi her awayî, nizanim balefirên şer yên din ê bi her awayî, gelê bi sîvîl bi xwe jî ji vana pir xisarê dibînin. Lê belê yên ku li ser van disekinin kes nîne, yanê li gor wan Tirk mir yanê li cîhanê qiyamet rabû. Ev pîvanên xeternak yên dualî ne, ev standartên Tirkiyê ne. Em hîn jî dixwazin rastiyan ji cîhanê  re bêjin, lê belê wekî min gotî, ji ber ku hêza me pir bi sînor e, em pir zêde pêşketinê nikarin bidin avakirin. Yanê tu kesek nabêje ku; "Ev qas leşkerên Tirk di nav Kurdistanê de cî digerin." Tirk piştre hatine van xakan. Ev xak, xakên hin gelên din bûn. Di vê xalê de bila hinek jimara Tirkan li Almanyayê zêde bibin, bi mîsogerî wê daxwaza maf bikin. Karakterên wan ji vê re dest dayî ye. Em hinekî li Kurdistanê xwedî li nasnameya xwe derdikevin, hatinekî li ser me ecêp heye. Ya ku ez bi giştî dikim, ez teslîm nabim. Ez dixwazim li welatê xwe bimînim, ez ê nebim Tirk, ez ê gelê xwe ronayî bikim, vaye ev tê serê me. Pir eşkereye yanê, me weke terorîst dayîna îlankirin ti wateya xwe ya din nîne? Terorîzma mezin ev hezar sale ji aliyê Tirkan ve li ser gelan tê pêkanîn. Hîn jî gelê Yunan, gelê Kibrisê ji tirsan nikarin gavekê jî bavêjin. Tirs ketiye nava hestiyên wan. Ev, ne teror e, lê çî ye? Wekî min gotî; "Rastî têne çewtkirin." Li Almanyayê bi awayekî bê mafî alîkarî didin Tirkan û risteke neyênî di pirsgerêka Kurdan de lîstine.  Tirkan serxweve birine. Li Almanyayê ev li serxweve birin, dikare ev qas pirsgirêkan derxînin holê. Ez vê pirsê wiha dirnirxînim.

G: Agirbesta ku we bi yekalî dabû îlankirin, di raya giştî ya cîhanê de eleqederiyeke mezin da çêkirin, ger we  bi vî rengî dabûna berdewamkirin wê ne baştir bûya? Nexwe, di nava PKK'ê de

feraseta di aliyê şerê çekdarî de hîn girantir e?

---: Na, giştdi heman astê de ne. Li gel me ti tiştekî yên alîgirên fereseta zêdetir yên feraseta çekdarî nînin. Yanê çeribandina rêya aştîxwazî, vaye ez, a niha bila destnedin min, bila yek çek tenê jî neyê teqandin, dixwazim li Kurdistanê polîtîkayê bikim. Bila vê garantiyê Ewrupa bide min, yek çek tenê jî nadim teqandin. Bi vê wesîleyê ve ez vê pêşniyara xwe pêşkêş dikim. Ez vê garantiyê didim, yek gule tenê jî nayê teqandin. Di vê bipejirînin?

G: Ev kombûnên dawî yên hêzên li Bakurê Kurdistanê, dê ev pêvajo hîn kurtir bibe û encama vê yekê dê here îlankirina eniyekê?

---: Dibe ku pêş bikeve. Armanc îlankirina eniyekê ye.

G: Nêzîkatiyên birêz Ocalan û PKK'ê ji têkiliyên li Kurdistana Başûr re çawa ne?

---: Em dixwazin nêzikî dostên li wir bibin. Ger nebin kuklayên Tirkan, têkilî wê asayî bimeşin. Wek Şerê Başur ya di '92'an de, nebin yek û neyên ser me, di navbera me de pirsgirêkên cîdî çênabin. Lê belê ditirsim ku Tirk disa bi wan bilîzin, yanê pêwîst e em vê cîdî bigirin. Çawa bi Almanyayê re dilîzin, hûn bifikirin û bînin pêşberî xwe. Ev Tirk bi Kurdan re hîn xeternak dikarin bilîzin. A niha ji Kurdên Başur 7000 hezar leşkerên bi pere avakirine, ji bo li dij me bidin şerkirin. Di her mehê de ji yekî re 200 dolar didin. Ev bi fermî û eşkere tê meşandin. Fermandarên Tirkan di wargehên leşkerî de wan rêve dibin. Nêzikî 70 wargehên leşkerî avakirin.

G: Hûn têkiliyên aborî yên Başurê Kurdistanê bi Tirkiyê re çawa dinirxînin?

---: Wê ti pirsgirêk nebe.

G: Gava din jî we da diyarkirin ku ji pêşxistina şerê çekdarî wêdetir ti hilbijartineke din nîne. Di vê wateyê de, ev şer, wê di Bakurê Kurdistanê de bimîne, naxwe Başur, Rojhilat heta li Ewrupayê jî?

---: Erê, wê giraniyeke mezin bi Bakur re bi sînor be. Lê belê wê bandorên wê li Başur û Rojhilat jî belav bibe. Bawer nakim pir bihêz li Ewrupayê belav bibe. Lê belê dibe ku li Ewrupayê nakokiya Tirk-Kurd pêşbikeve. Dibe ku bikevin nav hev. Ev xwepêşandanên dawî hinekî jî dibin hêmayên pêşî yê vê. Ya duwem jî dibe ku li Tirkiyeyê belav bibe. Bi taybetî jî li hinek qadên krîtîk belav bibe. Ez bawerim li vê derê jî hinek tesîsên zêde yên Almanyayê fîlan-bêvan hene, heta karanînên aborî yên şirîk hene, dibe ku bi sînor jî li van deveran belav bibe. Wekî aborî ji bo ku ev şer neyê fînansekirin pêdiviyeke me ji vê re heye. Hîn zêde bi armanca aborî ye. Bi qasî ku ji berxwe ve bê zanebûn nebe wê mirovan nekin hedef. Em dixwazin aboriya şer lewaz bikin. Ji ber ku ev şer bi giraniyeke mezin bi dahateya turîstan tê fînansekirin.

G: Bi awayeke şêmber ev çawa dibe?

---: Dê bi awayê derbekirina turîzmê, ne di karanîna wê de bibe.

G: Bi awayeke şênber hûn ê, maşineyên turîstan, basên wan, turîstên ji Almayayê tên, Fransayê yan jî yên ji Îngîltereyê tên, li dijberî wan êrîşan bidin pêşxistin?

---: Na, bi taybetî li ser sivîlan çûyîn di giştî de nabin şêwazên çalekiyên me. Hîn zêdetir ruxandinên tesîsan, mijara gotina tesîs

hatina rewşa ku neyên bikarkirinê û turîstan bidin jêvegerandin.

G: Hûn dikarin mînakeke bidin ka wê ev êrîş li ser kîjan karanînan, ev çalakî pêk werin?

---: Gundên turîzm hene, otel hene.

G: Ev jî jiyana mirovan naxin xeteriyê?

---: Ji bo ku nexin xeteriyê ez dixwazim bal bikişînim. Bi rastî jî pêwîst e bêzanîn ku Tirkiye herêmeke şer e.

G: Tirkiye bûyîna herêma şerekî, tê kîjan wateyê?

---: Jixwe çekên bi her awayî li Kurdistanê têne bikaranin, ev waletê me ye. Weke ji vê re bersiv dayînê, em ê şer li Tirkiyê bidin pêşxistin.

G: Di pêşerojê de, her turîstê ku were Tirkiyê, pêwîst e hesabê xwe bike, yan e dê bibe hedefa PKK'ê?

---: Turîstekî bi tendurist, pêwîst e wê werzê derbaz neke bizanibe.

G: Turîstên ku tên Tirkiyê, Tirkiye herêmekî şer e, bi mîsogerî ji derveyî di zanabûna wan de ye. Dîsa di heman demê de serwîsên turîzmê, di jimarekî nehatiye dîtin de ne.

---: Jixwe min ê vê mijarê di vê civîna çapemeniyê de vegotibaya.

G: Li gorî ku ez ê tevlî vê civînê nebim, li ser vê tu dikarî

daxuyanî bidî?

---: Ev e, daxuyaniya min ev e, yanê ez ê nû bikim.

G: Alman dibin, turîstên din yên biyanî dibin, daxwaza we ji wan re, li aliyê neyên Tirkiyê, ne wisa?

---: Şîretdikim, lê belê rastiya Tirkiyê nizanin. Hinek rewşên tirs bijîn berpirsiyarê vê wê ne em bin. Hewceye jibîr nekin ku Tirkiye, gelekî di qirkirinê re derbaz dikin. Dema ku dijmin dixwaze her tiştên me bide îmhakirin, qasî ku ji dest tê pêwîst e li ser de biçin. Divê şîrketên turîzmê û turîstan vê bizanin, piştre bimirin, bêjin “way PKK terorîst e” bila me gunehbar nekin. Bila herin li Kurdistanê binêrin, heke wîjdanê wan bipejirînin, em ê jî bipejirînin.

G: Bi rêya me re turîstên Alman bila neçin Tirkiyê, ev daxwaziyeke we ye û wekî din ji bo yên geştê li Başurê Kurdistanê dikin, ji wan re xeteriyekî dibe?

---: Jixwe Başur, ne qadekî turîstîkê ye.

G: Hîn zêdertir rojnamevan yan jî…

---: Îro ez mîzginiyekê bidin wan, çar dostên me yên Alman gihîştine gerîlayan. Yekem car tevlîbûneke navnetewî dibe.

G: Wekî tiştekî enternasyonal li Îspanyayê ye.

---: Na, yekem car çar Alman, wêrekî kirin û gihîştin me. Tevlî şer bûn, a niha li Botanê ne.

G: Ew bi mîsogerî Alman in, yan jî Tirk-Kurd in?

---: Na, bi cewher Alman in.

G: Ceribandinên wan yên leşkerî yan jî rewşa wan ya xwendevanî çawa ne?

---: Bi guman im xwedî ceribandin in, pir jî bi israr xwestin. Yek du sale bi israr xwestin. Em jî neçar man ku bipejirînin. Jinek jî hebû, ji min re raporek nivîsiye; dibêje ku “Ev saleke ez têm astengkirin” dixwest ez jê re bibim çareserî. Min nameyek ji wê re nivîsî lê belê gotin; “çûye nav gerîla”, yanê yeke pir bi israr e.

G: Ew jî Alman e?

---: Alman e.

G: Ew ji wan çar kesên ku we xala wan kiriye?

---: Erê.

G: Yên Rojava, yanê yên Rojhilatê Almanyayê ne?

---: Ji Rojava ne. Ew ji vê re ne amade ne.

G: Pirseke girîng bû ji bo wê min pirs kir.

---: Ez bawerim ku Rojhilatî zêde ji vê re ne amade ne, yanê dostên Alman hene. Yek ji wan bawirim di girtîgehê de ye. Yanê li gel me dijminatiya nijad nîne.

G: Birêz Ocalan, yek turîst tenê be jî çi Fransî, çi Alman, çi jî Îngilîz be di encama van çalakiyan de bimirin, ev wê îmaja we di raya giştî de ber bi encamên neyînî de nede?

---: Em hêvîdar in ku wê tiştekî wisa nebe. Xeletî bû, pêwîst e ev zêde neyê mezinkirin. Weke min gotî, bi taybetî em ê li ser mirovan de neçin. Sabotaj dê hîn zêdetir li ser mijarên din pêş bikevin.

G: PKK dê kengê bi stratejiya turîzmê li ser van tesîsan de here?

---: Dibe ku di demek nêzîk de, dest pê bike.

G: Mirov dikare bêje di vê havînê de ye?

---: Helbet. Ez ê di demek nêzîk de îlan bikim. Ez bawerim ji bo daxuyaniyên çapemeniyê amadekariyên me temam in. Ji nivê vê mehê û pê ve dê şer dijwartir bibe.

G: Çima ji nîvê vê mehê û pê de?

---: Me hinekî pêvajo wiha amade kir. Hinekî jî me ji hukûmeta Tirk re pêvajo da nasîn.

G: Şêwazên çalakiyên hatine plankirin hene?

---: Ez dizanim ku hinek amadekarî hene. Em hîn jî dixwazin pêş bixin. Di heman demê de, ev karanînên şirîk yên aborî hene, em ji bo wan jî dihizirin. Têkiliyên Alman -Tirkan, hîn zêdetir li ser bingeha berjewendiyên aborî, li dijberî me pêşketin. Tirk bi rêya avantajên aborî Almanya amade kirin. Alman kişandin nav şirîkayî ya aborî û polîtîkaya xwe pêşxistin. Her wiha şirîkatiya aborî hedefekî pir cidî ye. Ev jî girîng in. Bikaranînên şirîk em dikarin hinekî din jî bînin rewşa hedefan.

G: Bi mîsogerî agahiyekî ji bo ku em ji hemwelatiyên Almanan re ragihînin, dibe di kîjan bajaran de…

---: Hîn zêdetir li Egê, di peravên Derya Spî de pêşbikevin, dibe ku li Stenbolê jî pêşbikevin.

G: Hûn dikarin di peravên Derya Spî û Egeyê de, yek-du bajaran bêjî?

---: Bi giştî ye, pêwîst e neyên xweserîkirin.

G: Tirk, PKK'ê her tim wekî terorîst lanse dike, bi çalakiyekî wiha re pêşbikeve, her ku biçe ev ê li derve li dijî Kurdan pêşnekeve?

---: Ev kar wê xalê derbaz dikin. Ji propapandayan zêdetir wê rastiya şer derkeve plana pêş. Diyare ku em ê hinekî bi Tirkan re li ber hev bisekinin(boy ölçüşeceğiz). Ji vê wêdetir xwe vegotin bêwate ye. Bi qasî ku wê Kurd teslîmkariyê nepejirînin, hewceye em berxwedaniya xwe nîşan bidin. Em neçarin bidin îspatkirin ku em ne kerî ne. Pêwîst e em vê bi mîsogerî ji Tirkan re vebêjin! Lazim e Alman jî hinek dersan jê derbixînin. Divê em bînin bîra xwe; Almanya hîn ji Moltkê ve polîtîkayeke wê ya alîgirê Tirkiyê heye. Şovenîzma Tirk, îmhakariya Tirk hinekî jî di bin serê Almanan de pêşketiye. Kohl wiha digot; "Di navbera me de pirtûkeke stûr heye", yanê têkiliyên me pirtûkekî stûr e. Digot; "Em rûpelekî nû vekin." Heger ev rûpelê nû wekî kevin bibe, diyare ku em ê hinekî jî bi Almanyê re xerîk bibin. Polîtîkaya Almanan ya Tirkan, neçar e ku hinekî balê bikişîne ser endamên Kurdan. Di rastiyê de Moltke hinek rast nêzîk dibe. Kurdan baş tahlîl dike. Nivîskarên Kurd yên di demên xwe yên herî baş de, ew bixwe dinivîse. Lê belê ew, yek leşker e. Lê belê dikarim bidim diyarkirin ku yekî rastiya Kurdan pir

baş tîne ser pênûsê ye. Di vî alî de hukûmeta Alman neçar e ku Kurdan bibîne. Berxwedana Kurdan, dibe ku polîtîkaya Almanan têxe nav neçariyê. Di rastiyê de me dixwest vê bi aştîxwaziyê bidin pêşxistin, lê belê bi antî-PKK'yekî pir cuda bersiv dayê.

Demokratên Sosyal, ji Demokratên Xirîstiyanan hîn zêdetir hişk nêz bûn. Tam li hember me wiha hişt, têre û polîtîkayeke tecrîd û înkarker dan pêkanin. Ez ji rojnameyan fêr bûm, di meşa herî dawî ya li Bonê ji ber ku em tevlî bûne Demokratên Sosyal ên Almanyayê tevlî nebûne. Ez wer bawerim ku talîmatên Înonû pêktînin. Halbûkî bav Înonû, kurê Înonû di qirkirina netewa Kurdan de du sîmayên girîng ên diyar in. Ne filan bêvan û Sosyal Demokrat in jî. A niha bi Tûrkêşan re ew hukûmetê rêve dibin. Helbet em van zêde nikarin bi Almanan re vebêjin. Ez wer bawer im ku dê hinekî çalekî vebêjin. Ger têkoşîn pêşbikeve, wê ev helwestên xwe di ber çav re derbaz bikin. Lê belê li gor min ne li gor berjewendiyên Almanan in. Di rastiyê de Tirkan ev yek ser xist. Hinek teng, derûdorên paşqetî, berjewendîperêst bikaranin, polîtîkayekî li dij Kurdan ya bingehîn, anîn kirin polîtîkaya Almanan. Hinek derûdoran berjewendî bidestxistin û kirin. Li gorî min di vê mijarê de li Almanyayê siriyet veşartin heye, dirûbûn heye. Gelê Alman hatiye xapandin. Li Almanyayê pir bi zanebûn antî-PKK'yî pêşket. Bi taybetî ew "Doza Dûseldorfê" û her wiha. Ev doz tam rezîltiyeke. Yanê ez wê jî bêjim, a niha tam jî rewşeke dîlgirtinê heye. Ango dikarim bêjim ku li Tirkiyê hîn zêdetir huquq tê binpêkirin. Li gor agahiya herî dawî min girtiye, dibêjin; "Ya wê PKK li gor daxwaziya me bibe, yan jî dê qet nehêlin." Ji vê jî agahiya tu kesî nîne. Lê belê di rastiyê de jî wiha ye. Tam jî rewşeke dîlgirtina mirov jê fedî dike. Di rastiyê de me jî hizirî ku hinek dîl bigirin, lê belê ne layîq e. Di wê Çiyayê Nemrudê de deh kes girtibûn, me ji nişka ve ew berdan. Bi rastî jî me tahrîk dikin. Heşt sale doz berdewam dike! Bila soza wê bidin em razî ne. Nade,

soza jî nade, huquq jî nayê bikaranin, pir ecê be. Lêkolîn bikin tam jî rezîltî ye.

G: Di girtina wan dîlên li Çiyayê Nemrudê de wesîle bû çî, çawa bû?

---: Di rastiyê de hinek girêdayî van dozan bû, lê belê me di cîh de nedît. Ew hukûmet bi rastî jî me hinekî tahrîk dike, sor dike.

G: Ji niha ve di qada navnetewî de ti dewletekî alîkariyê nadin PKK'ê, wekî ku nadin jî, rêxistinê jî wekî terorîst pejirandin tê dîtin. Birêz Serok, êdî hûn; "çi dibêjin bila bêjin, êdî me têkildar nake" bi nêzîkatiyeke wiha re hûn dikevin navê?

---: Ji mêj ve em anîne wê xalê.

G: Kîjan xalê?

---:Yanê "PKK çi dibêje bila bibêje, em ê wê wiha binirxînin." Tahrîk heye, DYA (ABD)'yê jî di nav de nêzîkatiyên wan bi me re tahrîk dike heye. Bûyera Kurd li holê ye. Bila ew bixwe bernameyekî asayî pêşbixînin, em ê pêk bînin. Em nabêjin wisa em ê bibin dewlet jî. Ji bo gelekî bernameyekî demokratîk yê asayî hewce ye.

G: Bi qasî ez pê dizanim... hinek beş dibêjin bi eroînê, esrarê, ji bo birêz Serok zêde ne girîng e?

---: Min xwest wê mijarê bidim fêmkirin. Di vê xalê de cîhan gelekî sextekar e. Baweriya min bi min bêdawî ye. Ez esrarkêşan lanet û şermizar dikim. Yên ku gelan ji welatên wan qut dikin û dikin belayên li ser serê gelên dîtir, lanet û şermizar dikim. Gelan wekî koleyên hemdem kirin û firotina wan lanet û şermizar dikim. Ez

dixwazim gel li ser welatên xwe bi azadî bijîn. Ez dixwazim xwedî li ziman û çandên xwe derbikevin. Bi karên xwe yên siyasî bi awayeke azad bidin meşandin. PKK ev e, APO ev e. Bi cûreyekî din nayê nirxandin. Ji vê zêdetir bi ti wateyên din rengeder ne layîq in. Werin em van ciwanan bi hev re rêkin Kurdistanê, di vê mijarê de bi her cûrê alîkariyê em bikin, em wan lêkolîn bikin, kê ew kirina nav esrarkêşiyê, em wî bibînin.

G: Di rastiyê de peyameke baş ya PKK'ê di raya giştî de heye. Ji bo mafên Kurdan, serxwebûna Kurdan şer dike, lê belê bi çalakiyekî wiha ketina nava vê pêvajoyê, yanê çalakiyên ku li dijî turîzmê pêşbikevin, di pêvajoya çalakiyê de ev îmajê nade wundakirin.

---: Tirk, her tiştî çewt dide çewtkirin. Şerê me di rastiyê de, bi Tirkan re ye. Bawer nakim ku yên biyanî zêde bandor bibin. Wê bê fêmkirin ku bi taybetî berê me ne li turîsta ye.

G: Piştî îlankirina we ya agirbestê, bi pêşketina têkoşîna çekdarî re wê hîn zêde şax bide, pişt daxuyaniyên ku we dayîne û pê de, baweriya çareseriyên polîtîk çênebin pêşdikevin?

---: Di pergela Tirk ya heyî de cih ji çareseriya polîtîk re nîne. Heta cih ji nasnameya Kurd re nîne. Min got ya, ev çalakî pirsgirêka Kurd hinek anî rewşa nîqaşqirinê. Hûn hinek li gor pîvanên xwe dixwazin Tirkiyê binirxînin, yanê li gorî pîvanên demokrasiya Awrupayê. Rastiya Tirkan, ji bo gelan, ji bo gelên li Anatoliyê, rastiya daqurtandinekê ye, pêwîst e ev neyê jibîrkirin. Bi dagirkirina welat û çandên gelên dîtir re,hûndirînkirinê re hatine rewşa netewîkî. Gelek gel tinebûn. Niha dora Kurda ye. Dema ez derketim holê, min Kurd wekî çêlîka mirişkê ji devê mar derketî nirxand. Pirsgirêka min a

giştî, ji bo ku em di devî vî marî de neyên daqurtandin e. Ya ku em dikin jî şerê cînekî ye. Têkiliya xwe bi teror û anarşiyê re nîne. Têkiliya xwe bi çareseriya siyasî ya Tirkiyê re û bi terorîzma PKK'ê re nîne. Rastiya gelê Kurd bibînin û dadweriyên xwe pêşbixînin. Lawir bixwe jî azad deng derdixînin, dikarim bêjim ku ji bo zimanê Kurdistaniyan qasî lawiran jî azadiya wan nîne. Ev hatiye qedexekirin. Mirovan ji bo bi çend peyvan, bi Kurdî axaftine, bi feleqayan(iskenceyan) re derbaz bûne. Rastî li holê ne. Çewtkirina vê zêde ti wateya xwe nîne. Dev ji çareseriya siyasî berde, Kurd qasî lawirekî azad in? Bi tenê ev azadî heye; Ger bibe Tirk dikare bibe her tişt. Ev, ne azadî ye. Di pêşberî zagonan wekhev de ne, lê belê wekî yekî Tirk. Wekî yekî Kurd ti car!

G: Niha em dikarin rewşa we bişibînin wek ya Ermeniyan û Fîlîstîniyan?

---: Hîn xirabtir e… Ermenî gelekî hinek alîgir dîtine, dikarin xwe di nav qada navnetewî de bidin jiyankirin. Li gel Fîlîstîniyan jî Ereb in, ji bo wan Ereb spartekekî bi hêz e. Wekî din jî Îsraîl ziman û çanda Fîlîstîniyan nade çewisandin. Ji mêj ve ji otonomiyê re vekirî ye. Rewşa Tirkan zêde-zêde li paş e, hîn zêde hov, dirûnde û Kurd jî hîn zêdetir paşqetî û bi tenê ne. Qabîliyeta Kurdan ya xwe dayîna îfadekirinê pir lewaz e. Nivîskarek hebû, digot; "Gelê çiya yên bêzanebûn." Navê wê wisan danîbû, Korus Kingter bû.

G: Tevî ku rewşa Kurdan ev qasî neyênî ye, dîsa bi ti awayî alîkariyeke li qada navnetewî eşkere nîne. Lê belê li beramberî vê Tirk di warê leşkerî de pir bi hêz e, dîsa alîkariyê ji gelek dewletan werdigire. Mirov dikare bibêje, têkoşîna hûn didin meşandin, têkoşîneke bêhêvî ye?

Rast e, ev rast in. Têkoşînekî pir bêhevî jî ji tinebûnê hîn baştir e. Bîranînekî min heye, qasî ku tê bîra min: “Ger ez bimirim, ez bikaribim ji bo têkoşîna Kurdan mirina xwe biserbixînim, ew ê ji bo min wê bibe serkeftineke pir mezin.” Ger ji bo Kurdan pir bêhevî jî be, ji bo rastiyên netewî têkoşînkirin, têkoşînekî pir mezin e. Ji bo Kurdan ev taybetmendiyekî pir girîng e, pêwîst e em wê baş binasin. Hêza têkoşînkirinê dayîna nîşandan mûcîzeyek e. Ji bo min sedema tenê a niha li serlingan mayîn, ez bi hatina rewşa hêza têkoşînkirinê ve didim girêdan. Rewşa Kurdan bi pîvanên asayî re nayê têgihîştin. Jixwe tirsa mezin ya Tirkan jî ev e. Ez dikarim bêjim ku fêmkirina rastiya Kurdan, mirina Tirkan e. Ji qirkirina netewî wêdetir pêkanînek heye. Sosyolog û nivîskar Îsmaîl Beşîkçî, digot ku civakekî ji mîtîngeriyê wêdetir e. Bi rastî jî tawanên Tirkan pir mezin e. Di rastiyê de qiyamet ji vê yekê radibe. Ez ê vê yekê hinek din jî vebêjim. Di rastiyê de ez ê ji cîhanê re bidim vegotin. Lîstoka bi Kurdan re tê lîstin pir mezin e.

G: Bi demê re û bi vê pêvajoyê re li Tirkiyê hinek Tirkên ku hêdî hêdî rastiya Kurdan têdihîjin û bi derketina wan re, gelo mirov dikare ji bo Kurdan bi pejirandina otonomiyekê re bihizire?

---: Helbet, gengaz e. Lê belê wê Tirk heta kengê vê bipejirînin; kêliya ku bikaribin her tiştî bifikirin û bipejirînin… Ne ji ber niyeta wan yan jî demokratbûna wan, di dema Tirk ketin nav xeteriyeke zêde de dibe ku bibe.

G: Ez dixwazim du pirsan, pirs bikim; a yekemîn, we da diyarkirin  her ku biçe hûn ê şer hîn zêde dijwartir bikin. Ez dihizirim di vê xalê de, şîreta ti kesan wê ji Kurdan re tinebe.Loma di şerekî wiha de, bi mîsogerî serkeftina leşkerî, ji bo herdu aliyan jî dê bi xwe re neyne. Di vê wateyê de, di pêvajoyekî wiha de dikare hevdîtin

destpêbikin, yan jî dibe ku Tirk teslîm bibin?

---: Rast e. Ji bo herdu aliyan jî serkeftina leşkerî zehmet e. Lê belê bi rêya leşkerî em ê bikaribin hinekî pêşbikevin. Çalakbûyînên leşkerî, gelê me dide zanekirin. Dide rêxistinkirin, dihêle xwedî li nasnameya xwe derbikevin. Wekî din jî erdnîgariya Kurdistanê ji bo berxwedanê destdayî ye. Ji bo me rêya leşkerî nabe rêya girtinê. Lê belê di hevsengiya cîhana heyî de yan jî dema ku mirov hevpeymanên Tirkiyê tîne ber çavên xwe, tam serketftina leşkerî jî zor e. Rêya çareseriya siyasî jî wê rêya pêşketinên leşkerî bide vekirin. Di vê pêvajoya pêşiya me de wê hinek gavên serkeftinê pêşbikevin, dê hîn jî çareseriya siyasî xwe bide sepandin. Ger Ozal bijiyana, dibû ku hîn leztirbûna. Pirsgirêk ne Ozal e, lê belê dîsa jî ez bawerim em dikarin Tirkan ji encama têkoşinekî dijwar bînin çareseriyekî siyasî. Ger têkoşînekî çekdarî nebe, dê pirsgirêk tasfiye bibe. Tê gotin ku ferasetekî ji têkoşîna çekdarî anîna çareseriya siyasî heye. Teslîmbûyîn wê her rêya çareseriyê bigire. Wê polîtîkaya înkarkirin û îmhakirinê mayînde bike. Ji ber van sedeman berxwedanî mutlaq pêwîst e. Loma em li pey serkeftina leşkerî ne, em li pey çareseriya siyasî ne.

G: Pirsgirêka Kurd, di nav pirsgirêkên Rojhilata Navîn yên îro de, di wê çerçoveyê de bê destgirtin yan jî bi awayekî cuda bi serê xwe tenê û di konferansekî çawanî de ya ku bi tevayî hêzên navnetewî jî tevlî bibin de bêdestgirtin, hûn vê yekê rast dibînin?

---: Helbet, tiştekî wiha pêşbikeve heta bê xwestin dê erênî be. Pirsgirêka Kurd ji nîqaşên navnetewî re dayîna vekirin, derbazî civînekê kirin girîng e. Yek carê demokratbûyîna Rojhilat Navîn, bi girêdayî enternasyonalîzakirina pirsgirêka Kurdan ve dibe. Ew civîn jî di vê çerçoveyê de pêşbikeve, heta bê xwestin dê erênî be. Di

rastiyê de dewletên cîran jî dixwazin pirsgirêka Kurdan îzole bikin. Welatên ku herî zêde lihev nakin; Tirkiye, Îran, Suriye ji ber sedema pirsgirêka Kurd, pirsgirêka PKK'ê di yek lutkeyê de tên dîtin yan jî tên gel hev. Ji bo ku pirsgirêk nebe navnetewîbûyîn, ji bo ku nebe siyasîbûyîn ev yek kirin.

G: Tam ez nizanim lê belê dîsa dixwazim bipirsim; li Bakurê Kurdistanê ji gelek aliyên cîhanê re Bakur tê gotin, mirov dikare di bin hêza Netewên Yekbûyî de, daxwaza hilbijartinên aştîxwazî û demokrasî bike?

---: Pêşniyarekî pir baş e. Di bin ewlekariya Netewên Yekbûyî de çûyîna referandumekî heta dereceya dawiyê dê bibe ronahî. Em, ji pêşniyarên wiha re vekirîne. Pêwîst e ger gengaz be mirov pêşbixîne. Di vê wateyê de pêwîst e mirov pirsgirêka Kurd enternasyonalîze bike. Vê rewşê bi wîjdanê Tirkan re hiştin pir nestêle ye. Mînak, rewşa Kurdên Iraqê li holê ye. pêkanînên zêde dirûnde mijara gotinê ne. Lê belê ji ber dewletên li herêmê bi bandar in ji vê re derfet nadin. Dîsa ji ber berjewendiyên dewletên din jî mijara gotinê ne, nahêlin pirsgirêka enternasyonalîze bikin. Ez heqîqetparêz im, dîsa dijwarî hebe ez pir zorê dikişînim. Lê belê ji bo di pirsgirêka Kurd de em qasî bejna ceh, rê bikaribin bistînin, ji vê zêdetir ti çareyek din nîne. Bi rastî ez hinek dengên wisa li Ewrupayê dibîhisim. Dibêjin; “Terora PKK'ê ji bo aştiyê kelem e.” Ev ne rast e. Ewrupayan jî hinek dewletên dîtir yan jî hinek hêzên dîtir, bila çareseriyekî maqul bibînin. Em jî wekî PKK, amadene ku ji holê xwe vekişînin. Pêwîst e em nebin hedef. Me ji bo vê yek alî agirbest pêşxist. Di Newrozê de yek çalakî tenê jî nebû, gule nehat berdan. Lê belê yên nasekinin Tirk bixwe ne. Çareseriyên herî girîng bi xwe jî asteng dikin, aliyê Tirk e. Ez dîsa ji daxuyaniyê re amade me. Her tim ji qutkirina agirbesta yekalî re amade me. Bes, Tirk nêzîkî

çareseriyekî nerm bên kirin û bi eşkere di huzura we de dibêjim.

G: (...)

---: Gel kesayetiya min derdixîn pêş. Ez ji vê nerihet im. Gel, eleqederiyeke bi awarteyî ya di jor de nîşan dide. Ez ji vê eleqederiya zêde bi awayek giştî, nerihet dibim. Derdê min, di vê pirsgirêka Kurd de, bikaribim hinek rastiyên wî yên nayên pejirandin, bikim rojevê. Hinekî jî tevayî hêza xwe di vê xalê de distînim. Tu dibêjî qey her tişt min derxistiye holê. Wekî ku pirsgirêka her tiştî ez bixwe me dispêrin. Pirsgirêk li holê ye. Bila çareserî jê re bê dayîn. Bila ez bikevim bin erdê. Hukûmet jî reîscumhur jî kî dibe bila bile, ji pirsgirêkê re çareseriyekî maqûl hatibaya dîtin, ji min re bes bû.

G: Di vê meha em tê dene li Viyanayê II. Konferansa Mafên Mirovan dê were çêkirin. Ji vê konferansê re ji gelek cihên cuda yên cîhanê wezîr û wezîrên karên derve tevlî dibin. Di vê derê de rojeveke pirsgirêka Kurdan bê spartin yan jî di nav biryarên ku ew bigirin de, li ser Kurdistanê hinek biryar bigirin, gelo ev yek dê gengaz be yan jî ji aliyê we ve yên ku van xebatan bidin meşandin hene?

---: Civînên curên wiha, zêde ji bo Kurdan encamên hêviyan bidin bi xwe re naynin. Bixwe bê nîqaşqirin jî ji derveyî sînorên destûrên dewletên wan ve dernakevin. Pisgirêka Kurd, di bin ambargoya dewletan de ye. Di destpêkê de jî dewletekî wek Emerîkayê jî bi mîsogerî dê ambargoyê bide pêkanin. Heta bawer nakim ku bi azadiyane tên nîqaşqirin. Mînak, hûn hinekî nêzîkatiyên demokrasî dizanin; di wan civînan de, di navbera xwe de nîqaş bikin, ji bo gelekî bernameyekî maqûl, nerm derbixînin holê û wekî biryar

di wê civînê de derbaz bikin, ger qasî mîlîmekê jî derbazî pratîkê bû, ez ê serê xwe jêkim. Ji ber ku destûra hesin derbazdar e, ambargo derbazdar e. Yanê wek tê dîtin raya giştî ya navnetewî jî ne alîgirê çareseriya demokrasiyê yan jî hêza çareseriyekî wiha nîne. Pêwîst e pirsgirêka Kurd pir baş bê fêmkirin. Loma mirov hinekî wekî mîtîngeriya navnetewî jî dikare bigire dest. Di rastiyê de Kurd hinek hatine derbazkirin yan jî gelekî ketiye pêvajoya tasfiye yê. Ew xwe bixwe çi qasî dev ji xwe berdan e, pergela navnetewî jî ew qasî devjêberda ye. Ez vê pir bi eşkere dibêjim; “Kurd, gelekî herî zêde xiyanet li xwe kirine.” Para rastiya vê nêrînê heye. Ev qasî sivik ji axa xwe, ji dîroka xwe qutbûn ti şîroveyekî wê nîne. Di cîhanê de bûyîna gelekî bêzanist ti şîroveyekî wê nîne. Pir caran min wekî gelekî nîv-mirî nirxand. Di wateyekî din de em dixwazin wî zindî bikin. Dema ku ez derketim holê, yek kesî tenê jî, nedigot; “Ez Kurd im.” Yanê bi salan min bi tenê serê xwe têkoşîn kir. Ez rûbirû gelek bûyerên mezin dihatim, ez bi henekan dihatim pêşwazîkirin. Pêwîst e mirov Kurdan baş binase. Mirov rewşa wan wekî gelên dîtir yên asayî negire dest. Ji ber van sedeman pîvanên Kurdan bidin pêkanîn, pêwîst e hinekî cudatir bin. Ji ber van sedeman, hewceye PKK’e bixwe, çalakiyên wê, bi awayekî giştî Kurdan di nav orijînaliteya wan de binîrxîne. Dîsa xebatên tenê, xebatên ku min dayîne pêşxistinin. Ji derveyî vê rêyekî din hebûna, di rastiyê de ez gelek kedê didim. Heke wisa bûna em ê dilxweş bûbûna. Civînên navnetewî hinek nêzîkatiyên erênî bidin pêşxistin, hukûmetên xwe bi bandor bikin, mînak di çerçoveya Netewên Yekbûyî de referandumekî, dibû gavekî mezin. Heta komîteyeke çavdêrî ya agirbestekî jî gavekî pir mezin e. Komîteya çavdêrîkirina Mafên Mirovan dibe gavekî pêş. Komîteya Çavdêrî Ya Helsînkî li Kurdistanê jî çavdêrî bike pir baş dibû, lê belê nîne, yanê ev bi ti awayê pêş nakevin.

G: Hevala me ya jin pirsên xwe amadekiriye û sekiniye. Bila

ew destpêkê xilas bike, lewre em destpêkê didin wê. Wekî dawî em ê pirsên xwe pirs bikin.

---: Helbet, dibe.

G: Piştî wê jî dixwazim bi tenê hevdîtinekê çêbikin.

---: Dibe. Du seat û nîv min bi bêtêlê (têlsiz)axivîm, pir werimîm, min bi 16 navendan re axivî, pir bi gengeşe derbaz bû, lê belê dîsa jî ez performansê îdarê dikim.

Rojnamevana Jin:

G: Tê zanîn piraniya Kurdên ku li Tirkiyê dijîn, alîkariyê didin PKK'ê. Lê belê ew rêxistinên dîtir ku tên zanîn jî hene. Di van demên dawî de hewldanên bi yekbûna wan rêxistinan re jî destpêkiriye. Dîsa xebat û têkiliyên we yên di derbarê Başur de jî tên zanin. Li gel vê Kurdên bi Îranê re û rêxistinên wan re têkiliyên we hene? Ger hebe, di çerçoveya van têkiliyan de, ji rêxistinên Kurd yên parçeyên din re, bi berpirsiyarên li wan deran re, xebatên rêxistinkirinekî cuda yên bi bûyera eniyekê derbaz dikin, dibe ku tiştekî wiha belav bibe, gelo xebatekî wiha bi awarte ye?

---: Ez bawer dikim ku tu dixwazî qala Kongreya Netewî bikî. Mirov dikare wekî ji bo tevayiya Kurdan rêxistina sêwanî bihizire. Mirov dikare eniyê hîn zêdetir ji bo Kurdistana Bakur bihizire. Lê belê mirov dikare Kongreyê ji bo giştî Kurdistanê bihizire. Organîzasyonekî wiha pêdiviyeke. Em di wê oxurê de dixwazin hinek hewldanan bikin ango pêş bixin. Parçeyên din zêde ne amade ne, lê em ê zorê li wan bikin. Li gorî me pêşxistina saziyekî wiha şart e. Ji bo netewa Kurd, zagon dayîna pêşxistin û vê jî di asta navnetewî de nûnertiya wê kirin, dibe erka bingehîn ya

avahîsaziyekî wiha. Yanê pêdiviyeke, nûneretiya netewa Kurd pêwîstiyek e. Netewîkî nêzikî sîh û pênc mîlyon neçar e ku parlementoyeke bê avakirin.

G: Komên Kurdan yên li Îranê, çi di nav partiyan de, çi jî di nav partiyên Başur de derûdorên ku nêzîkî vê fikrê nebûne mijara gotinê, gelo di vî warî de pêşketineke heye?

---: Helbet ew tê nîqaşqirin. Lê belê rastiyên wan pir teng in. Zêde nikarin bibin netewî. Em ji wan re dibêjin, netewperest. Em zorê li wan bikin, dibe ku pêşde werin. Hîn jî dixwazin têkiliyan di asta kesayetan de bimeşînin. Di van mijaran de Talabanî, Barzanî rolê baş dilîzin. Girêdayî şansan dîplomasiyê dikin. Dixwazin bi berjewendiyên eşîrî mehelîû teng tevger bikin. Ger şoreşa me pêşbikeve, em ê wan bixin nava zoriyê.

G: Hûn bawerin di jiyana xwe de, rojek were tiştekî weke dewleta Kurd derbikeve holê, ev gengaz e?

---: Ez dibêjim ku dema ez derketim, di wateya hemdem de, yek kesî tenê jî nedigot; “Ez Kurd im.” Em îro di vê mijarê qada navnetewî tangav dikin. Baweriya min bi min heye. Pêşkeftinên heyî jî îspat in. Hinek pêşketinên siyasî yên Kurd derbikevin holê, pêwîst e mirov qet şaş nemîne. Dibe ku pêşketinên Kurdan hin gavên çawanî (nitelik sıçraması) bavêje. Yanê di vê mijarê de ceribandinên min hene. Bi rastî jî dema ku ez derketim qet ti tiştek tinebû. Di wî demê de deynê min li dewletê hebû. Bi salan yek kesî tenê jî baweriya xwe bi min nedanî. A niha bi mîlyonan re em bêjin “bimirin” qasî ku bimirin, em dikarin derbazî tevgerê bikin. Bi deh hezar fedayî heye. Di her kêliyê de ji mirinê re amade ne, bi deh hezar fedayî, ne hêzekî kêm e! Çiyayên muazzam hene. Rewşekî

wêrekî û fedekariyekî pêşketî heye. Wateya çareserkirina Tirkan, tê wateya çareserkirina cîhanê. Yekem care di dîrokê de me ev qasî Tirk xistiye nav zoriyê. Yanê nehsed sale li vê qadê ne. Ev, pêşketinekî girîng e. Ez bi xwe bawer im. Em ê di nêzîk de bibînin, yanê dê pêşketin çêbibin.

Bayan G.: Di vir de pirsek a min heye. Nêrina we ji bo sîyaseta Emerika çawa ye ku Kurdê Başur alikariyê pê re dikin.

S.P.: Siyaset a Emrîke a ku Kurdê Başur digre ji bo Kurde Bakur rast e. Dixwaze wan tê xwe rêya xwe. Emerîka ne bi mesela Kurdan re ye. Emerîka bi hinek şexsên Kurd re ye. Bi rêya kesan dixwaze xwe li ser mesela Kurdan xwe bihêz bike û rola PKK'ê teng bike. Heta tesfiye bike. Gelek alîkariya Tirka kir. Nikaribû biqedîne. Niha jî dixwaze vi tiştî bi destê Başur bimeşine. Ez siyaseta Emerîkayê gelek xeter dibînim. Lewre em ê jê istifade bikin. Şexs nikarin zêde graniyê li ser gel çêbikin.

G: Wekî tê zanîn di meha Îlona 1992'an de, li Başur jî di navbera Kurdan de şerê biratî dest pê kir. Birêz Ocalan yaku ez dixwazim bizanibim, sedemên ku rê ji vî şerî re vekirî çi bû?

---: Di rastiyê de ev ne şerê biratiyê filan-bêvan bû. Polîtîkayên ku Tirkan didan meşandin, di bingehê hinek berjewendiyên Kurdên Başur de ji aliyê mifte ve yan jî ji aliyê komeke teng ve hatiye meşandin. Çavkaniya xwe jî ne nakokiyên di nabera Kurdan de digire. Bikaranîna beşeke Kurdan ji aliyê Tirkan ve ye. Polîtîkaya cerdevaniyê li Başur karanîna wê ye.

G: Dema Barzanî û Talabanî li dijî PKK'ê şer kirî, li dij wan ti rexneyeke birêz Ocalan heye?

---: Helbet gelek e. Ev tawanbariye, ne rexneye jî.

G: Ji aliyekî ve weke gava din jî we dayî diyarkirin, rewşekî ji çawaniyê wekî ku tewanbariya ji rexneyê wêdetir, di aliyê din de dîsa hêzên beramberî hev şer dikin, di heman şêwazî de, ew nebin xebat jî nayên meşandin, dîsa xebat û hevpeymanên roja îro. Mirov ne gengaz e ku van fêm bike. Çawa çêdibe?

---: Di bûyerên Kudan de ev gengaz in. Kurd, gelekî ku pir zêde hatine bikaranin. Şert e ku zêde hişkbûn û nermbûnê di nav hev de bên bikaranin. Em dîsa dikarin bidin xebatkirin. Em dikarin hev bînin rewşa mirovbûnê. Yanê dê Kurd hinekî jî şer bikin û hev bikin mirov.

G: PKK di herêma sînor a Bakurê Iraqê de çalakiyên ku ji hêla Tirkiyê ve serîlêdixe tên meşandin, ev yek nabin provokasyon?

---: Na, na çavkaniya xwe ne ji wê digirin. Hîn zêde bingehîntir e. Ji bo '92'an planê tinekirina PKK'ê hebû. Ji '91'an ve ev plan hate pêşxistin.

G: Ji aliyê kê ve?

---: Ev hêzên Başur jî tevlî bûn. Ji Tirkiyê re hêzên Başur jî xistin nav, Ewrupa ji vê re destûr da. Hedef ev bû: 'Di dawiya '92'an de PKK'ê ji bûyîna pirsgirêkê derxistin bû. Talabanî ji min re name nivîsî bû. Di dawiya '91'an de bû, "Were Enqerê, dev ji çekan berde." Ev hinekî ji bo me banga şîretê bû. Me red kir û şer hat li vê polîtîkayê sekinî.

G: Pirsgirêka vê namê û bi taybetî di van pêvajoyên dawî de planên ku dixwazin pêşde bibin, mirov li ber çav bigire, di roja îro de

hûn baweriya xwe bi Talabanî û Barzanî tînin?

---: Mesele ne bawerkirin û ne jî bawernekirin e. Mesele rastiyên polîtîk in. Pêşketinên polîtîk wan neçar dike ku ji me re dost bin. Em vê asayî pêşwazî dikin.

G: Lê belê bawerî nîne.

---: Baweriya min bi bavê min bi xwe jî nîne.

G: Hûn cudahiyekê dixin di navbera Barzanî yan jî Talabanî de.

---:Birêz Talabanî, hinekî din rengê hemdemîn ji Barzanî ye. Heye, cudahiyên wan jî heye.

G: Kîjan yanî?

---: Pir rojane texlîtkar e, nerm e,xweşbînî ye (toleranslıdır). Barzanî hişk e, giran e.

G: Di kîjan wateyê de hişk e?

---: Hema hema di her alî de. Gelek zêde di bin ajotiya (güdümündedir) dewletan de ye. Hinekî din jî zêde aşîretperest e.

G: Muhafazakar e?

---: Muhafazakar e. Derûdora rewşenbîrên Talabanî hîn zêde firehtir in. Di aliyê çînayetî de jî hîn zêdetir, dixwaze xwe bispêre avaniya civakiyekî modern.

G: Agahiyên ku em di derbarê PKK'ê de dizanin hîn zêdetir,

agahiyên di qada Tirkiyê yên bi armanca propapandayên tên kirin de ne. Ji bo vê di derbarê rastiya PKK'ê de ji bo ku em bi destê yekemîn fêr bibin, hinek pirsan dixwazim pirs bikim. Di derbarê vî şerê peyîza derbazbûyî de, wundahiyên PKK'ê bi şêwazên cuda cuda hatin ragihandin. Bi rastî jî em dixwazin vê fêm bikin. Bi mîsogerî wundahî çiqas in?

---: Bi mîsogerî jimar di derdora sed û pêncî de ne.

G: Bi tenê sed û pêncî ne?

---: Bi tenê sed û pêncî.

G: Lê belê ji hezaran dest pê dike, heta çar hezaran…

---: Na.

G: Li gel vê jimarên ku ji aliyê CT'ê hatine girtin?

---: Yazde kes in. Ew jî revokên şer in. Ew jî ne girtin, yên çûne teslîm bûne.

G: Di Bakurê Iraqê de bi sedan kesên hatine girtin hene. Hûn ji van re dibêjin propapanda yan jî vir in (ne rast e)?

---: Yên ku hatine girtin, ji me ne?

G: Hezar û çar sed kes in, ya hîn rastir qasî ku em pê dizanin, hêzekî ji hezar çar sed kesî ku naxwazin vegerin PKK'ê, li Başurê Kurdistanê dimînin. Van jî çekên xwe teslîm kirine. Barzanî û Talabanî van di bin kontrolên xwe de digirin. Ma ev jî propangande ne?

---: Bi temamî propagande ye. Gişt bi çekdar in, di van rojan de me hefsed kesî derbazî welat kir. Yên din jî ew hêzên ku bi yek fermanê dê ji wir qut bibin.

G: Bi awayekî çalak yên şer dikin û di bin çekan de ne hêzekî çi qas heye?

---: Di derdora deh hezaran de ye.

G: Di kîjan welatan de, ji van deh hezar lê tên dîtin?

---: Gişt li Bakurê Kurdistanê ne, ji der ve nîne.

G: Li Tirkiyê çi qas hene?

---: Li wê derê xebatkarên rêxistinê pir in. Lê belê gerîla li Tirkiyê nînin.

G: Li Bakurê Iraqê û li Başurê Kurdistanê çi qas hene?

---: Pir hindik. Ew di heman rojê de dikarin derbazî Tirkiyê bibin.

G: Kêm, zêde dibe ku çi qas bin?

---: Di rastiyê de wargehekî me heye, lê zêde nîne. Wargeh jî nêzî hezar kesî heye.

G: Li Suriyê çend kes lê tên dîtin?

---: Nîn in. Lê belê yên li Suriyê gişt alîgirên me ne.

G: Li Lubnanê yên di bin çek de yan jî di wargehên perwerdê

de çend kes hene?

---: Qet ti kesek nîne.

G: Deh hezar kes li Bakurê Kurdistanê, hezar kes li Başurê Kurdistanê, wiha ev rast e?

---: Rast e.

G: Li gor gotegotan yan jî li gor agahiyên ku tên dayîn, dibêjin PKK partiyeke pir dewlemend e, qasî sed mîlyonî pereyê wê heye, ev ne propaganda ye, nexwe rast e?

---: Budçeya me li derdora sed mîlyonî diçe û tê (100 mîlyon dolar). Yanê ev budçeya giştî ye.

G: Ev pere ji bo şerê we têrê dike, yan jî hindik e?

---: Em bi çavkaniyên xwe, xwe bixwe fînanse dikin. Em yek quruşî tenê alîkariyê jî ji der ve nagirin. Alîkariyekî mezin ya gel heye.

G: Ev bi giştî ji bexşandinê digirin dest?

---: Gişt bexşandine. Qet li ti derê bi zorê dest danîn tine.

G: Tevî ku agirbest hîn li merîyetê bû, beriya deh roj berê, sedemê bûyera li Çewlikê hatiye holê, ez wekî bi mîsogerî dixwazim fêr bibim. Sedema vê bûyera dayî afirandin çibû?

---: CT li wê herêmê pezdeh hevalên me şehîd xist, bi awayekî giranî heyfa wê ye.

G: Yên ku ev meşandine ango pêkanîne kîne?

---: Berpirsiyarê yêkînekê ye.

G: Ma we destûr dayê? Hîn beriya wê agahiya we jê hebû?

---: Na.

G: Niha ji bo ku ez bi mîsogerî bersivê bistînim, ez dixwazim pirsekê bipirsim. Pir hatiye gotegotê, dîsa dibe ku agahdarkirinekî şaş be jî, dibe ku bi armanca propagandayê jî be. Hinek kesên ku di nav PKK'ê yên serokatiya we naxwazin yan jî ji serokatiyê re dilxwaz in, gelo rewşekî wiha heye?

---: Ez, di nav PKK'ê de jî têkoşînekî pir bi nîqaş didim meşandin. Bi rastî min dixwest ku li dij min derketiban, bi rastî jî di vê mijarê de, ez daxwazkar im ku li dij min hinekî muxalefetekê bidin pêşxistin, lê dernakeve. Ne ji bo rihetiya min, ne jî ji bo muxalefet derketiye.

G: Baş e, bûyera li Çewlikê, ji derveyî agahiya we pêkhatina wê û vê jî beriya ku biqewime bê agahiya we, mirov vê wekî hêmayekî xirab nikare bigire dest?

---: Na, çalakiyekî asayî ye. Dijmin me bibîne ew jî wê wisa bike.

G: Lê belê hîn beriya vê we ji raya cîhanê re û ji raya giştî re şaxekî aştiyekî dirêj kir. Lê belê bi vê bûyerê re, ev vala hate derxistin. A niha di rojeva cîhanê de nêzîkatiyên bi awayê "êdî em baweriya xwe bi birêz Ocalan naynîn" nîşan dide, ev we tengav

nake?

---: Raya cîhanê qasî serê derziyê êşên me, pirsgirêkên me negirt cidiyetê. Em bi hezar carî jî destê aştiyê dirêj bikin, em ji fermana îdamê ji wêdertir bi tiştekî din re rûbirû nayên. Hinekî me xwest ku bi rêbazên aştiyê ve girêdayî bin, qala “teslîmiyeta bi rûmet” kirin. Di dîrokê de bi hezaran Kurd teslîm bûn, dawiya tevan jî ketin sêdarê. Pêwîst e mirov dîroka Kurd-Tirk pir baş bizani be. Dijminê me pir bê wîjdan e. Her bijî ji me re ku em di demekî pir dirêj li hember wî dikarin li ber xwe bidin. Li gel helbestvanekî hebû; “Berxwedan Jiyan e.” Ji derveyî vê riya jiyanê nîne. Ji Ermeniya, ji Ruman bipirsin. Tirk, çi qasî aştîxwazin, ji Ereban bipirsin.

# AXAVTINA RÊBERTÎ BI BBC'YÊ RE

BBC. : …….

---. : Heke li ser bê hizirin, sala par di van dîrokan de hewldanek me ya agirbest hebû û li ser vî esasî derfetên pêşkeftinên sîyasî derketibû holê. Hinek hêviyên çareseriya pirsgirêkên siyasî diyar bûbûn. Ji ber vê sedemê min wek aliyeke bi îdia tevlîbûna me ya hilbijartinê dîyar kir. Min diyar kiribû ku em dikarin piştgirî bidin hinek partî û namzetên guncav jî. Mixabin, piştî ku pêvajoya agirbestê zêde pêşneket û weke ku tê zanîn tevî destpêkirina serdema şerê herî giran, gelek pêşketinên antî demokratîk bûn mijarên gotinê. Di vê navberê de, li Kurdistanê valakirina hezaran gundan û dîsa, qasî ku em bêjin kêmbûna derfetên hilbijartina demokratîk, ji dêvla wê bi pêşxistina şerê taybet ê ku bi awayeke bipergal didin meşandin, helbet bala me kişand ku em polîtîkaya xwe li ber çav re derbas bikin û rê vekir ku li hember pêşxistina vî şerî em şerê xwe bidin ferzkirin. Di vê wateyê de ti wateya tevlîbûna hilbijartinan nebû. Me berê jî vê yekê diyar kiribû. Li hember şerê ku ji me re dihate ferzkirin, şerê parastina xwe kirin mijara gotinê ye. Her wiha, helwesta me ya niha ne tenê boykot, ji wê jî wirdetir ev hilbijartinên ku leyîstokê nûnerên şerê heyî ye em derfet nedin wan. Mînak, navçeya Cizîrê ku ji % 95'ê wê welatparêz in, niha ji wan re Kamîl axayê ku sêsed cerdewanên wî hene didin ferzkirin. Di vê mijarê de, taybetî jî ji aliyê fermandariya giştî ya artêşê ve namzetên RP(Partîya Refahê) derdixin pêş heye. Dixawazin wan bidin hilbijartin. Li hember vê bi teqez helwesta me ya dijber wê hebe. Bi rastî jî di vê mijarê de em bi biryar in. Ji mafên hilbijartina demokratîk yên gelan re piştî ku ew qas astengî datînin

lê, dîsa DEP xaîn îlan dikin û piştre jî endamên wê digrin û davêjin hundir (ku DEP bi awayeke îdia dixwest tevlî hilbijartinan bibe), partî û namzetên partiyên ku bi vî awayî xwe li ser girseya me ya welatparêz û raya me ya giştî ya demokratîk dana ferzkirinê em nikarin bipejirînin. Bi vî awayî, bi boykota me ya çalak ve li hember vê yekê dijber derketina me mîsoger e.

BBC. : …….

---. : Me gotibû; ji hilbijartineke ku bi tevlîbûna heyeta çavderên navnetewî re em hene. Mixabin, weke ku tê zanîn ev nehat pejirandin. Ji bo hilbijartineke wekhev derket holê ku tu ewlekariyek tune ye. Jixwe hemû sindoqên hilbijartinê birin cihên ku cerdewanên gundan lê serwer in û li wir kom kirin. A herî girîng jî ew e ku rêbazên li ser DEP'ê bikartînin hene, ji ber hinek jî namzetên ku em ê piştgirî bidin...

BBC. :….

---. : Na, berevajiyê wê yê ku ji hilbijartinên demokratîk direve hukûmet bixwe ye. Me di vê mijarê de ewlekariyeke navnetewî xwesti bû. Dîsa, taybetî di hilbijartinan de partiya DEP'ê ya ku em ê piştgiriyê bidin, me pêwîstiya tevlîbûna azad dabû diyarkirin. Weke ku tê zanîn dema hilbijartin nêz bûn li dora DEP'ê diwareke dorpêçkirî ya tam hat kişandin û herî dawiyê namzetan, parlementeran xaîn îlankirin û hatin girtin. Bi sedan kes hatin bincavkirin, dawiyê jî ewlekariya navnetewî qet nepejirandin. Di vê navberê de pêncî hezar leşker birin heremê. Bi vî awayî di bin fermandariya wan de, di bin bandora cerdavanên gund de qasî ku xuyakirî jî em nikarin bibêjin, ketin nava leyîstoka hilbijartinê. Em ê ji vê yekê re nebûna amûr, qasî ku em nebûna amûr bi hemû hêza

xwe ve danîbûna holê ku ev tê çi wateyê. Me vê helwestê nîşan da. Berevajiyê vê kesên dixwestin xwe veşêrin û lewaz in, ên ku dixwestin neserkeftinên we veşêrin û vêya jî dixwestin di bin zehtên giran de bi rê ve bibin, hukûmet bixwe ye.

BBC. : …

---. : Bi ti awayî rewşeke hilbijartina demokratîk ne mijara gotinêye û li holê tiştek wisa tune ye. Nêvenga di bin zordestî û serweriya mîsoger ya hêzên leşkeri de ku hejmara wan dused hezarî derbas dike, mijara gotinê ye. Di rastiyê de, rewşeke me ya ku em hilbijartinan qedexe bikin tune ye. Tenê ne qedexekirina hilbijartinan, bi şerekî taybet ve hemû rihê hilbijartinê ji holê rakirin mijara gotinê ye. Bi rastî jî gelek çeloxwarî nêzîk dibin. Tenê ne nêvenga hilbijartinan, hemû rêgezên hilbijartinê (kî heke rêgezên wan jî li ber çav bê girtin) dikeve rewşa nebikaranînê. Me hilbijartinek di sînorê mutewazîbûnê de dixwest. Derfet nedan vê, derfetdayînê aliyeke bihêlin, rewşa îlankirina xayînbûnê felan heye. Pêwîst e vêya baş bînin ber çavên xwe. Mijara ku em dixwazin qedexe bikin an jî dijberiya vê pêşbixin, li gor ez dibêjim mijara cerdevanên gund in. Hema, hemû namzet û van cerdevanan di destên wan de çek bi rojane li hember me şer dikin. Ma wisa bi çekan hilbijartin dibe? Heke, ji gel re wisa bê ferzkirin bersiva ku em ji vê re bidin xwe parastin e. Şîrovekirina ku tê xwestin ev e.

BBC. : …

---.: Me bi caran kir, ê ku nakeve meriyete TC. ye. Bi rastî jî em, ji bo deklerasyona cenevreyê bixin meriyetê her dem amade ne. Di vê mijarê de ji aliyê me ve ti aciziyek tune ye.

BBC. : …

---. : Pêwîst e, em vê yeke bînin ber çavên xwe. Bi rastî li holê, pilana tasfiyekirinê ya ku bi temamî rêgezên şer dide aliyekê û gihiştiye asta qirkirinê, mijara gotinê ye. Hewl didin ku biparêzin. Dema hewl didin biparêzin, em jî hewl didin ku ji armancên leşkerî dernekevin. Mînak li gel vê, li Bosna-Hersekê gelek rêbazên ku tên bikaranîn hene, gelek baş tê zanîn ku em qet îtîbarî bi wan rêbazan nakin. Hinek çalakiyên ku bertekên raya giştî girtiye, çêbûne. Ev ji bo me ne rêbaz in. Bertekên hinek komên welatparêz in, car caran tiştên wisa çêdibe. Ev bi sîyaseta partiya me ve ne girêdayî ye. Rewşa me ya ku em êrîşî sivîlan bikin û zagonên şer asteng bikin, wê nebe mijara gotinê. Di vê wateyê de bi aliyekî be jî ez diyar dikim ku di vê mijarê de em ê xwedî li berpirsiyartiya xwe derkevin û bi rastî jî pirsgirêk ji TC.'yê derdikeve.

BBC. : …

--- . : Em nakevin nav wan helwestan, ji bo ku em nekevin, em ê eleqeyek mezin bidin nîşandan. Weke ku ez dibêjim di partiya me de wisa feraseta tundî tune ye. Ji ber ku gelek kêm çêdibin, pêwîst e bînim ziman ku van bûyeran çavkaniya xwe ji pêşketinên ji bilî îradeya me digrin. Li gel hemû bangewaziya me bi ti awayî kesên ku naxwazin me fêm bikin an jî ji helwestên weke xwe dixin nava jin û zarokan û dixawazin wisa gerîla îmha bikin jî derdikevin holê. Dîsa jî ji bo ku pêşketinên wisa pêşnekevin em ê eleqeya mezin helbet bidin nîşandan.

BBC.: …

---.: Di rastiyê de pêwîstiya ku em li vêderê fêm bikin ev e; mînak bikaranînên li ser dîlgirtiyên şer li vê derê girîngiyek mezin

digre. Wisa bi çend bombebarankirinan jî ew qas ne diyarker e. Bi rastî jî dîlgirtiyên di destê me de me hemû berda û me qet li ser êşkenceya herî biçûk, zordarî neda kişandin. Berdana nêzîkî pêncî leşkeri mijara gotinê ye. Lê, bi rojane hesabê êşkenceyên ku li ser me tên bikaranin tune ye. Vê mijarê li ser vî esasî bigrin dest wê hîn rastir bibe.

BBC: :...

---.: Heta ji dest tê ji girseyên wisa re êrîşên me tune ye. Ew, hilbijartinê bi me nadin kirin lê, ji dêvla vê jî bi armanca ku em zextên giran li ser raya me ya giştî tê kirin protesto bikin, li ser esasên hişyarîyên diyarkirî ez dibêjim qey astengiyên wisa dibe ku hebin. Ji bo ku mirovan nekin hedef hin tedbîran digrin û wisa çêdikin.

BBC.: ...

---.: Di rastiyê de, rewşeke me ya ku dev ji daxwaziya me ya serbixwebûnê berdin tune ye. Dîsa, rewşeke me ya yekîtiya Tirkiyeyê xira bikin jî tune ye. Em bi vê jî bawer dikin ku di rastiya heyî de, tevlî bi sînorên heyî ve jî ji pirsgirêkên navnetewî re çareseriyan, dikarin pêş bixin. Weke gelek caran ew qas tê gotin, em ne li du cihêbûnê ne jî. Di vê mijarê de, bi mijarên bingehîn ve girdayî em hewl didin; bi şertên ku di bin siya zor û zehtan de nemînin ango di nêvenga zor ya ku me dijber dibinin de, di têkîliyên Kurd-Tirk de ji vesazbûnên nû re fersend bê dayîn û bê naskirin. Ev du mijar cewhera nêzîkatiyên me diyar dikin. Yanê, dev ji nêzîkatiyên ku xwe dispêre zorê bê berdan. Têkîliyên Kurd û Tirk ji nû ve bê vesazkirin. Ev vesazbûn, di zagon û makezagonê de bigihêje asta îfadeya diyarkirî. Rastî jî em ji vê yekê re hene. Heta ez

vêya jî lê zêde bikim min gotibû; “di vê wateyê de mafê siyasetê ya ku bi awayeke azad em bikin, bixin bin ewleyê, em di asta netewî an jî navnetewî de ewleya wan besbûyî bibînin; em jî feraseta xwe ya tundiya çekan dikarin bidin aliyekê û her wiha siyaseteke bê çek jî dikarin hilbijêrin” dabû diyarkirin. Lê mixabin, li hember vê ti bersiva hukûmetê nebû û bi bersivên weke “em ê biperçiqînin, îmha bikin, bi operasyonên Bihar û Havînê re em ê koka wan zuha bikin” ve bersiv didin.

BBC. : …

---.: Weke ku ez her car dibêjim yanê, ez jî tê de bi awayeke azad mafê me ya sîyaseteke ewle bikin û heke nasnameya gelekî bê pejirandin em ê, hewl bidin ku bi rêbazên siyasî ve encam bigrin. Di kêliyê de, em amadene ku çekan berdin. Aliyê li hember me, di vê mijarê de gelo bi xwe bawer in? Hin tedbîrên zagon û zagona bingehîn dikarin bigrin? Raya giştî ya demokratîk a navnetewî wê ewleyek diyar bike? Ger ji van pirsan re bersivên erênî bide em hene.

BBC.: …

---.: Erê,ez bi xwe jî gelek bawer im. Ez dikarim tevlî hilbijartinên hem li Kurdistanê hem jî li Tirkiyeyê bibim û berevajiyê vê tiştê ku tê zanîn, ji gele Tirkiyeyê re jî dikarim bidim nîşan ku ji bo ji vebijêrka demokratîk a wan re ez dikarim bibim alternatîfek. Ez bawer dikim ku gelek piştgiriya wan jî bidim hev. Em li vê derê azadiyê dixwazin. Bila ewleya vê hebe, em amadene ku gel kî hildibijêre û heta dewleta ku di derheqê wî de bi têkçûna hilbijartineke herî giran ve dixwaze bersiv bide, bi rêzdarî pêşwazî bikin. Di vê mijarê de, bi rastî jî yê ku asê ye û qet destûr nade

zagonên TC'yê ne.

BBC.: …

---.: Niha li gor tê zanîn di çend salên dawiyê de Newroz bi komkujiyan ve hat pêşvazîkirin û bi van komkujiyan ve gelek mirov hatin kuştin, bi hezaran jî birîndar bûn. Ez bawer im û em fikaran dikin ku îsal jî ji meşên girseyan re komkujiyên xeter wê bidin ferzkirin. Yekîniyên şerên taybet ên heyî, taybet jî ev yekîniyên artêşa taybet li gor agahiya ku me sitandiye her roj bi dehan cînayetên kiryarên nediyar dikin. Mirovên welatparêz ên ku ji rêzê ne an jî mirovên li gor wan bi guman in qetil dikin. Ji girseyên wisa re dibe ku komkujiyên hîn giran bidin ferzkirin. Ji bo em pêşiya vê bigrin me guncav dît ku em di malên xwe de bimînin.

BBC.: …

---.: Na, rastî jî di vê mijarê de azadiyeke diyarker hebûna min dixwest hinekê ewleya vê bigrim ka di metrepolan de kî bi hêz e, pêşwaziyên girseyan ka çawa ye, me veya bi hev re bidîtana. Ew bixwe "di nava hefteyekê de sed û pêncî hezar belavkirina leşkeran heye û heremên ku rojane operasyonên nayên meşandin tune ye" dibêjin. Gel wê çawa Newrozê pîroz bikin. Gelên ku ew qas bi komkujiyan re rûbirû ye di rojên wisa kirîtîk de xwe bikşînin parastinê û ev jî ya herî guncav e. Maye ku, em bidin nîşan ku em ne layikê vê ne, şerê gerîla di rewşeke ber bi hilkişandinê ve ye. Ev ne nîşana lewaziyekê ye, ev nîşana ku em bixwe bawer in. Em ji piştgiriya gel guman nakin û di piştgiriya gel de pêşketineke muazam heye. Heke ev pêşketin nebûya, hukûmet dikaribû ew qas jî serî li zextên leşkeri yên hişk bidana? Meclîsa leşkeriyê hîn îro kom dike. Civîna awarte ya meclîseke wisa dikaribû banîbûna rojevê?

Tevî ku ew qas hêzên artêşê û hêzên din dikare bixe meriyetê? Zagonên hişk zagonên bi antî-terorîst ve tê binavkirin dikin hene. Ji girtina derabeyên herî bi çûk re jî cezayên herî giran pêşdixin. Di piştgiriya girseyan de pêşketin nebûya, gelo pêwîstî bi van zagonan didîtin?

BBC.: …

---.: Pêkane ku bersiveke wisa pêşbixin; hukûmet vê helwesta xwe bi awayekî vekirî da nîşan. Li ser întîfada an jî serhildanên girseyan bersivdayîna gelek biryar û komkujî jî têde da nîşandan. Nepêkan e ku em vê yekê tespit nekin, taybetî jî ji havîna par ve li ser girseyeke pir bi biryar rewşeke zextkirinê hebû û ez yeqîn dikim ku vê bûyerê gelekî dan çapemeniyê. “bingeha girseya PKK’ê em ê bişkînin, nizanim mîlîsê ku ketiye bajêr em ê ji holê rakin.” Hate gotin. Wateya wê ev e, piştgiriya gel em ê bi awayeke bêrehm qut bikin. Ji bo vê yekê wê her rêbaz bê ceribandin. Ji ber ku me vê tespit kir, me jî xwest ku em zêdetir giraniyê bidin textîka xwe ya serhildanê. Heke bi rastî jî me bixwestana, me dikaribû bisedan-bisedan Cîzir, Lîce avabikirina. Lê belê, ez bawer dikim ku li hember vê wundahiyeke mirovan a ku hejmara wan bigîhîştana deh hezaran wê bibûna mijara gotinê. Dibe ku ev bibûya helwesteke bê berpirsiyartî. Yanê, tiştê ku hûn dibêjin ez fêm dikim lê belê, yê me jî bi vî ali ve guhertina taxtîka me heye. Li hember hukûmeta ku serî li hemû komkujiyan dide, bi riya serhiladanên gel ve dixwaze komkujî û rêbezên xwe yên tinekirinê bi vî rengî bikar bîne, lewre ji ber vê me jî ji pêşwaziyên girseyan re sînor danî, daku nikaribin vê riyê polîtîkayên xwe yên qirêj bidin meşandin. Heke em bixwazin em dikarin hîn berfirehtir pêşbixin lê, em naxwazin zêde giranî bidin van rêbazan.

BBC.: …

---.: Bi rastî jî ji feraseta lihevkirinê ya ku Ozal dixwest pêşbixe re me gelek pêşwaziyeke erênî da û heke bala xwe bidin piştî Ozal, di asta jor de pêşkeftina cinayetên kiryarên wan ne diyar gelek bi bandor in. Weke ku her car ez dibêjim gumaneke min din jî heye, ez bawer dikim ku Ozal jî kiryarî wî ne û ez bawer dikim ku rojeke wê dîrok vê hîn baştir derxe holê hîn ji niha ve gelek nîşan heye. Polîtîkaya kemalîst a bikaranîna heftê salî de Ozal xwest navbereke biçûk veke û ev bi rastî jî ji meseleya Kurd re çareseriya siyasî bû. Me, ji vê mijarê re bersiveke erênî da û ez bawerim ku di nava vê pêvajoyê de em çiqas girêdayî agirbestê ne, dawiyê jî me dît ku di bin re dihate xwestin agirbestê bi şêwaza teslîmiyetê ve bigrin, dan diyarkirin. Jixwe bi israr ve digotin “em ji çiyayan daxin”. Piştî ji daxistana çiyayan, ez dizanim ku wê çi bibûya û çi bikirina, yanê di dîroka TC’yê de diyar e. Jixwe ew bi xwe jî dibêjin “îsyana 29 mîn e”. Demirel vêya gelek vekirî vedibêje, “em ê bitepisînin” Dibêje. Piştî tepisandinê kesên ku bixwazin bi rastî jî berxwe bidin wê bi îdamê re bên derbaskirin, kesên ku poşman bibin û efûyê bixwazin ew ê jî weke noker(îşbîrlîkçî) bên nirxandin û di mijara gelê Kurd de gavek jî nayê avêtin. Ev helwest bi awayeke wekirî diyar e û helwesta fermî ya hukûmetê ye. Di vê mijarê de, ji bo em nêvengê sor bikin an jî çareseriyê bibin qada leşkerî, ti berpirsiyara me ya esasî tunebû. Dibe ku bi rêbaza em dixwazin ve, nikarin pêvajoyê rêve bibin, dibe ku çalaki jî bûbe mijara gotinê lê, ya ku diyarker e kesên li hember me ji radestiyê pêvtir ti polîtîkayê wek fersendek nedan pêşiya me. Baweriya xwe qet bi derfetên çareseriya siyasî re netanin. Jixwe ev piştî mirina Ozal zelal bû. Piştî ku zelal bû, diyare ku wê agirbest pêşnekeve. Diyar bû ku hemû karan derbasî pilansaziya leşkeri bikin. Dawiyê, gelek cinayetên kiryarên nediyar hat pêşxistin. Serfermandaran kuştin, wisa gelek subayan kuştin. Ew

kes hemû, di serdema Ozal de mane û kadroyên Ozal bûn. Leşkerekî wisa di nava xwe de ew qas bêrihm nêzîk dibe, pêwîst e gelo rêveberiyeke wisa tund wê li hember me çawa nêzîk bibe, em baş fêm bikin.

BBC.: …

---.: Bêguman, bi feraseta parastina di cîh ve, ji vê pêvajoya agirbestê re bersiv nayê dayîn. Di vê mijarê de hinek taxtîkên ku me pêşxistine hene. Taybetî, ji sala par ve hîn zêdetir pêşxistina van taxtîkan mijara gotinê ye. Herî dawî operasyona ku dixwestin bi êrîşa Biharê re binav bikin, bi vê operasyonê ve girêdayî operasyonek zincîrî jî mijara gotinê ye. Mînak, operasyona Gabarê hebû, 2'yê meha Adarê despê kir, 9'ê Adarê bi dawî bû. Wundahiyên me çar in, ên wan jî qasî ku 80 kes mirî, nêzikî 150 birîndarên wan hene. Bi rastî jî ew hêza agirê muazzam, li çiyayên Kurdîstanê hatin helandin. Teqez tevgereke diyar heye ku em ji vêya re dibêjin şerê bi tevger. Bi pêşxistina vê re dîsa bi belavbûna gerîla ya ku li qadên Welat ên berfireh ve em bawer dikin ku wê vala bê derxistin. Li gor tê gotin wundahiya me tune ye. Di hêzên gerîla de pêşkeftineke teqez, ji aliyê çendaniyê ve jî bilindbûnek heye. Çiyayên Welat ên ku yek jî nehatibe girtin tune ye. Teqez dikarim vê bibêjim ku di rêbazên leşkeri yên ku didin ferzkirin de çareserî tune ye, van rêbazan di derheqê wan de encamên neyînî daye. Weke leşkeri, em ji çareseriyê re rast nêzîk dibin. Ez ti carî ew qas bixwe bawer nebûm ku bi rêya leşkeri ve em ê encam bigrin û cara yekemin e ku bi rêya leşkeri ve em ê bikaribin encamê bigrin û hem jî amedekariyên heyî ewle dikim.

BBC.: …

---.: Di vê mijarê de nakevim nava xeyalan. Mîsoger li hember girseyê zextên tund, rêbazên komkujiyê wê her dem di meriyete de be. Lê, taybet rewşa me ya girtina qadên gerîla heye. Her ku biçe, em ê hewl bidin ku bi giranî beşeke gel bikşînin heremên rizgarkiriyê. Ji vî alî ve hinek tedbîrên me hene. Heta, îsal bi ferzkirina li hember hilbijartinan ve rewşa me ya çêkirina hilbijartina azad jî hebû, hilbijartinên eyaletan çêdikin û heta bi spartina van hilbijartinên eyaletan ve em ê hukûmetên eyaletan pêş bixin. Heta, heman weke yê Başur li çend eyaletan hukûmeta fedaral em ê pêş bixin. Di vê mijarê de amedekariyên pêş ve diçin hene. Yanê, wisa weke ku ji derve xuya dike ne meseleya kirin û nekirina agirbestê ye. Desthilatdariya gelekî ya ku heta dawiyê pêşdikeve mijara gotinê ye û em xwedî hêz in ku vêya biparêz in.

BBC.:…

---.: Careke din bidim diyarkirin ku DEP ne partiyeke PKK'ê ye. Heta li ser vê partiyê gelek rexneyên min en hişk hene. Li ser nenirxandina potansiyela gel ya ku me hişyar kiriye re jî çêbû lê, me gotibû; heta ku girêdayî gel bin, heta ku hinek daxwazên demokratîk ên netewî xwe pişt çav nekin em dikarin piştgiriyê bidin. Telkînên min di vê çarçoveyê de ne. Jixwe ew bixwe jî vê yekê dibînin û dan diyarkirin ku rewşeke wan ya li hember PKK'ê derbikevin tune ye. Li hember PKK'ê derbikevin jî ti ferqa wan ji partiyên din namîne. Her wiha ji bingeha girseya me re spartina wan nabe mijara gotinê. Pêwîst e, têkîliya DEP û PKK'ê di vê çarçoveyê de bê fêmkirin an jî heke diyalog hebin, van diyalogan ji derveyê mijarên ku me diyar kiriye pê ve ti wateyeke din tune ye. Van parlementeran, li gor ku tê gotin ne dûvikên, ne dengên an jî ne PKK ya ku di meclîsê de ne?

BBC.:…

---.: Me, di demên berê de ji partiya demokrasiyê bi hinek parlementeran re li pêşberî çapemeniyê hevdîtinên vekirî çêkir. Li vir ya girîng naveroka hevdîtina ye. Wan diyarkiribûn ku wê piştgiriyê bidin pêvajoya agirbestê û eleqeya ku me nîşanî wan dabû bi şêweya; “ di vê pêvajoyê de hûn dikarin rola xwe bileyizin, heta hûn dikarin rola xwe ji aliyê nermkirina nêvengê ve jî bidin lîstin” bû. Dem dem hinek hevdîtinên ku dişibiya vê çêdibû û em gelek baş di ferqa wê de bûn. Namzetên DEP’ê nikarin bibin mîlîtanên me. Pêwîstiya şertên endamtiya PKK’ê nikarin bi cîh bînin. Fikrandina vê jî hinek tewşitî ye. Lê belê, diyalog jî çêbûn vê jî vekirî çêkir û ev helwesteke demokratîk e. Vê yekê ne tenê bi namzetan re, gelek mirovên ji Tirkiyeyê ne û heta, kesên ku bi siyasetê re eleqedar dibin re jî, me hevdîtin çêkir û em van hevdîtinan berdewam dikin. Ez bawerim, aliyê vêya ya ku bibe sûç jî tune ye. Çûndina Nûsret Demiral a li ser DEP’ê, di rastiyê de çavkaniya xwe ji taxtîka hilbijartinê ya hukûmetê digre. Gelek baş dizanibûn ku li Kurdistanê hilbijartin wê referandûmeke çawaniyê qezenç bike û di veya de jî texmîn dikirin ku wê HEP-DEP rol bileyîze. Ji bo wan wisa bihatana wateya referandûmê û ji bo xwe rewşa xeteriyê ji holê rabikin, ji xwe re sûçdar digeriyan. Kesên sûçdar jî bûn miletwekîliyên DEP’ê yê meclîsê. Her wiha, rewşa wan ya bi awayeke tund teşhîrkirin û herî dawî bi îlankirina xayîntiyê bû mijara gotinê. Her ku nêzîkî hilbijartinan bûn vê rewşê birin heta bincavkirinan. Bi rastî jî heke di diyaloxên me de(me di salên derbasbûyî de van diyaloxan çêkiribû, çar sal berê jî ev hevdîtinan çêbibûn) sûcek hebe û di van de zagonên xwe dixwazin bikarbînin, nexwe ji bo çi destnedayîna miletvekiliyan ji holê ranekirin? Bi rastî jî di nav van çar salan de zagonên heyî nehatin bikaranin. Heke nehatibin bikaranin ên ku sûç kirine hukûmet bixwe ye. Nexwe weke sûçdareke ku peywirên xwe

bikar neanîne, li ser kursiyê sûçdariyê ya hukûmetê pêwîst e ew birûnin. Lê, çend hefte maye ku hilbijartin çêbibin wisa bi îthamên giran ve hatina li ser DEP'yan, di rastiyê de xuya dike ku çiqas antidemokratik in.

BBC.: …

---.: Weke ku li nêvengê ewlehiya sindoqên hilbijartinê tune ye, li ser gelê me jî bi awayeke muazam polîtîkayek tund heye. Rewşa qetilkirina mirovên me yên welatparêz ên ku ji rêzê ne jî heye. Rewşa darazandina nûnerên gel ên ku herî lîberal û nerm in heye. Li vir, em dikarin behsa kîjan ewlekariyê bikin. Heke teqez behsa ewlehiya sindoqan bikin, dibe ku ew jî parastina gelê me be. Ji bo ku di Newrozê de qetlîam çênebin dikarin ewlekariyê bixwazin. Ji derveyê feraseteke vê ewlekariyê wê bi rastiyê re henekê xwe kirin bibe.

BBC.:…

---.: Ez bawer dikim ku di demên pêş de wê ravekirinên me yên hîn berfirehtir çêbibe. Dûbare di sînorên Tirkiyeyê de ji bo rêyek ji çareserkirina siyasî re bê vekirin herî dawî me pakêtên xwe yên pêşniyaran peşkeş kir. Di vê mijarê de taybetî raya giştî ya navnetewî gelek bi hestiyar tevgeriyan. Ez bawer dikim ku her ku biçe, raya giştî ya Tirkiyeyê jî wê hestiyarî tevbigerin. Her çiqas çareseriya leşkerî an jî tundiya leşkerî bê ferzkirin bila bê ferzkirin, dibe ku di pêşketinên siyasî de jî lezbûnek nelibendê çêbibe. Dikarim diyar bikim ku li hember vê jî em amade ne. Li ser vî esasî ez jî ji we re spas dikim.

**Adara 1994**

**Rêbertiya Partiyê**

# RÊBERTIYA PARTIYÊ BI WESÎLEYA SALVEGERA DEHEMÎN DAXWUYANIYA KU DAYE BBC'YÊ

BBC.:…

---.: Rast e, çareseriya siyasî asê bûye aliyekê jî çareseriya leşkerî ya ku wek hêviyekê dihat destgirtin asê bûye. Di rastiyê de ez dixwazim ji vê rewşê re ne weke asêbûneke bi şêweya weke "gihîşt rewşeke hevsengiyek lihemberhev" ve nirxandinek bikim. Ez bawer dikim ku sala par ji aliyê Gureş ve bi awayeke gelek giran ve hemû hêzên xwe yên artêşê bikaranîna ji aliyê leşkerî ve dixwestin biçin çareseriyekê. Bi kurbûna me ya di şer de, tedbîrên ku me girtibû fersendê neda vê yekê. Bi rastî jî niha rewşeke ji aliyê leşkerî ve hevsengiyeke wekhev tê jiyîn. Ev yek, xuya dike ku wê demeke diyarker wisa bidome. Di artêşê de lewaziyên cidî hene. Em jî (tevî ku em zehmetî jî dikşînin) dikarin bi rehetî webêjin ku bi vî awayî em ê vî şerî pêşde bibin. Ji bo çareseriya siyasî ez dixwazim ku dîtinên xwe dubare nû bikim. Li ser vê mijarê pirsên ku hîn xwesertir dixwazin pirs bikin hebin ez li bendê me.

BBC.:…

---.: Di vê mijarê de ya ku nûye ev e, artêş şansê xwe yê çareseriyê ceriband. Bi awayeke vekirî biser neket. Ev, li ser avaniya siyasî ya Tirkiyeyê û heta li ser artêşê wekiriye ku hinek bandorên wê çêbike. Her wiha ez difikirim ku pêşniyara me parve kiribû lê, em negîhîştibûn encamê û pêvajoya pêşketinê ya ku li ser rêya çareseriya siyasî me nikarîbû bidana despêkirin, mirov dikare hîn rastir bibine û binirxîne. Dibe ku, hem di asta berpisiyartiya avaniya

siyasî ya Tirkiyeyê de û hem jî asta artêşê bi awayeke cidî agirbestê bifikire; ji ber vê yekê bi sînor be jî bi min re baweriyek heye. Di vê mijarê de tiştê ku herî zêde bi awayeke erênî em bikin, biçin çareseriyeke ku herdu aliyan jî nexe tengasiyê ( tengasiya gelên Tirkiyeyê jî mijara gotinê ye). Şert û mercên jiyanê yên ku qet nayên jiyandin, tên jiyîn. Jixwe valakirina hemû gundên gelên me û heta tu bibêjî mayîna wan a li hemberî zordariyeke dijwar jî rastiyek e. Gel, êdî zêde naxwazin vê rabikin. Û teqez çareseriyek dixwazin. Niha di van şert û mercan de tiştê ku em bikin û bikaribin ev şerê ku bê wate û heta tu bibêjî di nava dengekê de ye, bi agirbestekê ve pêşwazî bikin. Niha ev hîn rastir e û ez pêşniyara xwe dubare nû dikim. Rewş niha, Ji her gavî zêdetir ji agirbestê re guncav e û qet ne zore ku em rêbaza siyasî ya makûl bibînin. Ez di vê mijarê de hem hîn baştirim û bawer dikim ku rastiyên heyî jî vê rewşê gelek dixe tangasiyan.

BBC.:…

---.: Rastiya rewşa ji aliyê hukûmetê ve bi awayeke israr wisa cûdaxwazin, wiha parçeker in dihate gotin, hate fêmkirin ku nerast e. Ji bo, pêwîstiya bi hevrebûna azad û wekhev ên herdu gelan bê kirin sahayek berfireh heye. Em vê têkiliyê bi şêweya ji nû ve vasaz bikin ve tînin ziman. Teqez her kes dide diyarkirin ku bi pêşxistina naveroka wê ve sînorên demokrasiya Tirkiyeyê jî em dikarin vesaz bikin. Di vê mijarê de hinekê din wêrekbûn pêwîst dike. Herî kêm mirov xwe ji diyaloxekê nekişîne. Di kijan astê de dibe bila bibe diyaloxeke makûl dibe ku bibe gava yekem in. Ez bawer dikim ku ev yek teqez bibe feydeyek û rehetiyek bide destxistin.

BBC.:…

---.: Heke baldar bin tundî gelek hatiye rapelikandin û bi şêweyên dijwar tên bikaranin. Vaye, beramberî hev ji holê rakirin û qutkirin, gava yekemîn e. Di pişt vê de (li Tirkiyeyê jî ev bi giranî tê nîqaşqirin) (pirsgirêka guhertina makezagonekê tê nîqaşqirin) pirsgirêka guhertina makezagonêk heye. Di serî de zagonên partiya siyasî, zagonên hilbijartinê û hwd. heye ku di zagonan de jixwe nîqaşek li ser mafên mirovan û li ser pêşxistina demokrasiyê heye. Ez bawerim, di serdema pêşiya me de wê xisûsî bigîhîjin hinek biryarên meclîsê û heta pêwîst bike behsa hilbijartinek pêşwext jî tê kirin. Ez di vê baweriyê de me ku ev, di çareseriya pirsgirêka Kurd de pêwîst e wek firsetek bê nirxandin. Vesazbûna zagona bingehîn nasnameya Kurd wê bigihîne garantiyê. Zagonên bêne vesazkirin, dibe ku fersendê bide bikaranîna mafên siyasî yên Kurdan. Em van bi rêyeke guncav ve dikarin nîqaş bikin. Ev, ew qas ne girîng e ku vê yekê bi îkdîdarê re an jî partiyên muhalefetê re bikin. Peymanek an jî konsensûsek pêwîst dike, di vê bingehê de bê pêşxistin. Ez dîsa di vê mijarê de dibêjim heke hewce bike bi rêbazên neyekser ve be jî (heke îleh derfet dest nede) dikarin bikar bînin. Lê, ez xwedî qenaetim ku rêya herî rast pêwîst e ku em yekser bikevin dewrê. Êdî şert û merc jî hinek jênereviyê destnîşan dike. Ez di vê baweriyê de me ku li ser vî esasî tam dema hinek gavên wêrekî avêtinê ye.

BBC.:…

---.: Heke bê dîkaqkirin, gavên ku hukûmet bi sere xwe pêşxistiye û avêtiye, bi giranî tasfiyekirina me qir dike û dixe rojevê. Niha, vî karî dikişîne ber bi tengasiyê ve. Hem tê xwestin ku demokrasi bê pêşxistin, di vê navberê de tê gotin ku dikarin ji pirsgirêka Kurd re çareseriyek bînin. Mînak, wezîrê karê derve yê nû jî dibêje: “pêşkeftina demokrasiyê, çareserkirina pirsgirêka Kurd e.”

Ji bo ku ev wisa bibe, ji carê yek ne hewceye ku xwe bi silogana “ya xilas bibin, ya xilas bibin” ve bipêçin. Xilaskirin, tasfiyekirin e. Hêza ku dixwazin tasfiye bikin jixwe ew hêz jî neçar bimîne ku xwe biparêze. Ev tengasiyê hîn jî kurtir dike. Her wiha heke hukûmet bi biryar be, di muhalefetê de vêya bixwaze, pêwîst e ku gavên pratîkî jî li gor vê û bi paralel bê daxwazkirin. Bi rastî jî dikarin bibêjin em di wateya leşkerî û siyasî de hêzekê temsîl dikin û ji gelek partiyên din jî xwediyê îdiayê ne. Her kes vê yekê dibîne. Pêwîst e binê vê rastiyê bê xêzkirin. Di vê mijarê de nêzîkatiyeke rast ji aliyê me ve gelek pêşwaziyek erênî û esnek bibîne. Yên ku di vê mijarê de asê bûne û ji gavavêtina xwe paşve kişandine ne em in. Heke bi me re têkevin têkiliyê wê her kes bibînin ku em ê çiqas xuliqkar, esnek û ji bo berjewendiya herdu gelan encaman biafirînin. Ji bo vê em li benda gavên yekemîn in.

BBC.:…

---.: Niha tê gotin ku, partiya Refahê ji ber ku partiya DEP’ê neketiye hilbijartinê an jî nehîştine ku têkevin hilbijartinê, her wiha bi nirxandina vê valatiyê ve hêz girtiye. Ev bi awayeke vekirî encama qedexekirinê ye. Di rastiyê de hêzeke Refahê wisa tune ye. Her kes behsa xeteriya Refahê dike. Yê ku vê xetereyê yekser ava dike qedexekirinên hukûmetê ye. Bi gotina “laîkbûn ji dest diçe” ve yê ku qiyametê radike SHP ye. Bila qedexekirinê rake, ji hilbijartineke azad re derfet bê dayîn wê bibîne ku şansê Refahê zêde tune ye. Ez di vê rewşê de me ku bi rehetî dikarim vê bibêjim.

A duduyan jî ew hêzên ku dişibin Îbrahîm Aksoy ê ku hûn behs dikin ji nû ve pêkhatinên wan ên demokratîk, ji min re zêde rast nayê. “Çareseriya bê teror” tê gotin, diçin ji MHP’ê bi îdeoloxekî yê kevin re hevdîtîn tê çêkirin. MHP, ji aliyekî ve di

cinayetên kiryarên wan nediyar ve hêza lêder a bingehîn be û rabe li ser navê gelê Kurd bibe hêza demokrasî û biçe ji wir destûr bixwaze ji bo me heta dawiyê xetere ye. Qaşo, îcar valatiyê di wateya bin navê “ çareseriya bê teror” de dixwazin binirxînin. Ji aliyekê ve Refah tê nirxandin, ji aliyekê ve jî li benda rewşa tevgera şoreşger a ku di zorê de ye yan jî hewtuneye ku bê tasfiyekirin, li wan dinêrin û taxtîk pêşdixin. Di ava şolî de nêçîra masiyan xetere ye. Hêvîkirina wan aliyekê bihêlin îtîbara ku heyî jî wê bi temamî wunda bikin.

BBC.:…

---.: Teqez rewşeke gel wisa ya şemitandinê tune ye. Ez dîsa îdîa dikim ku di nêvengeke azad a bi sînorkirî de wê bê fêmkirin ku piştgiriyeke wek aşûtê bi kîjan alî ve ye. Şemitandina gelekî fîlan tune ye li rastê. Wekîlên gel bi îdamkirinê tên darizandin. Ew jî dixwestin siyasetê bikin. HADEP hate damezirandin, kongreya HADEP’ê raste rast hinek rastiyan derxist holê. Piştgiriya gel a bi şêt (hem jî mercên herî zor de) wê kîjan alî ve derkeve holê em bi awayeke vekirî dibînin. Gelo, hêzeke din weke kongreya HADEP’ê dikare çêbike? Ev kongreyeke hîn duh hatiye lidarxistin. Her wiha eleqe û têkoşîna gel a ku zêde dibe berdewam dike. Mînak meşeke li Ewrupayê pêncî hezar kes dikarin tevlî bibin. Ji dêvla ku bişemitin aliyekê yan jî piştgiriya wan kêm bibe, pêşkeftineke giran heye. Germbûyîna nêvenga leşkerî qasî ku rê li encameke ji derneketina herdu aliyan sûd wergirtina hêza sêyemîn re venake, rêya sêyemîn an jî rêyeke navîn jî bêderfet dihêle. Rewşeke, berevajiya gotina ku hûn dixwazin bibêjin mijara gotinê ye. Şansê pêşketina hêzeke sêyemîn qet û qet tune ye. Berê hebû, niha tune ye.

BBC.:…

---.: Bi rastî jî dixwazim ji vê mijarê re ravekirinek bikim. Ez bawer dikim ku bi gelên Tirkiyeyê re bi vesazkirineke baş ve di çarçoveya zagona bingehîn de civakek serbixwe heta, sosyalîstên demokratîk em dikarin avabikin. Pirsgirêk ne sînorên erdnîgariyê ye. Di nava sînorên erdnîgariyê de jî hemû gel dikarin bibin serbixwe, hemû gel dikarin bibin demokratîk. Ev ya ya herî rast e jî. Ne şert e ku cudabûyîna erdnîgariyê derxin holê. Di Dinyayê de gelek şêwekirina vê jî heye. Heke di vê mijarê de hinek gav bihata avêtin, wê bide nîşandan ku em taxtîkan nakin. Gelek rêyên guncav ên ku di giraniya demokratîkbûnê de bihevrebûna gelan heye û di rastiyê de jî bidin nîşandan ku em dev ji vê bernadin. Ji ber ku di mercên heyî de em dibînin ku Kurdistaneke bi serê xwe bi awayeke tendirûstî nikare jiyan bike. Nehevsengiyek aborî heye. Gelên Kurdîstanê, hîn bi rêk û pêk rewşeke dibistana seretayî ya bi zimanê xwe nikare veke heye. Wê demek dirêj ji me re Tirkî jî pêwîst bike. Aboriya Tirkiyeyê jî ji me re pêwîst bike. Dîsa, li Tirkiyeyê gelek kadroyên ku gihîştine hene. Ew jî wê ji me re sûdwert be. Hewce bike em ê bi alîkariya wan ve Kurdistanê hîn rehetir pêş bixin. Ev ji hin kesan re dibe ku tirsek bide avakirin. Lê, pêşketina biratiyeke wiha tenê wisa çêdibe. Niyeta baş û ji hev re bawerî dayîn e. Yê mayî tenê vesazkirinek e. Ez bawer dikim ku ev, wê bikeve meriyetê.

BBC.:…

---.: Binêrin, li Emerîqayê pergala federal heye. Elmanya heman netew e. Gelek meclîsên federe û hukûmetên federe mijara gotinê ye. Di hebûna heman netewê de jî gelek pergalên federal ên demokratîk hene. Vêya, nehewceye ku ez îspat bikim. Em, netewên orjîn ên cûda temsîl dikin. Çima pergaleke federe ya ku ji vêya re guncav tune be? Gotina ku di gava yekem in de ez vebêjim;

meclîseke federe ya kurdan, girêdayê hukûmeteke federe û dîsa wek vesazbûnekê di mercên Tirkiyeyê de di bin banê meclîseke federal de dîsa, bi hukûmeteke federal ve tememkirin çima zor be. Tiştê ku Elmanya pêkaniye, di mercên Tirkiyeyê de ma em çima nikarin pêkbînin? Gelo, ev gelek bêderfet tê xuyakirin? Ez dipirsim.

BBC.:…

---.: Di serdema Ozal de, di serî de di warê bawerkirinê de bi rastî jî min zehmetî dikişand lê, her ku diçû bi cidiyeta wê re şahid dibûm ku derfeteke çareseriya siyasî xwe dabû nîşandan. Em bi agirbestê jî bi awayeke cidî difikirin. Tiştê ku ez di fêmkirinê de hîn jî zehmetî dikşînim, çûndina Ozal e. Hem jî bi deredorê xwe re. Di rastiyê de partiya wî jî hat şemitandin. Li gor min ev komployek bû. Di rastiyê de ev şans hate wundakirin. Dawiyê jî gelek tişt hate wundakirin. Mi vê demê ( ji ber mirina Ozal) vêya jî vegotibû. Wê Demirel jî rojekî were heman xetê. Di vê hukûmetê de di rêya çareseriya siyasî de wê xwe neçar bibîne. Pêşketinên heyî vê rastiyê dide nîşan. Lê, heke ev par çêbibûya bi rastî jî wê me nêzîkî çareseriya siyasî bikira. Di vê wateyê de, çûndina Ozal bû wundahiyek. Hîn jî lêgerîna wê heye û ez vê bi watedar dibînim. Di vê wateyê de, di vê baweriyê de me ku em fersendek ji destê xwe direvînin.

BBC.:…

---.: Dikare bê gotin ku tiştê ku em dixwazin di hindirê xwe de li gor ku tê xwestin, nikarin pêkbînin. Lê, di mijara avêtina gavên bingehîn de ez bawer nakim ku ketibim kêmbûyîna taxtîkeke cidî. Ez bawer dikim, gelek gav di çawaniyeke hem leşkerî hem siyasî de, di cihê xwe de hatiye avêtin. Ez ewle me ku ev, di serkeftiyên bêdawî

de hatine pêşxistin. Lê, bi rastî jî heke pêkanînên heyî hineke din jî di kurahiyê de bûna, di hundirê me de bi taybetî rewşên ku astengî nedana me wê, her tişt hîn baştir bibûya. Dibe ku wê, gelek tişt hîn ji niha ve serkeftîtir bibûya.

BBC.:…

---.: Em tevgereke ku di şert û mercên herî zor de di taxtîka têkoşîna çekan de derketine holê. Her wiha, ev ne asteke wisa rehet bê derbaskirin e. Bi ketina nava rêya pirsgirêka çareserkirina Filîstînê de, dîsa dibêjin,(bi pirsgirêka korfezê ve girêdayî) rewşa ku Irak jiyan dike dema têkeve nava çareseriyekê wê bibe dawiya têkoşîna çekdarî. Ev nirxandineke şaş e. Bi vêya ve hêvîkirin, tê wateya bi salan ve bi awayeke bê wate ve, bi nirxandinên şaş ve çavên xwe ji wundahiyan re vekirî bihêlin. Weke ku her car dibêjim; ji bo me şertek wisa tuneye ku heta dawiyê çek bê bikaranin. Em, tevgereke pêşkeftinên siyasî ya ku bi çekan ve girêdayî ne û me vêya baş tespît kiriye. Mercên têkoşîna çekdarî bê astengkirin jî (ez dikarim bibêjim ku niha derfetên vê nayê astengkirin û ji aliyê pêşketinê ve ye) rêyên me yên ku têkoşîna çekdarî pêşbixe, heta dawiyê zêde bûye. Mevziyên ku me xwe spartiyê ( Başur jî tê de) gelek zêde bûne. Ji sahaya Ewrupayê bigrim dikarim Balkan û Kafkasan jî lê zêde bikim; em dikarin bi perwerdeya ku li gor em dixwazin ve ( rêbaza leşkerî jî tê de) xwe dorpêç bikin. Ti pirsgirêka aborî tune ye. Dikare bê gotin ku ev, bi rehetî dikare bi çend salan ve jî bidome. Ji ber vê yekê, ez tevlî nêrîna di mercên têkoşîna çekdarî de astengî heye nabim. Heke rewşeke me wisa hebe jî bi awayeke berfirehî rewşa me ya bi siyasî ve tevgerîn heye. Sahaya dîplomatîk heta hûn bibêjin vebûye, di hêza siyasî ya gel de pêşketinek mezin mijara gotinê ye. Em dikarin, di astengiya têkoşîna çekdarî de bi hêsanî veguherînin pêşketinên siyasî an jî dîplomatîk.

Ji niha ve hemû dewletên heyî ji vê pêşketinê re pêşwaziyeke bi erênî didin. Ev jî ji niha ve dide xuyakirin ku ji aliyê dîplomatîk û siyasî ve em ê encamên mezin bigrin dest.

BBC.:…

---.:Feraseta min a sosyalîzmê; ji serî heta niha feraseteke sosyalîzma ya li hemberî çepgiriya sosyalîzma pêkhatî û ya hewldan tên dayîn ku nûnertiya wê li Tirkiyeyê dikin re çepgiriyeke dijber bû. Min qet feydaya vê sosyalîzmê nedîtiye. Berevajî, zirara sosyalîzma pêkhatî û nûnerên wê Tirkiyeyê min zêde dîtiye. Dema têk çû, mîn dît ku ez dikarim bibêjim em dikarin derfetên pêşkeftinê hîn zêdetir bidest bixin. Welhasil wê pêşketinên heyî jî baş derxistana holê. Em weke partiyê pêşkeftina xwe ya baş di serdema piştî salên 90'î de digirin dest. Ev pêşkeftin bi xizeke mezin ve didome. Pêwîst e bê dîtin ku em di nava feraseta sosyalîzmeke çawa de ne? Ez di vê baweriyê de me ku nirxandinên me yên wisa bi şêweya nêzîkatiyeke stalînî nezêde rast û bi îsabetî ne. Em di nava hewldanên bikaranîna sosyalîzma zanistî ya ku bi şêweya di mercên welatê me de ji aliyê gelek kesan ve nayê zanîn û fêmkirin de ne. Ez dibêjim pêwîst e ev bi awayeke zelal bê fêmkirin. Heke civak hebin wê hişmendiyên sosyal û di vê navberê de wê sosyalîzm jî hebe. Hewceye em ji sosyalîzmê netirsin. Ez ê bibêjim ku sosyalîzm pêwîstiya civaka ne. Ya baş ew e ku ji çekan re û bi taybetî jî li gor berjewendiyên beşên kedkaran bên vesazkirin. Taybetî, ji nirxên demokratîbûnê re bi morol bersiv bêdayîn. Min her dem sosyalîzmeke wiha xunaf kiriye û ji vê sosyalîzmê re girêdayînbûna xwe didomînim.

BBC.:…

---.: Ez jî we spas dikim. Di vê navberê de ez vê bibêjim, weke

berê rêxistin li gel tabloyeke gelek neyênî li ber çav dihate girtin( di serî de we jî wisa da diyarkirin) ez hinekê di nav çavderiyeke erênî û cûda de me. Şert û mercên heyî çareseriyê nêzîk kiriye. Her çiqas tabloya heyî nebaş be jî di serdema pêşiya me de gelek pêşkeftinên girîng em dikarin derxin holê, bi hêviya ku gelên me û dostên me bi vê mijarê ve bawer bin, hezkirinên xwe pêşkêş dikim.

**14’ê Tîrmehê 1994**

**Rêbertiya Partî**

# MUHABÎRÊ ROJNAMEYA CUMHURIYETÊ ORAL ÇALIŞLAR:: ROPORTAJA KU BI RÊBERTIYA PARTIYÊ RE KIRIYE

ORAL ÇALIŞLAR: Nikare fermandariyê bi endamên xwe re bike, kontrola xwe wunda kir. Ji ber wê yekê di vê çalakiya dawiyê de di hinek rojnameyan de derket. Bi awayeke zelal tê dîtin ku kontrola xwe wunda kiriye ji ber wê, ger em lê binêrin dê bikaribe li endamên xwe bide guhdarikirin. Îdîayekî wiha heye?

---: A niha, rastiya Abdullah Ocalan, ji yek diyardeyên herî kêm tê fêmkirine. Min bi tenê ji bo vê ne tenê ji bo raya giştî, ji bo partiyê ronahî bikim, di rastiyê de nirxandinên li ser Rastiya Rêvertiyê çend berg (cilt) çêkirin. Hîn jî ger em berdin raya giştî, ez bizanibin hevalên me yên partiyê, bawer nakim ku karibin fêmkiribin û pêkanîn bin jî, lê belê ev rastiyeke ku, di aliyê durûstbûn, girêdan qasî ku di ti rêxistinan de neyê dîtin, heta ji min jî zêdetir dikarim bêjim ku fedayiyekî bi wêrekî, fedekarî di hemû çêkera hevalan de pêşketiye. Ev bûyerekî pir balkêş e, yanê ev qasî kêm têbigihîje lê belê ev qasî bi balkêş xwe bide, girêdayî be!..

ORAL ÇALIŞLAR: A niha, PKK'ê agirbest îlan kir û got ku em êrîş nakin, ger neyên ser me, bendewarî û nêrîna raya giştî ya Tirkan ev e; yanê her wiha dê dewleta Tirkan jî ji vê re bersiveke erênî bide. Lê belê ya niha bi vê bûyera Çewlikê re, baweriyekî din wiha jî çêbû; "Abdullah Ocalan guhdar nekirin, Abdullah Ocalan dixwest agirbestê bide berdewamkirin, lê belê ji ber ku wî kontrol wunda kirîbû, piştre neçar ma ku xwedî lê derbikeve."

---: Vaye di lihevkirinê de gotin. Ji me pirskirin, bûyer hinekî

din cuda ye. Bi rastî jî agahiya min ji pêşkeftina pratîka bûyerekî wiha tine bû, lê belê talîmatekî me ya bi sernivîsa bi awayekî giştî; “Ger artêş êrîşê ser me bike, em ê mafê xwe yê bersivdayînê bikar bînin” heye û heta herî dawî li ser Amedê “We 15 gerîla wundayî dan, hûn neçar in ku bersiva vê bidin,” ez wer bawer im ku ji vê bardor bûbûn. Di pêkanînekî wiha derket, derxistin holê, lê wekî pir bi taybet, gotibana; “Çalakiyekî wiha heye, em çi bikin?” min ê gotibaya tarzek din yê hîn cudatir bidin pêşxistin.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela?

---: Min ê hinekî din dema wê hevsengtir kiribûya.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela min digot ku, Abdullah Ocalan dikari wiha kiribûya. Gotibûna, birayên min, me pêvajoya agirbestê dirêj kir, lê dewleta Tirk tê ser me, em vê ji vê rojê û pêde ji holê radikin. Baş e, bi negotina vê re çêbûna wê, pirsgirêkekê nade afirandin?

---: Di rastiyê de li dijberî me hate bikaranîn.

Oral Çalışlar: Mesela ev yek dayîna çêkirin dê ne rastirbûya?

---: Bêguman piştî îlankirinekî fermî dê pêşkeftîbûn, hîn watedartir bûbûya. Lê ev giştî jî mirov dikare wekî pirsgirêkên taxtîkî yên sivik bigire dest. Cewherê vî karî ev e; dewlet sondxwar ku me ji çiyan daxîne û dê zagona poşmantiyê bide pêşxistin û me dîl bigire, cewherê vî karî ev e. Piştî ku ev polîtîka nehat guhertin, ha îro çalakî çêbûn, ha sibe, ha mezin çêbûye, ha biçûk, ha bi bê çekdarî çêbûye, ha bi çekdarî, qet ti girîngiya wê nîne. Di bingeh de û di polîtîkayê de ti guhertinek nîne.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, we di dewleta Tirk de ti guhertin

hîs nekiriye?

---: Di aliyê çareseriya siyasî de: guhertin bêwate û bi xeterî bû. Dîsa vaye biryarnameya qanunî (kararname) hate weşandin, gava din nûçeyan da. Niyet ev e; Bila werin ji çiyan, bê ku bikevin girtîgehê dê herin malên xwe, piştre dê bi dijwarî operasyon bê, yên daneketine dê îmha bibin. Piştre pirsgirêka Kurd di bingeha operasyonan de bê çareserkirin. A niha, di vê rasteka nêrînê de, polîtîkaya 'bi dûr xistina' (tenkîl) ya 70'î salî ya Cumhuriyeta Tirkiyê heye. Heman tiştî dixwazin bidin pêkanin. Rejîma Iraqê li Başur, otonomî jî bixwe da, pir car zagona efoyê ya bi vî awayî jî derxist. Yanê piştî ku netewperest bi xwe jî otonomiyê napejirînin, radîkaliya PKK'ê ya di çareseriya pirsgirêka netewî de tu yê qet ji nedîtinê ve werî, dibêjî; "Teslîmbûnekî bi şeref", êdî şerefa teslîmbûnekî ya bi şeref heye, nîne ew jî mijara nîqaşekî cuda ye. Helbet bi vê ve dixwazin raya xwe ya giştî têrbikin. Ev, nêzîkatiyekî rûreşî ye û di rastiyê de berê me dayîna navtêdanê (tahrîkê) ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Belê, di raya giştî ya Tirkiyê de tiştekî wiha heye, dibêjin ku; di beşekî de "me operasyon da sekinandin, PKK demê qezenc dike, xwe ser hev kom dike, dê êrîş bike. Ji ber vê yekê pêwîst e em vê operasyonê bikin, em ê bikin û dê PKK'ê tine bikin." Dibêjin; "Ez a niha bi vê operasyona dawî re, bi baweriya tinekirina PKK'ê re alîkariyê didim." Yanê dê PKK bi vê operasyonê re tine bibe?

---: Hûn dibêjin di raya giştî de alîkariyeke wiha heye dibêjin?

ORAL ÇALIŞLAR: Ez nebêjim bi mîsogerî alîkarî heye, herî kêm bendewariyekî wiha heye.

---: Hûn dibêjin bendewariyek a raya giştî heye.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê belkî bi vê operasyona dawiyê re, bêguman a niha me di nûçeyan de jî guhdar kir, Iraq, Îran, Tirkiye ber bi hevpeymankê ve diçin. Di vê mijarê de qasî ku min fêmkiriye, ev jî ez bawerim dê vê baweriyê bide hîzkirin.

---: Bi Îran-Iraqê re?

ORAL ÇALIŞLAR: Me nûçeyeke wisa guhdar kir, ne wisa ezbenî?

X…: Îran-Suriye-Tirkiye…

ORAL ÇALIŞLAR: Erê Îran-Suriye-Tirkiye. Yanê a niha…

---: Na, ne Îran-Suriyê, dibêje Îran-Tirkiyê.

ORAL ÇALIŞLAR: Wek din jî wekî giştîbûna axa Iraqê fîlan-bêvan…

---: Niha ew beradayîne, jixwe wargehên me wisa li Îranê nîne ku…

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, helwestên Îranê li hember we çî ye?

---: Teza we ya ku em xwe li têkiliyên ji derve de digirin û pêşdikevin piroleyî ye (abartılıdır). Dîsa ew pirsa we ya yekemîn a gava din bibersivînim, yanê bendewariyekî wiha ya raya giştî heye; “Herhal îsal artêşa me pir bi amadekar e, bi operasyana havînê re dê biqedîne.” Min digot ku, yanê bila rojnamegerên objektîf biçin li Kurdistanê bigerin û em ê jî wan li hemû eniyan bidin gerandin. Vêca herin binêrin, bi yek operasyonê, bi pênc operasyonan jî

hêzeke heta sala 2000'an dê bikeve an na, nexwe hêzeke wekî dêwekî mezin dibe an na? Hûn ê wî demê bibînin û agahiyan rast bi raya giştî bidin vegotin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez wekî rojnamevanekî vê dikarim bêjim, ez dixwazim herim bibînim…

---: Helbet here bibîne. Ma rojnamevaniya herî baş wiha tê kirin. Hina jî rojnamevanekî pir bi coşê dide. Di qada navnetewî de pir pêşdikeve. Em we di tevayî eniyan de bigerînin, li lotkeyên Agiriyan, li qontarên Munzuran, li Bînboxanyan, hema hema her aliyê Torosan, li Çiyayên Botanê, li Çiyayên Garzanê, li Çiyayên Çewlikê bigerînin û wî demî hûn ê bigihijin darêzekî (yargiyekî) objektîf. Hûn ê çavdêriyên xwe binivîsin. Bersiva vê, ya herî baş wiha tê dayîn. Kozik (mevziyên) û nêzîkatiyên artêşa Tirkan bibîne, yên me jî bibîne, yên ku raya giştî rast didin têgihandin, bidin û bila raya giştî jî bikeve nav bendewariyekî rast. Her wiha ez li vê derê ti îdîayan nexwazim. Lê belê hûn dixwazin bi israr bizanibin, ez dibêjim ku; "Bingehê arteşekî gerîla ya sexlam heta di sala 2000'an de hatiye avêtin." Her ku diçe dê mezintir bibe. Dîsa di pêşkeftinên siyasî de jî dê di pileyên bilind de bibe, heta ku bê xwestin dê gelê xwe rêxistin bike, wê berê (kapasiteya) xwe zêde zêde bide pêşxistinê, dê kozikên (mevziyên) xwe yên ji derve jî bihêztir bike. Li gorî min yanê zû-dereng; "Di rastiyê de ev kar ji destpêkê ve, karekî pêwîst bû ku me bi riya siyasî re dayîbûna kirin" em ê bînin xala vê gotinê.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin di encama vê de, dê ji nû ve çareseriya siyasî were rojevê…

---: Ew neçariyek e. Lê belê niha ev çawa tê astengkirin? Çîroka wê girîng e. Li gor min yên ku armancên wan ê siyasî cîdî nebin, yên ku ji tirsa kursî û berjewendiyên takekesî wêdetir nabînin;

va ye “dê kî bibe serokwezir, dê kî bibe serokê fîlan-bêvan partiyê, dê kî hilbijartinan qezenc bike”, bi giştî polîtîka li derdora vê dizivire û tenê ji bo ew bihêz bên dîtin, wekî Karên Wezereta Hindur dayî kirin, vaye “Min îro evqas serî qutkirin”, yê dinê jî“Ez ê li hember terorê ewlekariyên herî radîkal bigirim.” Vaye. “Di vê meseleyê de yên herî dewletger jî, alîgirê helwesta giştî ya yekgirtina netewî bi me re ye”, a niha hemû di vê mijarê de, di nav pêşbirkê de ne. Ev, ji bo vê yekê jî qet ti nirxê çareseriya siyasî nîne. Bes, wekî min gotî, ji bo kursiyên xwe û partiyên xwe rizgar bikin dikin. Lê belê qasî ku pirsgirêkên Tirkiyê wiha ji berjewendiyên takekesî, partîbûnê neyê qiyaskirin berfireh in. Her wiha ji serokên asoyên wan fireh, heta ku bê xwestin ji tirsên berjewendiyên partî, takekesî dûr pêdivî dide nîşandan. Hinekî jî krîza Tirkiyê di vir de ye. Jixwe erkekî gelê Tirkiyê neçare ku hinekî jî bide pêkanîn heye. Helbet dibêjin ku; “Her gelê bûye layiqî serok, reveberê xwe dibîne.” Lê belê li gor min bi rastî jî êdî gelê Tirkiyê ji vir û pê de, ji endamên serokên û ji çareserkirina pirsgirêkan re layîq e yan jî pêwîst e wan serokan bafirîne.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e niha, di dawiya vê de em bêjin Kurdistana serxwebûn?

---: Serxwebûnî daxwaza her gelekî ye. Mirov rabe serxwebûnê jî bi cudaxwaziya dewletê re bi sînordar bike ne rastiyek e. Dê roj were ku hemû netew di nav yek civakbûna siyasetekî tenê de bibin yek, lê belê statûyekî herî serbixwe jî dê bijin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê nîqaşekî wiha li Tirkiyê bû, dibêjin ku; “Çi heye birayê min, erê dê bê dabeşkirin? Yanê bi her awayî maf didin Kurdan, lê pişt wêre her tiştî dikarin bikin, lê evana hîn jî dibêjin em ê dabeş bikin, dabeş bikin û li hemberî Tirkiyê disekinin.”

---: Bi nêzîkatiya mantiqekî înkarkirin û yên ku naxwazin rastiyên siyasî fêm bikin, bi seriyên *hişk,* apolîtîk in (nesiyasî ne). Rastiya Tirkiyê bixwe jî tam nikariye xwe serbixwe bike. Li gor min bi serê tanzîmatê, li hember Rojava bi seriyê dûvik dijî, pêdiviya wan jî ji serxwebûnê re heye. Yeksanbûna serxwebûnê, nayê wateya ku ez bûm xwediyê dewletê. Qey serxwebûn bûyîn ji dev vêkrebûnê nabe. Gelên serbixwe, mirovên bi serbixwe, gel û mirovên herî baş dikarin bi hev re bin. Heta li gor min yên ku ne serbixwe û azad bin ji karanîna mafên xwe yên vêkrebûnê bêpar in. Yên ku vîna wan nebin, mirov dikare vêkrebûnê bihizir e? Em dikarin qala yêkitiya koleyan bikin? Yekî kole, yêkitiya wî ya bi begê (efendiyê) wî re, em dikarin bêjin yêkitiyekî cidî ye? Hinekî bi aqil bin, êdî bi rastî jî di vê mijarê de rewşenbîrên Tirkiyê serûbin û şilopilo dikin. Heke hûn yekbûnê dixwazin, ev hinekî jî bi azadiyê re derbaz dibe, bi wekheviya maf re derbaz dibe, ma hinekî Kurd serbixwe bibin, bila ziravên wan ji vê neqetin; Kurd serbixwe bibin, dê bi rastiya Tirkan re hîn bi tenduristir, bi berhemtir di nav helwestek yekbûyîna berjewendiyên beramber li ber çavan de bin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yek din jî gelên Kurd û Tirk zêde xwediyê dîrokekî şirîk in. Li Tirkiyê va li Stenbolê binêrî, nûfusekî Kurd a girîng heye, li Çukurovayê binêrî, nûfusekî Kurd a girîng heye, li herêma Egeyê binêrî nûfusekî Kurd a girîng heye. A niha, mesela dipirsin di nav derdorekî wiha de dê çawa qut bibin.

---: Ez, her timî ji qutbûnê wêdetir girîngiyê didim peyvên yekbûyîn ên serxwebûn, azadî û wekheviyê. Ez gotinên qutbûnê zêde bikarnaynim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê yanê hûn vê wekî tişta polîtîkayêkî bikartînin, nexwe bi rastî jî we ji bo çespandinekî wiha kiriye, dibêjin?

---: Serxwebûyînê, ji bo gelên ku di nav hev de dijîn jî diyardeyekî ku mirov baş dikare bide pêşxistin. Ez di hizirkirina serxwebûyînê de, qet ne ji bo ti mirov, gel û netewan jê natirsim. Mirov di nav heman dewletê de jî dikare serbixwe bibe. Hûn serxwebûyînê nîqaş nakin, ditirsin. Yên ku hizra wî/ê serbixwe be, yên ku polîtîkaya wî/ê serbixwe be, dê yekbûyîna siyasî xweştir pêkbîne. Lê belê seriyên ku li Tirkiyê têbigihîjin hene? Ew her tiştî xistina di bin desthilatdarî û rêveberiya (otoriteya) xwe de, dihesibîne ku çareser bike. Ger vîna li hemberî xwe bîne sifrê, wek ku ew têdigihîje yekbûyîn û giştîbûna netewî tê avakirin. Ger hûn bi vî serî bijîn, hûn ê hîn zêdetir pirsgirêkan mezintir bikin û hûn ê bînîn rewşek wisa ku nikaribin ji bin derbikevin.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, aniha ev diyardeya Amerîka jî heye, wekî di tevayî cîhanê de heyî, di Rojhilata Navîn de jî wekî diyardeyekî girîng heye û di demên dawî de jî tê gotin ku va ye; “Di derketinên PKK’ê yên dawiyê de, lêgerînekî Amerîkayê di arambûna (îstîqrar) vê herêmê de rolekî girîng heye û PKK’ê hinekî jî li Amerîkayê dimezîne û wiha nêz dibe.”

---: Ez ji Amerîkayê tênegihîştî me, erê hinek komên çepgir yên ji Tirkiyê dibêjin; “PKK dibe Rojavayî” yan jî “Bi Amerîkayê re têkiliyan dide pêşxistin.” Xwezî Amerîka nêzîkî me bûbûya. Herî dawî ew dostên me çûn Amerîkayê; ez ê wê di civîna çapemeniyê de hinekî din jî bidim vekirin, hişmendiya daye ev e; “Ji PKK’ê dûr bisekinin”, yanê em ji wan re dest dirêj dikin, lêbinêre ew naxweze yan jî ditirse.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku; “Ev ne pirsgirêka me ye, pirsgirêk pirsgirêka Amerîkayê ye”…

---: Ez vekirî bêjim; ji ber ku em baweriyê bi xwe tînin, em

xwe ji hevpeymana bi her kesî re kirin nadin alî.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e em bi wiha…

---: Bila Amerîka were, em ê têkiliyê pêşbixin. Evê jî bi eşkereyî dibêjim. Yanê wateya têkiliya xwe dayîna pêşxistin, nayê wateya ji devjêberdana şerê bi mîtîngeriya Amerîkayê re.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, ji bo ku hûn bi hinekî din jî pirsê bidin vekirin bibêjim. A niha Amerîka navenda mîtîngeriya cîhanê ye, hûn jî ji çand û daneheva sosyalîstî tên. Ez hîn jî bi bawerim ku hûn baweriyên xwe yên sosyalîzmê diparêzin.

---: Ne hîn, em di asta Rêbertiyê de ne.

ORAL ÇALIŞLAR: Erê, yanê di vê mijarê de tiştekî we nîne. Baş e niha, hûn ji ciwantiya me heta niha dizanin, têkoşîn bi mîtîngeriya Amerîkayê re bingeh e.

---: We pir gotin kirin, we sloganên wê bikaranîn lê belê we ew bixwe nekir.

Oral Çalışlar: Me nekir.

---: Me hindik slogan gotin, lê belê em pratîka (kiryara) wê baş dikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê dewlet vê pirsê ji we bike, yanê “Çi bû ji PKK’ya ku li dijî mîtîngeriya Amerîkayê? Çi bû ji Amerîkayê dest bi hewara hêviyê kir?”

---: Ji bîr neke ku Amerîka di cîhanê de PKK’ê wekî rêxistinekî sosyalîst a bitenê û herî bi xeter dibîne. Ev dan weşandin. Rêxistina herî xeternak, rêxistina herî Marksîst Ortadoks. Ger

çepgirên li Tirkiyê naşopînin ez çi bikim? Her serê yek du gotinan de; “PKK xwe nêz dike?”, “Çima PKK çû Amerîka ye?” Yanê evanan tarzên nirxandinên roviyên lepek in (Leyîstoka ku tu çawa deynî deyne dîsa wisa tik disekine (hacıyatmaz-); zêde cidî nayên girtin. PKK rêxistinekî pir bi radîkal e; hûn lêkolîn bikin, ger em PKK’ê di vî rewşî de bibin, dê bibe tevgerekî ku hemû pîvanên heyî yên bîrdozî-polîtîk serî û bin bike. Rojavayî, di vê mijarê de pir ber bi dest in (ihtiyatlıdır), yanê di mijara PKK’ê de. Naxwazin tê jî bigihîjin. Di mijara PKK’ê de ketine nexweşiya esebî.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, wî demê tabloya niha derdikeve; Mîtîngeriya Amerîkayê heye, Rojava heye, Dewleta Tirk heye, Suriye heye, Iraq heye, di nav van tevan de, di nav van tevayî hêzan de…

---: Dîsa jî em mezin dibin.

ORAL ÇALIŞLAR: Erê, yanê di nav van tevayî tevlîheviyan de çareseriyekî çawa bê dîtin…

---: Dîsa jî em pêşdikevin. Tevayî evên ku li dijberî me, bi aliyekî xwe re ji me hez dikin, dev ji me bernadin.

ORAL ÇALIŞLAR: Tiştekî din wiha tê gotin, dibêjin ku, vaye; “Suriye di demê dawî de nêzî Amerîkayê bû, bi hilweşandina Yêkitiya Sovyetan re nêzî Amerîkayê bû û wî demî PKK, vaye di pîvanekî mezin de alîkariya Suriyê, di heyîna PKK’ê de rolekî girîng lîst. Sibê Suriye ji pişt PKK’ê vekişe, dê bi Amerîkayê re hevkariyê bike, dê PKK bikeve rewşeke pir zor û vî karî nikare bibe ango bimeşîne.”

---: Cihên ku banî min bikin pir in, yanê heta em herin

Amerîkayê jî bawer nakim ku em bên retkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Çima?

---: Yek carê giraniya me ya polîtîk heye, erê asta me ya polîtîk qasî ku bi her kesî re têkilî avabike bi hêz e. Wekî din jî rewşa welatê me, lê cihbûyîn jî dest dide.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku; “Em ê herin welatê xwe.”

---: Ez dikarim herim her cihî. Me ew xala krîtîk derbaz kir. Hinekî ji wan qadan dûr mayîn ez daxwaz dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Te ji rojnameya îro re daxuyanî daye, vaye; “Ez dikarim werim Tirkiyê, dikarim herim Tirkiyê”, ‘ez ê herim” yanê ev niha tê çi wateyê?

---: Di vê wateyê de, wekî giyanê, hizrî û têkoşîna siyasî rojek û wekî fîzîkî jî li nav welat yê herî bi hêz ez im, yek carê fîzîka min kêm e. Dê ew jî rojekê pêk were.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, hûn mesela tiştekî wiha dihizirin, di nav pêvajoya pêşiya me de, rojekî wekî Serokê PKK’ê di parlamentoya Tirkiyê de, di wateya tişta siyasetekî de li Tirkiyê yan jî li Kurdistanê, wekî kesayetiyekî siyasî yê rewa, yanê vê bi temamî bi takekesiyekî wiha…

---: Vegera min ya li Tirkiyeyê, bi nêzîktiya veguhertina Tirkiyê ve girêdayî ye. Pêşeroja Apo Tirkiyekî bi Kurdistanê re, magezagona xwe dayî guhertin, zagonên xwe dayî guhertin, Kurdistanê ki bi Tirkiya bi saziyên xwe yên bingehîn re bi guhertinên pir cewaz dayî avakirine û ev jî bi veguherîna Tirkiyê re

û guhertina pejirandina statûya Kurdistinê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e em vê, yanê niha ev ûtopyayekî ye, yanê di wateya tişt de ûtopya ye, hûn dibêjin dê pêşeroja min wiha be, wekî tişt. Baş e wekî dîrok, yanê em bêjin mesela, sê sal, pênc sal dê kîşan demî çêbibe, li gor we ev guhertin û veguhertin?

---: Ji ûtopyayê wêdetir, bûyerekî roj bi roj di pratîkê (kiryarî) de tê pêkanîn.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku, piştî dîrokekî kin û pêde evê pêk were.

---: Girêdayî xebatên me ye, heger em bi vê tempoyê bimeşin û hevalên me jî şaşiyan nekin, wisa ne taybetmendiyekî ûtopyaye yan jî dê nebe paşdexistina dîroka (jimara bêdawî).

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, hûn çarenûsa Başurê Kurdistanê çawa dibînin?

---: Bi rastî jî li Başurê Kurdistanê tevlîhevî heye. Hinekî pirsgirêkên Kurd bi hev ve girêdayî ye, herdu ji nêz ve dê hev bandor bike, ez guman dikim ku di vê rewşa tevlîheviyê de, dê hinek ferasetên şareşgerî pêş bikevin, bê çareseriya dispêrin li pêşiya Kurdan dê hîn jî ber bi xebatekî şoreşgerî ya radîkal ve bide û ev jî tê wateya giştîbûna Şoreşa Kurdistanê.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, mesela niha ev operasyona li Başurê Kurdistanê hatî kirin re, hûn jî dizanin, ji ber sedemên têkiliyên Barzanî û Talabanî bi dewleta Tirkiyê re, di wê demê operasyona li hember we hatî kirin de ristek neyînî lîstin. Niha hûn li vê derê ne, mesela sibe hûn ê beramberî tiştekî wisa werin, yan na?

---: Na. Bi giştî pêşgiriya (tedbîra) vê hatiye girtin. Xwezî

pirî caran li Başur operasyon bê kirin, yek kesî bixwe jî nabînin.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, wî demî ew tişt hat gotin, vaye "Abdullah Ocalan, ji birayê wî Osman Ocalan re çima we ji wir bi şûnde kişandinekî rêkûpêk nekir û hûn bûn sedemên gelek wundayiyan" we rexneyekî wiha kiriye.

---: Min rexne kir, pir bi berfirehî jî.

ORAL ÇALIŞLAR: Di nûçeyên rojnameyên derketî de, tiştekî wiha cih digirt. Yanê bi rastî rexneyekî wiha hat kirin?

---: Hat kirin.

ORAL ÇALIŞLAR: We çawa rexne kir, yanê we çi got, rexneyên we yê bingehîn çi bûn?

---: Başur erzanbikaranîn, giran bikaranîn. Hinekî jî bi vekirî-legal, bi awayê gund û bi tarzekî bibin hedef û vekirî bikaranîn. Nikarîn gerîla himbêz bikin, xwe nedan ber zoriyên gerîla, tehemûl nekirin. Di bingeh de em çûn ser vê derê û em mafdar bûn. Ev jî yanê bi tenê derfet da Tirkiyê yan jî ne ji bo ku rê ji hêzên Başur re dayîna vekirine, di bingeh de ji bo ku astengkirina nebûyîna me ya di gerîlabûnê de, ez dijber derketim û ez beriya mehan li hember derketibûm. Rexneyên min yên pir hişk jî hebûn.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e Osman Ocalan pejirandin yan na?

---: Ne tenê Osman, rexne hema her kesên ku li wê qadê dimînin re bû.

ORAL ÇALIŞLAR: Gerîlayên we yên li wê derê çi gotin?

---: Tiştekî falan-bêvan bêjin ti nîne, rastî li holê ne; cûrên

ferasetên wiha dibe îmhayê û tevahîyan dîtîn, vê bi hinek destekariyên (mudaxaleyên) me pêşî lê hat girtin û xet hinek din hat rûniştandin. A niha tirsekî wiha nîne. Ne PDK bi hevkariya Komera Tirkiyê re nikare me bînin rewşekî wiha deng û tengav ne jî li gel me ji vê re, yek kes nikare car din bikeve vê şaşiya kevin tê dîtin. Bi hevseng e, kîjan hêz tê bila bê dikare xwe biparêz e. Jixwe talîmatên giştî yên tên dayîn, dê bizava (tevgera) gerîla li ku derê, çawa êrîş bikin nediyar e, wekî girêdayî tarzê baregeh û bizavê (tevgerê) di bîst û çar seatên de di nav tarzê tevgerekî de bimîne. Ev talîmatekî mîsoger e û di asteke bilinde tê pêkanîn. Her wiha êdî PKK'ê wekî kevin li cihekî dîtin, lêxistin ne mîsoger e.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, niha em bêjin ku dewleta Tirk ev operasyon kir, ev operasyon xilas bû. We jî got ku, vaye lê binêre… em bêjin ku di dawiya vê de du alternatîf heye, yanê ji bo raya giştî, alternatîfek; "PKK têk çû (binket)", alternatîfa din jî, "PKK têk neçû." Piştî ku têkneçûyîna PKK'ê derket holê û pê de, Abdullah Ocalan ji nû ve dê bêje, "Em ji aştiyê re hene?"

---: Ez ê wan taybetmendiyan (xalan) di civîna çapemeniyê de baş bidim vekirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê binêrin, ew dê beriya civîna çapemeniyê neyê weşandin, bernameyekî wisa nîne.

---: Na. Ya ku ez dixwazim, dikarim hinek din jî berfireh vekim. Agirbestekî rastî dê çawa pêşbikeve. Dîsa bi van operasyonên nû re girêdayî bi agirbestekî nû re dê çawa bê avakirin, ez ê vê baş vebêjim. Li gor min agirbesta ku me bi yekalî dayî pêşxistin, di destpêkê de dewlet kir nav şaşiyekê, piştre di nav tirşê de xeniqî, xwestin tiştekî bidin çêkirin, ev jî pir bi nebes bû. Me jî ji encamekî dafdayîna bertekê wiha wêdetir, ji çawaniyekî re rê nedida

vekirin. Ji ber van sedeman dê şer kûrtirîn bibe.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku dê di demê pêşiya me de şerê kûrtirîn bibe.

---: Bi mîsogerî kûrtirîn bibe. Ger di sala çûyî de ji me û ji aliyê li hember bi hezaran kes çûbin, di pêvajoya pêşiya me de pêwîst e qala deh hezar kesî bike. Bi kinayî dê bi xwînî bibe, lê belê bi mîsogerî mirov nikare hêjmarê bide. Belkî jî ji wundahiyên 15 sal hîn zêdetir bibe; ev şeş mehên li pêşiya me, neyê zanîn jî. Lê, vaye wî demê cihê ku PKK werê ne tinebûna wê ye, tam berevajî wê weke di leşkerî de PKK'yekî binketina wê negengaz e, yanê wisa pirsgirêka neteweke ku sergomkirina wê negengaz be û êdî bi beramberî meşrûyeta yek û du yên aliyan, hev dipejirînin û derbazbûna vî karî ji platpormek siyasî re, xwe bi rûbirûyê dîtina ji rastiyekî zêdetir ti çareseriyên wan nemayîne, dê bibe mijar gotinê. Ez wer guman dikim ku dê alî di encama vê pêngavê de, yan jî bi operasyonên nû û li hember vê jî asta pêşketina pêngava me binêrin –ez bi bihêzî îhtimal didim ku bigihîjin nirxandinekî wiha.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e niha, hinek baweriyên we di derbarê Ozal de, di çapemeniyê de derket…

---: Ozal, bi deh sal ser hev bi dijwarî bi me re şer kir, tevahî hêza xwe bikaranî. Li gor min Koordînatorê Şerê Taybet bû. Lê belê bi taybetî ji '90'î û pêde dema dîtin bi rêbazên tenîlkirina (bidûrxistina) leşkerî re nikarin pirsgirêkê bidin çareserkirin û dê Tirkiyê pir xwîn wunda bike, ne çêkera aborî ne jî çêkera siyasî nikare vê rabike, dît ku nade rakirin. Berê xwe da lêgerînên nû. Ozal ji wî demî heta niha, mesaj dida me jî. Birêz Güneri Civanoğlu jî hinek bibîrxistin dabû çêkirin, vaye "Aliyên we yên wek Ozal" fîlan, bêvan…

ORAL ÇALIŞLAR: Bi rastî jî heye aliyên wek yên wek hev?

---: Ez nizanim, wisa dihate gotin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê baweriya we, mesela hûn wekî Ozal…

---: Ji beşek tarzê tevgera Ozal bi balkêşî dibînim an jî dikarim bêjim ku ez jê bandor bûme. Êdî ew nexweşiyên tên zanîn hene, encamekî wî derxistiye holê yan jî encamekî têkoşîna me ya ku wî daye hizirandine, zêde nizanim. Dixwest bi taktîksiyenekî wekî me.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e cumhuriyeta duwem, mesala niha bi carekî dawî gotin ku, vaye "Apo, bûye cumhuriyetgerê duwem, helbet ji Ozal bandor bûye."

---: Me got, derbazbûna cumhuriyeta duwem dê watedar bibe. Cumhuriyeta yekem xetimiye, jixwe ev nirxandin, nirxandinekî hîn me ji mêj ve kiriye. Nirxandinên me yên ser xilasbûna cumhuriyeta yekem, piştî 1980'an û pêde pir berfireh in. Destûrên herî bihêz ku li hember faşîzmê, ev di pirtûka "Li Hember Faşîzma 12'ê Îlonê, Berxwedana PKK'ê" de hene. Her wiha nirxandina cumhuriyetekî duwem, beriya Ozal xususuyetekî ku me dixwest bikin rojevê de. Berevajî vê tinebûnê her çi qasî têkoşîna me dabe avakirin jî, Ozal jî ev dît, ket nav helwdana pêngavek nû. Min jî bersiveke erênî da vê. Dema ku min bersiv da, hevalekî min ê rojnamevan ku pir baş dinasim, "Bi destê xwe serî jêkir"…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ev tê çi wateyê?

---: Yanê Ozal çû. Mixabin bi rastî jî çû. Tê gotin ku ji nexweşiyê çû, li gor min dewlet wî ji çav derxist an jî cumhuriyeta

yekem wî ji çav derxist. Bêbergiriya (bêtedbîriya) mirina wî di asta herî bilind de bû. Wekî din jî di wê rojê de pir bi rîsk be jî bi rastî jî dixwest di mijara pirsgirêka Kurd de gav bavêje. Ev jî hinek hêzên di nav dewletê de xist nav tirsê. Êdî di vê xalê de çû, dane birin, zêde wateya nîqaşqirina wê nîne. Ozal girêdayî pirsgirêka Kurd, di xalekî krîtîk ya dîrokî de, dê hinek gav bavêtaya, wiha yan jî wisa mir, ev neavêt. Ev meseleyekî cuda ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e niha, dema tê gotin cumhuriyeta duwem, tabloyekî wiha heye; Hûn jî dizanin li Tirkiyê, di pîvaneke zêde de parazvanên cumhuriyeta duwem laderînin (dönek in). Niha jî Abdullah Ocalan wekî Marksîstekî, bi van laderan re cumhuriyeta duwem dihizire, tiştekî çawa ye, pêwîst e mirov vê çawa bide şîrovekirin?

---: Cumhuriyeta duwem ku ez dihizirim, cumhuriyeta duwem ku hinekî bi têkoşînê dê bê damezrandine. Ne cumhuriyetekî ji kapîtalîzma tekedestî (tekelci) ya bingehîn hatî avakirin e, cumhuriyetekî gel giraniya xwe daniye holê ye. Hinekî jî cumhuriyeta duwem, cumhuriyeta gel e.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê niha evên ku cumhuriyeta duwem li Tirkiyê diparêzin, hûn jî dizanin, hîn zêdetir tiştin, vaye wekî fikrên min gotî û hîn zêdetir alîgirên sermeyedarên mezin in…

---: Fereseta wan ya cumhuriyeta duwem, li gor orîjînbûna çînên wan bixwe cuda ne, cumhuriyeta me ya duwem girêdayî gel û hinekî jî bisedema şoreş cumhuriyetê tîne cuda ye. Bi tenê wekhevbûna nav heye. Lê belê cumhuriyeta yekem a statûkoyiyan zêde ne cumhuriyetekî pêşketiye, em wê jî bixin di nav antîkevanê de. Tengbûye, hêmayên jiyanê wundakiriye, êdî cumhuriyetekî aciz dike, êdî ev cumhuriyet ji nexweşiyê, qeyranê wêdetir ti berhemekî wê din nîne. Ji beriya kêliyekê di tasfiyekirina wê de sûd heye.

Erê… Yanê di vê wateyê de tekedestî (tekelci) li gor statûkoyiyan hînek din zêdetir çalakbûnekî dibînin. Lê helbet yê me jî çareseriya gel e, dê ew jî çalakbûnekê bibîne.

ORAL ÇALIŞLAR: Hûn dibêjin ku heman tişt nîne?

---: Helbet ne heman e. Pir vekiriye yanê ji ber ku em hinek sloganên heman bikartînin, bûne heman darezaneke wiha kirin, çewtkirine, bêmafî ye. Bingehê çîna cumhuriyeta duwem, çawaniya (nîtelîk) demokrasî, çareseriya ji pirsgirêka netewî re bîne, heta ku tu bêjî cuda ye û naveroka wê jî dide nîşandan. Ji ber vê yekê wateya gotina laderên (dönekên) cumhuriyeta duwem, tê wateya nêzîkatiya ku pir tenik (sığ).

ORAL ÇALIŞLAR: Ez, tiştên vedanên di raya giştî de dibêjim.

---: Bila raya giştî hinekî jî kûrtir ji reş û spî, safîtî û teredînîtî, aqilsivikî ji hev veqetîne û bihizire, bi vî mantiqê teng hizirîn, dê zêde ji raya giştî re jî sûdê neyne.

ORAL ÇALIŞLAR: Tamam, yanê ez siyasî, em niha hinekî din jî ew biaxivin, Abdullah Ocalanekî takekesî û raya giştî, niha her tiştî pirskirin, her tiştî vegotin, lê belê ez ê hinekî ji aliyekî din ve…

---: Zêde ye, ev raya giştî Apo çawa dinirxînin, yên Tirkan…

ORAL ÇALIŞLAR: Mesala niha nirxandinekî, “Bawerî bi Abdullah Ocalan nayê, vî zilamî got; agirbest, piştî wê çû 33’ê leşker da kuştin, ji bo vê dê ew ê çi bike nediyar e.”

---: Li cîhanê yek mirovê tenê ku bawerî bi gotina wî were, ew jî Abdullah Ocalan e.

Oral Çalışlar: Lê belê ev nirxandina te ya kesî ye…

---: Bi rastî jî wisa ye. Here vê ji dostan re bêje.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ez vê yekê ji bo vê dibêjim…

---: Dijminên min bixwe jî pir baş dizanin ku ez çi qasî durist im. Ger li xwe mûkûr nayên ew meseleyekî dine.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê dema ku ez li vê derê vê pirsê dikim, ez dixwazim tiştekî dinê jî lê zêde bikim, yanê bawerî bi îmaja Apo nayê…

---: Li cihê wê bêjî; "Apo nayê xapandin, nayê lîstikan" tu yê hîn rastir bibêjî. Yanê Apo ne zarok e, bi hêsanî nayê xapandin. Ger di vê cîhanê de bibêjin; "Vaye em xwediyê kevneşopiya polîtîkaya dewletekî pir kevin in, em ê zilamekî wekî Apo li derdorê bikevin, bînin lîstikê", bi rastî jî Apo nayê bawerkirin û bi hêsanî nayê xapandin. Lê belê ger hûn bêjin, daketina bingeha pirsgirêkan, bi rastî jî hinekî di bingehê rêzdayîna niyeta baş, ji onura-şerefa mirov re, hinekî bi girêdayî azadiya xwe, mirov bi vî Apoyî re dikare kar bike, hûn heta dawî dikarin pê bawer bin. Belkî yê di vê cîhanê de herî sadiq, zilamê herî girêdayî sonda xwe, heta temenê dawî dikarin jê bawer bin.

ORAL ÇALIŞLAR: Em ê vê ji nirxandina raya giştî ya ji Tirkan re pêşkêş bikin.

---: Helbet, berdin…

ORAL ÇALIŞLAR: Êdî raya giştî ya Tirkan…

---: Ez amade me, ez amade me. Bila raya giştî ya Tirkan çareseriyekî guncaw ji rumeta mirov re, ji wekheviya wê re, ji

azadiya wê re bipejirîne û bêjin; “Bila Apo li gor vê here”, heke ez yek mîlîmê jî ji rê derketim, bila di derbarê min de raya giştî biryarê bide, ez amade me ku serê xwe dirêj bikim. Yanê ez ji vê zêdertir çi bibêjim. Rûmeta min ya mirovbûnê neperçiqînin, hinekî daxwaza min ya bûyîna gelekî azad bi xirabî pêşwazî nekin. Hûn bixwe darazanekî wiha ev ji bo ejdadê mirov layike pêşbixînin, wekî raya giştî, wekî gel, piştî wê heke ez, wekî min got; bi mîlîmekê jî ji rê derketim, tiştên pêwîst min nekirin, hûn çi dikin bimin bikin! Yanê beriya ku hûn bibin celad û stûyê me bidin, ez dibêjim ku vegotina me bigirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ev 20-25 salin, ez Abdullah Ocalan dişopînim, dinasim jî. Ji dema xwendekariya Fakûlteya Zanistî ya Siyasî ve…

---: Erê, pîşesaziya ji we mayî me dewir girt.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha, dema ku ez şûnde dizivirim û lê dinêrim, “Yahu min ev ev şaşî kirin, hem wek kesî, hem wekî siyasî”, hûn xwe bixwe nirxandinên wiha dikin?

---: Jixwe niha ew rojnamevanên din jî roportajên xwe nivî daxistin kesayetiya min û dixwazin temam bikin…

ORAL ÇALIŞLAR: Ev vê wekî kesayetî napirsim.

---: Çi yanê, yanê “Min şaşî kir, bi poşmanim?”

ORAL ÇALIŞLAR: Ez nabêjim ku hûn poşmanin. Poşman bûyîn tiştekî din cuda ye.

---: Vêca…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê dema ku tu xwe dinirxînî, her

mirov dem bi dem xwe qiyas dike, ji bo her kesî xwezayî ye.

---: Niha, ez şêwazekî bi dijwarî bi xwe re di nav şer de me. Yanê gotinekî min hebû, 'Ez zilamekî zilma herî mezin li xwe dikim', ev tê çi wateyê? Ev tê wateya ku kesê her roj bi şaşiyên xwe re şer dike. Heger hûn bêjin kesekî bi pêşderazên xwe ve eliqî nemîne, bi ecibandina pêşderazên xwe re, her tim kî li hember derdikeve bêjin, ew jî ez im. Xwe neecibandin, her tim ji bo ku xwe bîne xalekî ecivandinê û yê ku her tiştê datîne holê kî ye di vê cîhanê de, ew jî ez im. Li derdora rastiyê dizivirim û digerim, ez li pey mûkemmelbûnê, bi mîsogerî min têkiliya xwe ji objektîfbûnê qut nekiriye.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, hevalên we jî hinekî we rexne dikin? Nabêjine, Serokê min…

---: Mijara rexnekirina hevalên min, li gor rêbazên xwe ne, ecêb rexne dikin. Lê belê çawa rexne dikin? Taybetmendiyên ez pir baş dizanim ku rast in, berevajî wê derbazkirina jiyanê. Ev rexneyekî pir mezin e. "Apo, tu çi bibêjî jî, tu çil carî jî bêjî, rastiyekî me jî heye, em ê jî nebesî, bi kêm û wekî em dixwazin çêbikin" ma ji vê hîn mezintir rexne dibin? Ev desthilat e û ez jî darvenakim û qutnakim, hûn dizanin helwesta min a herî mezin çî ye, hîn mezintirîn xizmetkirin, ji hezar newalî avê tînim û wan îqna dikim. Ji vê hîn mezintirîn demokrasî jî nabe. Rêhevaltî.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha, hûn dizanin di nav rêxistinên sosyalîst de hinek kevneşopî û tişt hene, serokê partiyekî çêdibe û her tim di wê partiyê de jî qala tiştekî wekî navendîbûna demokratîk tê gotin, lê di dawiya pratîkê de ya ku tê pêkanîn navendîbûne, demokrasî nayê pêkanîn. Heta hina yên li cîhanê…

---: Mixabin, li gel me berevajiyê heye, pirsekî pir balkêş e û

ez bersivekî balkêş bidim; ya ku pêşnakeve merkez e, ya ku ecêb pêşdikeve demokrasî û keyfiyet in. Ev çawa dibe? Ez vê hinekî bi demokratbûna xwe ve didim girêdan. Ez vê nû nû fark dikim. Apo, tu zilamekî çawaye ku ev qasî otorîterî ku, ev heval jî dizane, yanê hîn jî merkez çênebûye.

ORAL ÇALIŞLAR: Tu çi dibêjî Cemîl?

---: Hûn ê sibe roportajê bikin. Bila sibe, rewşa navenda me ji we re baxive. Hûn ê hinekî ceribandina we jî heye, bi malbata Doxuyan re, ji bo ku ew bê fêmkirin, ceribandina me heta bê xwestin balkêş e. Min li ser navendîbûnê bi gotinên dahûrandinên di Gulana 1985’an de nirxandin kirin, min ji hezar dolê av anî. Çima em neçarê navendîbûnê ne? Çima em neçarin ku bibin navendekî baş? Qet nehat fêmkirin. Tişta hat kûrkirin ev e: Her kes li gor rastiya xwe, yên dizane dê bike. Ev niha, qey ez dibêjim ev demokrasiye, demokratbûne, qey min jî demokrasiyê gûrkiriye.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê niha hinekî jî hewayekî we ya gazindî heye, yanê wekî min gotî… Hûn vê wekî taybetmendiyekî baş dihizirin?

---: Wekî encamekî demokratîkbûna xwe dinirxînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê wekî taybetmendiyekî baş e? Nexwe…

---: Di rastiyê de helbet wekî min ev xwestiye dibe. Yanê taybetmendiyên kesayitiyan, kesayetan bi demekî dirêj nasnameyên xwe parastin, bi demokratîzmekî bi hêz re gengaz e, nexwe taybetmendiyekî min vê gûrdike ku ew jî vê dijîn. Nexwe ez kesayetiyekî pir hişk, pir navendîbûma, çêbûna van yanê dê negengazbûna. Her wiha despotên li gel we hinekî zêde nedemokrat

in û di navendê de jî pir zêde dibin navendî, hêza wan ya demokrasî nîne. Ji bo ku hêza demokrasî nîne jî rêxistin pêşnakeve. Li gel me berevajiyê wê heye, tevî ku min otoriyek mezintirîn daye avakirin, rexmê hewldanên min ên navendîbûna herî mezin, encax ev bi demokratîzmekî bi hêz bikaribe bibe û nexwestina min ya girêdayîna xwe ji rastiyan qutnekirinê, yanê ji bo ku peşketin hinekî bi xwe jî demokratxwaze, ji bo ku pêşketin bi xwe jî hinekî bi pêşketina demokrasiyê re derbaz dibe, ez jî neçarî aliyê demokrasiyê bingeh digirim, ez bal dikişînim ser nasname û azadiyên kesayetan. Ez ji vê re heta bê xwestin bêjim tolerans, înîsiyatîf bêjim, didim nasîn yan jî girêdayî dimînim. Di encamê de, PKK dibe gelêrî, PKK tê rewşa rêxistinekî heta bê xwestin dibe şerker. Di vê navberê de heta bê xwestin jî otoriyeta min pêş dikeve. Ez wer bawerim ku hinek rastî hene û hatine pêkanîn. Di vê mijarê de gelek waneyên pêwîst in ku hûn derbixin hene.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, hina hûn Serokê şerekî pir dijwar in, yanê li Tirkiyê şerekî girîng dimeşe û hûn qasî ku roj bi roj fermandariya vî şerî kirin jî, yanê li ser rewşê hûn serwer in. Mesala ev ji bo we di jiyana rojane de, bandorên wekî çawa di jiyana we ya rojane de dike, wekî takekesî?

---: Beriya her tiştî giraniyekî fîzîkî ya zêde dide afirandin, ji ber vê yekê hinekî zoriyê dide tendûristiyê, di wateya tişt de…

ORAL ÇALIŞLAR: Di warê asabî…

---: Erê, mesala asabî. Madeya min wekî heyî giran dimîne, lingên min giran dimîne, xew nakim, zêde nefesê nakişînim; encamên wiha hene.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesala di rojekê de hûn çi qasî xew

dikin?

---: Ez xew dikim jî, pêwîst e ji vê re xewa kêvroşkê bê gotin.

ORAL ÇALIŞLAR: Nîv xew dike, nîv hişyar…

---: Dişibe tiştekî wisa, nefesê nagirim, bêhnê qet nagirim, yanê ez wer bawerim ku ev ji lêhûrbûnê pêş dikeve. Ez dikarim bibêjim ku ev encam, jiyana min aniye rewşa nokteyekî. Zêde ji xwarim û vexwarinê tamê jî nagirim. Ez wekî bi piraniya we, wê jiyana civakî ya xwezayî ketina nav tiştekî dişibe wisa pir zorbûye, lê belê ez bêzar jî nabim, ez bi hezkirinekî pir mezin li ser kûrbûme, min di hinek mijaran de qabîliyet qezenckiriye, ez di hinek mijaran de jî ji zarokan lewaztir im.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesala çawa?

---: Mesala yek zarokeke ji min hîn baştir hinek taybetmendiya dikare fêr bibe.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez dihizirim ku qabîliyeta we ya girtinê pir bilind e…

---: Ez dibêjim di hinek mijaran de. Mesala formûla bîrkariyekî ji min hîn baştir dikare çareser bike. Mesala zimanekî çil carî ji min hîn baştir dikare fêr bibe. Di vê mijarê de qabîliyeta min sekiniye.

Oral Çalışlar: Mesala tu dizanî tiştekî tê gotin, “Apo dest bi fêrbûna Kurdî kir”, dibêjin. Kurdî çawa ye?

---: Qet fêr nabim, pir lewaz e, pir lewaz pêşdikeve, yanê di vê mijarê de kesekî ji rêzê, ji min bihêztir e. Hinek danehevên wan

ên zanistî hene, di wê mijarê de hafizaya min wan nagire. Lê belê di hinek cihan de jî helbet ku bihêz e, bi taybetî, xususiyetên ku min di bin kontrolê de girtine, bi taybetî di mijarên mirovî de ez pir bi hêz im, tiştek ji destê min rizgar nabe. Yanê taybetmendiyekî bê destgirtin hebe, heke bitenê derfeta mafê jiyanê bê dayîn, bi mîsogerî ez ê bibim bi encamê.

Oral Çalışlar: Yanê mesela dem bi dem di wê jiyana ku ez dijim de tiştekî heye… Dem bi dem bi wiha “ez herim beravê, yara min li kêleka min hebe, zaroka min hebe, hedar bi hedarî wiha ez di nav huzûrekî de bijîm”, mesela rewşa giyanê…

---:.Lê belê bikarnaynîn. Dîsa pir bi hevalên jin ên bi nirx jî hene. Tîpên ez datînim li beramberî xwe, tîpekî neçare ku pir bi azad be. Tarzê min ê girtina têkiliya wisa ye, ne wekî li Tirkiyê sivik in. Ez di vê mijarê de gelek tişt im, pîvanên min pir bi azad in û nêzîkatiyên li Tirkiyê dijîn, ne li Tirkiyê tenê, li gor min gelekî li jorî pîvanên di qada navnatewî de jî tên jiyîn in, pir li jor in.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela di Komîteya Navendî ya PKK’ê de jin hene?

---: Jin hebe nebe, ev hinekî şekilwariye.

ORAL ÇALIŞLAR: Ne şekilwariye.

---: Lê ya niha ez bêjim ji sedî sihê gerîla jin e, ev jimarekî wekî dêwê.

ORAL ÇALIŞLAR: Rêveberî… Helbet, niha jin dê her tim di nav têkoşînê de cih bigirin. Mesala hûn wê wekî kêmasiyekî napejirînin?

---: Niha rêveberên giştî nine, feraseta me ya rêveberiyê cuda

ye. Niha, carna ez dibêjim kesayetiyên herî nayên revebirin zilam in.

ORAL ÇALIŞLAR: Li gor min jî.

---: Niha, ji bo wê girtina dest ya pirsgirêka jinê pir berfireh e. Belkî we hinek nirxandin xwendin.

ORAL ÇALIŞLAR: Nirxandina we bi Îlkay Dermîr re kirî…

---: Hîn pirtûk hebû…

ORAL ÇALIŞLAR: Dizanim, ez wê jî dizanim.

---: Xwezî we xwendibaya…

ORAL ÇALIŞLAR: Min ‘Hevpeyman’ xwend wekî din ya we bi Yalçın Küçük re kirî. Balkêş e, yanê nêzikatiyên te hîn tiştan…

---: Hinekî qewîtiya lêkolînê ji we re dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Dizanim, min xwend.

---: Ez di van mijaran de pir bi îdîalî me. Analîza min ya jinê taybetmendiyên bingehîn ku min girtine hine.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela, di civîna Komîteya Merkezê de, hizirîna “hevalno di vir de jin nîne, ev kêmasiyeke” ma hûn tînin ziman?

---: Niha ez bi tenê di vê mijarê de…

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela ev kêmasiyeke newisa?

---: Ji bo ku cudahiyê daynim holê, beşekî mezin kadroyên ku cihên ez lê dimînim, ji jinan hildibijêrim. Ev tê çi wateyê?

ORAL ÇALIŞLAR: Ev tiştekî pir bi negirîn e.

---: Na, wateya çi. Wateya Serokatiya Partiyekî bi komeke jin re xebat dayîna meşandin, ji bo civaka me ev gavekî mezintirîn e. Heta nirx dayîn, têkilî nîşandayîn di civaka me de… ku kêm e. Ji bo jinê riya derketinekî wekî dêw e. Di vê mijarê de navend, min gava din jî got, li ser navenda me min her tiştî got.

ORAL ÇALIŞLAR: Her ku ez rastî we hatim ez ê bipirsim, di komîteya we ya navendî de jin heye.

---: Min hîn beriya vê jî, Komîteya Navendî ku tê gotin, ez ê ji te re bêjim komîte bûyerekî cîdî ye? Min got, hawariyên HZ. Îsa hene, min got, xalîfeyên Hz. Muhamed hene, li gor te ew polîtbûrobûn an jî komîteyên navendî?

ORAL ÇALIŞLAR: Polîtbûrobûn.

---: Polîtbûrobûn, erê, baş e di komîteya navendî de kî hebûn.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez wê nizanim. Mesela di damezrandina Îslamê de usulên Şêwirmend ku tê gotin…

---: Ev meclîsa şêwirmendiyê ye. Zêde komîteya navendî nîne. Lê belê bandora Îslamiyetê ev 1400 sale bi zexmbûnek felaket e. Yanê niha ev meseleyên komîteya navendî, polîtbûro bi vê sosyalîzma pêkhatî hişktirîn kir. Ez ji bo wê pir zêde ne dildarê wê me, komîteyek navendî ya sexlam heye ya na? Ez baweriya xwe bi tiştê tînim, yanê otoriteyê tînim, ez baweriya xwe bi qabîliyeta vezaskirina (düzenleme) karan tînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha, min li Yêkîtiya Sowyetan nîqaşek jiyan kir, vaye "Li bijîşkan binêrin jin in, lê belê ne rêveber in."

---: Rêveber be dê çî… ha ji te re mîsyona rêveberiya zilam bide jinê. Ev, nayê wateya ku jin bûye rêveber.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez tevlî dibim.

---: Wateya gotina bûyîna rêvebera jinê, bi giştî dîtina nasnameya xwe ya dîrokî, bi dîtina hêza xwe re, di rastiyê de dewlemendiyekî jinê heye, cîhana wê ya hûndirîn heye, rastiyekî wê heye; heke rêveberiyekî çêbibe, hem derxistina wê zanebûnê, hem ji rêxistinkirinê re, hem bi rastî jî tevlîkirina wê ji jiyanê re bibe, dê wateya wê rêveberiyê hebe. Bibêjin hiş te re, dê Tansu Çîller bibe Serokwezîr, Tirkiye jin wekhev e, tê wateya ku qezenkirinek serdestiya mezin?

ORAL ÇALIŞLAR: Nayê…

---: … Bûyîna serokwezîr, li gor min xwe bi karanînek pir xirab a jinê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Na. Li gor min dîsa jî bûyîna jinêkî serokwezîr gavek e.

---: Zêde nagirim cîdiyetê. Yanê cîdiyetekî jinê…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê bi zilaman re tişt dibe, lê belê ew tiştekî dinêye…

---: Cîdiyeta jinê… Lê binêre, hûn neçar in ku pirsgirêka jinê pir bingehîn bigirin dest. Niha, wateya bûyîna bi jinê re wekhev û azad gotin, nayê wateya ku pir bi dest bistûyê hev de anîne jî. Ez, a niha mesela hûn rewşa min dipirsin, ji bo ku hûn hinekî din baş

têbigihîn, dê sûdbar be, ez bûyera hezkirinê wekî bûyera şerekî digirim dest. Min pir vekola.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesala gotinekî “Aşq anarşîst e” dibêjin heye…

---: Bûyera aşqê, eşk e êdî ji navê wê re çi dibêjin bila bibêjin, wê bûyerê tam hesasiyeta zanistekê…

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê aşq…

---: Yan jî li gor min sipartekên wê hene, zagonên hezkirinê heye. Carna ez dihizirim ku, bi rastî jî li ser jinê hizirîn, jinê bihezkirinê girtina dest pir bi girîng e. Lê carnan jî ez dibêjim ku nîv seatê jî li gel kîjan jin dibe bila bibe nikarim bimînim; ez ê dîn bibim.

Oral Çalışlar: Çima, ji ber çi?

---: Ji hinek şêwazên nêzikatiya wê re, nakirim li ber xwe bidim.

ORAL ÇALIŞLAR: Belkî jî jin nikare ji ber te li ber xwe bide.

---: Vaye ez wê dibêjim, mirov nikare li gel hev bimîne. Lê belê ez jinê digirim. Niha, di mijara jinê de, bi mîsogerî karên mirov bike hene, ez pîvanên hatine dayîn nagirim cîdiyetê, ev vê ji we re bêjim. Pîvanên we yên pevjînê, pîvanên we yên aşqê, bi eşkereyî ez pîvanên we pir sivif dibînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Çima sivif?

---: Ez layîqî xwe nabînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela di mijara jin û zilam de têkiliya hûn hîn kûrtirîn dihizirin çi ye?

---: Dihizirim ku, ez her roj şîroveya wê dikim. Taybetmendiyekî piraniya we jê nizane. Ez di rastiyê de, her kes aşqê, pir takekesî, dikarin wekî hestekî neçarin ku pir taybet bijîn, bidin îzahkirin, di vir de ya min cuda ye, ji bo min wekî pirsgirêkekî afirandina asta jinê ye. Ji bo ku bûyera eşqekî yan jî bûyera hestiyariyekê bê avakirin, pêwîst e alî pir cîdî bin, pir bi hêz bin; yên ku ne bihêz bin nikarin aşik bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, hûn aşik in?

---: Bûyîna aşikbûn, bûyereke pir bihêz e. Min her tim bi eşkere di tahlîlên xwe de da diyarkirin. Min got, di nav we de jinekî bikaribe bi min re hêzê bide jiyanê heye.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê, lê binêre ev, hinekî kêm jî be xwe di jor de dîtine, ji ber ku tu xwe li jora jinê dibînî…

---: Helbet tabî, ez ê xwe jor de bibînim. Ez ê çawa bi jinekî bûdela re aşqê bikaribim bijîm?

ORAL ÇALIŞLAR: Na, ne bi bûdela re, jinekî bi zekî re…

---: Bila derkeve ya jixwe bawer, ez ji we re dibêjim, ev bange jî ji Tirkiyê re; jina ku jixwe bawer, bila were aşqê bi min re bixwaze ava bike. Înşalah ez ê sibê ji wê tişta Hûriyetê re jî bibêjim.

ORAL ÇALIŞLAR: Ya ku ez dibêjim ne ew e.

---: Niha pirsgirêk ew qasî ne sivik e. Yanê Apo di vê mijarê

de ne zilamekî wisaye ku bi hêsanî xwe bide xapandin. Analîzên ku di vê mijarê de, ne analîzên ji rêzê û filan û bêvan in.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê ev tev bersivên giştî ne.

---: Ne bersivên giştî ne. Ez a niha bi kîjan jin be jî dikarim pê re xew bikim, heke hûn pir zore li min bikim, wekî ez dixwazim, awayê ez dixwazim dikarim pê re xew bikim jî, ev ne çareseriyekî cîdî ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Na…

---: Tabî, ne çareseriyekî cîdî ye. Yanê ji bo ku ev jî çê bû pêwîst e mirov qiyametê raneke. Em neçarin ku hinekî jinê hîn bi tarzê berzkirinê qezenc bikin. Ev jin, bi rastî bi cîdî hatiye çewisandin, hatiye parçe parçekirin, pir lewaz hatiye hiştin, heqaret lê hatiye kirin. Em dixwazin vê bidin derbazkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ev rast in, rastiyên giştî ne.

---: Rastiyên giştî ne lê belê pêdiviyên vê çi qasî tînin cih? Aşq, bi jina kole re nayê kirin, girêdanên hezkirinê bi jina kole re nayêne pêşxistin.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha “Jina şer dike, jina azad e.” Niha hûn fermandarê şerekî ne, wî demî hûn di nav jinên kole de ne.

---: Ez jî ji ber ku baldariyek bilind ji hezkirin û hestiyariyê re didim nîşandan, min karî bûyera jina şer dike derbixim holê. Ma ev nade nîşandan ku ez yekî çi qasî hestiyar im? Qet yek gerîlavan, qet yek şoreşgerî karî vaqas gerîlayên jin tevlî bike?

ORAL ÇALIŞLAR: Nîha ev tiştekî cuda ye, niha ev vî karî

çareser nake.

---: Diyare ku çareser nake, lê belê ev hezkirinekî, baldariyekî tîne ziman. Ez ew qasî di vê mijarê de berfireh, bi rûmet û dildar, bilind nêz dibim ku, jinekî giyanê min dixwaze ku derfetên min pir fireh in, ez wekî takekesî bi diltêrbûna xwe ji nişka ve çareser bikim, ma di bin vî karî de nabe ku ez derbikevim, bala xwe bidinê, ez berê xwe nadim vê.

ORAL ÇALIŞLAR: Ev, di dema pêxemberan de heye. Min tiştekî din pirsî. Min takekesî, helbet tu rêveberî, desthilatdariya te heye, hêza te heye, helbet dibe ku gelek jinên aşikî te bibin derbikevin.

---: Ne gengaz e, kes nikare ji vê re wêrekiyê bike.

ORAL ÇALIŞLAR: Nexwe di wî demê de, kêmaniya we heye. Pêwîst e ku zilamekî bikaribe evîndarî jinekî bibe.

---: Min xwe pêşkêşî holê kiriye jî, lê kesek nikare wêrekiyê bike. Mesela ji bo Atatûrk, hinek bi wan fêlan, ketin nav wan dildariyan. Hevala min a jin ya herî bijare jî di vê mijarê de bê rêzî ji min re nake. Girêdayînekî mezin ya wan heye, rêzdayînekî mezin ya wan heye, hezkirinekî mezin ya wan heye. Yanê sekneke pir bi terbiyeyî, pir di cih de ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê mesela nikare ji te re bêje: “Ez evîndarê te me”? Ma jinek nikare aşiqî te bibe?

---: Niha, destûrên aşqê ango evîndariyê li gel me hene. Yanê wisa bi awayên li Tirkiyê tên dîtin tu kesek nikare aşiq nabe.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, mesela jinek were bêje ku, Abdullah

Ocalan, ez aşiqî te me, ez ji te hez dikim.”

---: Ew pir baş dizane ku, vê gotinê ji Apo re gotin, qabîliyetekî mezin dixwaze.

ORAL ÇALIŞLAR: Ma tine keseke di wê qabîliyetê de?

---: Bila bêje, ez qet xwe nadim paş, ez ê zûtirîn rewşên xwe bispêrim ji wê re. Ez ê bêjim, abeceya hezkirina min wiha dest pê dike. Ger dewam bike, ez ê ji wê jinê re bêjim her bijî.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesala abeceya wê çî ye?

---: Ez ê rêz bidim, bila jinek were, ez ê rêz bidim. Bila li ber xwe bide, bila komployê bi min neke yan jî min…

Oral Çalışlar: Çima jin komployê bike?

---: Na, yanê ez dibêjim bila entrîka, arîşetiyê neke, bi wê re wekî ew dixwaze bibim.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, ma jineke arîşetiyê neke nîne? Çi dixwazî zilam be, çi dixwazî jin be, mirovê hez dike bi eşqê re bi hev ve bên girêdan, ne ji bo arîşetiyê, ji bo hezkirinê ji hev hez dikin.

---: Ez ê bêjim her bijî. Jinekî wisa derbikeve, bi min re bikaribe tiştan bike, her bijî ji wê re…

ORAL ÇALIŞLAR: Ma hûn rastî jinekî wiha bi wêrek nehati ne?

---: Digerim, yanê di wateya tişt de, ez ne ketiyê jinekê me,

wekî min gotî, ez…

ORAL ÇALIŞLAR: Ev ne ketîbûneke…

---: Rast e, ew jî ne peyveke di cih de ye, yanê tam berevajî jî, ez nirx didi mê. Lê belê bi rastî di vê mijarê de pîvan hene, ez hinekî dixwazim bi dildariyê bidim girêdan. Bi mîsogerî jinê…

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê aşq… Lê binê re baweriyekî min jî ev e, pîvanên aşqê nabe. Aşq, aşq e.

---: Na ez nikarim tevlî wê bibim. Bi jinekî kole re…

ORAL ÇALIŞLAR: Na, giyanê min ne kole, ez ne di wateya kole de dibêjim.

---: Na, na. Yên ku kêmasiyên cidî yên takekesî heyî re, ez yek saniyê jî nikarim bi wan re bijîm, ez ê dîn bibim yanê.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê, em niha bibêjin ku, tu di vîr de her tim bi tîpa jineke neyînî xêz dikî.

---: Ez ji te re taybetmendiyekî xwe ya din bînim bîra te, mesela têkiliyekî piraniya we bi hêsanî pêywendiya pêjnê dikişîne, têkiliya cînsel jî di nav vê de, ez carnan matmayî dimînim, yanê ez dibêjim ku ev çawa wisa dibe.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê …, tu yê bi giştî jiyana xwe ezêb bimînî, bê eşq bimînî.

---: Na, Dîsa di vê mijarê de mirovê ku qasî min bi dildarî nîne.

ORAL ÇALIŞLAR: Ma heye dildariyekî te? Mesela niha

yek…

---: Helbet dildariya min heye. Ez nirxekî pir mezin didim ji cewherê azadiya jinê.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê dîsa jî ew tiştekî xeyalî ye.

---: Na, ne xeyalî ye. Hewldana azadkirinê dildariyek pir mezin dide afirandin. Qasî ku bi azadkirina jinekê bûyera hezkirinê pêşdikeve. Ev ji bo min pir girîng e. Ev ji bo min ji zilam jî girîntir e.

ORAL ÇALIŞLAR: We bersiva pirsa di serê min de neda.

---: Tu ti carî wê bersivê nabînî. Li gorî pîvanên Tirkiyê, nehesibîne ku tê ji min bersivê bibînî.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez li gorî pîvanên Tirkiyê lê narênim. Me, qet qala pîvanên li Tirkiyê nekir.

---: Yekî jixwe bawer bila derbikeve were himberî min.

ORAL ÇALIŞLAR: Em bêjin ku ew jin wêrekiyê nake, am ti wêrekiyê nakin? Em bêjin ku te jinekî xweşik dît, hestiyarî bûyî, te hîskir ku tu dibêjî ev tam li gor min e, wêrek e, azad e, xwedî nasname ye…

---: Ez wê nakim. Ez wê ecêb (müthiş) dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez hina aşiqî yekê bibim, ez ê aşqa xwe ragihînimê.

---: Ez ji we re bêjim, ew giştî jinên ku we pevjîn kirine, ji berdana van pevjînan bigire, heta li ser bingehê azadiya nû, bi

hevgirtinekî bi her awayî re girêdayî me.

ORAL ÇALIŞLAR: Ev, kesek di têkiliya jin û zilam de… avê lê nake.

---: Em gav bi gav nêzî Tirkiyê bibin, ji wan mejiyan re, ger min keç û jinên wan paşayan ji destê wan negirt û min ew nexistin bi awayên yekbûyînekî cuda re, bila ji min re jî nebêjin Apo. Ez çi bêjim, wekî din tu dixwazî ez çi bêjim?

ORAL ÇALIŞLAR: Niha ne ku ez tiştekî dixwazim. Em nîqaş bikin.

---: Beşeke mezin ê pevjînan sextekariye. Beşekî mezin ê eşqan sextekariye, xapandine û bi taybet jî dijberî jina ne. Dirû ye. Ez ê wan bigirim ber topan.

ORAL ÇALIŞLAR: Me bawerî pê aniye, me bawerî pê aniye.

---: Ez bawerim ku dikarim bi zagonên nû, bi rêgezên nû van karan bixim di riya wê de.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha binêre, ev awayekî teorîk e, yanê…

---: Ger pirsgirêk di asta teorîk de be, ez çi bikim? Hûn çawa ji min pratîkê dikarin bixwazin? Hûn baweriya xwe bi teoriyê tînin?

ORAL ÇALIŞLAR: Pê bawer im.

---: Hûn pê bawer in. Hûn ji bo çareserkirina pirsgirêkekê girîngiya xebatên teorîk pir baş têdigihîjin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez dipejirînim. Ez niha…

---: Rast e, ez jî di mijara jinê de di astekî girîng de teorîk dimînim. Ez ji hinek hevalan re wiha dibêjim, "Rewşa min daye temamkirin, em di vê pêvajoyê de, belkî peyv hinekî jî li Tirkiyê baş nayê fêmkirin, dikare flortê bike." Hûn dizanin li gor pîvanên filortê, em bi hev re bin. Bi hev re bûyîn, yanê…

ORAL ÇALIŞLAR: Flortkirin, bi hev re bûyîn.

---: Yanê bi dostanî, di nav tişta nêzîk de bûyîn, yanê nîqaşqirin. Ev ji vê re bêjim nasîn, nebêjim flort jî, şaş tê fêmkirin. Min got; "Em dikarin di asta nasînê de bin." Jinê, tu kî yî? Li kûr bûyî? Tu çi dixwazî? Mirov bi we re çi dikare bike? Tîpîk… hevalan, em encax bi hev re di nav rewşa nasînê de bin.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê ev rewşekî exlaqî ye, yanê ya niha ev tişta te gotî tiştekî exlaqî ye.

---: Lêkolîn dikim, rastiya wê çi ye? Ma dibe, teoriye, giştî li aboriyê, civakî, çandî, dîsa çerçoveya wê ya dîrokî, dîsa di nav civaka rojeva de, bi taybetî ji ber sedemên wê ya di nav malbatê de pir baş lêkolîn dikim û encam jî digirim, ez dikarim bêjim ku ji bo jinê çareseriyekî herî baş em ber bi nêzîkbûna xweserbûna wê ve diçin.

ORAL ÇALIŞLAR: Çî ye, ji bo jinê çareserî çî ye? Ji bo jinê azadî…

---: Çareserî ne ev e, "me pir li hev kir, em pir li hev hatin, em hevûdu pir ecêb hez dikin" ji bo min wiha nayê çareserkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê nabe, wiha bû yanê ev kar.

---: Ji bo min di navbera şer û bi hev şabûnê pir hindik cudahî heye.

ORAL ÇALIŞLAR: Rast e, ez tevlî vê dibim, di şer de jî yek…

---: Ji bo hevûdinbûnê jî wî demê nîne lê belê.

ORAL ÇALIŞLAR: Helbet, helbet loma yê min jî wekî kesekî, bihizirin yanê niha tişta tê gotin aşq…

---: Ev encamekî ya felsefeya min e jî, yanê ez bi çêkerê re jî wiha me, hem pir nirx didimê, hem jî pir şer dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Jixwe aşq şerek e, yanê mirovan pevçûnekî bi hev û din re li beramberî hev ve…

---: Jinekî Alman ji bo min ev tişt got; “Tu vî karî bi eşqê didî mezinkirin”.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew tişketî dinê ye, ev girîngiyekî…

---: Na, karê bi dildariyê re ye…

ORAL ÇALIŞLAR: Tu di wateya himbêzkirina karê de dibêjî.

---: Helbet, yanê rast e. Her kes di vê mijarê de bi teorî fêm dike, wekî we dibêje, pir zêde pratîka wê danaynî holê, ez ji hevalên xwe re dibêjim, hûn serbest in, baş e jin li çiya ne û her tim bi hev re ne, dê we ji şer bigirin, dê we ji erkên şoreşgerî bigirin, hûn xwe nexin nav têkiliyên teslîmbûnekî bê rûmet, ji derveyî vê dê girêdanên herî mezin ku hûn bidin pêşxistin û ji eşqan re ez ê çepkan

bixim.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê em bêjin ku, mesela…

---: Ez hîn dikarim çi bikim?

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela em bêjin ku yek gerîla, jin yan jî zilam bi hev re bûn. Lewre piştre jin yan jî zilam yekî din cuda eciband û bi yekî cuda re bû yek, mesela ev yek…

---: Pîvanên vê ev e; li gorî min, dildariya erkê, armancên partiyê, dildariya welat.

ORAL ÇALIŞLAR: Qet ne ji derveyî yek ji wan e jî. Yanê jinekî şervan…

---: Ger xizmet ji serkeftinê re bibe, baş be, bila wekî dixwaze bike, ez ne mirovekî biçûk im bihesidim. Ew pevjîna min bixwe be jî, wisa bike, ez dîsa jî nahesidim beyefendî. Yanê min ev jî di analîzên xwe de anîn ziman. Ez bê serkeftin im, bila here jî, bila yê ku diecibîne bibîne. Li gel vê, ez jî mirovekî bihêz im, ger ez bitenê wisa xwe bispêrim hêza xwe, otorîteya xwe û kesekî li gel xwe digirim, wî demê ez nemerd bixwe me. Ger taybetmendiyên min nerakêşer bin, ez yek saniyê jî jinekê li gel xwe nagirim. Ez xwe bispêrim pereyên xwe, xwe bispêrim hêza xwe û jinekê li gel xwe girtin bê exlaqî bixwe ye. Di nav civaka me de ji van kesayetan dagirtiye, qirêj dibînim. Ez ji vê jinê re jî, ji vî zilamî re jî dibêjim mixabin. Dê ez ê nebim ew, ez ê xweşik bimînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Tamam rast e.

---: Ez ê xweşik bimînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê binêre, ev nayê wateya bê eşqbûn û

bê eşqbûniyê.

---: Tamam ez tê digihîjim. Ez neyekî bê eşq im.

ORAL ÇALIŞLAR: Min ne di wateya tu bê eşqî de, ne got ku.

---: Ê min di vê mijarê de pîvanên min ên exlaqî mezin hene. Ger hûn nizanin ji nîqaşan re bidin vekirin. Wisa ji bo cînseltiyê jî, yanê hem bi hêz im, hem bi pîvan im, hem jî desthilat im. Di vê mijarê de ez mirovekî heta bê xwestin min xwe perwerde kiriye. Ji bo aliyê beramber pêşbikeve ez bi giştî hêza xwe ve kedê didim. Zanista bilind a jinê jî heye, yanê wisa dildariya jinan mezin e. Ez jî rêzdar im ji rastiya wan re. Di vê mijarê de zêde tiştek bêjim nîne, giliyên min yan jî pirsgirêkên min yên ku neyên çareserkirin nîne. Dildariya min hîn zêdetir, xweşikbûna cînsiyeta jinê derxistina wê ya holê ye. Jin li gorî min, di rastiyê de pêwîst e hebûnekî bê dewlemendkirine, pir hatiye feqîrkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ne hîn zêde jin, zilam jî.

---: Lê hîn zêdetir ji bo jinê wiha ye. Rast e ji bo zilam jî derbazdar e. Pêwîst e em jinê bidin hêzkirin. Di rastiyê de pêwîst e asta jin bê girtin, gelek ji wê paşdetir e. Bi mîsogerî, fîzîka jinê, giyana jinê, mejiyê jinê bê pêşxistin, dê jiyan pir dewlemend bibe. Bi rastî jî dê jiyan bibe nirxê jiyankirinê.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê binêre, dema niha wiha tê bihîstin, mesela ez dîsa dihizirim ku, yanê dîsa dihizirim ku dê zilam jinê bide pêşxistin.

---: Na, na.

ORAL ÇALIŞLAR: Carnan jî zayenda jinê zilam bide

pêrwerdekirin û bide pêşxistin…

---: Hewldanên min ê di vê mijarê de…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hina îdîayekî yên femînîstan heye, dibêjin ku; “Cîhana desthilatdariya zilaman, cîhana jinê tarûmar kir û zilam bixwe jî tarûmar kir.”

---: Rastin hene, di hizir de jî rastin hene. Tarûmarkirina cîhana jinê, tarûmarkirina cîhana zilam e jî. Yan jî razberkirina jiyana jinê, jiyan bi tevayî neyînî pir hatiye bandorkirin, lê belê çareserkirina vê pirsgirêkê, ne bitenê pirsgirêka jinê filan,bêvan bixwe ye jî. Pirsgirêk hîn zêdetir pirsgirêka zilam e. Ji ber vê sedemê, ger bixwazin li Tirkiyê tiştekî li pêş bê kirin, li şûna çareseriya ku her kes wisa vî karî bê serûber, nizanim bi fesadiyên eşqê re, nizanim bi nêzîkbûna hev re bê kirin, pêwîst e kesayet ji hev re bi rêzdarî nêzîk hev bibin. Aşq, ne mafê herkesî ye, her kes nikare aşqê bijî, aşq karê fazîletê ye, aşq karê bilindbûnê ye, aşq karê mezinbûnê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, dema tu ev qasî razber dikî ji çi re…

---: Bi mîsogerî razber nakim. Aşq karê hewldanê ye, karê kedê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Karê kedê ye, rast e.

---: Niha zilam, nizanim ji kîjan derê pere ketiye bêrîka wî, dikeviyê diçe jina herî xweşik distîne. Ji destê min were, herim wan jinan ji destê wan bigirim. Înşallah dê rojekê derfet bikeve destê min, wî demê hûn Apo bibînin. Na na, yanê hûn dihesibînin ku, “Ev zilam bitenê bi polîtîkayê re xerîk dibe” nizanim, “estetîkê nizane,

xweşikbûnê nizane.”

ORAL ÇALIŞLAR: Na, na. Di encamê de tu jî mirovekî.

---: Na ez dildarim û xwediyê hêzê me. Ev, pir balkêş e, dema ez di civata jin û zilamekî de rûdinim, karê destpêkê tê hişê jinan berdana zilamên xwe tê. Ev taybetmendiyekî ya min e yanê.

Oral Çalışlar: Wî demî em li vê derê bikevin nîqaşa teoriyekî din. Ez tiştê dixwazim bêjim; niha di cîhanê de pirsgirêka azadiyekî ya homoseksuelan heye, dibêjin ku, “Em daxwaziyekî wiha dikin û ev daxwazî jî di bin çewisandinê de tê girtin.”

---: Na, ew çewtbûniyeke, nexweşiyek e. Bi mîsogerî nexweşiyek e.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, homoseksuel dibêjin; “Na, ev nirxekî kevneşopiyê ye.”

---: Na, na.

ORAL ÇALIŞLAR: Dibêjin; “Ez bixwe daxwaziya cînseltiya xwe çawa bixwazim ez bixwe dê biryar bidim. Bila kes xwe têkilî vê neke” dibêjin.

---: Ez di vê mijarê de, nabêjim ku em wan îmha bikin, lê belê…

ORAL ÇALIŞLAR: Ma mesela homoseksuelekî gerîla dibe ku hebe?

---: Zorkirina rastiyên heyî tê kirin. Tedavîkirina van mirovan ya herî rastir e.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez tevlî vê nabim, yanê wan wekî nexweşiyekî dîtin ne rast e. Ev daxwaziya cînseltiyê ye. Ma ye ku tu dipejirînî, napejirînî, munasib dikî, lê belê…

---: Qasî ku ji destê me bê pêwîst e em vê daxwazê bi sînor bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê di van kevneşopiyên olî de tişt heye, vaye "Pêwîst e mirov wan bavêje agir, bê şûştin û bê paqijkirin. Ev mîkrobekî ye" tiştekî di vî awayî de heye. Ev di nirxên kevneşopiyên me de jî wisa ye.

---: Li gor min, pêşgiriyên exlaqî bes in. Wisa bi pêşgiriyên sezayî…

ORAL ÇALIŞLAR: Pêşgiriyên exlaqî çî ne?... "Na, birayê min, ez wisa dixwazim. Ez dixwazim bi zelamîkî re bim. Ew te têkildar nake" dibêje.

---: Pêwîst e mirov pîvanan zêde zor neke.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ev, ji ber ku di cîhanê de pirsgirêkekî girîng e dipirsim. Yanê ez vê pirsê ji te re wekî pirsekî takekesî nabêjim. Îro li cîhanê mijara nîqaşan yek carê ev e.

---: Li gorî min, ya ku pêwîst e bê sînorkirin, heke ev qasî hatibe rewşa pirsgirêkê jî, çavkaniya xwe ji mezinbûna pirsgirêkên civakî tê. Li Amerîkayê ev qasî bi berfireh e, dîsa ev çavkaniya xwe civaka Amerîka çi qasî bi mirovahiyê dilîze digire. Heke li cihekî, di pêvajoyekî li Romayê şêtiyek (dînbûnek) wiha pêş ket. Pîvanekî dejenerebûna civaka Romayê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Loma mesela, di cîhanê de her dîktator berî her tiştî êrîşî çepgiran û piştre jî homoseksuelan dikin. Vaye

dîktatoriya Hîtler, hûn dizanin hedefên wî yên îmhayê yên herî girîng Yahûdî, çepgir û homoseksuel bûn.

---: Lewre di heman demê de mirovên dîktatoryal mirovan tînîn vê rewşê.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew pirsgirêkekî cuda ye, loma mesela di tiştê de…

---: Yanê pergalên faşîzanî zilaman heta bê xwestin tînîn nêzîkî rewşa jinan.

ORAL ÇALIŞLAR: Li Tirkiyê polîs çi dike? Porên homoseksuelan jê dikin, çewisandinê pêk tînin. Di nav civaka Tirkan de beşa herî zêde çewisandinê dibîne homoseksuel in.

---: Wekî min gotî pîvana rizandina civakê pirtirînê xwe van pirsgirêkan derdixîne holê û berfireh dike. Bi pêşketina civakên bitendurist re dê van pirsgirêkan çareser bike. Em, van wekî pirsgirêkên azadiyê girtina dest wêdetir, pêwîst e bibin pirsgirêkên bi kûrbûna pêvajoya rizgariya civakê re bikevin rêya çareseriyê.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê mesela hûn dibêjin, di civakekî wekhev, azad de homoseksuelî çê nabe?

---: Zayend, zayendên hember hev û din temam dikin. Ya ku rast e jî ev e.

ORAL ÇALIŞLAR: Em jî wisa dihizirin lê, niha zilam jî dibêje ku, “Min ev daxwaz kir” dibêje.

---: Na, ew ensakrît e û…

ORAL ÇALIŞLAR: Dibe. Dê di nav civakê de her tim

mirovên ensakrît hebin.

---: Yên ku ensakrît in, rêgeza giştî xira nakin. Yên ku giştî dijîn jî ensakrîtiyê ne hewceye bînin rewşa rêgezekî.

ORAL ÇALIŞLAR: Ma mafê hindikayiyan jî nînin? Yanê ew jî di civakek hîndikayî de.

---: Hindikayiyên xwezayî hene.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew jî hindikayiyek xwezayî ye.

---: Ger hindikayiyek xwezayî bin, dê wekî hindikayî bimînin. Ji bo xeteriyê nedin giştibîbûnê bixwe jî her wiha pêwîstiyek demokrasiyê ye. Tu tişta ji bo hindikayiyekê dihizirî, bi hizirîna ji bo tevayî giştîbûnekê re nikarî qiyas bikî.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê niha di vê derê de digihîje vê encamê, jixwe her dem piranî desthilatî li hindikayiyan dike.

---: Na, dema ku dibe demokrasî, her wiha nirxên hindikayî dijîn, wekî nirxên demokrasiyê, nirxên beriya her tiştî mirov jê re rêzdar be. Nirxên piranî dîjin, ên hindikayî jî jê re rêz bidin, pêwîstiyek demokrasiyê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam. Dibe ku tu wê daxwazê dikî, Ez jî vê daxwazê dikim…

---: Niha di vir de pîvanek heye, demokrasî çî ye? Vîna piraniya ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Hindikayiyekî vîna piraniyan negire baldariyê, … mirov dikare qala çewtkirina bikaranînê bike.

ORAL ÇALIŞLAR: Evê vegere çî, wî demî dê vegere vê, ji derveyî darazên nirxên piraniyan, ti kesek nikare ti tiştekî bike, tê vê rewşê.

---: Tu ti tiştekî di mijara darazên nirxên piraniyan de bikî.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, temam. Dibêje ku, zilam “birayê min tu daxwaziyekî wiha ya zayendiyekî dikî, vaye tu têkiliya wekî daxwaza zayendî ya jin û zilam dipejirînî, ez jî daxwaza têkiliya jin bi jinê re, zilam bi zilam re dipejirînim. Ev jî mafê min e. Tu jî nikarî destekariya vê bikî. Ev jî mafê hindikayiyekî ye.” Em ê çi bikin?

---: Çi li xwezayê, li cîhana zindiyan, li şînkayê, li cîhana tebayan bûyerên wiha pir hindik in.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê mirov hebûna herî pêşketiye yanê.

---: Hebûna herî pêşketiye, heta niha nifşê mirov ê aniye vê rewşê, pêşketina asta têkiliya beramber a zayenda ye. Rêgezekî bingehîn a hebûna mirov dike mirov ev e. Mirov vî rêgeza bingehîn xira nake. Fantezî dibe, wekî demagojî tişt dike.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez wek kes bixwe demagojî napejirînim, yanê tu dikarî bêjî; “Daxwaza tu dikî ez rast nabînim”, himber derbikevî, ez jî li himber derbikevim, dikarim beramber nîqaş bikim. Loma dê mirov bêje ku, “Ev daxwaziya min a zayendiyekî ye. Vê daxwaza min a zayendiyê…”

---: Xweşikbûn çi fermanê dide, xwezayîbûn çi ferman dide, tenduristîbûn çi ferman dike, dê ew bê kirin. Mirov venagerîne nexweşiyê.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê niha li cîhanê gelek mirovên navdar, felsefevanên pir girîng, hizirvan homoseksuel in…

---: Ew cîhanekî çawaye em ji wan bipirsin.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha Sokrat, homoseksuelekî girîng e. Niha kes nikare bêje ku Sokrat…

---: Di wê mijarê de min pir zêde nîqaş nekiriye. Bi tiştên wisan re zêde naxwazim aqlê xwe jî pê xira bikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê binêre, ev jî parçeyekî ji têkoşîna azadiyê ye. Dê ev pirs were rojeva we.

---: Ger tu dixwazî ez vê pirsgirêka azadiyê zêde nexim rojevê.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam. Yanê ez vê ji eniya we re wekî pirsekî…

---: Bawerim vî Clintonî jî li artêşê bi raya giştî re tişt kir. Piştre gav paş de avêt. Vaye çû. Bi vê lezê here, dê karên baş jî neke.

ORAL ÇALIŞLAR: …

---: Em nebêjin meseleya oportunîzm, radîkalîzm e rojevê jî zêde bi pirsgirêkên sunî re ji asta wê nexînin. Ev hinekî girîng e.

ORAL ÇALIŞLAR: Jixwe min ev wekî hizirvanekî ji te pirskirin. Rojev, wekî rêberekî siyasî, wekî şervanekî ew tiştekî dinê ye…

---: Ez bi mirî dibînim. Mesela ez ji bilindkirina jinê, dîsa ji bilindkirina zilam re heme. Bila zilam bi hişmet be, jin bi hişmet be,

bila têkilî pir bi rûmetgiran be. Têkilî, bila bi cîhbûna di asta hinavan de be. Bila em di vê mijarê de di ziraviya hûnermendekî de bin. Ez ji vê re heme. Ez ji niha ve vê bes dibînim. Ez vê biserbixim, ez ji xwe re bêjim her bijî. Ji tiştên din re wekî takekes naxwazim zêde têkildariyê bidimê. Di vê mijarê de rojevê digirim. Ev tişt hat fêmkirin, ya girîng ew e ku di mijara jinê de rewşekî cuda dijîm, bawer im di vê mijarê de di demê pêş de hîn zêdetir hêza analîzê bibînim…

ORAL ÇALIŞLAR: Em herin tiştê, qada têkildariya şirîk ku çavkaniya wê Îslamiyetê.

---: Rast e, bi balkêşî li wê lêkolînên we xwend jî hinekî. Hûn çalekiya Îmamê Alî yan jî feraseta wî di bingehê çînayetî de hinekî şirîkin bi vî şêwazî hûn dinirxînin?

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ez wekî rêberekî Îslamiyekî artêşvan dibînim, lê belê…

---: Yan jî harîciyan…

ORAL ÇALIŞLAR: Helbet, hîn radîkal in û hîn tişt…

---: Ked, xwe dispêrin beşên feqîr.

ORAL ÇALIŞLAR: Wekhevîxwaz in, lêgerîna pêreyî…

---: Muawiyê jî beşa arîstokrat…

ORAL ÇALIŞLAR: Erê, yanê bîrdoziya civaka Îslamê ya dewletger…

---: Ma we hinekî ji nêz ve kesayetiya Îmamê Alî lêkolîn kir?

ORAL ÇALIŞLAR: Min, pêvajoya dîrokî lêkolîn kir. Yanê civaka Alewî yanê mijara lêkolînekî cuda ye. Meseleya civaka Alewî ya li Tirkiyê dijîn lêkolînkirin, ew cuda ye. Ma hûn ji koka Şafiî ne?

---: Min ji mêj ve koka olî, koka mezhebî derbaz kiriye.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez dizanim we derbaz kiriye…

---: Ez pir nêzîkî Îmamê Alî me.

ORAL ÇALIŞLAR: We di zarokatiya xwe de mêldarî ji ol re da nîşandan?

---: Helbet feraseta min a kesî hebû. Min xwe bixwe perwerde dikir, min dua ji ber kiribûn, min nimêj da kirin, helbet min xwest ez bibim Misilmanekî baş.

ORAL ÇALIŞLAR: Di paşeroja Cemîl Bayik de ezmûnekî wî ya balkêş heye.

---: Nizanim. Lê em hinekî Îslamiyetê di wê xalê de nîqaş bikin. Ew zaravayê Kemalîst ê li Tirkiyê ew qas wan pirsgirêkan bi çavên hesp dinirxînin ku, bi rastî jî nêzîkatiyekî bi tendurist ji dîrokê re, nêzîkatiyek ji civakê re nayê serxistin. Niha laîktiyek hat vedîtin, ji Rojavayê kopî kirin. Kesek jî ti tiştek fêm nekir. “Rûyê xwe veke”, nizanim, “çi ji ku dera xwe re bike” wiha hat nirxandin. Ên din jî “em li hember laîktiyê ne, em ê çarikê bînin, yanê çarik şerîat e, bang xwendin şerîat e” gotin. Niha di rastiyê de ne wî yên dike fêm nekir, ne jî aliyê din tiştên ku dike fêm kirin. Ev jî li Tirkiyeyê seriyekî tam xistiye nav tevlîheviyê. Ne yên li dijî Misilmantiyê nekarin çi qasî dijberin ku daynîn holê, ne jî yên Misilmantiyê diparêzin nekarin fêm bikin ku çi qasî diparêzin. Hîn jî ez ji we re

bêjim; ev Misilmanên li Tirkiyeyê ez wan Misilman fîlan bêvan nabînim, ez wan gruban wekî ukala (ê di her tiştî de zana dihesibîne), serserî dinirxînim. Laîktiyan jî wisa ên Îslamê tê digihîjin, nizanim di vê mijarê de wekî kesayetiyên demokratin nanirxînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Tu çi ji qedexekirina çarikê re dibêjin?

---: Ev gişt ji bo min beredayî ne. Li xwe kirina çarikê ne fazîlet e, derxistin jî ne fazîlet e.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê qedexe ye?

---: Wiha qedexe medexe nabin. Ger em qala fazîlet, azadiya kesan dikin, nizanim ne bi tenê çarikê, pêwîst e her tiştê xwe bide pêşxistin. Ez, ji bo jinekê çi digerim tu dizanî? Li mezinbûna giyanê digerim, li xweşikbûna fîzîkê digerim, li hêza fikirandinê digerim û cil û bergên pir lê werin, lê digerim. Ez wiha ji bo jinê şer dikim. "Çarik heye nîne?" Tu çawa dikarî nîqaşên ev qasî biçûk, ev qasî bê pîvan bidî kirin? Ma ez şêt im, ez bikevin nîqaşek wiha? Nakevim yanê. Ez bê pîvan dibînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Hûn dibêjin nîqaşekî bê wateye.

---: Helbet.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e ev Hîzbullah, hûn dizanin li Tirkiyê wekî pirsgirêkekî girîng derket li Başurê rojhilat. Vaye gotin Hîzbulkontra, gotin gurê dewletê. Herî dawî gotin; PKK'ê bi Hîzbullah re hevdîtin çêkir û bi beramberî lihevkirin." Rastiya vî karî çî ye?

---: Niha, bi birayên xwe yên Hîzbullah re em hinekî hev dibînin. Ez carna dixwazim dibêjim, ez ê van dawetî îmanê bikim.

Ez wer bawerim ku van em ê di demê pêş de Xudê jî şîrove bikin, em ê îmanê şîrove bikin. Pêwîst e şanaziya wan zarokan xirab nekin. Ya ku “Xuda ye” tê gotin û jê bawer dikin, ya ku “Îslam e” bi bîr tînin zêde ji naveroka wê nizanin. Heta dewlet bi xwe jî dixwaze bikarbîne, belkî hêzên ji der ve bixwazibin bikar bînin. Pir xirab jî dixwazin bikar bînin. Di demekê de, vaye Yêkîtiya Sowyetan ‘Partiya Komûnîsta Tirkiyê’ jî bikar bînin. Min ev hinekî jî şiband a li Tirkiyê; ha ‘Partiya Komûnîsta Tirkiyê’, ha ‘Hîzbullah’, yekî bigire dayne cihê yê din.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê we got em hev dibînin. Niha mesela dem bi dem ji çapemeniyê re hinek tişt derketin, vaye hûn dizanin Hîzbullah, wer guman im ku bû pirsgirêkên we, li Başurê rojhilat, li Anatolî ye. Gelek mirov kuşt in.

---: Gelek mirov jî hatin kuştin, nizanim. Niha meseleya Hîzbullahê jî ne meseleyekî olî fîlan bêvan e. Hinek beşên feodalên aşîretger ku xeteriyê ji PKK’ê dîtine hene, hinek ji ber wê bi hêz dibe. Ez wer bawer im ku Îranê hinekî valahiyekî li Kurdistanê heye farq kir, dît ku Kemalîzm tê derbazkirin û dibe ku dixwaze alîkarî bide hinek beşan; ji wê hêz stand. Wekî din jî dewlet bixwe êdî dema fêm kir ku Kemalîzm nagire, van tarîkatan, destpêkê di bingehê olî de tarîkatan herî dawî jî Hîzbullah kir dewreyê. Di rastiyê de ev mesele wiha derket holê. Yanê bi sê awayan çavkaniya wê heye, tevgera Hîzbullah a ku ber didin me. Em helbet bandora Îranê hebe, em ê bixwazin wê cuda binirxînin. Bi rastî jî yê radîkale ku baweriya Xudayê xwe hebe, em ê bixwazin wê cuda binirxînin. Ji ber ku berjewendiyên feodalên eşîretê xirab bûne, yên ku xwe dispêrin Hîzbullahê yan jî yên ku wê rûpêşî li xwe dike hebe, em bixwazin wê cuda binirxînin. Wekî din jî Hîzbullaha dewletê dayî avakirin hebe, em ê bixwazin wê cuda binirxînin. Wekî din jî di giştî de rastiya olî hûn dizanin em dixwazin binirxînin. Ev gişt, dide nîşandan ku em berfirehî nêzî pirsgirêkê dibin. Em ên wekî din

dikin, “Em laîk in yan na?” Nizanim vaye “Tu ji kîjan tarîkatê yî, em Misilmanên radîkal in, yan na” em nakevin nîqaşekî wiha.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e, di nav pêvajoya me de yanê bi Hîzbullahê re…

---: Ez jî wisa dê Hîzbullah jî, fîlan bêvan jî hebe, zêde nagirim cidiyetê. Min gava din hêjmart, bandorên giştî mijara gotinê ye.

Oral Çalışlar: Ew rast e, we pirsgirêk wekî teorî û wekî siyasî danî holê. Ti îtîrazekî min ji wê re nîne.

---: Ev gişt Hîzbullahê jî vegotin dike, tarîkatê jî vegotin dike, Îslamiyetê jî vegotin dike. Nêzîkatiyên me yên berfirehî hene. Mela Abdullahekî girêdayî olê xwe hebû; yê ku herî baş ji min fêm kirî û bi rastî jî Misilmanek di Kurdistanê de herî rûmetbilind, teslîm nebûyî, paqij bû. Yekbûyînekî pir baş çêbû, melayên pir bi nirx hene, têne, ez wan ji mîlîtanên herî bijare hîn bi nirxtir dibînim, pir zêde. Misilmanên paştekî jî dikarin werin, bi wan re jî em dikarin di astekî girîng de li hev bikin. Lê yên ku dewlet bikartîne, nizanim hinek “Partiyên Xudê” yên jirêketî, nizanim kaseyetiyên wiha jî dibe derbikevin. Ev li gorî min ha MHP’ya faşîst, ha wiha faşîst ti fark nake. Yanê em di rewşekî dikarin bersiva ku ji tevan re maf dikin bidin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn li gor feresat û xeta wan helwestên cuda digirin.

---: Helbet helbet, bi mîsogerî. Li gorî mijarên cuda, helwestên cuda.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê Hîzbullaha di bin kontrola dewletê

de ji bo me…

---: Helbet. Mînak Hîzbullaha li gorî Îranê hebe, neçare beriya her tiştî antî-emperyalîzmê (dijmîtîngeriyê) be. Neçare antîkemalîst be û dema wiha be, neçare bi me re di nav lihevhatinê de be.

ORAL ÇALIŞLAR: Girêdayî Îranê…

---: Pir zêde helbet, xeta wê ev e. Ger neke, nexwe sextekar e. Em ji tevan re bi nêzîkatiyên guncaw bersivê didin û wer bawerim ku dê vê pirsgirêkê çareser bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê di nav pêvajoya pêşiya me de mesela li Başurê rojhilatê em dikarin li benda vê bin; Ji vir û pê de dê Hîzbullah çalakiyên wiha nede berdewamkirin?

---: Ew bixwe dizanin. Ger wek pîvanên min gotî bin, hinek ji wan dê berdewam bike, hinek ji wan berdewam nake, Hîzbullaha alîgirê dewletê dê berdewam bike, lê yê girêdayî olê xwe be, yê alîgirê Îranê be, antî emperyalîst (dijmîtîngerî) be berdewam nake. Heta dê têkiliya bigere, yê ku welatparêz be, dê were bi me re bikeve nava lihevkirinê.

ORAL ÇALIŞLAR: Jixwe bi we re yên di nava tevgerê de hene…

---: Helbet, gelek hene. Di vê çerçoveyê de têkilî dê çareser bibin. Berê me pir berfirehe, li gorî pozîsyona her kesî qasî ku bikaribe bersivê bide nerm e. Yanê ez bawer nakim ku di vê mijarê de wiha em zorê bikişînin û bikevin şaşitiya çareseriyê. Wekî din!

ORAL ÇALIŞLAR: Bawerim min tu gelekî mandî kirî.

---: Na. Bawerim em ê berdewam bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Em berdewam bikin, ji ber ku ez vê wek tişt dihizirim, em ê ji vê tiştekî baş derbixînin wiha.

---: Helbet, ji bo we jî qasî ku bê xwestin dikare bê vedan. Em ê sibê hinekî din binîn rewşeke berferehî. Vê pêvajoyê, di rastiyê de mijarên ku hûn dixwazin bidin vekirin, mirov dikare bigire dest.

ORAL ÇALIŞLAR: Helbet, helbet. Ji ber ku nîqaşên me yên dirêj dirêj hîn dirêj em biaxivin hene.

---: Ez derfed bibînim, dîsa ez ê bigirim dest. Ji ber ku bi nebesî xwendin bû, li dijberî te tê bikaranîn. Em ê di vê navberê de jî hinekî li ser Kemalîzmê biaxivin. Dîsa ev tevgera çepgir, sosyalîst a li Tirkiyê biaxivin.

ORAL ÇALIŞLAR: Rewşa çepgiriya cîhanê, dîsa rewşa bera sosyalîzma cîhanê…

---: Erê lêgera sosyalîzmê ya li cîhanê di çi astê de ye. Dîsa bi çend tiştan derbarê girêdayî vê sosyalîzma pêkhatî, heta kapîtalîzm, pergala nû ya Dewletên Yekbûyî a Amerîkayê jî bibêje. Ger tu bixwazî em van sibê bigirin dest. Na, ez dikarim li ber xwe bidim jî, bila hîn biberfemtir be, mirov bi enerjiyekî taze re bersivên hîn bihêztir dikare bide.

ORAL ÇALIŞLAR:  Wek din jî tişt, yanê ji van tiştên we gotî yên hûn dixwazin sererast bikin, yên derbixin…

---: Helbet. Di wê mijarê de hevokên ku min zor bikin, pêwîst e hûn bixwe derbixînin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez ê derbixînim lê belê dîsa ji ber çavên

min derbikevin, min hişyar bikin. Ji ber ku ez…

---: Ez carnan pir azad daxivim. Dibe ku rojeva giştî şaş têbigihîje, wan xalan bi hesasiyeta nivîskarekî sererast bike.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew meseleya min a takekesiye, yanê ez ê wê bikim.

---: Li gor min cewherê wê vekiriye. Hinek hevalên nivîskar pir xweşik dikarin binivîsin. Em ji li benda wê ne. Ji ber ku hinek ji hevokekê gotaran li dijî me dinivîsin.

ORAL ÇALIŞLAR: Wek din jî li gor min ya ku nûçeye rastî ragihandine.

---: Di rastiyê de tiştên xweşik ku hûn ragihînin heye. Hûn di ragihandina van de azad in û alîkariya ku ji destê min tê jî ez ê bikim. Helbet bila rê ji nîqaşan re veke.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê bila hinek nîqaş vebe. Ez jî wê dixwazim. Yanê wek din jî min gelek pêşderaz pirsin, yanê hinek ji wan min zanebûn pirsî. Yanê di gotinê de "Apo ew e, Apo ev e" gelek îdîa hene, bila Apo bixwe jî xwe vegotin bike ku,…

---: Yanê ev hîn jî pirsgirêke, arasteyên wiha li ser min bên kirin, ti aliyên min ku ez jê bitirsim nîne. Dîsa bi giştî ew pirtûka Yalçın Hoca derxistî heye. Ez bawerim ku pirtûkekî bi nirx e.

ORAL ÇALIŞLAR: Min ew "Peyman" xwend.

---: Çend rûpel e?

ORAL ÇALIŞLAR: …

---: Di mijara jinê de ew Kongre pir girîng e. 600'î nêta şer daxwazkirine û heta tevlîbûna jinên tevlî şer bûne. Ez bawerim ku anîna van li ser ziman dê rê li pêvajoya dîrokî veke.

ORAL ÇALIŞLAR: Li gor min jin jixwe…

---: Me ew di binarên Çiyayên Zagrosan de tenê hiştine, yek zilam tenê jî têkildar nabe. Ew bixwe nîqaşê dikin, ew bixwe biryar digirin. Ev ceribandinekî pir balkêş e. Niha em ê encamên wê wekî min gotî bixwazin bibînin. Heta bê xwestin ji tişta min re jî tê. Di vê mijarê de jî ya ku ez dikim yan jî taybetmendiyekî herî girîng ya ku ez dixwazim bibim xwediyê alîkariyê, zêde destekariya zilaman e. Bila jin bixwe bihizire, bixwe bikeve nav hinek lêgerînan, bixwe biecibîne, bixwe berde, bixwe hilbijêre, ez di vê mijarê de pir hesas im, ji bo vê ez dihizirim ku pêwîst e nîqaşê hinek din bidin pêşxistin.

ORAL ÇALIŞLAR: …

---: Ez li bendê me. Pirtûka jinê, ev pirtûka lêkolîna Îslamê, kêmasiyên wê hene, heta hûn hinek wan pirtûkên balkêş yên derbarê dîrokê de jî amade bikin û ji min re rê bikin. Dem dem hebin hinek lêkolînên wiha û heta carnan jî ji bo nêrînên me bigirin mirov dikare hev bibîne. Pêwîst e hûn lêkolînên xwe bidin berdewamkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha ez pirtûkekî nû çêdikim. Bi gotina cînseltiya beriya Îslamê.

---: Helbet mirov dikare van mijaran bigire dest. Pirsgirêkê ne tenê ji bo cînseltiyê tenê jî bigirin dest. Her dem dibêjim, bûyera jinê, bûyerekî siyasî ye. Ez, wer bawerim ku ez ê hinekî bixwazim awirên we sererast bikim. Bi mîsogerî… Cînsellîk bi serê xwe tenê bûyerekî siyasî ye. Dê ez ê vê ji we re îspat bikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Bûyerekî siyasî ye, lê bitenê…

---: Di giştiya civakê de…

ORAL ÇALIŞLAR: Nirxên civakî yên bi her awayî…

---: Çawa nizilandiye, ez ê dê pir balkêş nîşanî we bidim, belkî wî demî rastî çî ye hûn ê hinekî din hîn baştir fêm bikin. Di vê mijarê de heta bê xwestin çavdêriyên min ên kûr hene. Dema em ber bi azadiya jinê diçin, em ê cînseltiya jinê bûyîna metayekî derxistinê dest bi kar bikin û jin jî di nav civakê de xwe wekî metayekî pêşkêş dikin, bikevin rê û her ku here pir azad, di vî bingehî de, vaye baş wê bê hezkirin, vaye dê me bigihîjîne eşqê jî, ez ê van encaman bigihîjînim we. Ji bo wê min got yanê, komeke nîqaşvan ji xwe bawer hebe, bi jinê re di vê mijarê de bê ku teng bibim bê ku tişt bikin jî, em dikarin hêz bigirin û hêz bidin. Pirsgirêk cidiye, ne tenê wisa…

ORAL ÇALIŞLAR:

---: Pirsgirêka civakî ya herî kûr e. Heta şoreşa sedsala 21. Hinekî jî dê bibe şoreşa jinê. Em ê binirxînin, jixwe gişt ev taybetmendî malzemeyên ku têra ji rojnameyekî bikin hatin dayîn. (…)

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê bi agirbestê re rewşekî wiha derket holê; hîn beriya vê yên heta dawî bi we re têkiliyên wan xirab bûyî û yan we di derbarê wan de yan jî wan di derbarê we de tiştên xirab we gotine kom û mirovên ku we helwest standî re hatin gel hev. Agirbestê tabloyekî nû derxist holê. Niha ev tablo çawa derket holê? Ya duwem jî dê ji vir û pê ve çawa here?

---: Me hewl da ku rewşekî karê heyî yê di fiîliyatê de fermî

bikin. Bal bê dayîn ku di navbera gelek nêrînan de zêde cudahî nîne; pirsgirêka netewîtî, statûya Kurdistanê, armancên wê û yên ku têkoşînê dimeşînin, pevreyîbûna van nêrînên heyî bi protokolekî safîkir û min ji gelek rêxistinên din re jî heman tişt gotin; “Ez tevlî beşekî girîng yê nêrînên we dibim û nêrînên xwe daxînin ser belgeyekî ez ê mohr bikim” ên hatin daxistin, min jî mohr kir, di encamê de ev meseleya pevreyî derket holê… Me cudahiyekî ya sûnî derbaz kir, bêguman di hinek mijaran de nêrînên cudahî, helwestên cudahî heta cudahiyên takekesî pir in lê ji bo ku şibandin çêbibe heta dereceya dawî ez nerm nêz bûm. Ew awayê kevin, ev hevok wiha bû, nizanim bila asta temsîla min bila ev be, ez neketim hesabên wiha sivik. Bi toleranseke, bi nêzîkatiyekî heta dawî çêker ji her awayê ji bo rêxistin, kes û grubê heman helwest da berdewamkirin. Encam, niha em bêjin her kes, tevlîbûna ji vê pevrebûyînê re; ji vir û pê ve ger gengaz be ji bo ku em bibin pevrebûyîna eniyekî kedê didin. Wer tê fêmkirin ku, di vê mijarê de belkî ji ber sedemên bêhêzbûna rêxistinan lez, gur pêşnekeve lê yên ku dixwazin tiştinan bidin çêkirin, yên ku naxwazin bêtawîz, bêpolîtîk bimînin, bi navê pevrebûyînekî wiha re ger bê gotin enî jî dê fermî bibe, mayînde û hinekî di bin vî navî de, pê bawerin ku dê polîtîkayên xwe hîn serkeftîtir bidin meşandin.  Ez bawerim ku di pêvajoya pêşiya me de di vê mijarê de jî dibe ku îlana eniyekî jî bê damezrandin.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e piştî van bûyerên dawî yên li Çewlikê û pêde pirsgirêkekî ji bo vê eniyê yanê ya hîn rastir, di derbarê van rêxistinên Kurd ku hûn di nav têkiliyekê de ne pirsgirêkeke derket yan na? Dibe ku derbikeve?

---: Na, na. Ez qet bawer nakim ku derbikeve, ji ber ku Tirkiye bi rêbazên ji dijminatiyê zêdetir ti tiştikî din nade spartin, dixwaze pirsgirêka Kurd tasfiye bike, ji cihê xwe derxistin (tenkîl) û diminatî, dîl girtinê re here encamê, vê baş dizanin. Di vê mijarê de

asta zanista tê xwestin a wan heye. Ew jî ger hebe hebe belkî di aliyê taktîk de dikarin rexne bikin. Hinekî wiha bû. Lewre ew bixwe jî vê dibêjin. Ger Tirkiye polîtîkaya xwe neguhere, mînak “Protokola” me birêz “Burkay” re kirî derbazî jiyanê nebe, em jî neçarin ku têkoşîna leşkerî bihizirin. Heta gotine di vê mijarê de hinek amadekariyên me hene. Rêxistinên dîtir hîn zêdetir wiha ne û heta hîn jî wekî rewşekî erênî tê nirxandin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê piştî Çewlikê hûn bawer nakin ku pirsgirêkekî derbikeve?

---: Dibe ku hîn yekbûyînekî hîn erênî, hîn leztirîn were.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e Talabanî risteke pir girîng dilîze. Wiha, “bi pêvajoya agirbestê re niha bi vê rewşa nû re, ez wer bawerim ku civîna çapemeniyê ya îro bê çêkirin Talabanî dê tevlî nebe, qasî ku min fêmkirî. Bi Talabanî re piştî van bûyerên Çewlikê têkiliyekî we pê re çêbû? We hîskiriye ku helwestekî wî ye.

---: Talabanî di giştî de ji têkoşîna çekdarî, bi taybet jî ji van bûyêrên li Çewlikê dilnerihetiya xwe anî ziman. Ew ji bo ku ji Tirkiyê hîn zêdetir alîkariyê bistinê, dikeve nav bi her awayê helwestên polîtîk. Bi me re jî dike, bi Tirkiyê re jî dike û vê jî her dem dike, ji vir û pê de jî firsata xwe yek bi yek dê bixwaze bikarbîne. Zû zû ji vê jî dev jê bernade. Êdî çi qasî bisûde û dê çawa bide bikaranîn, wisa dê sûd bigire û bikarbîne. Em Talabanî di meseleya Kurd de ger karanînek erênî bê dîtin, em ê binirxînin. Lê belê em di qadên cuda de polîtîkayê din... Cudahiya cih heye. Ew di dîplomasiyê de hîn zêdetir dixwaze rûşwetê bigire. Em xwe dispêrin hêza cewherî ya gel. Wer wiha dibe ku dem bi dem em werin gel hev. Lewre dem bi dem ji ber ku em di mijarên cuda de ne bêtêkilî yan jî berevajîbûn dibe ku çêbibe.

ORAL ÇALIŞLAR: Piştî bûyerên li Çewlikê pêwendiyekî we çêbû?

---: Dibe ku her dem pêwendî hebe jî nebe jî, ev vê ew qasî girîng nabînim. Dema pêwîstî bi kar hat dîtin, hatine gel hev zêde ne zor e, lê belê dema gavên polîtîk cuda bûn, dê ew li cihê xwe be, ez ê li cihê xwe bim.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha tu di du civînên çapemeniyê de bi cil û bergên taxim û kravatê tevlî bûyî.

---: Em ê vê di civîna çapemeniyê de vekin.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha qasî ku min fêmkiriye, di kevneşopiyê de…

---: Di her kêliyê de ya ku tê hizra te niha em di vir de ranegihînin. Em berdewam bikin. Erê.

ORAL ÇALIŞLAR: Wek din jî ez ê vê pirs bikim, yanê meseleyekî wiha, di guhdarkirina muzîkê de tu zewkê jê digirî?

---: …

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela ji bo wiha guhdarîkirin, dem derbaz kirin...

---: Hatiye fêmkirin. Pêwîstî bi derbazdanê (vurgu) nake. Jiyana me bixwe şêwazê muzîkekî pir cuda dide hêmakirin. Dema rastiya Kurdistanê, Kurd bû mijara gotinê, stranên klasîk ên kevin, li gor pêvajoya nû tên eyarkirin, her ku diçe dengekî nû yê wî alî jî derdixîne holê û pêşdikeve heye, her wiha stranekî nû ye. Jixwe ji niha ve ev qas starên di vî bingehî de derketine holê, ev têkoşîna me, çi qasî mêldarê ji pêşketinên muzîkê datîne holê. Helbet ji bo me

jiyan jî di heman demê de muzîk e. Jiyana min û weke giştî jî pêşketina PKK'ê pir dişibe vebêja stranan. Me bi rîtma stranê dest bi vî xebatê kir. Em wê jî didin berdewamkirin. Ya me şerekî bi stran e…

Oral Çalışlar: Baş e, niha di vê wateyê de mesela tu muzîka klasîk…

---: Helbet, helbet guhdarî dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela herî zêde di nav van de kîjan şêwazê muzîkê kêyfa we jê re tê?

---: Yanê, muzîka Rojava ya klasîk ez xwe pêde ber didim.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela herî zêde ji kîjan awazvanî diecibînî. Ji Beathooven yan jî Mozart?

---: Ji bo min girtina rîtmê pir girîng e, dema ku min rîtîm girt, ez ji wê re xwe pêde ber didim. Ev ji bo muzîka Ereban jî derbazdar e. Ez bi sedhezar carî "Umud-îsmî-maxazelan" guhdarî bikim aciz nabim. Gotinên di muzîka wê de çi dixwaze bide fêmkirin ew qasî ne girîng in.

ORAL ÇALIŞLAR: Rîtma wê girîng e…

---: Rîtma wê girîng e…

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e…

---: Rîtma li pêş pir girîng e. Aliyê rîtîm û muzîkaya li Hîndistanê, Rojhilata Dûr yan jî li Amerîkaya Latîn… Vêca ez xwe bi vê rîtmê re pê ve ber didim. Di bûyera Kurd de ev wiha ye, yanê aliyê muzîkî heta bê xwestin pêşdikeve. Weke min gotî jiyana me

bixwe jî wer bawerim ku jiyanekî girêdayî herî nêzikî muzîkê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Tu Îbrahîm Tatlıses çawa dibînî?

---: Ez Îbrahîm dinasim, guhdarî jî dikim. Îbrahîm Kurd e, lê belê di warê siyasî de xwestin bikarbînin. Hinekî xwestin bispêrin derketina PKK'ê… Niha bi taybetî dixwazin nirxên çanda me ya Rihayê wekî yê ku wê tîne ziman bidin diyarkirin. Nav û dengbûna wî bi îlankirina PKK'ê re dest pê dike. Li gor min wekî siyasî dixwazin bikar bînin. Heyecena gel, ya ku ji pêvajoya rizgariya netewî re vedide, muzîkekî di bin navê arabeskê de dixwazin naveroka wê vale bikin û dixwazin bikar bînin. Yek yê ku dişibe vê Emrahê Amedî heye… Wiha gelek arabeskvan derxistin. Dixwazin bi artîstên dişibin van re, artîstên bala civakê dikişînin, herikîna gel a ji şoreşê re asteng bikin. Wekî deng guhdarî dikim… Arabesk yan jî klasîk ne dengekî xirab e, muzîkeke bi vî awayî di hilberandinê de tiştekî ez bêjim nîne, lê belê vê wekî siyasî di îstîsmarkirina wê de…

ORAL ÇALIŞLAR: Min têkiliya ji aliyê wê yê siyasî ve hîn zêdetir, aliyê wê yê hûnerî pirs kiribû.

---: Zarokê xaka me ye û zarokê înşaatê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Helbet hûn hembajarî ne.

---: Ew hîn zêde bûyerekî têkilhevbûna Kurd-Tirk-Ereb derxistiye holê ye. Di wî de bandora Ereb-Tirk-Kurd bi hêz e. Di rastiyê de sedemekî girtina wî jî ev e.

ORAL ÇALIŞLAR: Ji têkilhevbûna van hersiyan hatiye holê.

---: Helbet pir e, lêhûrbûyîna çanda gelan tîne ziman. Ji wî re arabesk gotin jî zêde ti wateya xwe nîne. Lêhûrbûna çanda gelan

vegotin dike lê belê ne bi tarzekî şoreşgerî… Xirab tê bikaranîn, ew meseleyek cuda ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew meseleyek cuda ye…

---: Aliyê gelêrî heye, di hûnera wî de aliyê gelêrî heye.

ORAL ÇALIŞLAR: Mesela tu Ferdî Tayfur guhdarî dikî?

---: Ew jî hêzîkî wî ye, ez bawer dikim ku ew jî di vî mijarî de… Li gor we hîn zêdetir çi tîne ziman?

ORAL ÇALIŞLAR: Ferdî Tayfur hîn zêde derketinekî ji Çukurovayê ye, hûn dixwazin ji Tarsusê ye, ji Edenê ye.

---: Erê, ez wer bawer dikim ku êşa jiyankiriye tinê ziman. Ez xirab nakim lewre bi tenê êşê anîna ziman, dide diyarkirin ku koletiyê nade derbazkirin. Hîsên tên mîtîngerkirin ên di bin şert û mercên bêşanaziya Çukurovayê de hatine çewisandin, hinekî ber bi pêş ve têkildarî dike, ne xibare lê kêm e.

ORAL ÇALIŞLAR: Di pêvajoya dawî de gotina stranekî “Çi bû” derket, we bihîstî ye?

---: Min bihîstî ye jî…

ORAL ÇALIŞLAR: Li Tirkiyê qiyamet rabû. Bi gotina “Emmoğlu” Ferdî Tayfur…

---: Çima dibe “Emmoğlu” ku… Qiyamet rabe…

ORAL ÇALIŞLAR: Vaye hûn dizanin modayek tê…

---: Ka xweşikbûna, stranê…?

ORAL ÇALIŞLAR: Qet, “Ji Xudayê Emmoğlu re bibim gorî, ji giyanê Emmoğlu re bibim gorî” ew tiştên kevneşopî yên Çukurovayê hene ya, di dema dawî de fîlmê Toros, mechul, di nav nîv demjimêrê de sê şerîd, tiştekî wiha ye, yanê girîng e… Baş e Yaşar Kemal?

---: Min di wê mijarê de nirxandin kirin. Mirovê ku derketî ji derveyî civakê dike roman, hinekî cudahiyan dike roman, ev jî ji bo ku pêlekî şoreşekî bi hêz heye wiha ye. Îsyanê dike roman. Ne karekî xirab e, lê li gor min pir kêm e. Rexneya ku herî bingehîn lê bê kirin ev e. Karîbaya vê bide pêşxistin di qada romenekî bi hêz de dê karîbaya veke. Bi rastî jî li Çukurovayê veguhertina civakê tê jiyankirin, hinekî ev dîtiye û berhemên xwe bikaraniye, dîsa saziya eşqiyatiyê bikaraniye, ez bawerim ku ev jî bûyerekî pir tê dîtin. Ew bahozekî şoreşgerekî bi hêz najî yan jî bi nedîtinê re li gunehan digere, hinekî jî wiha ye; pir zêde cudahiyan bikaraniye. Her wiha hîn bihêzbûna xwe nedaye avakirin. Pêşniyara min jê re, serûbinbûna şoreşî ya cidî bibîne.

Yaşar Kemal bi aliyekî xwe Kurd e. Di rastiyê de, di vir de belkî jî aliyekî Yaşar Kemal ku wî bixwe jî neketiye cudahiya wê jê re alikariyekî bikim, heger koka wî ya Kurd nebûya, nedibû romannivîs. Wiha ji koka çanda Tirkekî romannivîs dernakeve. Çima, gelek zarokên kokên wan Tirk wiha hene û li heman gundan û li Çukurovayê jî hene. Derdikevin lê romannivîsekî wiha nayê aqlê wan bixwe jî. Ji bo ku mirov bibe romannivîsekî wiha hinekî pêwîst e mirov bibe Kurdekî wiha hatiye Çukurova ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê mirov wê guhertinê bijî.

---: Gelek e helbet. Yanê nakokiya Yaşar Kemal ev e,

qutbûna ji taybetmendiyên netewa Kurd re bi senteza mezinbûna ji Çukurovayê re jî.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê ez tiştê bêmafî dibînim, yanê Yaşar Kemal…

---: Em vê danesînê baş bikin. Yaşar Kemal, hilberînên bi motîfên netewa Kurd re li Çukurovayê yên beramber hatine yan jî ev motîf li Çukurovayê, ev taybetmendî bi şêwazên belekiyên nû dewlemendkirina wê ye. Çima niha ev mijar zêde wiha zanistî nayê hizirandin?

Di rastiyê de ev, hinekî ew guftûgoyek, bîranînekî wî bi rojnamevanî re heye; ew vê dixwaze fêm bike loma birêz Yaşar Kemal bixwe jî rast bersivê nade, rastî jî fêm nake. Nabe hêza bersivdayînê. Dibêje; “Sedemê bingehîn yê vê romannivîsa te çi ye?” Dixwaze ya orijîn bibîne. Bi rastî ew kesayetiya wî li wê derê disekine. Weke hinekî min bixwe ew çîroka vejînê yan jî ew guftûgoya, em bêjin ku me birayê me birêz Yalçin re kirî, erê, Yalçin Kûçûk danasîna wê zarokatiya me dike û ji bo çawa bi kirp gotinê, em gihîştine kesayetiyek îsyankar a civakî, siyasî û ji bo ku ji analîzên wiha re bibe alîkar kiriye. Wî bixwe jî dikarî helwestekî dişibe vê daba pêşxistin. Yanê bi Tirkî dinivîse, mînakên wêjeya Tirkî jî pêşkêş dike. Ev ne tiştekî xirab e, lê belê hewceye taybetmendiyên bûyînê bide ragihandin û di vê mijarê de wêrek be.

ORAL ÇALIŞLAR: Bi gotina Deriyê Kelha Dawî yek…

---: Yanê dibe ku ji Egeyê Necatî Cumaliyek derbikeve. Van mijaran, ji aliyê yekî Tirk ve, ji rastiya Tirkan re û ji rastiya Tirkekî re anîna ziman guncav e, lê Yaşar Kemal…

ORAL ÇALIŞLAR: …

---:. Yanê temam, rastiya Tirkiyê wekî yekî Tirk baş dikare bîne ziman. Yaşar Kemal hîn cudayî tê dîtin. Ew hinekî dixwaze tiştinan bide rastiya netewa Kurdan, ji ber ku tam jê qut nebûye vê nikare bike. Dixwaze tam yekî wek Tirk bide. Ji ber ku tam ne yekî Tirke jî naxwaze vê bide çêkirin. Lê li gor min, awayekî xweser girêdayî wî ye, dîsa derxistiye holê. Ev, bala Rojavayê jî dikişîne. Hinekî nirx didinê. Lê belê dixwazin ku, hîn jî pêş bikeve. Mesela dikare serûbinbûna Kurdan lêkolîn bike. Ez derketina wî ya bingehîn di vir de dibînim. Veguhertina Kurdan bikaribe bigire, di qada wêjeyê de dê rê ji pêngavekî nû re veke. Ji ber ku di rastiyê de di bûyera Kurdan de, serûbinbûnek mezin tê jiyankirin. Bala we tevan dikişînim; hûn hinekî nivîskar in, bi mîsogerî çêbûna serûbinbûnek mezin, guhertina di giyanê mirov de bide afirandin najîn. Bala we ji rastiyên,têkiliyên xwe parçe dikin, çawa ku têkiliyên nû didin avakirin nîne. Ev ji bo we pir xirab e, ji bo rewşenbîr, nivîskar, xêzkarên Tirk bixwe… hûn çawa dikarin ev qasî sewir bimînin? Çawa bê ast dikarin bimînin, aqlê min jê nagire. Ez vê tenê ji bo rewşenbîrên Kurdan nabêjim. Di rastiyê de rewşenbîrên Tirkan bixwe jî dikarin gelek tiştan bikin. Gencîneyekî (xezineyekî) wêjeyî ye. Analîza Kurdî kirin, bi rastî jî dê nefesekê bide. Di qada navnetewî de jî dê ber bi îdîayekê ve bibe. Lê belê çanda înkarvan a Kemalîzmê we tevan bandor kiriye. Hûn bêrûmet lê dinêrin, heta ku hûn bêrûmet lê binêrin, hûn ê bixwe jî bêrûmet bikin. Hûn ê di qada wêjeyê de qambost bimînin. Ku her wêje, qasî ku ji serûbinbûnekî cidî ya civakbûnekî re bibe bersiv, ew wêjeyekî cidî ye, ev dibe ku bi êş be, bi trajîk be, pêwîst e mirov tevî bikar bîne.

Oral Çalışlar: Yaşar Kemal piştî mirina Musa Anter di rojnameya Mîllîyetê de du rojan li ser hev goterekî nivîsandî hebû, ew li ber çawên we ket, di derbarê rastiya Kurdan de yekem car

hizrên xwe vedibêje.

---: Yanê dibe ku bide pêşxistin…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ew pir girîng bû, ger hûn wê bibînin û bixwînin, min dixwest mutlaq hûn wê bixwînin. Ji ber ku Yaşar Kemal hizrên xwe yekem care di derbarê pirsgirêka Kurdan de ew qasî radîkal û şêwazekî vekirî tîne ziman. Di rojnameya Hûrrîyetê de du roj li ser hev derket.

---: Hîn jî dikare bide pêşxistin.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, yanê ez ji bo têkildariyekî çêbibe wê dibêjim.

---: Helbet yanê mirov dikare derketina bide çêkirin. Bi mîsogerî pêwîst e hinekî riya wêjeyê rast bê têgihandin. Bixwazin bandorbûna serûbinbûna civakî ya mirovan bihêztir bigire. Heta bi hunerî ziravtir bikin. Wê bi hunerê hinekî din jî xweşiktir bikin. Şêwaza ku hewceye tespît bikin ku şoreş hînekî din jî bi hestî û goşt bibe. Bila ji piroletiyan jî neyînan biarêvin. Karanîna hunerê jî ev e.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e yanê niha ew karanînekî civakî ye lê di heman demê de pêwîstî bi ziraviyên pîşeyî dike.

---: Ziraviyên hunerê ev e; Hûn dixwazin min li Tirkiyê bikin mêvanê guftûgoya hunerî, jixwe ez nirxandinên di vê mijarê de bi awayeke cidî dubare dipirsim. Huner karekî cidî ye, lê hunera li Tirkiyê; wekî derketiye ji derveyî atmosfera civakê ya siyasî-civakiye, wekî hewldana bangên ji hîsên xwe hatiye qutkirin, tê hizirandin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ne gengaz e, yanê civakekî heger ez

tevlî vê nêrîna we nabim, çima ez tevlî nabim, ji ber ku…

---: Ya ku tu dibînî rastiyek e.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez ji ber vê tevlî nabim; niha dema huner rastiya civakê venede wî demê bersivê nabîne. Yanê em bêjin ku, yê ku zûtirîn ji xwe re dibêje hunermendim, tiştek kir, heger nirxekî wî hebe…

---: Di giştî de qet bêguman e, her tişt civakî ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê em bêjin ku civak…

---: Jixwe hebûna mirov civakî ye. Ev vê giştî nabêjim, giştiya ku ez didim çêkirin, pêwîst e aliyê bingehîn ê civakê bi hunerê re bê diyarkirin heye. Îro li Tirkiyeyê mezintirîn hilweşandinên 12’ê Îlonê li ser mirovan heye. Kê/î ev girt û nirxand?

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê her kesî li gor xwe xwestin tiştinan bidin çêkirin. Lê ev…

---: Romana vêya ya mezin nehat nivîsandin.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê nehat nivîsîn, ji ber ku hîn hinekî din… ne tiştekî hema ji nişka ve bê çêkirine ku.

---: Na! Hunermendan bi tiştên dîtir re xerîk bûn. Pir bi pirsgirêkên sûnî re xerîk bûn. Bi xirab nîşandina tîpên şoreşgeran re xerîk bûn. Rexnekirina tîpên şoreşgeran tê kirin. Mirov dikare tîpa şoreşgeran bi nûnertiya jiyanekî bi tendurist nake, bi her aliyê wê ve bide diyarkirin. Lê encamên ku ji vê derbikeve, bila nebe înkarkirina şoreşê û bilindkirina jiyana ku 12’ê Îlonê aniye jî. Pêwîst e hûn di vê mijarê de çavdêriyên xwe hinek din jî bidin pêşxistin. Hûn ê bibînin ku beşekî girîng tiştên hûn lê xerîk dibin, wek neyekser xizmetê ji

riya pergalê re vedike. Li gor min rexnekirina pergalê pêwîst bû ku bitendurist hatiba kirin. Ji ber ku 12'ê Îlonê, wêrankirinên mezin ji civakê re anî.

ORAL ÇALIŞLAR: Te "Kırlangıcan" (Hechecoka) ku Nîhat Behram nivîsî xwendiye?

---: Ez ne qala hema em bikevin nav pêşbirkekê ku bi tenê ji bo civakê xirab bidin nîşandan, hema em bidin xirabkirinê dibêjim.

ORAL ÇALIŞLAR: Ji ber ku "Kırlangıcan" romanekî pir min ecibandiye dibêjim. Yek ji wan berhemekî ya di pêvajoya 12'ê Îlonê de ye. Hinekî jî ji ber wê yekê min xwend. Hatiye vergerandin bi zimanê Almanî û wer bawerim ku di nav gelek romanan de romanekî pir baş e. Piştî wê romanê; çîroka Kurdekî ji Kurdistanê çûyî vedibêje.

---: Ne we wisa ye, mirov mînakê bi vî tîpî hîn jî dikare bide pêşxistin. Yanê hinekan…

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e hûn romanan dixwînin?

---: Ez ji xwendina romanê wêdetir, romanekî rastî dê çawa pêşbikeve, ez li ser wê lêhûr dibim.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê mesela, romanekî Yaşar Kemal ya tê gotin "Kale Kapısı" (Deriyê Kelhê" derket û dibêjin navê wê romana Kurd e, nîqaş tê kirin. Yanê dibêjin meseleya Kurd e. Weke din jî beriya wê, ji bo ku min bixwe jî romana jiyana ciwanekî Kurd nexwendiye ez jî zêde nekevim îdîa yê. Lê li gor min pêwîst e hûn "Kale Kapısı" bixwînin, mesela ev, dihizirim ku pêwîst e hûn "Kırlangıcan" bixwînin.

---: Rast e, ji bo ku ez di vê mijarê de hinekî bikarim alîkarî

bidim, bêguman hinek mînakan bixwînim bisûd e. Ger derfetên min hebin, ez ê binirxînim. Lê rista ku min ji bo xwe daniye hîn zêdetir hem bibim avakerekî tevna romanekê, hem jî bibim ê wê tîne ziman. Dixuye ku min hinekî karanîna bingehîn a romanê fêmkiriye. Roman, di awayeke giştî de wekî bingehê wêjeyê jî hewceye ber bide daku bikevin zanistiya wê. Evê di bûyera PKK'ê de, di asta reşnivîsê de jî be, bawerim di nêzîk de wek berhemekî derbikeve holê.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê li ser romanekê lêkolînek, çawa, dê çi be?

---: Ez ji vê re dibêjim reşnivîsa romanê.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e di aqlê we de roman nivîsîn qet derbaz nabe?

---: Ez niha bi reşnivîsa wê re xerîk dibim. Roman nivîsa min, naşibe nivîsarên dîtir. Riya ku min ji têkiliyan, rewşên giyanê, sazîbûnan re dayî vekirin mijara gotinê ye. Ez ê bixwazim wan bidim vedan. E pir girîng e.

ORAL ÇALIŞLAR: Wekî meseleya romanekî wisa ji rêzê?

---: Niha ya ku tu dibêjî romane, yanê mirov wisa rûne û tişt jî nake. Roman, tê wateya ku kûrbûna giyanê, di nav çewtiyên mezin girtinê. Tê wateya fêmkirina pêvajoyekî dîrokî ku derdixîne holê ye. Li Tirkiyê roman wiha nayê nivîsîn. Ez dibêjim, ez ê di vê mijarê de jî rexneyên bi hêz bikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê di wê espîriyê de wek armanc, niha tiştekî wiha derket. Wê rojê di roportaja bi Nûriye Akman re, ger ez romanê binivîsim, vaye ez ê ji Yaşar Kemal hîn xweşiktir binivîsim

filan bêvan, hin nayê bîra min.

---: Niha ji hîn xweşikbûnê wêdetir, ez ê rastiyê bi şêwazekî balkêş hilbijêrim got.

ORAL ÇALIŞLAR: Ew dibe gotar.

---: Na, na.

ORAL ÇALIŞLAR: Tişt nivîsandin dibe roman…

---: Roman ne wek we gotiye. Mirov dikare pêşxistina romanê bispêre pirsgirêkên herî bingehîn jî, bispêre pirsgirêkên herî siyasî jî.

ORAL ÇALIŞLAR: Helbet. Ez îtîrazê ji wê re nakim. Lê di dawiyê de roman hunerekî ye.

---: Vaye xala hûn dibêjin roman, ez dibêjim, çawa ku term ne bitenê hestiyan nayê vegotinkirin, yek şoreşekî jî qerqudeyekî ye. Wê bi goşt xemilandin karê hunerê ye. Ez rista hunerê ew qasî girîngî didimê. Em aliyê xweşikkirina jiyanê didamezrînin. Em hinekî jî nûnertiya mozayîka hundurîn dikin. Yanê, pêdiviyekî jiyanê ku mirov devjêbernade.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam, ti îtîrazekî min ji wê re nine…

---: Îro ne hema wisa tişt bibin xemil tên destgirtin. Mirovên xwe, bitenê şoreşê, ne bi riya leşkerî siyasî ya şoreşê têkirin, pêwîstî bi riya avakirina hunerî jî heye, pêwîst e ji mirovên Tirkiyê re pêdiviyekî ji nû ve avakirina ya hunerî heye bê gotin û ez nakokî, qirêjiyên mezin ên li Tirkiyê dibînim. Ez vê bi hinekî şoreşê rexne dikim. Di rastiyê de ez dixwazim bi nêzîkatiyên hunerî yên hîn

bibalkêş pêşbixînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê niha…

---: Romana Kemalîzmê hehatiye nivîsin. Ji bo dîroka Kemalîzmê çi dide vegotinkirin bi tenê hatiye pesinkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Kemal Tahîr; di derbarê wê de rexneyên pir xweşik kirî hene. Bi têkildarî Kemalîzmê rexneyên wî yên romanî hene.

---: Ne pir. Ne bi biryardarî û ne giştîne. Kemalîzm; ji aliyê Kemalîstan ve jî nayê fêmkirin. Ger hûn Kemalîzmê bi aliyên xwe yên rastî ve daneynîn holê, hûn nikarin xwe bidin nasîn. Ez vê ji we re bêjim.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam. Rexnekirina Kemalîzmê çepgirên Tirkiyê…

---: Ger hûn analîza Kemalîzmê, analîzê, bi her aliyê wê ve rast nekin, dê hinek mirovên li Tirkiyê di bingehekî rast de şêwaz nedinê.

ORAL ÇALIŞLAR: Ev dîrokekî ye, helbet…

---: Ne tenê dîrok e. Di giştî de diyardeyekî pir zindî tê jiyîn, bi şovenîzmê, bi tarzê çewisandinê, mîtîngeriyê, bi felsefeya jiyanê, piraniyê wan dafdaye ji şaşûmaşo, dengbûn û xetimandinê. Heta yên ku pir ji wê sûd dibînin jî bêçaren e. Niha ev tev bi rexneyên bingehîn re pêwîst dike. Herî zêde jî hinekî kar dikeve ser hunerê. Nayê kirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Baş e romana ku we dawî xwendiye…

---: Niha ji bo min…

ORAL ÇALIŞLAR: Ez ji bo tişt dibêjim, di nav xebatên we yên entelektûelî de, niha hûn şerekî leşkerî dikin, li aliyê din wekî rewşenbîrekî pêdiviya we ji xwendinê re heye, gotarên siyasî…

---: Temam. Ez ji xwendinê re derfetê nabînim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê li gor min yanê, ev ne kêmasiyekî ye?

---: Bêguman kêmaniyek e. Lê belê baş…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê ma rêberek bi xwendina romanê, bi wêjeyê re têkildarî bûyîn pêwîstî pê nake?

---: Ez wekî romanekê bûyeran, diyardeyan, dîrokê dişopînim, encam derdixînim, di vê xalê de di kêmaniya têgihîştinê de ne mijara gotinê ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Min ne di wateya têgihîştinê de, bitenê huner, wêje, muzîk tiştekî sax dike, kûr dike…

---: Qasî ku ez têbigihîjim asta min ya ku ez bêjim dewlemendim heye. Di rastiyê de ev vê pêdiviyê têr dikim, bi yek mirovî/ê re hêza min ya dewlemend a bi hev re birûnê heye. Ev bi wêjevan re jî dibe. Bi leşker jî dibe, bi siyasetmedarek jî dibe.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, ez vê dizanim. Ez taybetmendiyekî we ya wiha dizanim. Yanê hûn ragiha biberambiriyê pir sûd digirin. Di hevdîtinan de û bi têkiliya mirovan re…

---: Ew sûdê ji min digirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez di wateya têgihandinê de dibêjim, lê mesela niha, em rastî şoreşgerên mezin tên.

---: Ez di van mijaran de tam hildibijêrim. Ez nirx didim bilindbûna kalîteyê.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam jî wî demî ne pêwîst e ev hebe…

---: Ez ji rêzê jî napejirînim…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê wiha… Lê mesela niha ez li Lenîn dinêrim. Li jiyana Lenîn. Lenîn, desthilatî ji wêjeya Rus û cîhanê bû…

---: Ew hêza min lewaz e. Ew aliyê min hinekî pêş neketiye. Lenîn lêkolînvanekî pir baş e, pir dixwend.

ORAL ÇALIŞLAR: Tu lê dinêrî ku, hema hema wêjeya cîhanê xitim kiriye.

---: Li gel min ev hêz nîne, gelekî jî lewaz im, pêvajoya ku ez dijîm wekî fîzîkî zêde derfet ji vê re nade.

ORAL ÇALIŞLAR: Di vê mijarê de hûn wiha dikevin nav hewildana guhertinê? Ez vê wêjeya Tirkiyê yan jî wêjeya cîhanê…

---: Niha wekî min gotî yanê… Sedemên min ên tenduristî derfet nadê.

ORAL ÇALIŞLAR: Bêhêzbûyîna xwendinê?

---: Helbet ew pir li pêş e.

ORAL ÇALIŞLAR: Ji ku derê tê, ji çawên we…

---: Hişkbûna damaran heye.

Oral Çalışlar: Mandîbûn dike.

---: Helbet… Jiyan… Derfet nade… Nexwe min pir dixwest.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez egera we ya mandîbûna jiyanê napejirînim. Yanê bûyera wêjeyekî, hunerekî, muzîkekî.

---: Ez şêwazê wê tayîn dikim. Kûrbûna wê û vegotina wê ya huneri digirim. Rêbazekî min a li gor min heye. Baş têdigihîjim. Rêbazekî min a li gor min heye. Ez karên ku mirov dikin, karên ku dijîn baş têdigihîjim û ji bo ku ew nirxekî baş ê hunerê vebêje, pêwîst e çawa be ez dizanim. Ez di wê hêzê de me ku artîstekî Yêşîlçam jî şîrove bikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê tu fîlm temaşe nekî dê ev çawa bibe?

---: Ji bo min ew qasî, fîlmek bes e. Dem bi dem temaşe dikim…

ORAL ÇALIŞLAR: Temaşekirina we ji van fîlman re çêdibe?

---: Ma gelek e helbet. Maça sporekî temaşe dikim. Yan jî tevgera artîstîkî, yanê tevgerên giştî di sporê de astîstîkî hildibijêrim. Spor jî hunerek e. Ew hêza min a giştî aliyên artîstîkî bibînim heye. Ji bo muzîkê jî wiha ye. Helbet hîs di wê mijarê de jî heye. Ev hinekî min rêve dibe.

Oral Çalışlar: Baş e Galatasaray bûyîna şampiyan tiştekî

çawa da afirandin?

---: Her şampiyonî baş e. Her şampiyon min bandor dike. Ez, hema hema di her qadê de şampiyontiyê dilîzim. Yan jî ez li aliyê taxima şampiyon im.

ORAL ÇALIŞLAR: Sê sale Beşîktaş dibe şampiyon. Lê çima tu mayî Galatasarayî.

---: Ne pirsgirêk e. Wî demî me rexne dikir.

ORAL ÇALIŞLAR: Galatasarayê?

---: Yanê yên pêwîst e ji şampiyontiyê re bilîzin, pêwîst e dê çawa bixebitin, şer bikin dizanin. Êdî di demê dawî de dê hinekî çawa şer bikin fêr bûn.

ORAL ÇALIŞLAR: Îsal bi rastî jî Galatasarayê taximekî bingehîn da avakirin, te lîstikên wan şopandin?

---: Dem bi dem temaşe dikim. Hîn potansiyelên xwe, tam derbazî holê nekirine. Lê belê taximekî taybetmendiyên pêşketinê heyî tê dîtin. Heger rêvebirên wê bi taybetî antrenor in…

ORAL ÇALIŞLAR: Ma tu dixwazî li ser Galatasarayê bî?

---: Ez dixwazim her taxima ku şer dikin li ser bim. Ên ku her têkoşînê wekî şer dimeşîne, ez di nav her taximekê de me, ez wiha di nav de me. Ev, dibe ku komeke muzîkê be, komekî sporê jî dibe, yêkitiyekî wêjevanan jî dibe. Ya tê xwestin ku di jiyanê de li ser hev encamê bikarin bigirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku bila xwe bispêre

felsefeya jiyanê û pêngavên wan hebin…

---: Pêwîst e bandorker be, diyarker be, kêşîner be, xweşiktirîn be. Yanê ez şêwazên jiyanên dîtir pir ji rêzê dibînim û ez hilbijêrvan im.

ORAL ÇALIŞLAR: Dawî li şer hat û tu ne wek şervanekî êdî tu di her alî de wek siyasetvanekî Kurdistanî, yanê wekî siyasetvanekî vegeryayî. Ez xeyal dikim… Vegeriyayî… Piştî wê tu buyî wekîlê gel, tu ketî parlamentoyê, dê wî demî çi bibe?

---: Ji niha ve di serê her kêliyê de saziya wekîlê gel…

ORAL ÇALIŞLAR: Na, min ne wisa di wateya bûyîna welîkê gel de pirs kir. Yanê di encamê de rewşa giyana vî şerî hêdî hêdî wergeriya tiştekî din, ma nabe?

---: Ma wisa nebe dibe… Hûn gava din li ser teoriya şoreşê hinekî sekînin. Yek şoreşger bi hêsanî nakeve van rewşan. Ew di çûyîna xwe de pir bi bandor e… Pergal bihêsanî wî dagir nake. Dihejîne, bi tarûmarkirinan re rê ji nûbûnan re vedike. Niha em derbazî sosyalîzmê bibin, hema li pişt vê re jî…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê niha me dîmenên li Yêkitiya Sewyetan bi hev re temaşe kir, li Çînê jî rewşek tê jiyîn. Vaye dibêjin li Kubayê bûyerek heye. Li aliyê din tu jî wekî mirovekî sosyalîst, wekî rêberekî sosyalîst, hûn dibin dîroka cîhanê ya sosyalîstî. Ev hatiye jiyîn. Hîn di nav rastiyê de ne, sosyalîzma ku we dayî tayînkirin li ku derê ye?

---: Ez hîn jî dildariya xwe, coşa xwe, zanistiya xwe ya sosyalîzmê pêşdixim û berdewam dikim. Ez, qet ti demî neketim nexweşiyên sosyalîzma pêkhatî. Dema ku bi hêza sosyalîzma

pêkhatî derketin li pêşiya min, min bertekekî bi hêz nîşa da. Lê min bûyîna sosyalîstî jî pejirand.

Jixwe sosyalîzma pêkhatî ya Sowyetê, ya devokên wê yên li Tirkiyê her tim jê dûr mam.

ORAL ÇALIŞLAR: Ma di vê pêvajoyê de ji Partiya Komûnîstên Tirkiyê gazind nayê kirin?

---: Na, me her tim rexne lê dikir. Ez tevlî coşa şoreşvanên ciwanên Tirkiyê bûm. Lê belê nîqaşên sosyalîstî ku dikirin, min hinekî bê wate didît. Hîn jî ez wisa dibînim. Aliyê wê yê zimandirêjî pir giran bandor dike. Heta ku bê xwestin ez wekî tarzekî, şkandin, qelebalix, berjewendîperest dinirxînim. Lê li hember wê stotukoperestî û kevneperestiya civakê dîsa wekî tevgerekî pêwîst e tevlîbûnekî herî zêde bê kirin dinirxînim. Jixwe min biryara xwe ya di wî alî de da. Ji salên 1070’an û vir ve berdewam dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Niha hûn di derbarê sosyalîstên li Tirkiyê pir hişt rexneyan dikin. Eşkere eşkere hûn dibêjin ku; “vaye ev nabin mirov, her tiştên van nebaş e…

---: Na, na. Yanê niha ev ne bê rexne ne. Wisa bihizirin ku sosyalîstan, niha dema desthilatdarî tê gotin, memurtiya belediyê dinasin. Tê bêjî pirsgirêk ew qasî kevinbûna wê mezin e, dê tu yê di nav wan karên qirêj ên pergalê de xwe xurt bikî. Ev kasayet bi xeter e. Yanê wiha rexnekirina me ji kaseyetiya xeter re, nabe xirabkirin, nizanim nabe ku bi şêwazê hişbûbê bê nirxandin. Hîn jî li ser sosyalîzmê tevî ku bi giştî ji pêkanînên wê yên kiryarî, nebesî, nexweşikî, pêwîst e mirov wekî berhevbûnekî girêdayî eslê wê bimîne dinirxînim. Ez bi rêzdarî ji baweriya sosyalîzmê re û ji mîlîtanên wê yên hilbijare re bibîr tînim. Ez dibêjim ku pêwîst e ev qasî neyên gemarîkirin û neyên gunehbarkirin. Kubaya ku îro jî

dikeve nava vê. Stalîn jî dikevê. Lenîn jî dikevê. Rewşa sosyalîzmê, wekî heviyekî ji mirovahiyê re ye. Her demî dîrok jî hatiye wê derê.

Ez di Îslamiyetê de Îmanê Alî, tevgera ku Hz. Alî nûnertiya wê kiriye, di demê xwe de wek sosyalîzmê dinirxînim. Ew kolektîvîzma wî, ew mîlîtaniya wî, ew girêdaniya wî ya ji heyîna pîroz re, karakterê wî sosyalîstekî vegotin dike. Helbet li gor giştî, yanê em bêjin ferdparêz e. Ferdparêzekî Muawiya ye, desthilatparêz e. Helbet hûn ê bêjin Alîgerî, Alîvanî. Sosyalîzm nûnertiya beşên hîn proleterî dikin. Dibe ku serê herî ji Şoreşa Fransayê, serê herî dawî komûnîst in. Li wê derê jî sosyalîst hene. Di destpêka serdema şoreşa burjuvayê de jî wekhevî, kolektîfî û rêgezên pir girîng hebûn. Dibistanên wan hebûn, yanê rêbazekî nayê cudakirin a dîroka mirovahiyê ye. Ûtopyaya sosyalîstî, li Sowyetan ket rewşa qazancekî pir berfireh.

Mesela tevgera Robert Owen yan jî kooperatîfan jî damezrandinekî sosyalîstî ye. Lê ev di çerçoveya kooperatîfî de man. Li Sowyetan jî di çerçoveya van welatan de ma. Belkî sibê bi pêngavekî nû, hîn berfirehtir di çerçoveya cîhanî de pêkbê. Lê belê mirov rabe sosyalîzmê bi mînakên dîrokî bide pêkanîn yan jî bi şêwazê li erdnîgariyê çi qasî belavbûye, pêwîst e sosyalîzm wiha neyê nirxandin.

Li gor min sosyalîzm, zanista pêşxistina mirov, kes û civakê ye. Ne ya welat, netew û gergalan e. Li gor min taybetmendiyên dewletan, pêşketina dewletan, pêşxistina welatan, divê zêde sosyalîzmê têkildarî neke.

ORAL ÇALIŞLAR: hûn dikevin niqaşa dîktatoriya proleterya.

…: Bi baldarî temaşekin gotinên ku ez vedibêjim. Em sosyal

in, di pîvaneke gîrîng de mijareke exlaqî ye. Tenê meseleyeke sîyasî ye, fikrandina wek meseleya aborîbû îcada kî? Pêwîst e mirov wî kesî bibine û rexne bike. Kesayetiya sosyalizm, mirovên kollektîf, bi taybetî jî ji pergalên koletî yên cûrbecûr û ya herî girîng, parastina li hember pergalên emperyalist-kapîtalîst ên herî dawî bikaribe îfade bike. Ne şerte ku di asta dewletê de, di asta dîktatorya proleterya û şoreşê de be. Ez vê naparêz im. Çima hîn jî mûslimantiyek pêşdikeve.Çima li Îranê ayetullahan ew qas xurt in? Ew bi nefsên xwe re têkoşînê kirin. Bi salan, bi sedan salan û bi domdarî çandeke ayetullahan avakirin û ev dibe ku rojeke di daxwazê(îkbalê) de be. Niha, li Tirkiyê yên sosyalîzmê weke têşeyeke jiyanê hilbijêrin û di wê jiyanê de dimeşin hindikin. Dîtîna min a jiyana sosyalîzmê tenê weke şereşeke siyasî, weke meseleyeke bilindbûna aborî her ku dîçe dikeve zehmetiyê. Heya dikeve pilana duyem in. Erê, pêwîst e sosyalizm îktîdarê bike hedef, dewletê bigre dest lê belê, ev mijar hemû pêwîst e nebe bilindkirina îktîdarê, jixwe damezirênerên wan jî vê yekê digotin. Pêwîst e her ku biçûna bitefandana. Pêwîst e, her dem li ser vê têşeyê bê seknandin. Baldar be, dema ev wisa bin jî unsûrê min in, wê welatê min wisa di serî de bimîne, wê wisa di pêşbirkê de be û nizanim derbasî ku derê bibe, ev gotinên hawane li ser sosyalîzmê ne. Baldar be, sosyalizm di astên herî girîng de li vê derê weda dike.Mirovên ku ez rêve dibim(pêwîst e vê yekê bigotana) mirovên herî xweşik yên dinyayê ne. Hewceye, rastiya wê jî hinek wisa bibûya, pêwîst bû ku hemû pêşketîna çandî ya mirovahiyê fêmbikirina. Li ser vê esasê wekheviyê, azadiyê temsil bikirina û diviya ku her mirovek, ji her têşeyê mirov rehet bibûya. Bi kurtasî aramî anîbûna. Ji xwezayê re jî rûxandinê neanîbûya. Ji xwezayê re jî ji civakê re jî bi aramî nêzîkbûn, li vê derê rewşên ku tên wundakirin hene, yanê niha em dibêjin Çîn, Çîn çi ye? wê demê pêşketina netewa Çîn pêwîst e, hûn bibêjin. Temam ew enternasyonalizm, ji ber ku netewa Çîn pêşbikeve wê mirovahî jî pêşbikeve. Ev di gotinê de wisa ye lê, di pratîkê de newisa ye. Netewa Çîn wê pêşbikeve, pêşbikeve, pêşbikeve… Weke ku li

sovyetan çêdibe, her ku biçe dawî her ku birokrasiyeke gelek bûye navendî, gûndeki herî biçûk a ku bûye navendî û wê pêşengek bîne. Bê exlaqiya herî nebaş di jor de lêyîstin e. Di encamê de dibe ku Çîn weke dewleteke şoven û empreyalîst li sere mirovahiyê bibe belayek. Belê, dibe ku niha ber bi başbûnê de diçe. Dibe ku hinek sosyalist jî bimîne. Lê, pêwîst e vê sosyalîzmê bi mirovahiyê re parve bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: mesele çawa?

…: Çawa, wê Çînê bi plan ve nefikire. Nizanim bilindbûna çînê wisa, nizanim lezbûna bilindkirina wê wiha bibe… Ez nabêjim Çîn hemû van yekan bila înkar bike. Aliyekê sosyalîzmê yê enternasyonalîst heye. Enternasyonalîzîm bi gotinên zûwa nameşe.

ORAL ÇALIŞLAR:Lê, heya niha bi gotinan hat çêkirin û hate rêvebirin.

…: Ji ber ku bi gotinan bû, di welatekî de ceribandina sosyalîzmeke cidî nehat jiyîn. Kûba jî wisa ye. Nizanim Kûba wisa ye, Kûba wiha atletîk e, nizanim Kûba wiha hezdike, Kûba wiha çoş dibe. Ev hemû ne sosyalîzmê, şovenîzmê îfade dike.

ORAL ÇALIŞLAR: Dibe ku wan taybetiyan didin mirovan…

…:Ez nabêjim ku bila karê xwe hêza xwe bihêle were bikeve pey gelên din. Na, tiştê ku ez li vê derê dibêjim; ji dêvla ku li Kûbayê sosyalizm wiha çêbibe, hinekê pirsgirêkên bingehîn ên mirovahiyê pilansaz bike. Dibe ku ev hemû di raporekê de neye çareserkirin, qet pêwîstiya wê jî tune ye. Lê, herî kêm îro Îran di çarçoveya xwe de eleqeya li hember enternasyonalîzma îslamî dîde nişandan, hewceye, bi sosyalîstî bide nîşandan. Îran, dibe ku ji

welatê Îran hîn zêdetir lê vê yekê baldar be û tevî ku herî zêde tê hedefgirtin jî wê bimeşîne. Sosyalîstan vê jibîrkirine.

ORAL ÇALIŞLAR: Çawa, min fêm nekir? Tehlîla we ya ku li ser Îranê kir.

…: Dixwazim bibêjim feraseta îslamiya xwe belav dike. Tevî ku di bin dorpêçkirinê de ye jî.

ORAL ÇALIŞLAR: Bele, yanê ew jî dibin enternasyonaleke îslamî gelo?

…: Gelek rast e. Ew jî enternasyonalîsteke.

ORAL ÇALIŞLAR: Tişta ku Îran dixwaze belav bike jixwe belavkirina serweriya xwe ye. Yanê ne Îslamiyêtê.

…: Belav bike jî bila îslamiyetê belav bike. Ez ji vê yeke re jî rêz digrim. Tu li ser navê sosyalîzmê tenê netewîya ezotî, welatê tenê.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, yanê yên yekîtiya sovyetan…

…: Na, bûyîna hemû ji bo sovyetan, hemû ji bo mezinbûna netewîya xwe îro tê fêmkirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yê îranê çi ferq dike. Ew qas jî dibe.

…: Na, ne ew qas jî…Ez, serdemeke pêkanîna sovyetan jî ji bo gelan înkar nakim.

ORAL ÇALIŞLAR: Temam lê, di dawiyê de berbelavbûyînê çêkir.

…: Berbelavbûyînê çêkir, temam…

ORAL ÇALIŞLAR: Ji navê wê re got enternasyonalizm.

…: Ez li hember vê yeke me. Qet nebe Îran bi bawerikirinê ve îslamiyetê belav dike. Erê, dewlet felan na lê, hinek dibêje îslam ev e û belav dike. Di vê de hinek cîdî ye. Sosyelîstên Tirkiyeyê nizanim yên kijan welatan bi felsefeya her tim ji min re rabbena ve jiyan kirine. Sosyalîstbûnên wiha felan nabe. Helwestên herî şovenîst in. Niha îro li welatên Ewrupaya rojhilat faşist pêşdikevin. Ev ji aliyê sosyalîzma pêkhatî ve hatiye temsilkirin. Parastina rûmeta yek sosyalîstek li rojhilatê Elmanyayê qet heye? Li welatên Rojhilata Ewrupayê tu kesên ku diparêzin heye? Ev sosyalîzma heyî, derxistiye holê ku ne sosyalizm e. Yanê derxistiye holê ku sosyalîzma Rabbena her tim ji min re ye. Çawa derket? Çawa pêşket? Ew meseleyeke cûda ye. Rexnekirineke cidî pêwîst dike.

ORAL ÇALIŞLAR: Belê, niha weke pratîkî dema em lê binerin, hûn jî vêya dibêjin, hûn dibêjin ku: Sosyalîzmên ku heta îro hatine bikaranîn, giştî taybetiyên netewperestiya rojhilat hildigrin û her kes berjewendiyên xwe derdixin pêş. Yanê ji ber ku hemû mirov ne baş in ji bo vê? Ango, dema em nirxên me yên paşerojê û pratîka xwe binerin di van deran de pirsgirêkeke heye. Pêwîst e ku em bibêjin van mijaran li ber çav re derbas bikin.

…: Niha, kurdistan tevî ku welat û gelên herî zêde tê perçiqandin e, ez nabêjim hemû şoreşa me ji bo kurdîstanê ye, nabêjim ji bo mirovên Kurd in. Di şexsê mirovên Kurd de hinek mirovahiyê zevt bikin, a çê ji min re.

ORAL ÇALIŞLAR: Hemû şoreşger dema destpê dikin wisa destpê dikin.

…: Na, ne ew qas jî.

ORAL ÇALIŞLAR:Wisa nebû?

…: Ez pesnê xwe nadim.

ORAL ÇALIŞLAR: Ji ber ku we pesnê Kurdan da nabêjim.

…: Ez pesnê Kurdan nadim. Hemû tiştên ku em dikin em dibêjin ew jî însan in, ew jî dikarin bi şeref û bi rûmet bibin. Di vê mijarê de gelek bi israr im û şerekî me gelek bi hêz heye. Sosyalîzîm jî di cewherê de wunda nekir. Di bikaranînan û esasan de wunda kir. Li gor min dikare pêngaveke nû bike.

ORAL ÇALIŞLAR: Dikare bike helbet, ew tiştek cûda ye.

…: Lê belê, kesên ku di weke sosyalist bîmînîn de israr bin pêwîst e, teqez xwe di ber çav re derbas bike. Heke, li Tirkiyeyê kesên ku bi awayeke cidî bibêjin em dixwazin bibin sosyalist hebin, bizanibin ku teqez xwe hinek ji nû ve bigrin dest. Di gelek mijaran de bizanibin ku xwe bigrin dest. Sosyalîstek heke bi awayeke lez bişemite milê rastê, di binê vê de rewşeke felsefîk, kesayetî û exlaq heye. Rewşeke ber bi faşîzbûnê ve çûyîn heye. Lê belê, xeta di navbera sosyalist û faşist de hema-hema ji holê radibe carinan. Îro ji berbahîyên sosyalîzma pêkhatî pêkhateyên faşist ên bi hêz derdikevin. Encama ku ji vir derdikeve, di rastiyê de çanda sosyalistan jî sosyalist xwe ji pîsîyên kapîtalîzmê û ji aliyê wê yên xeteriyê rizgar kiriye. Rexnekirina vê pêwîst e ji nû ve bê pêşxistin, ji ber ku sosyalîzma dewletê wê gelek bişibê faşîzmê…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, ciwanan jî…

…: Ev rêbaz rêbazeke çi qas baş e. Qey wê di demên pêş de bên nîqaşkirin. Pêwîst dike nêzîkbûna îqdîdarê di ber çav re derbas

bike. Hewce dike, nêzîkbûna xwe ya ji enternasyonalîzmê re, nêzîkbûna xwe ya ji rojhilat re di ber çav re derbas bike. Weke ku ez dibêjim, ji rastiya netewe re, nêzîkatiya pirsgirêka netewe re di ber çav re derbaskirin pêwîst dike. Ev meseleya bilindbûna aboriyê ji nû ve bê destgirtin. Di ber çav re bê derbaskirin. Gelek mijarên ku dişibin vê derbaskirinê çêdikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, meseleyên cûrbecûr di serî de di ber çavan re bê derbaskirin. Di qada teorik de hûn dibêjin. Encamên Fikrandinên ku heta roja îro derketine holê. Di rojên derbasbûyî de axiftineke we ya di rojnameya Gûnlûk de di derbarê sosyalîstan de hûn dibêjin ku sosyalîstên Tirkiyeyê nizanin rêbertiyê bikin, berhemên wan yên rêbertiyê tune ye….

…: Niha, berhemên rêbertî sînorên nizama heyî derbas nekiriye, yanê faşîzîm ew qas ji rê derbixe, mêtîngeriya li ser kedê ew qas qat bi qat bibe û tu yek parastineke anjî tevgera berxwedaniyê pêşnexî, ka li ku derê ye rêbertîbûn? Çima pêşnakeve?….

ORAL ÇALIŞLAR: Di axiftina xwe ya li wê derê de hûn dibêjin ku bila werin em tiştên berhemên rêbertiyê bikaribin pêşbixin û rêbazên wê, bidin nîşandan.

…: Mesele ne ew e. Ez tenezûlê wê jî nakim. Messele mirov xwe di ber çav re derbaskirin e. Gelên te, karkerên te di vê rewşê de bin, tu nikaribî tiştekî bikî, tê wateya ku tu rewşeke sixte jiyan dikî. Ez dibêjim xwe di ber çav re derbas bike. Ev piştgiriyeke sosyalîstî ye. Rastiya netewa xwe, rastiya civakbûyîna xwe di ber çav re derbas bike. Tevgera çînîyê di vê rewşê de nehêle, heke bihêlî ez dixwazim bibêjim tu sûcdarî.

ORAL ÇALIŞLAR: EZ WE PIR DIWESTÎNÎM GELO?

…: Na, jixwe hûn nikarin min biwestînin jî. Hûn nikarin min biwestînin lê, ez difikirim ku ji pirsgirêkan re nêzîkatiyên hinekê rastir pêşdixim. Ev hîn girîngtir e.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, daxwazên heyî kêm dimînin…

…: Hinekê dilnizm bibin. Ez ji bo sosyalîstên Tirkiyeyê dibêjim. Hêviyên xwe qut nekin. Lê belê em hinekê bi dilnizm bibin.

ORAL ÇALIŞLAR::…

…: Weke ku min got, armanca hedefan ev bû; pêwîstiya wan bi dahûrandineke cidî ya rêbertîyê ve heye. Yanê, di gelek tîpên sosyalîstên tirk de jixwe razîbûn zêde heye, dibêjin qey li ser şaşitiyên xwe bigrin rexnekirina şoreşgeriyê ev e. Niha tu neserkeftî yî, rêxistin pêşnakeve, heya têkoşîna sendîkabûnê jî nikare pêşde bibe. Di mijarên herî bingehîn de navê çîna wî tune ye heke hebe jî, bi awayeke rêk û pêk ti meş tune ye. Lê di agirdankê de xwelî nahêle. Ev hinek jî min re hevnegirtî tê. Ez rastiya gelên Tirkan jî bawer dikim. Ez rastiya wan ya çînî jî bawer dikim. Lê, bi awayeke cidî rexnekirin û dahûrandin ji bo wan pêwîst dike. Li gor min tîpa sosyalîstên tirk jî ji nû ve di ber çavan derbaskirinê re bên pêşxistin. Dema ku ez dibêjim bila werin ez alikarî wan bibim, min dixwest ez vê bibêjim, PKK hinek vî karî çareser kir. Di tîpa kurd de bi awayeke yekser dikare pêş de biçe, pêşkeftineke dikare têkoşînê bide bidest xist. Ev ceribandina wê em ji unsûrên Tirk re şîrove bikin, bila bizanibin ev kar çawa ye, bila rêzdar bin. Yanê di nav xwîn û xwêdanê de encama ku em gihiştinê heye. Bila vê bi baldarî bizanibin. Di welatên din de ji hezaran re bi pirtûk xwendinê ve, nizanim bi lêkolînkirinê ve hewl didin vê yekê hîn bibin. Vê carê bila di vê mijarê de Kurdên ku li kêleka wan e vekolîn bikin.

Pêşketina ku hatiye bidestxistin bila ji bo berjewendiyên xwe bikarbînin. Alîkariya min, piştgiriya min di vê çarçoveyê de ye, ango weke din kulekî min ya ku ez ê tirkek biafirînîm tune ye. Lê, ya xwedêyo bila ev kar neyê sere min.

ORAL ÇALIŞLAR: Dema min vê rojnameyê xwend, hîn min serê sibê xwend û li malê bi hevjîna xwe re em nîqaş dikin. Hevjîna min jî ketiye sîyasetê û derketiye, em bi hev re ji wê serdemê tên. Got ku “yanê niha Apo, li vê derê dîmeneke wisa derdikeve ku, şêweyeke wek “zilamê sosoyalîstên tirk ên herî dawî bila were, em bikin zilam.” Bikaraniye. Yanê hinek ber tiştên min re çû. Lê ji aliyekê ve jî wisa ye. Yanê em vêya heq dikin.

…: Helbet belê.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê belê, çima ew qas di jor de li me dinêre.

…: Na, na. Hûn ji ber ku dûr de lê dinerin wisa vedibêjin. Ji bo min bareke giran e. Lê belê, ez bi mirovên tirk re eleqedar nebim, yanê ji bo ez bidim bawerkirin ku ez ne netewperesteke teng im dibêjim ku bila werin di heman ocaxê de em germ bibin.

ORAL ÇALIŞLAR: Em biçin xwarinê, xwarin amade ye, pêwîst e em bixwin.

…: Xwarin, belê em bixwin lê, em li ser karên rast jî nîqaş bikin. Ez dixwazim bibêjim ku ez ew qas enternasyonalîst im ango bi tirkekî re em dixwazin destpê bikin. Mixabin, eleqedarî nîşan nadin. Ji bo îlhamî jî, ji bo wî jî min got. Yanê, destpêkê “dolma” got, dawî jî siyaset û sosyalîzm.

ORAL ÇALIŞLAR:Îlhamî?

…: Îlhamî, belê

ORAL ÇALIŞLAR: YAA!

…: Di sala 1982’an de mêvanê me bû. Temam, yanê dolma jî pêwîst dike, lê sosyalîzîm û siyaset jî pêwîst dike. Yanê hevalên min ên piranî Tirk in. Ez bibêjim yanê îrtîbata min ne kêm e û li tirkiyeyê gelek dostên min hene, alîgirê min hene. Mirovên ku ez nirx didim wan û ji wan re rêzdarim hene. Bi ti awayî kesayetiya tirk ne ecibandin… na, ez gelekî wan ji tîpên me jî serkeftî dibinim. Pîvanên wan ên pêşkeftî jî heye. Lê belê, li gor min ew vê yeke nikarin temam bikin. Dikarin hinekê din jî dewlemendtir bikin, sergihayî bikin, çareserker bin. Yanê bi vê armancê min wê gotinê got. Yanê, ji ber ku ez dixwazim gelek baş bin wê sertbûnê, peyvên hişk bikaranî. Hûn dizanin, dema mirovan bînin asteke baş gelek zêde ser wan de diçin. Pêwîst nake ku berevajiya wê şîrove bikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Bes, dema te xwend, hevalên te yên polê çêbû. Niha ji wan kî heye, mînak tîpên wek “ya binere, yên me jî nizanim kî çi dike, wa… heye” gelo hebûn?

…: Yê min?

ORAL ÇALIŞLAR: Belê, mînak dem dem tê hişê min. Way…, wek Mesut Yilmaz bifikire.

…: Ez ji bîranînên wan re ters neketim. Di wê serdemê de bûm têkoşerê pêşeng a beşa siyasal, taybetî jî nêvenga dawiya 12 Adarê. Di rastiyê de kevneşopiya wan a berxwedêriyê min da berdewamkirin. Hûn dizanin ez di hundir de jî mam. Ew rêxistina we ya THKP-c…

ORAL ÇALIŞLAR: Na, beşekê wan li wir bûn.

…: Belê, ew Ferît wan li wir bûn. Bi wan re gelekî di nava germahiyê de bûn û min bîranîna wan anî heya roja me ya îro. Sosyalizm, berxwedanî, têkoşîna çekdarî, şerê gel, gerîla… gelek ji wan îşlikê sor li xwe dikirin. Niha em hîn jî wê ala sor li çiyayan berbayê dixin. Em li wan berevajî neketin, me navê wan jî bilind kir. Hinekê û pergala heyî ji wan re heke îdama Denîz wan li ser wan didan ferzkirin, nizanim heke civakeke ji xerapbûyînê neçûbe xerabiyekê, yanê xwe ne biribin ber bi aliyê rewşeke wisa bandora herî mezin a derketina me û ev çalakiyên me heye. Me îdaman dan sekinandin. Ev zagona înfazê çalakiyên me derxistin holê. Niha jî kar û xebatê vî zarokî baş e. Pergal,weke bere êrîşî wan nake, tavîz dide. Hûn dizanin, “pîrîma Apo” tenê li kurdistanê bandor nake. Hinek li tirkiyeyê jî bandor dibîne. Ez vê yeke ji pesnê xwe bidim nabêjim. Ev, li hember tiştên ku me ji wan xwestiye, tiştên ku me daye wan e. Lê, mirov dixwaze ku eleqayê bidin pirsgirêkên hîn bi koktir. Hevalên me yên siyasalê hene. Hinek ji wan hîn jî bandorbûnên xwe berdewam dikin. Hûn jî ji wan in û berdewam dikin. Hîn jî berdewam bikin, bi hêsanî teslîm nebin, sitûyê xwe xwar nekin, hîn zêdetir li dûv xebatên homojen an jî rêxistinî bazdin. Îkdîdarê jî nêzîkê xwe bikin. Xwe qirş û qalên faşîzma 12 Ilonê nepêçin, pêwîst nake. Damezirandina dinyayeke nû, qasî xwestek û coşa wê serdemê weke ku ez dibêjim ji pratîkê re, em xwe di ber çav re derbaskirinê, pêwîst e hinek em alikarî pêşkeşkirinê berdewam bikin. Ez hîn jî xwedî îdîa me. Yanê em ê berê xwe bidin Tirkiyeyê jî. Yanê van me bi zorê ji hev biqetînin jî ez zû bi zû naqetim. Ji ber hesabên ku bên pirsin hene. Hesabên min ên ji stenbolê pirs bikim hene. Dibe ku hûn bibêjin “heya vê derê xwe dirêj nekin”, ez ê xwe dirêj bikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Çawa, yanê hûn ê xwe dirêjî Stenbolê jî bikin.

…:Hesabên ku ez bipirsim hene. Li Stenbolê mêtîngeriya

kombûyî heye. Kirêjiya kombûyî heye. Nexweşîkbûn û êş hene, xweşikbûn jî hene. Ez ê berê xwe bidim wan. Heke hêza min têrê bike…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, em xurt in. Dema ku tu dibêjî ez ê berê xwe bidim, bi taybetî jî wan rojan li bakirkoyê çalakiyek çêbibû, par…

…: Ne ew! Ez wê nabêjim. Ew cûreyên berxwedanî û meş ez zêde bi wate nabînim. Şêweya berê xwe dayîna min gelek bi kok e. Ez ê berê xwe bidim rojava. Bila qet gumana we ji vê tune be.

ORAL ÇALIŞLAR: Wê berê xwe danîbûnek çawa be gelo? Mînak niha berê xwe didî Kurdistanê derdikevî çiya, şer didî, ê… niha li bajêr mirov nikare derkeve serê çiya, gerilayê bajêr…

…: Ez bawer dikim niha birayê me xoceyê Yalçin Kûçûk dibêje "pêwîst e em Apo bikin rojavayî û bikin tirkiyeyî" ew hinek meseleyê fêmkiriye qey. Ez ê berê xwe bidim. Li ser vî esasî ji mirovên tirkiyeyê re peyama min heye. Ez ê berê xwe bidim wê tirkiyeyê ew kesên ku li ser tirkiyeyê ne û herî zêde ji tirkiyeyê veqetîn e. Ji tirkiyeyê re û ji gelê tirkiyeyê re jî berevajî ketine û ez dibinim ku ketine rewşeke ajantiyê û kilîkbûnê. Ez qet li wan naynim. Ji bo ku gelê tirkiyeyê ji wan hesap bipirse em ê alîkariyê bidin û berê xwe bidin wan.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê tişteke çawa? Dema ku hûn dibêjin "ez ê berê xwe bidim" ji bo ku ez vê ji hev derxim ez dipirsim. Temam, yanê niha…

…: Niha di her astê de ez ê berê xwe bidim.

OARAL ÇALIŞLAR: Yanê, bi faliyetên çandî an têkoşîna

çekdarî ve?

…: Na, na! Bi çanda sosyal, bi çanda rihî, bi aborî, bi leşkeri…

OARAL ÇALIŞLAR: Jixwe li Stenbolê PKK bi rêxistiniye.

…: Na, bi temamî!

ORAL ÇALIŞLAR: Ne birêxistin e?

…: Ez hin tiştên din vedibêjim. Di her astê de bikevin nava mirovên tirk û ez ê berê xwe bidim wan. Tenê, ne wek PKK. Ez ê berê xwe bidim, pêşkeftina vê di demên pêş de hûn ê bibînin. Pêwîst e em tirkiyeyê ji kesên nelayiq in re nehêlin. Xweşîkbûnên Tirkiyeyê heye. Pêwîst e em van xweşîkbûnan ji wan re nehêlin. Ev mijareke gelek girîng e. Tê fêmkirin?

ORAL ÇALIŞLAR: …

…: A ku pêwîst e neyê hiştin tirkiyeya xweşîk, gelên tirkiyeyê yên xweşîk hene.

OARAL ÇALIŞLAR: Ez vê pirsê ji aliyê teorîk ve ji bo tiştê ku di wateya wê de we gotiye dixwazim vebikim dipirsim…

…: Yanê, ez bawer dikim ku hûn mafekê ji min re zêde nabînin. Qasî ku hûn bi Kurdîstanê re eleqedar dibin ez jî dixwazim bi tirkiyeyê re eleqedar bibim.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê, hûn dibêjin em xwediyê vî mafî ne.

…: Heke em enternasyonalîst in ango hûn bibêjin cudahiyê

neke Apo, temambûyînê, bi hev re bûyînî bike, ez jî niha bersiv didim we.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez tişteke wisa nabêjim yanê…

…: Na, yanê hûn alîgirê yekîtiyê ne? Bihevrebûyînên xweşîk…

ORAL ÇALIŞLAR: Ez alîgirê bihevrebûna van netewên ku di nava wekhevî û azadiyê de ne.

…: Temam, ji bo vê ez ê werim. Ji bo yekîtî û hevrebûna xweşik ez ê werim. Ên ku vê yekê asteng bikin ez ê wan bigrim. Ez nizanim ji ku dera wan bigrim û çi bikim?  Ez ê werim! Ew bi awayekê hatin Kurdistanê, ez ê bi têşeyeke din werim tirkiyeyê. Li gor sosyalîzîmê ez ê werim. Yanê mireqan nekin, ez ê weke kurdeke netewperest neyêm. Heya weke ji tirkekî herî bi tirkekî dijwartir ez ê bêm. Bisekinin, hûn ê bibînin. Bi meraq, bi heyecan û bi dostî li benda min BİSEKİNİN!

…: Bele, hinek jî kemalîzîm…

…: Ya niha hûn kemalîzmê di ber çavan re der bas bikin. Ê ku Mustafa Kemal ji we baştir fêm dike ez im. Birêz Bîrand her tim ji min dipirsî “hûn Atatûrk çawa dibînîn, hûn xwe bi wî re qiyas dikin” ji qiyasbûnê zêdetir min got mînak, Atatûrk bi kolorduyan ve dest bi vî karî kir, min bi deyndar dest pê kir, yanê tifingeke min a çat pat jî tune bû. Dosteki min jî tune bû. Min got pirsgirêk ne ew e. Yanê ew leşkerek bû. Mîsoger e ku ew rûtbeya xwe difikirî. Di kesayetiya wî de bandora rûtbeya wî mezin e. Mercên ku rûtbeya wî pêkhat, hûn dizanin di mercên ku împaratorî hatibû belavkirin û êdî ji tirkbûnê wêdetir ti havîrdor nemabûn de her wiha bûyîna wî ya netewperestiya zêde jê nerevî bû. Lê, vê yekê wê şêweya paşatiyê

bikirina. Xwe bi sapartina herî asta jor ve wê bikirina. Pêwîstiya rutbeya wî bû. Ji bo ku di van mijaran de ez wî sucdar bikim nabêjim lê, niha ji van herdu diyardeyan ve tevbigerin û kemalîzmê bikin dîrok, bikin pêşeroja hemû civakê; wê ji axa tirkiyeyê re, ji axa anatoliyê re bibe bêrêzdariya herî mezin. Ne Mustafa Kemal ew qas mezin e, ne jî yekî din. Tu rêbertiyek, ji mirovahiyê re ew qas bi hegoman û dagirkerî ve nêzîk nabe… ji vê yekê re em dikarin bibêjin girtina bin bandora xwe.

ORAL ÇALİŞLAR: Niha ez dixwazim aliyê vê karî bizanibim. Yanê kemalîzm, kemal çi bû ne çi bû?

---: Niha pêwîst e ku em vê bibînin. Rastiya tirkibûna anatolyayê ji Mustafa Kemal mazintir e. Rastiya mirovan ji rêbertiyan mezintir e. Naxwazim rêberan înkar bikim. Ji min re jî wisa dibêjin. Ez xwe dahûner dikim. Li gor min gelek li ser xwe ve çûn. Rewşa Mustafa Kemal ya di nava civakê de pir nitirandin. Cihê wî ya di nava dîrokê de hate nitirandin(abartma) ji pêşerojê re gelek hate belavkirin. Belavî hemû paşerojê bû. Derxistin asta xudatiyê.

ORAL ÇALIŞLAR: Giringiya vê yekê tune ye, yanê encamên fikrî…

…: Nebe dibe, îro hûn gelek di rewşa neçariyê de ne. Komara tirkiyeyê bê çreserî ye. Ev pirsgirêkeke bi kemalîzmê ve girêdayî ye. Heke hûn dahûneriya kemalîzmê nikaribin bikin ( li gor rastiya kemalîstê) hûn qeyrana komariya me ya îro nikarin derbas bikin. Gotina komariya duyemîn min nekir. Nîqaşeke herî di asta jor de tê kirin û berdewam dike diçe. Heke nîşaneyên xitmandinê nebûna ev nîqaş dernediket û ev jî heya kesayetiya kemalîzmê neyê dahûrandin wê zêde ji derketinekê re rê veneke. Ev ne biçûkxistin e, ji daxistina nirxdayîna M. Kemal e. yanê, gelek behsa kemalîstbûna rojnameya we tê kirin. Rojnameya we bixwe jî dikare rexneyan ji

kemalîzmê re bîne û erka kemalîzmê ya erênî dikare berdewam bike. Ev hisûseke gelek girîng e. Mînak; we got bi birêz îlhan selçûk re em wiha hevdîtînê dikin û nîqaş dikin. Ew hewl dide ku kemalîzmê gelek baş bîne ziman. Bi taybetî erka vî ya erênî dixwaze derxe holê. Lê, li gor min pêwîst dike ku hinêkê bikaribe rexnekirina wî jî bike. Heke bikaribe bike, di rastiyê de ji bo kesên ku bê rizgarkirin jî çare ye. Mixabin, ev aliyê wî nenîşandan li ser navî wî lewaziyek e. Na, her tim bi pesindayînê ve pêşxistina wî ez bawer dikim ku ji kemalîzmê re jî nayê wateya başiyê. Ez bawer dikim ku hinek bikaranînan temsil dike. Pewîst e em wî bikin rojaneyî. Heya, nîvîseke wî ya erênî, ji taybetmendiyê wî yên destpêkê re hinek berevajî bibin ango lêkolîn bikin derxistina holê jî modeleke pêşxistinê ye. Bi ti awayî eleqeya xwe bi şoreşgeriya dijber nizanim laderî(doneklîk) ve tune ye. Hûn dizanin, rexnekirin dem dem pêwîst dike. Dîroka marxsîzîm jî dîroka rexnekirinê ye. Pêşkeftîn jî herî zêde li ser vê bingehê derdikeve holê. Rexnekirina kemalîzmê pêwîst e bi rastî bê çêkirin. Hewceye, di bin navê misakî-mîllî, temambûyîna yekîtiya netewbûnê, bi qedexekirinan ve veşartin û bînin rewşeke neçêbûnê bê revîn. Mîsakî-mîllî jî ji bo mirov e. Li gor min temambûyîna yekîtiya tirkiyeyê jî ji bo mirov e. Heke ev têgînên heyî mirovan aciz dike, biçûk dike, li hember hev dibin ber bi şovenîzmê, gelan rehetsiz dike, pêwîst e van têgînan jî bên nîqaşkirin. Ji ber weke ku min got ev jî ji bo mirovê tirk e. Mirovê tirk ne ji van têgîna ye. Ev têgîn ji mirovê Tirk, ji bo civaka Tirk an jî gelên ku li tirkiyeyê dijin in. Heke îro van têgehan di makezagonê de êşkence be, hatibe qedexekirin, girtin be wê demê pêwîst e em bifikirin. Di van têgehan de dak û dolab heye. Pêwîst e ev bê rexnekirin. Jixwe kemalîzm jî heke di dîrokê de cihekê nû digre, qasî ku ji vê rewşê re bibe derenceyek wê wateyek îfade bike. Ji kerema xwe re hinek gotinên min fêm bikin. Ji ber vê yekê ez bi rexnekirinên xwe ve rêbaza xerabkirinê hilnabijêrim.

ORAL ÇALIŞLAR: Balkêş, nêzîkatiya te ya ji kemalîzmê re

jimin re gelek balkêş hat. Hem bi dîrokî dikarim şîrove bikim, hem rexne bikim hem jî derenceyek nû…

…: Erê. Ev tahlîlên nû ji bo we gelek girîng e. Binêrin niha bi we re bi rastiya tirkiyeyê ve ez ê têkevim nava şerekî mezin. Yanê ez berpirsiyartiya xwe tînim ber çavan û van mijaran diyar dikim. Li hember kemalîzmê jî hewl didim şerê herî mezin bikim. Lê, rastiya kemalîzmê wê çawa bê destgirtin ji kemalîstên herî baş jî hîn baştir çêdikim. Wan xwe teng hiştin, nezayok hîştin û ez bawer dikim ku li kemalîzmê re jî başî nekirin. Ez, dem dem vê pirsê jixwe dikim, îro li hemberî min M. Kemal hebûya min ê van karan hîn baştir rêve bibirina, ez ji vê bawer im. Ew bixwe hebûya, bi dahûrandinan, rexneyan û têkiliyên li hemberî hev dê me pêvajoyekî erênî daba destpêkirin. Lê mixabin bi navê Kemalîzmê, bi qambostan çareseriyê dixetimînin.

Kîdera neçareserkirinên Kemalîzmê nûnertiya Atatûrk dikin? Van paşayan çi qasî Atatûrger in? Ez dem dem dibêjim, hebe hebe ew dikarin bibin karîkatûrê wî, nabin ew bixwe. Yên pêşkêş jî dikin li pêşiyê astengên cidî ne. Yanê bi Kemalan, ên ku têkildariya wan herî bilind ew bixwe, bila şîroveya vê ya rast bikin û derbazî roja me bikin. Ji bo çareseriya pirsgirêkan belkî serê meseleyê bidin. Wekî din li aliyê din jî pêwîst e bê rexnekirin. Pêwîst e mirov nêrîna wî ya olî, nêrîna wî ya laîktiyê rexne bike. Pêwîst e mirov nêrîna wî ya dîrokê rexne bike. Pêwîst e mirov nêrîna wî ya netewî rexne bike. Ji van tevahiyan dibe ku karakterek civakekî ya bi hevseng, hizir û projeya vesazkirina civakî derbikeve. Ez dihizirim ku wê ev baş be dibêjim. Di pêvajoya pêjiya me de dê ji nû de avakirina Cumhuriyetê çêbibe. Min di vê mijarê de hizra xwe got, yanê dê Kurd jî bikeve navê, dê Tirk jî bikeve navê, dê çandên kêmnetew jî bikeve navê, dê ev Tirkiyê dewlemend bikin. Dê gelên li Tirkiyê werin rewşa gelekî bikaribin bi hev re bijîn.

Modelekî ev qasî Kurdan biçewisine dê zêde nejî. Modelekî ev qasî teng nêzîkî çandên Anatoliyê dike, najî û hinekî jî mirovên Tirik mezin nake, qambostê rizgar nake. Ji girêdaniya ji der ve rizgar nake. Ez di vî bingehî de nêz dibim. Bi modela yêkitiya bi Tirkiyê re, di rastiyê de rêzgirtina ji rastiyên dîrokî yên Anatoliyê re digire nav xwe. Bi rêzdayîna mezintirîn a gelan digire nav xwe. Têkildariya bilind a bihevrebûyîna jiyanek hîn xweşik dide nîşandan.

Wekî din çi ma? Ez wer bawerim ku pêwîst e em yek du analîzan li ser emperyalîzmê jî bikin. Jixwe li gor min ev wekî girêdayî sosyalîzmê hatiba destgirtin. Ez hîn jî bi diyardeya emperyalîzmê bibawer im. Ez bawerim ku di van demên dawî de jî di vê mijarê de pir helandin heye. Emperyalîzm NÎNE! Nîzama Cîhana Nû heye yan jî awayê emperyalîzma kevin hatiye jêbirin. Rast e, dibe ku awayê emperyalîzma kevin belkî nemabe, lê emperyalîzm li gor min bi rewşekî hîn cuda girtiye û heyîna xwe hîn bi bandortir dide berdewamkirin. Hanê dibêjin ya; “Vaye emperyalîzm hatiye rewşa diyardeyekî hundurîn, nizanim vaye mîtîngeriya kevin bi hinek bi burjuwayên komprador dihatin meşandin. Emperyalîzm ne bitenê di asta gelan de, di asta kesayetan de jî hundurîn bû. Emperyalîzm li Tirkiyê jî bû hundurin. Ez ne di wateya çêbûna hevkarên çînî de dibêjim. Heta ket nav kesan, bi taybetî bi çanda xwe ve, yanê ez wer bawerim ku emperyalîzma çandî, bi taybetî piştî 1980’an re pêşketina wê ya herî bibandor e.

ORAL ÇALIŞLAR: Piştî hilweşandina sosyalîzmê…

---: Erê, emperyalîzma çandî, emperyalîzma bêexlaqî pir bi bandor bû. Mirovahiyê perîşan kir. Ez ji êrîşên wê yên siyasî, leşkerî, aborî hîn zêdetir, êrîşên wê yên çandî û exlaqî xetertir dibînim. Ez wer bawerim ku ev jî karakterîstiya 10-15 salan dide vegotinkirin. Bi taybetî bi ecêb êrîşî pêşeroja mirovahiyê dike. Pir

ecêb êrîşî exlaqê wê dike. Bi ecêb êrîşî kevneşopiyên wê yên çandî dike. Ev tew Emerîka bi tirsnak êrîş dike. Êrîşa wî ya ji xwezayê re jî derketiye ser rûyê erdê. Êrîşa wî bi awayekî giştî derketiye û eşkerebûnê. Li gor min xeteriya herî mezin, xeteriyek mezin e û ez wisa vê xeteriya mezin welat dagir kir, nizanim bi şêwazê hegomanyaya xwe ava kir jî nanirxînim, wê derbaz dike. Pêwîst e di vî alî de analîza kapîtalîstî-emperyalîstî bê pêşxistin. Ji bo mirovahiya rastî xeteriyekî ye û cenawirekî ye. Bi serê xwe modela civaka mezaxinê dayî afirandin ji benê xwe filitî ye. Di asta jor de û di şêwazekî cuda de, rêxistinkirin û êrîşkarîkirina bi giştî dildariyên xeterî yên mirovî, bi giştî taybetmendiyên heywanî ye. Balê bikişînin yanê, mirov di roja me de hatiye rewşek hîn pir nayê zevtkirin û her ku diçe pîvanên xwezayî jî û civakî jî lê gef dike. Ev ya têkiliya xwe bi emperyalîzmê û kapîtalîzma ku xwe dispêrê re heye. Niha ji ber vê rastiyê, yanê hûndûrînbûnê bikî hinçet, di rastiyê de “emperyalîzm neba”, “êrîşa wî wekî kevin nîne, êrîşa wî ya leşkerî nîne”, wekî aborî jî wek kevin mîtînger nake. Rast e jî lê ev bû giştî, belav bû, kûr bû, bû gerdûnî û asta xeteriyê hîn jî berfirehtir bû. Vaye pêwîst e sosyalîzm vê bibîne yan jî rexneyên kapîtalîst-emperyalîst di ronahiya van pêşketinên nû de bikaribe bike. Çavdêrî û lêkolînên min ên di vê mijarê de bi sînor in. Lê ez fermanrewatî dikim ku rewş wiha ye.

ORAL ÇALIŞLAR: Hûn fîlmên Amerîkayê temaşe dikin?

---: Ez pir xem lê tînim. Ez pir ji tîpa Emerîkayê nerihetim. Yanê ne ku ez ji bo dihesidim. Ne ku ez ji bo van modelên jiyana wan a bi heybet najîm, ez bi xeterî dibînim. Ez bi sondxarê ku van modelên jiyana wan bixim bin erdê. Belkî ew bixwe jî ji vê kesayetiya min re pir dijmin bin. Ez yê wan ji bo mirovahiyê xeter dibînim.

Emerîka wekî dewletekî kapîtalîst-emperyalîst ya dûhî pir

xeter e û êrîşî paşeroja mirovahiyê dike. Êrîşî kevneşopiyên nirxên bingehîn yên mirovahiyê kiriye mirovahî dike. Ew fîlman nizanim ew tîpê ku bi tarzê Hollywood derxistiye holê, tîpekî cenawir e. Bi rastî dem bi dem bi wan kêştiyên çekên xwe ve jî xwepêşandina wê dide kirin, ev gişt li ser mirovan şûrê demokles e. Mafê Emerîkayê ji vê re nîne. Emerîka ev qasî raser nabe. Tarzê jiyana Emerîkayê nabe tarzê jiyanekî bê pesindan. Tê wateya ku bi pêşxistina nexweşiyên mirovan. Tê wateya ku gûrkirina aliyên neyînî. Tê wateya ku mirovahî rast vegere ber bi maymuntiyê ve. Ez nikarim vê rakim. Dîsa dubare dibêjim ne ku ji bo dihesidim, nakeve destê min, alîkarî ji min re nakin, ez wek gergalekê napejirînim. Lê mixabin di van demên dawî de li Tirkiyê mêldariyek ecêb ji vê re heye, ez bi dilêşî pêşwazî dikim. Her ku xweşikbûnên li Anatoliyê, hîn bi hezaran Emerîkayan binirxtir e. Mixabin ev nehatine pêşxistin û ev bêrûmetî tên dîtin. Ez bi dijwarî rexne dikim û pêwîst e hûn nirxên xwe yên gel û hêsan û yên taybetê we ne bixebitin ku bibînin. Pêwîst e ji Emerîkayê pirtir, hûn dildarê wê bin. Çî ye ev texlîdwariya Emerîkayê, ez Ewrupayê jî naecibînim, Emerîkayê jî…

ORAL ÇALIŞLAR: Tê gotin ku ya herî xweşik e Emerîka ye…

---: Em nekin xirab e. Ez vê wekî maymunbûnê dinirxînim. Vaye dema ez dibêjim ez ê herim li ser Rojavayê, wek din jî ez qala vê xulamtiyê dikim. Di wateya li Anatoliyê de li dij emperyalîzm bûyîn, tê wateya ku li dij vê xulamtiyê ye. Bila deng bikeve guhê wî Îlhan Selçukê we. Van gotinan wek heyî ji wî re bêje.

ORAL ÇALIŞLAR: Na, nêrînên wî di vê derbarê de baş in.

---: Erê erênî ne. Bila baş şer bike, bila me jî baş bibîne ku şervanekî çawa ne. Bila li gor wê di derbarê me de rast biaxive yan jî

bila di vir û wir de neaxive.

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn dibêjin ku, ez li dijî emperyalîzma Emerîkayê me, bila Îlham Selçuk jî vê li dijî emperyalîzma Emerîkayê bibîne û tevger bike, hûn dixwazî vê bêjin.

---: Bila bibîne, em ji çi re çi qasî dijber in, em ji çi re çi qasî dipejirînin jî bizane. Yanê me bila wisa neke mijara cudahixwaziya Anatoliyê gûr dike, nizanim bêje dijberî çanda Anatoliyê ye, mubalexe û şaş nenirxîne. Bila wisa bê ku me qet nas bike, bi rexneyên kor felaqî re rexneyan neke. Em qasî ku ew têgihîje hîn zêdetir rastiya Anatoliyê dijîn. Ez ji wê hîn zêdetir bi zarokekî Anatoliyê re dikarim lihev werim. Ez bi keçeke Anatoliyê re pir baş dikarim bijîm. Ev, bûyîna min a bi Anatoliyêbûnê dide diyarkirin, dide nîşandin ku bi Tirkmenên Torosan re ji yekî faşist hîn zêdetir têkildar dibim. Yanê ez dikarim bi Tirkmenan re li hev werim. Yê min bi vê re jî bi gelê Tirkan re hîn zêde bi sûd, hîn zêde nêzîkbûna dide diyarkirin.  Ez wisa me jî. Bila vê biçespîne, li gorî wê rexneyan bike. Çi qas rexne dike, bila bike, ez xwe nadim paş lê, dê hinek rastiyan piştguh bike, bi şêwazê “cudaxwaz e” nizanim, “xwînê dirijîne” bila neçe tiştên erzan, ev nehêjabûna wî dide diyarkirin. Ji bo rewşenbîrên Tirkan ez dixwazim bi taybetî van rexneyan bikim. Mirov bi dij emperyalîstbûnê re xwedî li dîroka rastiya çanda gelan derbikeve, em heta dawî hene. We Tirkiye pir bi emperyalîzmê ve da girêdan. We gelê Tirk jî pir xirab kir koleyên ber derî. Ez heyf ji vê re tînim. We di demekî de vaye di fermana Îslamê de kirin leşker, niha di bin fermana Rojava de dikin leşker. Heta hûn dikin gêzikvan. Rezîlbûna îro ya Anatoliyê çî ye? Em bi vê sedemê dest daynîn ser, ew Almanan…

ORAL ÇALIŞLAR: …

---: Erê, ez têm wir, vaye ev jî encamekî ya emperyalîzmê ye.

Li gor têkiliyên qirêj ku we bi emperyalîzmê re kirî, we ev mirovan li wê derê tejî kirin. Alman helbet wê ev qasî napejirîne. Helbet hinekî feraseta nijadên jor jî heye û hinekî jî ew welat yê wan e. Tu jî wisa bê hevsengî herî, dagir bikî, tu li her taxê, li her bajarî şevnîşînên Tirkan bidî danîn, dê tu rê ji bertekên wan re bidî vekirin.

ORAL ÇALIŞLAR: Lê heman tişt ji bo Kurdan jî mijara gotinê ye; li Stenbolê, li Enqereyê.

---: Rast e, ew jî şaş e. Ez wê jî şaş dibînim. Ew jî encamekî polîtîkaya mîtîngeriyê ye, rakirin û birin li wan şevnîşînên peravên bajar ê Stembolê û Stembol nexweşik bû, ez vê rexne dikim. Rakirin birin Ewrupayê. Bi wan mirovan bazirganiya koletiyê kirin derbazî wê derê kirin. Qet pirsgirêkekî wan ya cidî negirtin ber çavan. Bi rastî nexwestin têbigihîjin. Bitenê qezenc, diwîz, bi hêrsa hêza karê erzan ev hatin kirin. Niha ev bûyerên trajîk dijîn. Mixabin di vê de jî desthilatdarî berpirsiyar in. Berpirsiyariyeke giran e. Ji bo Kurdên li Stenbolê jî sucên giran in. Hîn jî radikin û dibin rojavayê, hûn dizanin têkoşîna çîna karkerên Tirkiyê jî neyînî bandor dikin. Ji têkoşîna gelê Kurd re jî bandorekî neyînî dike. Ez dibêjim ku em van bi giştî erkên wan ên rastî re binirxînin. Ez dibêjim em Tirkiyê ev qasî bi rojavayê ve nedin girêdan. Ez wer bawerim ku nirxên herî xweşik ên Tirkiyê we pêşkêşî turîstên rojavayê re kiriye. Ên di peravên Egeyê dijîn bi giştî biyanî ne. Bi êş e… Qet pêdiviya gelên Tirkiyê ji jiyanekî wisa xweşik re nine?

ORAL ÇALIŞLAR: Bazirganên li wê derê Tirk in, kedkarên wê derê Kurd in û ew giştî peravên başur û qeraxên welatê me…

---: Ên ku pereyan qezenc dikin ew in, kedkarên wan Kurd û xweşikbûnê jî têr dijîn jî biyanê ne…

ORAL ÇALIŞLAR: Wellehî hema wisa ye.

---: We nekin, ev qirêjîne, vaye ez li dijî van im. Mafê we ev qasî belangazkirina gelê Tirk û gelê Kurdan nîne. Mafê we ev qasî xweşikbûnên welat ji pêşkêşkirinê re nîne. Ez mirovekî destgirtî me, lêbinêre ew jî wekî we dijîn, nabêjim ez jî dijîm. Ez şervanê rêgeza me. Ez ti carî di van mijaran de xwe naxapînim. Ez ji xwe re destgirtî me. Ev tevgera pêşkêşkirina gelê Tirkiyê ye. Tevgera firotina Tirkiyê ye, dijber im, dij emperyalîstbûna min, yan jî girêdayî ji azadiya gelan re, girêdayî me ji mafê jiyana wan re, ew di welatê xwe de bixwe û çavdêriya mafên tam sûdgirtina ji encamên keda xwe ferman dike. Lê yê ku kontol dike çûye, tirsnak e, Kurdan jî, Tirkan jî pêşkêş dikin. Xweşikbûnên welat pêşpêş dikin. Jixwe ji bo ez vê bi şêwazekî giran dibînim, ez berxwedanê hîn dijwartir dikim. Bi mîsogerî wisa vê berxwedana me bi awayên dîtir, bitenê şêwazên cudaxwaziya Kurdan tênegihîjin. Erkên çepgiriya Tirkiyê jî yan jî şoreşgeriyê jî neanîne cih, êdî em dixwazin bidin berdewamkirin. Ew jî di milê me de barek e. Niha pir baş dizanim; li Tirkiyê çareserkirina pirsgirêka desthilatdariyê, tê wateya ku çareserkirina pirsgirêka desthilatdariya gelê Tirkiyê. Her wiha ez niha karê wê jî dibînim. Zor e lê belê em ê bixwazin bibin. Ez di vî bingehî de dibêjim; ez diyardeya emperyalîzmê dinirxînim. Ez dibêjim Tirkiye pir girêdayî emperyalîzmê ye. Ez dibêjim hema hema şêwazê çand û exlaqê emperyalîzmê anîne. Ez dibêjim ked hîn zêdetir hatiye pêşkêşkirin. Ez dij van tevan im, di vî bingehî de rewşekî me ya dij emperyalîstbûnê heye. Di vê mijarê de jî sosyalîstên li Tirkiyê, rewşenbîr bi taybetî ne realîst in. Her serê kêliyekê vaya “PKK wiha tevgerekî netewperestê deng e.” Nexwe ev, îdîayekî ew tevgera hûn beriya wê jê hatine ji aliyê wê ve bi mikûrî daye berdewamkirin. Ez wan wek netewperestên teng dinirxînim. Ez xwe jî heta dawî wekî enternasyonalîstekî pêşketî û PKK’ê jî di vî bingehî de wekî rêxistinekî dide pêşxistin dinirxînim.

Rewşenbîrên Tirkan bixwe cudaxwazên teng in. Di vê mijarê de em wekheviya bihevrebûyîna azad, em bi îhtîmam nîşan didin. Bila hîn bi pîvan nêz bibin. Sosyalîst bi taybet ger bixwazin bûyera PKK'ê enternasyonalîze bikin, bixwazin bikin Tirkiyebûnê, bila pêdiviyên wê wekî tê dîtin bibînin û rexneyên xwe pêşbixin. Heta bila bi me re têkoşînê bikin lê bila tiştên rast ji nedîtinê ve neyên. Bila pêşiya bihevrebûyînê asteng nekin. Bi vê wesileyê re bi sosyalîstên li Tirkiyê re karkirin, dixwazim bêjim daxwaziya mil bi mil têkoşîn kirin dubare dikim. Ez wer bawerim ku di nêz de em ê wan re jî rêze hevdîtînekê dest pê bikin. Têkoşîna me ji wan re jî gelek tişt daye fêrkirin, dê hîn baştir jî bide fêrkirin. Gelek tişt pêşkêşkiriye, dê hîn zêdetir jî pêşkêş bike. Niha têkoşîna me ji bo wan jî darsêpê hilweşandiye. Yanê bi derketina Denîzan re, me piştî Pêngava 15'ê Tebaxê derfet neda. Ew 141, 142'yên nav û deng hilweşandin. Li gor min ew her serê kêliyê de ew hikmên li ser serê wan dihejînin derbaz bû. Piraniyê wan jî gihîştin azadiya xwe. Ev ne yekser bandora me ye, pêwîst e neyê mandêlkirin (înkarkirin). Lê hîn jî ya girîngtirîn em dihizirin ku di şerê wan ê meşa di aliyê ber bi desthilatdariyê ve ji vir û pê de hîn alîkariyê bidinê. Bi mîsogerî ev ne begidî ye, pêwîst e bi beramberî têkiliyên rêhevaltiyê bên pêşxistin. Ew ne di bingehê mezintirîn, biçûktirînê de, dikarin bi wekhev û azad nêz bibin û alîkarî bidin hev. Pêwîst e ew hinekî din jî me baş binasin, şerê me heta tu bêje ku karê wan hêsan kiriye lê êdî ew bixwe jî pêwîst e bibin yek, çi dixwazî awayê yêkitî, çi dixwazî awayê partî, dixwazî di nav yêkitiya hêzê de bibe, bila xwe bigihîjinin yekgirtinekê. Bila ew hêza ku tarûmarkirine di rastiya hedefeke destdayî de bidin meşandin û di vê mijarê de bila derfetên me binirxînin. Ji rêxistinên biçûk mûçûk, ji giştî rêxistinên yên legal, yên îlegal re, ez ê careke din hîn bi îhtîmamî van destnîşan bikim. Pêdivî bi tevgerek eniya berfireh re heye. Pêwîst e ew awayê rexneya kevin derbaz bibe. Yanê tu çi qasî sosyalîstî, tu çi qasî oportunîstî ji şêwazê gotinekî wiha zêdetir, pêwîst e ûslubê lezgîntir kirina têkoşîna şirîk a qezenkirina karanîna yêkitiyê dike bikin

desthilatdar. Ez bawerim ku di vê mijarê de tiştên pêwîst e bên derbazkirin û bi taybetî jî ûslubên bên guhertin hene. Gav hene. Di nêzîk de…

ORAL ÇALIŞLAR: Yanê hûn ê bi komên sosyalîstên li Tirkiyê re û bi komên ji Tirk re dixwazin hevdîtinan bidin çêkirin.

---: Ez bawerim ku rewşekî wisa çêdibe. Di vê mijarê de hinek pêşniyar hatine. Rêze hevdîtinekî wekî ya Kurdan me dayî çêkirin û ceribandina ku hinek tişt bi hev re kirinê, em ji bo komên li Tirkiyê jî dihizirin.

ORAL ÇALIŞLAR: We qet pêwendî kirin?

---: Hûn dizanin piştî 1980’an em Eniya Berxwedanê a Yekgirtî Li Dijî Faşîzmê rêxistin kiribû. Lê belê bi neyîniyên Dev-Yolê bi taybetî ji ber sedema neyîniyên nûnerê wê –Taner Akçam-yê ji der ve pêşneket. Di rastiyê de me dixwest bi komên pir berfireh re bimeşin. Piştî wê jî me ev helwestê xwe da berdewamkirin. Hîn jî rêxistinên dostên baş hene. Niha bi taybetî ji nû ve di vê pêvajoya pêşketina dîrokî de ku ez wer bawerim ku em ê ber bi çareseriyekî siyasî ve herin vê netenê di bingeha rastiya Kurdan de, em dixwazin di bingeha rastiya demokrasiya Tirkiyê de bidin meşandin. Vaye ji bo vê tu yê rêxistinên li Tirkiyê amade bikî, bila bernameyên xwe yên demokrasiyê heta bernameyên xwe yên sosyalîstî derbixin holê. Rasterast ber bi çûyîna çareseriya siyasî ve, bila ew jî carekî din nasnameyên xwe derbixin holê. Li gor min amadekirina vê girîng e. Ev berpirsiyariyekî dîrokî ye, em di zanistiya vê de ne. Bi mîsogerî di vê mijarê de vaye bi nêzîkatiyekî ku pêdiviya PKK’ê bi hevkaran re heye, wekî ji ber vê tengasiyê dike nekevinê. Tam berevajî vê her tim rexne ji me re hebûn. Rexneyên Tirkiyeyê, çîna karkerên li Tirkiyeyê û sosyalîstan nabînin em rexne dikirin. Niha em dixwazin di nav alîkariyek pir baş a beramberî hev de bin. Ez dibêjim em

amade ne. Hûn jî wekî sosyalîstekî hem nû, hem kevin, me hinekî jî wiha têbigihîjin. Vê mesaja me pêwîst e bi wesîleya rojnameya we jî di vî bingehî de ragihînin. Di vî bingehî de ji we re ji bo hatina we ya li vir wekî xwendekarekî siyasalê, wekî heman kesên kursî parvekirî jî ji zindîbûna bîranîna hevaltiya me re kêfxweş im. Di wê bingehê de silavên xwe ji wan re, ji wan hevalên di wê demê de dişînim. Ez dixwazim bi hêvî bin. Wek din jî spasiyên xwe dikim.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez jî spas dikim. Ji bo ku we ev çend demjimêr in, çend roj in wina mandî bûyî, di nav van giştî rageşiyan de, bi sohbetekî xweş, ev sohbeta hevlatî dayî avakirin û bi hevdîtinên hîn dirêjtir, hîn di demê pêş de di nav aşitiyê de û ji bo em bi yêtikiyekî bi Tirkiyê re…

---: Ez bi bawer im. Tirkiyekî xweşik, Kurdistanekî xweşik; Em ê yêkitiya Tirk-Kurd bidin jiyankirin. Bi rastî jî dê bi mîsogerî xweşikbûnên mezin, yekgirtina jiyanê çêbibin. Di 1970'an de ew berxwedanên me jiyankirî, ew şerên me dayîkirin vala neçûne. Derketiye holê ku vala neçûye. Ev me kêfxweş dike. Em di vî bingehî de dubare silav dikin.

ORAL ÇALIŞLAR: Ez spas dikim.

# HEVPEYVÎNA LI GEL ROJNAMEVANÊN CUMHURIYET Û HÛRIYETÊ

Rojnameya.H.: Bi taybetî di destpêkê de ez dixwazim di derheqa we de baxivim...

---: Ango weke miroveke rêxistinî, pêşengtiya rastî çî ye? Heta ne di zanabûna wê de ye. Bûna zilamek yê dozê, ma divê bi wê ve girêdan? Li Tirkiyê ev pîvan rizîn e. Rêbazên min yên jiyanê diyar in, an jî taybetmendiyên min hene. Jiyanê an jî fikrên civakî yên pîroz, nirxên komkirî, bûyeran, ji dil nêzî saziyanbûyîn û di jiyana xwe de ciheke herî bilind dayîna wan e. Di destpêkê de hestiyar, derûnî, her ku biçe bi zanabûn tevlîkirin. Ez ji bo nav û dengê te dibêjim, feraseta ku destpêkê di nav malbatê de, tê empûzekirin ev e. Malbata xwe bifikire, mirovên xwe bifikirî ye. Di rastiyê de jêmayên min yên klan û kabileyan bin jî di malbatên me yên Kurdan de, li gorî yên Tirkan hîn bihêz e. Malbatî (Ailecilik) bûyîn li gel me nexweşiyek e. Ji bo malbatê mirin exlaq e. Jiyana xwe hemû fedaî malbatê kirin dixîne. Min ji zarokatiya xwe ve, ev girêdan xeter dît. Hemû nirxên xwe ji bo berjewendiyên malbatê bikaranîn, ji bo min bêwate dihat. Bi taybetî malbatgerî, hîn di wê demê de, ez dihizirîm ku şerê di nava malbatan de, dê ev şer qet encameke baş nede. Taybetmendiyeke min a herî diyar, di vê demê de min ferq û cudatiya malbata baş û xirab nekir. Min li hemberî parastina wê bertek raber dikir. Li şûna vê pêdiviya yêkîtiyê, bi cîranên xwe re têkiliyên baş, zêde tevlî pevçûnên malbatî nebûyîn, ez bisemt

(ihtiyatlı) nêzbûm. Min girîngî da, ji bo ku ez vê tangezariya malbatê derbas bikim. Min giranî da dibistanê. Heta gihiştim dîrok û bi gihiştina hinek bibandorên dinî ve jî min hewl dida ku ez derbas bikim. Çûyîneke ber bi dînî ve heye. Weke min diyar kirî, ji bo ku ez ji vê jiyana sivik rizgar bibim, amûrek bû. Ev di ser de çûyîneke destpêkê ye. Bi rastî jî em bi hestên pir germ ve nêzik bûn.

Rojnameya H.: Hûn çend salî bûn?

---.: Hema em bêjin ji qasî ku em xwe nas dikin wisa ye. Belê hîn di temenê biçûk de. Dema destpêkê ez çûm dibistana seretayî tê bîra min, li gundê me dibistana seretayî jî nebû. Bi meşa demjimêrekê em diçûn gundê cîran û pênc salan demjimêrekê biçe, demjimêrekê were. Me wisa xwend. Bi meşê, tam pênc salan çûn û hatin. Tê bîra min, salên ku ez diçûm dibistanê min nimêj dikir. Pênc salan ez li ser hewîn û nimêja xwe bûm. Belê bipênaseyeke guncav ve em dihatin hezkirin. Lê bi demê re, me xwest ku wê heskirinê têxin wareke zanabûnê. Lêkolîna Îslamiyeta ji rêzê bigire, heta şêwazê wê yê hemdem, ew ê min yê têgihandinê hebû. Vê di dibistana navîn û heta amadeyi de dewam kir. Fikreke olî ya dijwar, mînak li Tirkiyê em bêjin, dema senteza Tirkî ya Îslamî... Ev e min zagonên dibistanê jî binpê dikir û heta nîvê şevê ez beşdarî konferansên Fazıl Kısakürek dibûm. Ez diçûm mizgefta Maltepê û min nimêj dikir. Ez di vê mijarê de, hinekê binav û deng jî bûm.

Rojnameye H.: Ma malbata we gundî bûn?

---.: Gundî û feqîr bûn. Carcaran... Ez diçûm Edenê û min pambo kom dikir. Sê salan min li Edenê li gel dibistanê pambo jî kom kir. Min di zeviyan û bênderan de jî kar kir. Lê ez di karê zeviyan de hîn baştir bûm. Min wê demê dibistana seretayî

dixwend.

Rojnameya H.: Hûn çend xwîşk û biran e?

---.: Xwîşkeke min a ji min mezintir heye û sê birayên min jî hene.

Rojnameya H.: Ango tam şeş kes?

---.: Heft.

Rojnameya H.: Heft kes? Ma hûn çûn Kadastroyê?

---.: Min Tapu Kadastro xilas kir, min salekê jî karmendî kir. Demekê min li Amedê pere kom kir û ji der ve dibistana amadeyi qedand.

(...)

Jixwe di salên 1970'an de, her kes hate girtin. Ez heft mehan girtî mam. Ji Nîsanê heta Cotmehê ez mam. Me di '72'an de encam ji vê derxistin. Bi taybetî ji bo tevgereke mayînde, me ewlekariyên neketina hundur girt. Car din me di pirsgirêka netewî de pijandinek jiyan kir.

Rojnameya H.: Hûn çawa hatin vir?

---.: Di hundur de ev hinekê xwe dide hîskirin.

Rojnameya H.: We di destpêkê ji hîs kir ku hûn Kurd in?

---.: Min ji destpêkê ve dizanî, ji dibistana seretayî ve. Ji ber ku gundê min lê dixwend Tirk bûn. Gundê min jî Kurd bûn.

Nakokiyên Kurd û Tirkan ji destpêkê ve hebûn. Gundê cîranê me bi Tirkî daxivîn, gundê me jî bi Kurdî daxivîn. Jixwe gundên cîranên me sê Kurd bûn, sê jî Tirk bûn. Rewşeke wisa hebû. Ev her kêlî zindî tê girtin. Her çi qas zanabûnek wisa ya netewî nebe jî lê ev anîna berhev, her kêlî û her seat heye. Ji bo derbaskirina vê jî nîşanpirsek heye. Ez fêrî ceribandinên derbaskirinê bûm. Ez bi ol, felsefe û herî dawî jî bi siyasete re mijûl bûm. Min hewl da ku çareseriyekê peyda bikim. Bi navê Kurdistanê destpêkê têkilî hebû. Di rojnameyan de li ser serhildana Başurê Kurdistanê, nivîs hebûn. Min dixwendin. Car din dema ku di vê mijarê de pirtûk diketin deste me, min di vê mijarê de dixwend. Lê heta 70'an ez lewaz bûm. Çepgirên Tirkiye jî weke roja îro, dikirin mijara nîqaşê. Ez bawer im di 70'an de bû, li ser vî bingehî, di rojnameyek ya gundî û karkeran de mijar dihat bikaranin. DDKO hebû. Ev jî wek rêxistineke netewî ya Kurd digirt dest. Car din hêdî hêdî ketibû lîteratora çepgiran. Min dişopand in. Belê me zor û zehmetî jî dikişand. Ango em bi serê xwe çawa dikarin komekê avabikin? Ji bo ku em di hundur de bûn, ev ê di vê mijarê de qonaxek bi me da avêtin. Ji ber gelek ji wan, ên li wê de rê nûnerên komên çepgir ên li ser seradê mayîn bûn. PKT (TİP) hebû. Ciwanên Şoreşger (Dev-Genç) hebû û PKST (TSİP) hebû. Ji bo di gelemperiya ku dema bê de, bikaribe teşe bide tevgerên din, li wir bûn. Me li wir nirxandin dikir. Ez di wê zanebûnê de bûm ku diviya me komek aîdê gel ava bikira. Jixwe dema em di dawiya sala 72'an de derketin, yekser em derbasî waneyan dibûn. Me di sala 73'an de jî yekser amadekariyên komê kir. Me di fikir de, amadekarî kir. Wê demê cara yekemîn teoriya mêtînkariyê ser me re derbas dibû. Cara yekem bû, em di asta wateyê de pispor dibûn. Me dahûradin pêş xistin. Ev e di vê babetê de xebatên lêkolîn û propagandayê bi bihara sala 73'an re dest pê kir. Heta wê demê ezmûnên me yên avakirina komên vaşartî jî hebûn. Pir veşartî û sinordar bû. Bername û rêziknama wê jî nebû. Kesên ku pir baweriya me bi wan hebû, me

pirsgirêk bi wan re nîqaş dikir û bi vî şêwazî me sala 73'an derbas kir. Me dest bi sala 74'an kir. Piştî wê me KHBRE (ADYÖD) damezrand. "Tevgera Bilind ya Hînkariya Ciwanên Xwendevan a Enqerê" bû. Di ser Stenbolê de hatin. Di ser herêmên din de jî hatin. Di destpêkê de bandora me zede bû. Paşê me ev ji bo AYÖD'ê û Dev-Gençê hişt. Me bi 76'an re, hîn pirtir xwe da pratîka komê û bîrdoziya komê nivîsand. Me endamên komê yên destpêkê rêkirin Kurdistanê. Me civînên hîn berfiretir lidarxistin. 1976'an de jî damezrandina tevgerê bû. Me civîna damezrandinê lidarxist. Komên fireh avadibûn. Ez bi taybetî di mehên Adar, Nîsan û Gulana 77'an de, li seranserê Kurdistanê geriyam. Civînên ku nêzî sêsed kesî beşdarbûyîn hatîn lidarxistin. Ez bawer im piştî wê bala dewletê kişand û cara yekem me Hakî Karer wisa wunda kir. Êdî ji bo hin tiştan berteka dewletê li hemberî me bû. Wê me anî beranberî ku an wê tevger di asta kom de bimînin an jî em ê pêş de gavan bavêjin. Me pêş de gav avêt. Bersiva ku me ji şehîtxistina hevalê Heqî re dayî, di 78'an de me gelaleya bernameya rêxistinê tim di nava koman de dida guftugokirin, em ê bibin tevger, an jî wek kom bimînin? Herî dawî em bûn tevger. Nêrînên min yên wê demê ev bûn. Em dibistanê, heta KT bitevahî bigirin hemberî xwe û em jiyaneke nû avabikin. Tevayî sala 78'an ev hesab hate kirin. Lewaziya siyasî heye, di kadroyan de jî heye. Lê tevî vê jî me weke berpirsiyarê tevgerê ev berpirsiyarî girt. Tevayî gotinên tevgerê yên destpêkê û piştî wê jî hemû komên propaxandavanên me bi rê ve bir. Piştî damezrandina tevgerê, bê ku em derfet bidinê bi çalekiyan me tevger îlan kir. Ev jî weke demeke rêxistin kirinê bû, kargeriya pihêtkirî (sıkıyönetim) hat. Piştre girtin çêbûn....

( … )

Rojnameya C.: Ma we bi vî rengî bi Mehmet Alî Bîrand re jî

axivî? Em hêvîdar in ku we bi vî rengî pê re naxivî be.

---.: Cuda bû. Hinekê bişibin hev jî, lê min zêde venekir.

Rojnameya C.: Baş e, niha pir baş bû…

Rojnameya.H.: Ango em her tiştî, li alîkê bihêlin.

Rojnameya C.: Ji bo eşkerekirina van hûn 5-10 salan dereng man.

---.: Di mijara azadiya jin û zilam de, hîn ji destpêkê ve ez aciz dibim, nikarim xwe têxim şûna zilameke çar-çar. Mînak; xwe di jor de dîtinê ez naecîbînim. Netewîperestiya zilam dixwaze bihêz û xurt be. Bi rastî ev azwêrî di her kesê de heye. Wekî civaka feodal, ji aliyên nirxên xwe yên civakî ve lê dinêre. Îlahî wê egîdiyekê raber bike. Ango li vir newekheviyeke dest pê dike. Ez di destpêkê de, li dijî vê newekheviyê bûm. Min bêwate didît. Min serbilindiyeke mezin jî di vir de nedidît. Ez bawer im ev ê, qasê ku min xwe naskirî heta niha, li dijî vê jiyanê û têkiliya di navbeyna herdu cinsan de bertek pêşxist. Bi cewaziya mîsoger ve ez tim di nava lêgerînekê de bûm. Daketina bingehê wê, çima rewşa (van jin û zilaman) wiha ye? Ne zilamtiya wiha, ne jî yên xwe wisan jin dihesibînin, napejirîne… Ne welê, xwe weke jina ku heyî qebûl bike, ne jî van zilamên wan; herdu yan jî qebûl neke. Me qet vana cidî negirt. Hîn jî wisa ye. Ez carê ji van têkiliyan bi guman im, ditirsim, direvim, carnan jî pir kirêt dibinim. Niha li gor min li vir, bêrêziyeke pir mezin heye. Ji nava wan pir kêm mirovên jidil derdikevin û bi rastî jî ev hemû xapandinin. Li gundan û di navan ciwanan de pir zêde ye. Ez difikirim ku ev tê çi wate yê? Em xapandinekê bigirin dest. Têkiliyên hestiyar, ma zewac dixwaze çi, kî çawan rizgar bike? Niha ez li ser van ferasetan pir fikirim. Azadiya jin û zilam… Mînak dema dikevin nav, van kar û

têkiliyan pir tiştan wunda dikin. Sedemê wundanekirina min a herî girîng û sereke jî ev e. Ji destpêkê ve, sedemê hatina min a vê rewşê, giştî di têkiliyên civakî de, bi taybet di têkiliyên malbatî, car din têkiliyên jin û zilam yên ku parçeyeke ji wê ne, heta dawiyê radestbûn heye. Ji ceribandinên min bixwe jî, di vê mijarê de carê hin mînak derdikevin. Ji bo min a girîng watedayîna wê ye. Ango bi şêwazê ku heyî ve, netevlîbûna ji têkiliyên civakî re pir girîng e. Şert û mercên me yên civakî berhemên feodalî û kapîtalîzma dûvre ye. Lê wê demê zanabûn nîne. Bi mîsogerî encamên di wê demê de bi vî rengî bûn. Belê di têkiliyên wê demê de, ez hinekê bitirs û nerihet bûm. Ma ev tê çi wateyê? Ji çi re rê vedike? Têkiliyên civakî, dagirker û bindest, yê dixe û yê têxistin. Jixwe dema ku tu nekevî vê davikê, tu nayê radestkirin jî. Piştî wê dema 12'ê Îlonê, digotin; "zarokno arambin, saziya malbatê bi vî rengî hatiye damezrandin" û jiyanek erzan dane gel. Di asteke mezin de ciwan xistin. Ev çîrokek dirêj e. Belê ji destpêkê ve carekê ji mirovan re di radeyeke bilin de nirx tê dayîn, ji bo wê jî divê asta têkiliyan pir bilind bin. Li gorî min di vê jiyana mirovan a civakê bi vî rengî sivik û erzan neyê damezrandin. Lê pir sivik in, malbat, gund, bajêr, ciwan û herî dawî civakên şoreşger jî…

Rojnameya C.: Ez dixwazim niha qala wê bikim. Weke kes tiştên ew di encama lêkolînên xwe de derxistine holê û nêrînên ku hûn tînin ziman, li gor we bi teoriyên sosyalîst ên ku heyî û feraseta morala heyî re di nav dijberiyê de ye yan na? Ma nakeve dijberî ceribandinên heta niha?

---.: Min nêrînên xwe di derbarê sosyalîzma pêkhatî de anîn ziman. Li gor min jiyana civakî heta dawiyê zindî ye. Jidil û taybet doxmatîzma têkiliyên ku divê pi dehfdan û fermanan neyên bi rêvebirin. Divê heta dawiyê baweriya me bi têkiliyan bê û bi wate

be. Divê tevlîbûn jidil û can be. Me vî milê sosyalîzmê girt. Lê di destpêkê de, ger li hin walatên serwer, sosyalîzm wisan be, lewre piştre pir tişt hatine kirin.  Ez bi tevdîr nêzî bûyerên civakî dibim. Ev pir girîng e. Bi taybetî beşdarbûna bûyeran. Ji binî ve rihê xwe dana têkiliyên civakî.

Rojname: Belê rêzdar Addullah Ocalan, bi navê din APO. Dema ku tu diwestî, li çiyan û deştan. Li ku dibe bila bibe, dema tu diwestî, tu dixwazî tiştekê bixwînî. Tu dixwazî tiştekê guhdar bikî…

---.: Di van mijaran de, fêrbûnên min yên bi vî rengî nînin. Ev e, ez wisan pirtûk dixwînim. Wisan dikim…

Rojname: Na, gango tiştekê…

---.: Kabasîte sînordar e, ez pir dixwazim bixwînim. Lê erk pir girîng in. Ez dixwazim pir baxivim.

Rojname: Yanî tiştek xwendin û hwd.

---.: Belê heye. Mînak hebû tiştên ku zarokan diceribandin, ez jî diceribînim. Weke zarokan temaşekirin, sîporkirin, bazdan, meş… Ev ew qas negirîng in. Ez di cih de dikarim bikevim tiştên jiyanê yên sivik. Ez xwe wisan weke rêberên din nabînim. Belê  ez nakevim jiyana sivik, bê armanc û di riyan de nameşim, baznadim, naxivim û hwd. Her tiştên ku mirovek, ji rêzê bikaribe bike, ji bo vehesîna xwe ez jî dikarim bikim. Yanê weke ku gelek kes dibêjin, wisan şehtînên mezin bi min re nînin. Ango ez nabêjim jiyanek min a wisan bi rêk û pêk heye, an jî jiyanek min a wisan xweş heye. Ez tiştên wiha nafikirim. Ez zêde ne di wê baweriyê de me jî ku kesayet bikaribe, bi vî rengî zêde xwe rizgar jî bike. Jiyana erzan pir erzan tê. Weke min gotî, bi jiyanek pir tijî ve, veşartina min heye. Ez bawer

nakim ku kesek din bikaribe navgîniyeke wiha bijî. Ez bawer nakim ku bigihê jî. Perspektîfek wisan jî nîne. Hin taybetmendiyên hebin jî dê xiraptir be. Elimandin e... Hîn jî avahiyek min a wisan hişk nîne. Lê jiyanek min a heta dawî bi rêgez heye. Min çi fêrbûnên xirab negirtin e. Ez bi tiştan sînordar namînim. Min fêrbûnên xwe yên ku ez nikarim devjêberdim, şkandine. Ez heta dawî pey tiştekî nakevim. Ez tiştek wisan jî nahêlim ku heta dawiyê ez pey de biçim. Fikir, raman, tevger, çi dibe bila bibe, ger şaş be, xeter be, ji pêdiviyên wê demê re nebe bersiv, em dev jê berdidin. Ev nermbûn heye. Li gel min rêgez û nermbûn pir pêşketiye. Hem jî pir bi hêz pêşketiye. Heta astek girîng hatiye. Lihevkirina rêgez û nermbûnê li gel min pir pêşketiye. Di vê mijarê de jî, zêde zehmetiyan nakişînim. Her kêlî û di mijarên herî girîng de, ez ji mijarên pirsgirêkên cîhanî yên bihgehîn xelet nabim. Ez nûnertiya rastiyan dikim. Di vê mijarê de baweriya min heye. Belê ev ji bo pirsgirêkên ji rêzê jî derbasdar e. Ango bi mirovek ji rêzê re jî ez dikarim di vê astê de têkilî deynim.

Rojname: Ûtopya Abdullah Ocalan îşev pêk bihata…

---.: Ûtopya tinebûya…

Rojname: Demekê heba…

---.: Ji ûtopya xwe zêdetir, ez dikarim hin ûtopyayên din baş şîrove bikim. Mînak ûtopya Îslamî, ûtopya Kurd a sosyalîst.

Rojname: Baş e. Ger demekê pêk bihata, we yê ji bo xwe çi bikira?

---.: Ji bo min wisan e. Bi pirsgirêka netewî ve mijûlbûn, ji bo min tiştek mirovî ye. Ez Kurd bûm. Belê ez Kurdek bindest bûm. Bi mîsogerî ez li hember tiştên wiha hestiyar nabim. Ji bo min

pirsgirêk, mirovî ye. Hin kes dibêjin ku wisan xetere, aman xwe nêzî wî nekin. Ez hîn di dibistana navîn de bûm, ev tişt digotin. Hîn wê demê digotin “Kurdînî pir xeter e. Tu jî bibe çepgir. Bibe Ecevîtperest. Zêde xeteriya van nîne”. Ango di ser çûyîna min a pirgirêkan de, ev heye: Milek xwe di astek tirsnak de, bihêz dihesibîn e. Milek jî xwe di astek tirsnak de, înkar dike. Belê tam jî di vê mijarê de, berxwedanek heye. Li gorî nêrîna min a mirovî, divê mezinbûn û biçûkbûnên wiha tirsnak nebin. Di şert û mercên wisan tang de, kî li dijî jiyanek wisan xeter û tijî xwîn, bi feraseta min a jiyanê ve şer kiriye. Ev e Abdullah. Niha tiştek wisan bihêz nîne. Zilamê wisan bi hêz û jina wisa ketî, dagirkerên bihêz û gelên bindest, mirovên qet nirxên wan neyin û mirovên bedelî her tiştî, ev du alî ez pir mijûl kirim. Di encam de, min xwe gihand vê sentezê û min xwe çareser kir. Ger qala ûtopyayê bêkirin ev e. Min bixwe jî ev pêk anî.

Rojname: Ez pirsa xwe ya dawiyê ji we bikim.

---.: Baş e, ez çima pîr nebûm? Min xwe çareser kir. Di vê mijarê de, gotin nîne. Ez tiştên wiha munasib nakim. Xwe çareserkirina min, pir mezin dikim. Bi mîsogerî her dera ku ez diçimê, ez ê di rewşên çewisandinên kirêt û dagirkirinên erzan dê çareser bikim. Ez vê jî bibêjim, bi mîsogerî min dikarî gel wan jî bijîm. Tişta ku ez jê nefret dikim, xwe pir mezin û di jor de dîtin e. Ez van tiştan weke lewaziyên mirovan, yên herî mezin dibînim. Berdana wan a hev pir hêsan e, ne zehmet e. Mirov rastî van jî tê.

Niha dibêje ez çiyan çareser bikim, car din bajar ketin dewrê. Vê carê ma wê pergal li gorî bajaran çawa be? Bi kîjan helîkopteran li çiyan da? Me got, ma wê li gel deşt û zozanan bi çi çek û amûrî li bajaran bixe? Wê dewlet hinekê bikeve tangasiyê. Bêguman ev jî bi

me ve girêdayî ye. Bajêr xistina tevgerê, ne pirsgirêkeke teknîkî ye. Her çendî di milê teknîkî de me her tişt çareser nekiribe jî, lê pêşkeftinên ku di nava gel de tên jiyankirin, dide nîşandan ku wê di demên pêş de pêşkeftinên mezin çêbin. Piranî jî wisan in. Ciwanên bêkar, ciwanên diçin dibistanê û bi taybetî pirsgirêkên mûtfaqê di radeyek bilind de ye. Ev jî nîşan dide ku avahiyek bihêz heye. Gel me dixwaz e. Li çiyan nikare tevgerê asteng bike. Ger li çiyan tangav bibe, dê li bajêran pêşbike. Li herdu deran jî pêşketin wê me rizgar bike. Li gor dem û pêwîstiyan, mirov dikare giraniya xwe bide herdu deran jî. Ji naha û pê ve, em ê van hevsengiyan hîn baştir ayar bikin.

Rojname: Gelo, bendav jî di hedefa çalekiyan de ne?

---.: Na, na. Ew hinekê nepixandin e. Lê em ê çalekiyên cûrbecûr lidarbixin.

Rojname: Ma hûn ê êrîşî ciyên tûrîstîkê jî bikin. An jî…

---.: Heta niha em zêde, ser ciyên tûrîstîkê de nehatine. Lê mirov dikare pakêteke berfire ya hedefên aborî dikare bifikire. Belê ev şer e. Ma ser hedefên berfireh yên aborî de çûyîn, tê çi wateyê? Jixwe dewletê, bi mîlyaran wunda kiriye. Nikare vê eşkere jî bike. Rastî jî bi ser her hedefek aborî de çûyîn, 500 hezar lîreyan dide wundakirin. Em gihiştine bi sedan, hedefan jî. Ji niha û şûn ve dibe ku berfirehtir jî bibe. Hedefên civakî hene. Li ser hevkaran, dibe hedefên berfiretir pêş bikevin. Pergala cerdevaniyê jî, bi giştî li ber hilweşînê ye. Lê carê, li hin qedên ku em zêde girîngî nadinê, gav tên avêtin. Bi taybetî li bajaran, hêzên hevkar, yên ku bêdawî alîkarî didin desthilatdariyê, dikarin bibin hedef. Mirov dikare ji nîşteciyan, ticar û hwd. vêrgiyan bigire. Bêguman ji ber têkiliyên wan, yên bê sînor bi dewletê re werin sînorkirin, em ê ser wan de biçîn. Ji niha

ve, serdeçûn hene. Lê em ê zêdetir bikin. Cerdevan, ji bo jin û zarokên wan ziyanê nebînin, malên xwe dibin deverên cuda. Ji ber ku em ê, dest deynin ser mal û deravên wan jî. Yên sedîsed xayîn û dijmin, mirov dikare malên wan desteser bike. Di dema pêşiya me de, dibe em van tiştan bikin. Car din dibe ku em ser wan kesên ji bo şerê taybet xizmet dikin, di saziyên dewletê yên fermî û berdevkên wan de jî biçin. Li ser van kesên ku ji bo yekîneyên şerê taybet xizmet dikin, pakêtek ya çalekiyan a berfireh heye.

Rojname: Belê, di vir de du tişt hene. Ya yekem radyo…

---.: Belê, em li ser radyo yê difikirin. Radyoya me nîne. Lê ji bo ku em pêşbixin hin hewldan hene. Tevî ku heta niha me girîngî nedida radyoyê jî, lê ger hebaya, wê sûda wê pir bûya. Lê ew jî pirsgirêkeke siyasî ye.

Rojname: Pirsa duyem. Ma di wan herêmên ku hûn dixwazin rizgar bibin, kîjan kes hene?

---.: Mirov nikare, di vê mijarê de bersiv bide.

Rojname: Weke ardingerî û bîrdozî…

---.:Min di pirsa yekemîn de bersiv dabû.

Rojname: We li Sêwasê…

---.: Giranî li wan derên ku, nifûsa Kurdan lê heyî. Mînak demê pêş, asta federasyonê wê sînorên wê jî diyar bike. Ango li deverên ku ziman û çanda Kurdî lê serwer be, pêwîst e weke sînorek xwezayî bê pejirandin. Mirov dikare vê, weke erdnîgeriya federasyona ku çêbe, binirxîne. Lê em zêde, girîngî nadin vê. Em hîn

pirtir li pey şoreşa civakî ne. Yanê milê şoreşê yê civakî, ji bo me ji sînorên wê girîngtir e. Sînorên pirsgirêkê yên civakî, pêşxistin di rastiyê de neşoreş e. Wê ev şoreş herdem, Tirkiye jî bandor bike. Xwezayî, em ê sînoran tim di plana dawî de bifikirin.

Rojname: Pirsek seyre. Lê nexşeya we û Ermenîstana ku Ermeniyan avakirî hinekê dişibin hev.

---.: Tiştek wisan biwate nîne. Heta niha me zêde girîngî neda pirsgirêkeke wiha. Ger ji gelên Ermenî kesên ku dixwazin têbikoşin hebin, di rêxistinên Tirkiye de jî hene. Mînak; di hinek rêxistinan de pir hene. Di rêxistinên mîna TÎKKO de pir hene. Li gel me çend kesên Ermenî hene. Lê ji ber ku wihaye, em nikarin sînor li ber wan deynin. Heta ji bo Kurdistanê jî, sînor danaynin. Ango li vir tinê gundek jî yê Ermeniyan nîne. Ango niha bi erdnîgariyê ve destpêkirin çi qas bê wate ye, diyar dibe. Em rastiya gelê Ermenî ya dîrokî fêm dikin. Em ji axa xwe qutbûn û penaber kirina wan fêm dikin. Em tevkujiyên wan jî dizanin. Lê niha bi xeyalên Ewrupa re, sînoran xêz dikin. Ev nikare zêde derbasdar be. Lê weke ku min gotî, ger li deverên cuda Ermenî hebin, heta ev dikarin di astên cuda de, pirsgirêkên gelê xwe, di astên cuda de bi guftugo jî bikin. Derxînin rastiyê. Pêwîst e mirov bi feraset nêz bibe. Weke min gotî, di vê mijarê de ketina nava helwestên bê bingeh ne rast in. Wê zarar bide. Heta niha em jî di vê mijarê de, wisan tevgeriyan e.

Rojname: Rêber, wê demê Kurdî car din weke zimanê fermî, pirsgirêka çanda Kurdî û axaftina zimanê Tirkî… Hûn zimanê Tirkî bi awayek pir dewlemend daxivin. Xezîneyek we ya gotinan pir fireh heye. Van herdu zimanan bi hev re axiftin, hinekê nabe dijbertî?

---.: Belê, weke ku we anî ziman, wisan e. Tevgera me weke

zimanê danûstandinê, piranî Tirkî bikar tîne. Di aliyê şekil û cehwer de, Tirkî baş bikar tîne. Kiriye amûrê danûstandinek bihêz. Tişta Tirkiye nekariyê serbixîne, kiriye amûrê zimanê vegotina siyasetê. Dana fêmkirin, sererastkirina gotinan û heta dewlemend dike. Em wateyên pir dagirtî bar dikin û bikar tînîn. Em ji ber vê aciz jî nabin. Gelek kes di nava me, Kurdî jî nizanin. Kesên ku Kurdî nizanin û eslê xwe Tirkin pir in. Yên ku bi çanda Tîrkî ve jî jiyan dikin pir in. Li gel vê taybetî, li derên ku zêde pêşneketine Kurdî daxivin. Şervan bi piranî Tirkî nizanin. Em bi wan re Kurdî daxivin. Em van dikin yek. Di destpêkê de, me rêgezek wiha şopand. Rizgarkirina çand û ziman jî, bi rizgarkirina siyasî ve girêdaye. Heta rizgariya demokratîk a siyasî çênebe, rizgariya ziman jî çênabe. Di vê mijarê de em bi nêzikbûnên netewperestî li hev nakin. Ew her tiştî bi alfabeyê re destpê dikin. Mînak; di vê mijarê de hin hêz hene, tevî ku Tirkî dizanin jî her gav dibêjin, ez ji derveyî Kurdî bi ti zimanên din naxivim û di ya xwe de jî ferz dikin. Ez vê zêde rast nabînim. Hîn heta duh jî, li Cezayîrê zimanê serwer Fransî bû. Ji dibistana seretayî, heta zankoyê zimanê Fransî dihat xwendin. Tevî ku zimanê Erebî ew qas bihêz e jî, ger wisan be, li derek weke Tirkiye, Kurdî hinde lewaz û Tirkî jî hinde bihêz be, di nava sînoran de Tirkî axfftin fêde ye. Car din li gorî pêwîstiyan Tirkî axiftin baş e. Ger em ji niha ve bi alfabeyê destpê bikin, ev tê wateya oportûnîzma siyasî. Ji ber ku diyar e, alfabe bi serê xwe nikare tiştekê rizgar bike. Heta ku em gel rizgar nekin û demokrasiyê nedinê, bi taybetî em di milê siyasî de bihêz nekin, em zêde girîngî nedin, azad axiftina bi ziman û jiyankirina çanda xwe. Di vê mijarê de, Tirkiye dibêje; “Em qedexeyên li ser zimanê Kurdî rakin”. Heta Ecewît jî vê dibêje. Seyre, netewperestên hoveber jî vê dibêjin. Ev hinekê jî çavkaniya xwe ji DYE’yê digire. Dibêjin; “Qedexeya li ser zimanê Kurdî rabikin”. Em dixwazin qedexe li ser gelê Kurd rabe, ne ser Kurdî. Dema ku qedexe li ser gel rabe, wê li ser çand û zimanê wî jî rabe. Ji bo wê ji rîşiyan destpêkirin nerast e.

Ramana me ya bingehîn ev e. Cewaziya me ya ji pir mijaran re, di vir de eşkere dibe. Ev jî rêgezî ye. Ji berê ve cewaziya me heye û vê jî di milê erênî de encam daye. Yên ji çand, ziman û zaravayên cuda, car din yên ku Kurmancî, Zazakî, Soranî, Tirkî û Erebî dizanin, hemû jî di nava tevgerê de bi hev re jiyan dikin. Di vir de jî çi pirsgirêk nîne. Lê di rêxistinên din yên Kurdan de, ev pirsgirêk hene. Ew li derveyî, çend gotinên teng û heta hin tiştên zelal axiftinê şerm dibînin. Li gel me ev tişt nînin. Di vê mijarê de, ji destpêkê ve xweşbîniyek li gel me heye. Em bi kîjan zimanî karibin hev fêmbikin, em wî zimanî bikar tînin. Xwezayî, divê mirov di van mijaran de, ne oportonîst be û rastiyan berevajî neke. Jixwe di vê dema dawiyê de, dixwazin berûvajiyek wisan jî çêbikin û nîşan bidin ku wekî pirsgirêka Kurdan tinê ya ziman e. Di vê mirov ji vê re nebe amûr. Qedexeya li ser zimanê Kurdî, ji min re wek bûyerek pir çêkirî tê. Ez nikarim vê weke pirsgirêka netewî ya sereke bibinim. Ji bo her zimanî dema ku em bixwazin pêş bixin, divê di destpêkê de, em di nava wî gelî de demokrasiyek berfireh pêş bixin. Ger ew nebe ez dibêjim ev pirsgirêk nînin. Dixwazin li Tirkiyê pêşbixin. Em vê rast nabînin. Em li ser bingehên van rexneyan, nêzî têkoşîna di vê mijarê de dibin. Lê belê di vê çarçovê de dikare çareser bibe. Ev jî nayê wê watê ku mirov saziyên taybet yên lêkolîna li ser zimanê Kurdî dernaxe û heta di dibistanan de jî gavbigav neyê pêkanîn. Evê bibin, ev nehewldanên siyasî yên lezgînin jî. Di dema pêş de, qasî ku azadiya siyasî çêbibe, wê ev xebat jî pêşbikevin, yanê şartê me yê ji bo vê, rizgariya siyaseta demokratik e. Ev vê pirsê jî dikarim bi kurtî wisan bersiv bidim.

Rojname: Herî dawî jî li ser pratîkê….We rêbazên çawan dan meşandin? Hûn çawa heta van rojan hatin?

---.: Ev weke tevger û têkoşîna wê, tiştek tevlihev e. Ez ji

vegotina jiyana xwe ya rastî natirsim.Tiştek ku ez nikarim eşkere bikim nîne. Heta ji bo ku ez bibim xwendevan, carnan ez ji jiyana xwe jî hin mînakan didim. Belê bi serbilindî, ez dikarim vê ji we re bêjim, ew kesên siyasî yên ku li Tirkiye cewaziya wan heyîn, ma mirov çawa dikare wan derbas bike? Gelo mirov çawan dikare tevgerekê bide jiyankirin? Ez dikarim ceribandinên xwe bidim. Ma rêbertiyek çawa bê jiyankirin? Di van mijaran de xapandin hene.

(…)

Li vir di şûna rizgariyê de, mêrkujî û nezanî heye. Rastî jî yên ku pêş neketine û çîna navîn jî, rê ji vê re vedikin. Lê pêşdarizîn, girtîbûn û nezaniya gundîtî jî dihêle ku kesên weke Kenan Evren jî, êdî xwe li gorî vê amade bikin û bibêjin; “Ev e hêzên wiha li piş min hene. Ger ez niha jî bikevim nav, ez ê qezenc bikim”. Hin rêber heta vê astê diçin û wan rêve dibin. Vê çavlêkirinê li Tirkiye rêveberiyek taybet û çewisîner ava kiriye. Ez nabêjim di nava gel de belav bûye, lê di nava gel de hem hêvî dane çêkirin, hem jî hilweşandinê. Jixwe di jorê de jî, ev bingeh heye. Karek wan yê cuda jî nîne. Mînak; dema tu li taybetmendiyek Cemal Gursel û fermandarek leşkerê yê ku pay wî re bigerî, lazime tu vir bibînî. Pêwîstî bi vir heye. Ji ber ku di vê demê de piştgiriya gel pir girîng e. Piştgiriya gel û ev pêşdarizînên sad salê. Ji pêşketinên kapîtalîzma roja me bê xeber in. Bi taybetî çîna navîn, ji teror û anarşiya ku weke dehban didin nîşandan, ditirsin. Heta beşek berfireh yên ji feqîran jî, karîne wê rabikin. Lê ma wê ji niha û şûn ve bikari bin rabikin? Li gorî min hinekê zehmet e. Lê ger artêş hinek din li berxwe bide, dibe ku hinek din temenê xwe dirêj bike. Lê ger gav avêtin di vê wateyê de çêbin jî, di vî milî de, hin tiştên din dayîna kapîtalîzmê zehmet diyar dibe. Rastî temenê xwe jî dagirtî ye. Eva ku ez dibêjim temen, ji destpêkê ve li ser hevsengên dewletê, bi taybetî li ser hevsengiyên

27’ê Gulanê û lewaziya wan hevsengiyan hatine damezrandin. Ji ber ku çepgiran jî pêşniyarî pêş nexistin û di vê mijarê de nebûn çareseriya alternatif, gewdê wê mezin dikirin. Lê di demokrasiya serbest mezin dibe de, jê re cîh nîne. Bi awayek xwezayî jî, berdewamiya wê di vir de têşe girt. Ango di nava lewaziyan de ne. Niha vê rewşê jiyan dike. Ger Tirkiye vekirinek pêşverû çêbike, wekî min berî niha anî ziman, çi DYP, çi SHP û çi jî Ozal dibe, diyare wê dawiya wan jî were. Ji niha ve pêşkeftin vê ya nîşan didin.

Rojnameya H.: Em pir sipas dikin.

Rojnameya C.: Tiştên ku em li Enqerê bibînin hene.

---.: Di vê wateyê de kurt e.

Rojnameya C.: Na giyan, em pir spas dikin. Te pir baş pênase kir. Bi mîsogerî hûn çapemeniyê, ji nêz ve dişopînin.

---.: Rojnamejî tên, ez radyoyê jî guhdar dikim.

Rojnameya C.: Ma hûn zimanên biyanî dizanin?

---.: Na, ev neh salin ez li vir im, hîn du gotinên Erebî…

Rojnameya C.: Ma wisan, hûn fêrî du gotinan bûn.

---.: Derfet nîne. Ez bawer im tiştên qet min nekirin, nahêlin ku ez tiştên xwe yên berê jî biparêzim.

Rojnameya C.: Lê we pir ji nêz ve şopand. Diyar dibe ku hûn Cağaloğlu pir ji nêz ve dişopînin. Ango divê welê be…

---.: Her roj, em di rewşa mirin û jiyanê de ne.

Rojname C.: Ev pênaseya Rêberekî ye.

---.: Em nikarin li ser polîtîkayên sexte, bînayan avabikin. Em ne dipejirînin, ne jî efo dikin. Em kesayet û têkiliyên sexte napejirînin. Xelk welê jiyan dike. Negengaz e, ma ez dikarim vê wisa bijîm? Heval jî piranî welê ne.

Rojnameya C.: Ma hûn ê karibin hinekê qala xwe bikin?

---.: Hûn rastiya PKK'ê pirs dikin.

Rojnameya C.: Belê, ji bo ku ez xwendevanan agahdar bikim.

---.: Ji bo ku em rastiya tevgerê pênase bikin, ez bi kurt van bibêjim: PKK di salên 1970'an de, di şert û mercên Kurdistan û Tirkiyê de, dema ku li Tirkî tevgera ciwanan bilind dibû û sosyalîzma zanistî belav dibû, serweriya bîrdoziya dewleta kevnar a li ser her tiştî sînordar bû, di Kurdistanê de jî, li gel pêşketinên modern, êdî bandora feodali û aşîretî dişkest. Dema ku êdî çînên modern derketin pêş, dema ku rewşenbîrî pêş diket û ciwanên rewşenbîr zêde dibûn, şerê demokrasiyê a li Tirkiyê, berdevkiya wê li Kurdistanê şênber dibû. Pirsgirêka netewî, bi rêbazên şoreşgerî û di şîrovekirina ronahiya sosyalîzma zanistî de pênaseya pratîkeke şênber derxistina holê ye. Bila di van mijaran de, li ser rastiya welat lêkolîn û lêhûrbûn bêne çêkirin, propaxandaya van rastiyan bên kirin û bi demê re tevgereke siyasî bê damezrandin. Ev helwest wê çavkaniya xwe ji tevgera sosyalîstên Tirk bigirin. Car din ger sînordar jî be, wê çavkaniya xwe ji bermayên berxwedanên Kurdistanê bigirin. Lê wê hîn zêdetir çavkaniya xwe ji lêkolîn, lêhûrbûn û têkoşîna koma xwe ya taybet bigire. Di salên 1973 û 78'an de tên

wateya hewldana vê komê. Weke tê zanîn li Tirkiya di wê demê de, tengasî (qeyran) têkoşîna çînî, hem di çîna jêr de, hem jî di çîna jor de dewam dikir. Di vê demê de xebatên komên şoreşgeran jî zêde dibûn. PKK'ê ev dem baş nirxandiye. Di nava şert û mercên wê demê de, pêşkeftinên pêwîst bidest xistiye. Bingêhê xwe daniye. Bi awayek serkeftî pirsgirêk zanistî girtiye dest. Xwe gihandiye qadên ku mirov nikare biçûk bibîne. Car din di vê demê de PKK'ê ji koma bîrdozî derketiye. Li herêmên cuda û di bajêran de komên xwe ava kirine. Taybetmendiya PKK'ê ya vê demê, pirtir xwe dispart ciwanan. Komek rastî bû, Propaxandaya devokî dikir û giranî li bajaran bû. Taybet di van salan de tevger, ji ber nêzikbûnên netewî yên li ser çepgiriya Tirk serwer hatiye retkirin. Her tim rewşa tecrîtê hebû. Li dijî vê jî pêwîstiya xweparastinê derket pêş. Taybet dewlet jî ji 77'an ve êdî bi awayek şênber ser me de hat. Çek wundakirin. Ji bo ku PKK'ê jî xwe biparêze hêdî-hêdî, pêwîstî bi dijwariyê dît. Taybet xala dawiyê, şehadeta Hakî Karer e. Wê jî nîşanî me dida ku dê êrîşên dijwartir li ser me çêbibin. Di heman demê de pêwîstiya ku em tevgerê têxin tevger jî derdiket holê. Rastî jî di 78'an de pêşkeftinên wiha hatin jiyankirin. Tevgera me, fermî hatiye îlankirin. Bi gel re bûna yek hebû. Çek rakirin û xwe parastin, hinek din pêşketî bû. Taybet li deverên weke Hîlvanê, pişta xwe daye gel û pêngavek din jî serxistiye. Lê dewletê jî qetliama Maraşê kir û faşistî bilind bû. Li Kurdistanê, taybet li derên ku em serwer rêveberiya awerte hat îlankirin. Ev dihat wateya îlankirina rêveberiya leşkerî jî. Derketin bixwe, pir baş hatibû amadekirin. Ne tevgerek bi kadroyan hatibû damezrandin. Bêguman bîrdozî bingeh dihat girtin. Tevî di nava gel de, xebatên polîtîk jî dihatin kirin, lê bê tecrûbetî jî pir li pêş bû. Di asta amatoriyê de ye. Kesên ku beşdarî tevgerê jî dibûn, zêde teoriya wan nebû. Ne kesên welê bûn ku, bi jêhatiyên politîk tevbigerin. Xwezayî tevgerê ber bi tevgerbûnê ve, gav davêt. Lê ji ber ku kadroyên wê lewaz bûn, nedikarîn wê rêxstin bikin. Taybet di

78 û 79’an de, dema girtinên destpêkê çêbûn, bêrê ku xwe rêxistin bikin, bi darbeyên giran re, rûbirû man. Lê tevî vê jî nêrînên ku derxistin holê, dihat wateya destxistana derfetên nîqaşên girîng. Rasti jî her ku diçû ev nêrîn digihiştin, ev jî tevahî wundahî pêşwazî dikir. Yek diçe deh tên. Çewisandin, ji leza xwe tiştekê naxine. Belê di vê demê de, li Tirkiyê têkoşîn jî pêş diket. Bê ku em wundahiyan bidin, em gihiştin serê 79’an. Tim pêşkeftin çêdibûn. Van pêşkeftinan dewletê ditirsand. Xeletiyên dewletê yên di derbarê tevgerê de eşkere kir. Pêşkeftin çêbûye. Heta desthilatdariya siyasî jî, xistiye zor ê. Sedema ku polîtîkayên Ecewît, yên tasfiyeyê ev encam negirtin û nemana Demirel a heta dawiyê li ser desthilatdariyê, bilindbûna PKK’ê ve girêdayî ye. Di vê demê de, hinek pêkanîn li ser PKK’ê dihatin farzkirin. Ji milekê ve weke wezîrê derve yê Enqerê, Hesen Fehmî û Gureş digotin, sazî û daîreyên taybet tên avakirin. Hewldan pêşiya wê bigirin. Car din di vê demê de girtin dan destpêkirin. Car din bi taybet ya ku PKT’ê serê wê dikişand, ferasetên wan yên hilbijartin û parlamentoyê hebû. Ber bi hibijartinên 81’ê, li Kurdistanê gel pir şiyar bû. Bi hin hêzên wek Özgürlük Yolu, DDKD û KUK’ê re hevkarî kir. Saziyek wek UDG’ê jî ava kir. Di rastiyê de ji bo ku pêşiya me bigirin, xwestin KUK’ê wek hêzek lêxistinê bikar bînin. Hinekê têkiliya van bi Başurê Kurdistanê re jî hebû. Belavbûna tevgerê ya li wan qedan jî hebû. Ji vê pir ne rehet dibûn. Destpêkê li Mêrdînê karê wan tê eşkerekirin. Îro jî cerdevanên gundan heman tişt in. Beranberê wê ev e. Hêzên ku wek UDG damezrandin, rêgez, armanc û bernameya wan a sereke, li dijî PKK ‘ê têkoşîn bû.

Rojnameya H.: Hûn dikarin UDG’ê pênase bikin?

---.: Yekîtiya Hêzên Netewî Yên Demokrat. Daxwiyaniyek wiha ya PKT’ê jî hebû. Rast e, pir wundahiyên me jî çêbûn. Lê tevî vê

tevger pêşket. Bi taybet piştî 79’an xwe derve rêxistin kir û kir tevgerek kadro. Dema ku wisan bû, ev ewlekarî jî vala derketin. Ecewît di hilbijartina de wunda kir. Demirel di dema xwe de nesekinî bû. Dema ku dewletê ne karî tevgerê rawestîne, bi zehmetiyan 12’ê Îlonê ket dewrê. Di rastiyê de ne Demirel tam bi derbê tê xwar, ne jî ew tam desthilatdariyê digirin. Wek me gotî hincirî û westiyayî bûn. Lê artêş jî wisan ne bi xwestek û niyet bû. Loma tevî vê jî, neçare ku were. Ji ber pevçûnên civakî, dibe her kêlî pêşkeftinên cuda çêbin. Bi taybet pêşkeftina me mîsoger e. Hinekê tevger di qada navnetewî de jî diteyîse. Di vê mijare de, belge jî hatin girtin. Wek hûn dizanin, darba bingehîn ji bo me bû. Tevgera ku em rêve dibin, xeteriya wan anî ber çav û darbe kirin. Di vê demê de 5 jêr, 5 jor PKK wisan e. Bi mîsogerî armanc ji derketina derveyî welat, ji bo rizgariya ji plansaziyên tasfiye bû. Amedakiriyên ji bo wê ne. Ji bo ku tevger mayînde bibe, bi taybet ji ber tevger nekeve rewşa berxwedêrên 12’ê Îlon ê. Pêwîst e mayîndebûna tevgerê berî her tiştî be. Ji ber vê pêwîstiyê derdikeve. Herî kêm ji bo wê demê, mayîndebûna tevgerê digire bin ewlehiyê. 12’ê Îlonê bû janek vekirî. Li dijî hemû çepgiran û bi taybet li dijî tevgera me, êrîşên xurt pêşxistin. Ji neçarî paş ve kişandin çêbû. A ku di vê demê de pêwîst dahûrîna 12’ê Îlonê û xwe komkirin bû. Me ev di konferansa yekemîn a 81’an de kir. Heta astekê me kadro perwede û komî ser hev kir. Di astekê de, ev serket. Piştî wê amadekariyên vegera walat çêbûn. Jixwe di kongreya 2. ya 82’yan de, xwesteka serdeçûnê pir eşkere bû. Berê jî armancek me ya bi vî rengî hebû. Em bi ser de çûn. Bi taybetî ji bo vê bîryarbûnê tevger pê xurt kirin, li Başurê Kurdistanê, bi riya hin têkiliyan, ev derfet çêbûn. Ev hate nirxandin. Vegera walat ya 82 û 85’an ji nû ve avakirina têkoşînê ye. 84 car din destpêkirina çalekiyan e. Çalekiya 84’an demek nû ye. Piştî demek dirêj tevger li derveyî welat xwe baş komî ser hev dike û di heman demê de, wêrekiya demek nû dana destpêkirinê jî nîşan dide.

Bernameya rastiya 12’ê Îlonê eşkere dike. Tevî hemû polîtîkayan jî, nehişt derbazî jiyanê bibe. Nehişt pêşkeftina demokratîk û şoreşgerî rawest e. Mayîndebûna şoreşê ava kir. Di hundur de jî, alîkarî da berxwedanên zîndanan. Têkoşîna wan bihêz kir. Ji bo vê jî girîngiya wê heye. Rastî jî têkoşînê, dewlet bê amadeyi girt. Dewletê bi mîsogerî bawer nedikir ku wê têkoşînek wiha pêş bikeve. Lê tevger wek bûyerek taybet vê gengaz dike. Ev têkoşînek e. Li gor ku tê xwestin amade ye. Ger komên şer bi taxtîkên hostayî şer nekin jî, vê carê bi taybet qedên çiyan bingeh in.  Her ku diçê hêzên çekdar yên propaxandayê dixwazin bigihên têkoşîna gerîla. Rastî bi çawaniya xwe ve serkeftinên bêhempa bidest dixin. A rastî, artêş jî ne amade ye. Bi her awayî me jiyana dirêj gengaz kir. Dewlet jî bi piranî ser vê demê de tê, 84 û 85’ê. Li ser şoka xwe rêxistin û sazîbûnê ava dike. Îstîxbarata xwe pêş dixe. Zagonên nû yên poşmaniyê derdixîne. Bi 85’an ve bi mîsogerî polîtîka tinekirinê, di rojevê de ye. Têra xwe derba jî hatin xwarin. Dawiya 85’an ji bo me demek zehmet bû. Bi taybetî bi wan hêzên Kurdistanî re, têkiliyên hukûmeta Tirkiyê pêşketî bûn. Wan em nedikirin wê qadê. Hevkariya bi dewletê re jî ferz dikirin. Pergala cerdevanî ya ku hûn dizanin pêşket. Ev kar em xistin zoriyê û ji wundahiyan re rê vekirîbû. Rastî wek tê gotin dawiya 85’an em ketin rewşek zehmet. Lê me car din xwe komî serhev kir. Me kongreya 3. lidarxist. Lewaziyên ku heyîn, hîn kûrtir me girtin dest. Bi taybetî ji bo neketina taxtîka jiyanê. Di vê mijarê de, bê berpisiyariyên mezin hebûn. Yên ku di cehwer de, ji xetê bawer nedikirin wan rêxitinê pêş nedixistin. Di dawiyê de, taybetmendiyên tasfiyeyê derdiketin pêş. Ev di kongra me de eşkere bûn. Xet hinek din kûr bû. Perwerdeyek hîn berfireh, erkdarkirin û gavên hîn baştir pêşde hatin avêtin. Van tiştan bi mîsogerî mirov dikare bêje. Di tevgera me de, asta çawaniya çînî pêş ketîbû. Ferasetên derveyî çînî hatibûn zelalkirin. Di radeyek bilind de, hin kes hatibûn tecritkirin. Lê tevgerê jî, tam pênaseya

taxtîkê nedîtibû. Tevî ku çalekiyan berdewam jî dikir, lêwaz bûn. Em di vê rewşê de ketin 87'an. Di 87'an de tevger carek din bihêz bû. Kadroyên hîn bi bandor û pêşkeftinên nû ve. Di 87'an de çalekî hîn pirtir tên lidarxistin. Her çendî hin xeletî hebin jî, lê em pirtir nêzî taxtîkê tevgerê dibin. Lê ev jî rastiyeke, yên derveyî xetê di vê demê de jî zarer didan. Bi feraseta xwe ya çalekî û rêxistinê ve zarar didan. Tiştên ku dikirin, bi piranî tasfiye û çewisandin e. Wê demê, em pir li ser wan sekinin. Hin kes tasfiye bûn. Dema ku ev têkoşîna hundurîn, bi çalekiyan re bû yek, em derbasî 88'an dibûn. Tevgerê 88'an, bi pêşkeftinên pir mezin ve girtiye. Diyar bû ku tevger, nayê perçiqandin, wê bênavber berdewam bike û pêş bikeve. Ango eşkere bû ku walîtiya taybet nikare tiştek bike û bi rêveberiya awerte jî bitenê ye. Pê hesiyan ku li hemberê tevgerek karekterê wê cuda ne. Taybetmendiyên tevgerê yê ku xwe nû bike heye. Bi taybet pevçûnên navxweyî, perwerdê xwe nûkirin bihêz kiriye. Ber bi roja me ve qadên çalekiyan hîn pirtir pêşketine. Li her derê walat belav dibe. Li pazde bajêran, hêzên têkoşînê yên çekdar, di tevgerê de ne. Ji çalekiyan zêdetir, me qala şerekî kiribû. Ji ber ku hêjmara çalekiyan nediyar bû, roja ku bêçalekî derbas bibe nîne. Rojê dikevin sad gundî zêdetir. Bi xwezayî divê mirov qala şerê gerîla bike. Di vê demê de teoriya gerîla jî, di nav me de pir pêşkeftî ye. Lê hîn baş ne hatiye pêkanîn. Hewldanên pêk anînê jî pir in. Ev dikara asta çalekiyan hîn bilidtir bafirîne. Di vê demê de çalekî pir tên lidarxistin û beşdarbûn jî pir e. Wek şerê meydanê, di van pevçûnan de çil pêncî kes dimirin. Bi hezaran yêkîneyên leşkerî û gelek helîkopter di van pevçûnan de tên bikaranîn. Ev ne çalekî ye, pevçûne, şer e. Tam wek şerê dema Înonû yê 1. û Înonû yê 2. lê hatiye. Îsal jî şer wisan pêşket; çar, pênc, deh ciyan pêşket. Bi rojan berdewam kir û bi dehan wundahî çêbûn. Şer wisan pêş dikeve. Ger tinê çapemenî jî bê şopandin, bixwe dibêjin, li Şemzînan, Şirnex, Mêrdîn, Dêrsim û Çewlikê bi seatan pevçûn çêdibin. Car din dibêjin bi dehan wundahî

dane. Belê bi rastî jî hîn pirtir e. Tiştên ku berdevkên fermî dibêjin, tim ji bo xwe xurt nîşan bidin û hêzên çekdar, yên şoreşger jî lewaz nîşan bidin radihînin.  Ew ne rast in. Îsal jî bi mîsogerî tevgerê di nava gel de pêşkeftin çêkiriye. Bala gelan, alîkarî û tevlîbûna wan pêşkeftiye. A herî girîng jî di bajêran de şiyarbûn pêşketîye. Li gorî berê beşdarbûn jî pir zêde ye. Di vî şerî de, wundahiyên me û yên komara Tirkiyê di xetên stûr de, pênc hezar hene. Tevî ku em baş nizanin jî, lê bê nepixandin hejmar eve. Bi gumanek mezin, di têkoşîna me de heta niha 1500 kes, ji artêş û ewlehiye, yanê hêzên fermî hatine kuştin. Car din ji der û dorên hevkar 2000, an jî ji 2000’î zêdetir, 2000, 2500 wundahî hene. Di têkoşîna me de jî heta niha wundahiyên milîtanan ne kêmî 500’î ye. Ji 84’an ve em dikarin bêjin 300 kadro û şervan şehit ketine. Belê birîndar jî hene. Bi hezaran girtî hene. Jixwe girtî hîn zêdetir in. Ji avakirina sazûman ve mirov dikare qala sed hezaran bike. Ji ber ku hin kes heftiyekê girtî man, hin sê rojan, hin mehekê. Bi sedan kes jî hatin dardekirin. Em dikarin bêjin her gund û bajarî nasîbê xwe jî jê girt. Belê wundahiyên madî! Ez bawer im komara Tirkiyê di van xalan de rastiyan nabêje. Ez bawer im tenê di salekê de, artêş 100 mîlyarî xerc dike. Li gorî ku tê bîra min, tenê par 60 mîlyar kirin fermana walîtiya taybet. Lê zêde ye. Bi taybetî amûr û amraz pir kirin. Bûtçeyên wan zêde kirin. Li gorî xwe rêbazek finansa şerê taybet heye. Trîlyan tên xerckirin. Bi têkiliyên derve ve hatin girêdan. Bi polîtîkaya tawîzdayînê ve dixwazin vî karî birêve bibin. Di hundur de jî neçarman ku tawîzan bidin mûxalefetê. Heta bi taybetî li Kurdistanê pişta xwe dan hevkar, axa û hêza eşîretan. Ew li ser piyan girtin. Rastî jî axatî ji nû ve rabû ser piyan. Ew girtin nav saziyên berfireh. Ew kesên li dijî dewletê, nijdevan,(eşkıya) û qaçax hemû efokirin û kirin nav pergala cerdevanî yê. Gavên ku di vê xalê de li Kurdistanê avêtin, bi mîsogerî gavên paşketîne. Wek min gotî tevî vê jî şer pêş ket. Bêguman artêşbûna me bingeh e. Di vê demê

de xeta me ya leşkerî pirtir pêşket. Mijarên leşkeri hatin lêkolînkirin, xeta rêxistinê ya leşkerî hate pêşxistin. Ji bo ku ev xet bi awayekî guncav were pêkanîn jî, me perwerde dîtin, xwe amadekir û di cîbûnê de pêşketin çêkirin. PKK li ser vê xeta leşkerê pêşketî ye. Niha li çil-pêncî deverên walat, hêzên têkoşînê yên çekdarî her roj digerin. Her roj dikevin bi sadan gund û carnan jî dikevin bajêran. Yêkîneyên me yên gerîla rastî jî dibin bingehên hemû pêşketinên siyasî. Her ku diçe hejmara wan zêde dibe. Derfetên şer yên nêzikî rastiyê peyda kirine. Hîn gerîla tam nerûniştiye, lê amadekariyên wan yên girîng hene. Di vê mijarê de we qala zagona leşkeri kir. Zagona leşkeri bi awayekî dildarî, me xwest ku em pêk bînin. Her çendî di van mijaran de, hin xeletî derketibin jî, lê bi demê re pêwîstiya leşkerî kirine, ya di artêşa gel a cehwerî de, ji aliyê gel ve hatiye fêmkirin. Di destpêkê de ji vê mijarê re girtîbûn, lê niha derbas dibe. Di artêşa gel de, hewldanên gerîla û milîsan zêde bûye. Enî jî bilêvkirina yêkîtiya gel a siyasî ye. Ji destpêkê ve çawaniya tevgera me ya eniyê heye. Ango çawaniya gel, di vê demê de bingehek berfirehtir hatiye avêtin. Hin kesên ji gel ên derveyî tevger û artêşê, xwe di eniyê de rêxistin dikin. Ger çîn û tebeqeyên cuda, yêkîneyên xwe avabikin ev ê çêbibe. Em bi lihevkirina karker, gund, rewşenbîr û ciwanan ve eniyê avadikin. Em wan ne wek komên cuda yên ku hatine gel hev, em wek yêkîtiya kesên ku di rewşa şer de ne û alîgirên tevgerê dinirxînin. Lê ev jî nayê wê wateyê ku kesên fikrên wan ne wek yên me bin, nikarin têkevin vê eniyê. Ji kesên dîndar bigirin, heta kesên ku bîrdozî li dijî me, hem dikarin, di vê eniyê de cîh bidinê. Em di polîtîkaya eniyê de nerm in. Çi mercê, ku em bêjin bi mîsogerî divê têkoşîna çekdarî jî bikin nîne. Li gorî mercên jiyana şênber, di qada aborî, çandî, rêxistinên civakî û siyasî de, dikare rêxistin çêbibe. Di vê wateyê de, mirov dikare eniyê wek yêkîtiya gel û rêxistina wî ya berxwedanê binirxîne. Tevger hêza rêveberiyê ye. Di vê wateyê de, artêş jî hêza parastinê ye. Çalekiyê

gerîla wê gel bikişîne, nava eniyê. Tevger avadike û rêve dibe. Li gel me, ev çek hîn di asta destpêkirinê de ye. Di nav hev de tên bikaranîn. Di nava wan de, hîn cudabûnek mezin çênebûye. Lê ji milê têgihînê ve, kêm be jî hin gav hatine avêtin. Ev jî rastiyek e. Taybet şerê me piştî 87'an pêşkeftinên ku nayên hizirîn bidest xist. Di vê mijarê de xwestin bi rêveberiya awerte ser bixin. Taybet par ji bo walîtiyê pêkhatinên taybet bikaranîn. Saziya walîtiyê, ya jê re dibêjin sûper pêşxistin. Li dijî têkoşîna me walîtiya herêmê, an jî ya Kurdistanê, jixwe tê wateya taybetbûna dewletê ya li gorî Kurdistanê. Di Kurdistanê de rêveberiya dewletê, li hemberî têkoşîna me ketiyê rewşek nû. Li ser gelê berê yê ku bêdeng û pasîf hatibû hiştin, bandora rêbazên kevnar hebûn. Lê çawa ku me ev hejand û derfetên berxwedanê derxistin holê, êdî dewleta kevnar têr nekir. Rêxistinên nû yên civakî (sivil) û leşkerî cara yekê hatin damezrandin. Walîtiya giştî vekiriye. Walîtiya Kurdistanê ye. An jî rêveberiya dagirker a Kurdistanê ye. Tê vê wateyê. Bixwe jî dibêji; "Destpêkê navenda Amedê" û li bajêrên der û dora wê rêveberiyek awarte avakirine. Mirov vî rêbazî jî li ser walatek cuda bikar tîne. Pêşkeftin jî ev e. Walîtî qasî civakî, wî qasî jî rêbertiyê ji pêkanîna leşkerî re dike. Artêşa taybet ava dike. Wek hûn dizanin ev artêşa taybet, ji yêkîneyên Tîrkiyê yên herî bijarte pêk tên. Bi giştî ji wan kesên faşîst, yên kevin pêk tên. Ji kesên çi ehlaq, sînoran nasnakin û pisporên bijarte pêktên. Ji nû ve rêxistinekê pêş dixe. Cîhbûnê ji karakol û bîryargehan re pêşdixin. Car din îstîxbaratê pêş dixin. Ger tam nehatibe rûniştin jî, lê ev saleke li ser kar in. Karê ku îsal kirin, ji operasyonên berê pêşdetir neçûne. Lê ji milê teknîkî û îstîxbaratê ve bihêz kirine. Tîmên taybet jî li ser ve zêde kirin. Pêkînanîna tîmên taybet jî, amûrê şerê taybet e. Ev zêdetir dixwazin bajêran biparêzin. Vê jî bi rêbazê kontregerîla dikin. Yanê li Salvador mangên mirinê çi bin, wê ev tîm jî, li Tirkiyê tîmên mirênê bin. Kontran e. Ev li Fîlîpîn û Nîkaraguayê jî hene. Em wan wek kontra

binav dikin. Tevî van kirinan jî di vê sala dawiyê de, ser neketiye. Masrafên pir mezin kir. Heta niha pir kêm di operasyonan de ser ketine. Mînak; wundahiyên ku me 85'an dayîn, bi mîsogerî sedema van wundahiyan ne ew bûn. Hin kesên bêberpirsiyar û destûrên şer pêkneanîn bûn sedema ku em van wundahiyên dawî bidin. Bi mîsogerî sedemên wudahiyên me ji sedî not û pêc, çavkaniya xwe ji hundurîn digirin. Mînak; tevî ku li qadek ji rêzê bi hezaran xevkan davêjin, me li vir wundahî nedane. Bi zanabûn neguhdarkirina destûran û dubarekirina wê, dibe sedema wundahiyan. Li Mêrdînê mirov rehetî dikarîbû, pêşî li wan bigire. Lê lewaziya endaman derfet nedan vê. Tevî ku me nedixwest jî di encama van nêzikbûnên bê perpirsiyar de, ev çalekî pêk dihatin. Bi vî rengî diketin rewşeke dijberî rêxistinê û bi taybetî taxtîkên wê pêk nedianîn. Car din bi taybetî kesayetên taybetmendiyên gundî li pêş û giranî çêdikirin hebûn. Van zarer didan. Berpirsiyarên van pêk hatinên ku em ne li bendê bûn qewimîn û hiştin ku civak hinekê ji me dûr bikevin, ev kes in. Em ser wan de diçin. Her ku em ser wan de diçin, em hewl didin wan bidin derbaskirin, tasfiye dikin. Tevî ku di salvegera yekemîn, ya yêkîneyên taybet de gelek mesref û propaxanda jî hatekirin, lê encan di holê de ye. Niha bi rastî jî qasî ku mirov nikare bi sala derbasbûyî re bîne pêşberî hev, em di qadên berfireh de belav bûne û em bi cih bûne. Ev rastiyek e. Ez baş dizanim ku hêza me ya îsal, ya par derbas dike. Di jêhatiyên şer de pêşkeftinek heye. Ma em niha weke ku dixwazin? Na. Me hîn meztir hêvî dikir. Dehqat ji vê zêdertir e. Weke ku min gotî, ger ev nehatibe pêkanîn, sedem ne mesrefên yêkîneyên hêzên taybet e. Sedem em ji bê baweriyê bigirin, nêzikbûnên heta dawiyê hişk, lîberal, bi taybetî nêzikbûnên şêwazê şerê demê înkar dike, nêzikbûnên kesî û helwestên heta dawî bi niyetên sûbjektîf, em ji van pêşkeftinên mezin dûr hiştine. Li şûna ku waliyê taybet, bêje ez çi qas bi tevdîr, pêşketî û bi hêz im, bila ji vê re dua bike. Di rastiyê de dibû ku encamên wê jê re pir

giran jî bihatana. Lê ji ber ku hêza kadroyên hundur têra van tiştan nekir, di şer de ne afrêner bûn, ev jî bû sedem ku waliyê taybet karibe xwe biparêz e… Lê ev jî tam nebû. Rastî jî wekî ku raya giştî jî ji nêz ve dizane, di gelerîbûna PKK'ê de pêşkeftin heye. Li ciyan û bi taybetî li bajaran.

Rojnameya C.: Ma mirov dikare di vê mijarê de hêjmarekê bide?

---.: Na, bi mîlyonan, em dikarin bêjin bi mîlyonan. Bi teqez weke ku di wan rojnamayan de jî hatî nivîsin, wisa çend gund hene…

Rojnameya C.: Na, min qala wê nekir. Ya ku ez qal dikim, çend endamên PKK'ê hene?

---.: Bi teqez mirov nikare hêjmarekê bide. Ji ber ku hêjmar tim tê guhartin. Em dikarin bêjin niha li derdora hezar kesî ne.

Rojnameya H.: Yanê yên di walat de?

---.: Belê, li dora hezar kadro û şervan li walat tevlî şer dibin. Lê ger em li gor têkiliyan bigirin dest, di bingeh de pir berfireye û her kêlî dikare zêde bibe. Kom tên. Li vir şûna çendiniyê, divê mirov li çawaniyê binêre. A girîng gihîştina me ya hemû qada ye. Em di hemû qadan de pêşxistina şer pir girîng dibînin. Li Qers, Agirî, Wan, Colemêrg, Sêrt, Amed, Mêrdîn, Riha, Semsûr, Mereş, Muş, Bidlîs, Çewlik, Elezîz, Dêrsim û beşek jî li Erzuromê hêzên çekdarî hene. Di milê din de hawirdorek berfireh ya propaxanda jî heye. Di hemû gundan de beşên propaxanda hene. Jixwe li bajaran rêxistin wê berfireh were nîqaşkirin. Herî kêm ji nîvî zêdetir alîkariyê dikin. Bingehê girseyê pir xurt e. Lê belê bê rêxistinin. Lê her kêlî

rêxistinkirina wê, dê nezehmet be. Rewş bi awayek eşkere vêya nîşan dide ku her şev komên leşkerî dikevin sadan gundan û derdikevin. Niha wisa tinê li çiyayên bilind û mezran namînin, şev nîv nîv li gun û deştan digerin, roj jî li mala dimînin. Weke min gotî û tim vedanên çapemeniyê jî dibêjin, tevger ji par nelewaztir e. Ez bawer nakim ku dewletê jî heta niha hemû ewlekariyên pêwîst û yên karine bigirin girtine. Yanê mirov nikare qala rêxistineke bi çawanî bike. Teknîka herî baştirîn kiriye. Em ji helîkopterên ku DYE, yên li Vîetnamê bikaranîn bigirin, pêşketinên di vê mijarê de bi Îngîlîzan re çêdibe, teknîka Fransiyan, amûrên helîkopterên zirxî, çekên ku hêza wan a reşandinê ya bilind hemû kirîne. Car din di perwerdê de, ew tugayên komandoyan hemû berdan qadê. Car din komkirinên leşkerî yên mezin kirîne. Ez bawer nakim ku di şerê bi Yunanan re, ew yêkîne ew qas teknîkê bikaranî bin. Ji bo dem jî çar sal tijî dibin. Ev jî nîşan dide ku me di şer de pêşketinên girîng bidest xistin e. Hem jî ev di nêvengînek wisa bêhevsengiya mezin a hêzê de pêk hatiye. Di vê mijarê de serkanê giştî (genelkurmayî) neçare ku bi awayek rast, wundahiyên artêşê yên madî û manewî eşkere bike. Serkanê giştî di salvegera şer a yekemîn de kombûnek çêkir. Vural.... serokatiya vê kir. Lê belê pirsgirêk dubare bû. Sedemê dubarebûnê pêşketina şer e. Ya rast bi brîfîngan dikarîbûn vê bikin. Dikarîbûn rewşa heyî bi awayekî rast deynin holê. Belê wê artêş di vê mijarê de bê hincirîn kirin. An jî dizanin ku dema raya giştî di vê mijarê de bibe xwedî zanistî, wê ji bo prestîjiya wan pir xirab be, ji bo wê jî brîfîngan nakin. DYE'ê ji vê re dibêjin; "serhildana çekdarî", dibêjin; "raperîn". Rastî ev e. Tirkiye hinekê îflas dike. Di vê mijarê de komên me xwedî înîsiyatîfên berfireh in. Propaxanda-ajîtasyon û rêxistin bilind kirin. Ji bo wê jî rewşek me ya wisa, em rojane ferman bidin, nîne. Lê hema hema têkiliyên me bi hemûyan re berdewam dikin. Bi rêyên curbecur re wê bê dewamkirin. Teknîka hayî ji hevbûnê pêşketî ye. Ev jî dibe sedem ku di têkiliyên me de,

pêşketinek wisa çêbibe. Lê ya girîng ew e ku kom bixwe, wê têra xwe bikin û bikaribin ajitasyon-propaxanda û rêxistinê pêş bixin.

Rojnameya C.: Belê, li gor ku li Tirkiyê tê gotin, ketin û derketina komên perwerdekirî, yên li Tirkiyê; piranî girêdayî Iraqê pêş dikevin.

---.: Ev pirsgirêk êdî newekî berê ye. Di 1983’an de wisa bû. Di ser Iraqê re bû. Niha dikarin di her qadê re biçin. Jixwe ji derve de ketin nîne. Dikarin li ser Ewrupayê re biçin. Li tevayî Tirkiyê, dikarin her çar milan ve bikevinê. Lê niha lewaz bûne. Êdî weke berê zêde koman naxinê. Şeş mehan carekê dibe, yan nabe. Ji ber ku hêzên me yên bingehîn, li hundur bi cih bûne. Ez bawer im walîtiya taybet, vêya dizane. Dernakevin ji der ve. Zivistan û havînê di hundur de ne. Dibe ku bi pir sînordar hinek kurye derkevin. Car din hin komên pir piçûk dibe bikevin hundur. Dibe ev bi pasaportkê jî bibe.

Rojnameya H.: Ji ber ku tim wundahî hene, divê tim bên destek kirin.

---.: Pêwîst e êdî hinekî jî bixwestek û hewldanên xwe destekê pêş bixin. Ji ber ku êdî ji der ve telafîkirina wundahiyan ne guncav e.

Rojnameya C.: Hûn ji bo perwerdekirinê kadro tînin vir. Ne wisa?

---.: Derveyî welat, gelek beşên kedkaran hene. Tinê ne li vir, li Rojhilata Navîn û Ewrupa jî perwerde heye. Li her derê heye. Belê li gelek qadên curbecur derfetên perwerdê hene. Tê nirxandin. Vir jî êdî wekî berê negirîng e. Erka xwe pêkaniye. Wekî saziyek alîkariyê

li vir tê karkirin.

Rojnemay H.: Yanê, ma hûn di pozîsyonek berxwedêr de kesayetan perwerde dikin?

---.: Na, lê dikere ew qas bibe. Yanê di pîvanek diyar de, ji bo pêşkeftinek baş çêdibe. Li Ewrupa yan jî li derek cuda. Lê belê êdî girêdana şervanan, di hundurê welat de ye. Di milê madî-manewî û siyasî de zor e. Jixwe wekî berê nehêsane jî. Bi taybetî ji Başur zehmet dibe. Gelek ewlekarî girtine. Herdu milan jî ewlekarî girtine. Ez dibêjim, êdî ji aliyê me ve jî girîngiya xwe wunda kiriye.

Rojnameya H.: Di hundur de, cihbûn çawa çêdibe?

Rojnameya C.: Çek?

---.: Bi temamî ji gel tê girtin. Ji artêşê tê girtin.

Rojnameya H.: Carê nayê dîtin. Ji ber ku carê bi tonan birinc, pitat, şekir û cih têne dîtin.

---.: Bêguman ji bo peydakirina xwarinên bi wî rengî cih hene. Li gel me rêgezek e. Her ku diçe tevger dikeve bin erdê. Li her qadê stargeh hene. Berî şeş mehan pêdiviyên xwarinê li wir tên depokirin. Car din çek hene. Ez bawer im bi taybetî li ser Iraqê re qaçaxçîtiya çekan gelek e. Ji van deran jî heta wê derê çek derbaskirin, rêbazên klasîk in. Li Tirkiyê her kes dizane, yanê em gelekî çekdar in. Jixwe walîtiya taybet jî, çek dan 20 hezar kesî.

Rojnameya H.: Herî dawî deh hezar bû. Lê heta berî sê mehan.

---.: Gihîştina me ya wan çekan ne zehmet bû. Bixwe jî hejmarek pir mezin dide. Em di wê astê de ne ku bi derfetên xwe yên cehwerî, xwe biçek bikin. Em ê hewl bidin ku hîn pirtir çekên esasî ji yêkîneyên artêşê bigirin. Hinek hatiye girtin. Herî kêm qasî ku ew yên me digirin, em jî yê wan bigirin. Em ê hin riyên nû peyda bikin û bigirin. Ji bo xwe bi çek kirinê rewş ev e. Jixwe gel xwarinê dide. Lê divê bi rêbazek hîn guncevtir em jî rêve bibin. Yanê her roj çûna gundan û xwarin peydakirin ne rast e. Bi demê re em dixwazin ji wê polîtîkayê dur bikevin. Divê bixwe, xwarina xwe peyda bikin. Çûna mêvandariya malan, xwarin xwarin zarar dide. Ji wundahiyan re, rê vedike. Sedama wundahiyên dawiyê jî ev e.

Rojnameya H.: Rewşa çalekî şemitandina bajaran, bi awayek çalek…

---.: Çi li Tirkiyê dibe, çi li Kurdistanê dibe, livandinên nû hene. Bi taybetî girseya giran a pêxirtengiya aboriyê îflas kiriye. Ji bo vê jî ew di rewşek aciz de ne. Sempatiya ji bo partiya kevnar jî heye. Em difikirin ku em ê ji çawaniya pêşkeftina bajêran birgirin. Di vê mijarê de dewletê du ewlekariyên girîng girt. Heta 80'an navenda rêxistinê li bajêran bû. Ji bo vê jî li bajêran pergala polîs û ewlekariyê pêşxist û hinekê jî serket. Ber bi 82'an ve bi giştî encam girt. Lê piştî vê me vê carê deşt kirin dewrê. Dewletê jî ji bo ku li tevayî deştan têkoşîna çekdarî bide rawastandin, modelek da destpêkirin. Niha bi qereqolan, nizanim bi hemû pergala xwe ya hundurîn ve ji bo şerê li deştan bide rawestandin, ji bo di hundur de jî deştan tengav bike, li pay taktîka ye. Taybet kemînan davêje hemû qadan. Car din belkî di herêmek sê hezar kemînan davêje. Hêjmara kemînên ku davêje, par digot 20 hezar. Lê ez bawer im ku tine kemînên ku di vê sala dawî de avêtî, dusad hezarî derbas dike. Ji bo deştê pêkanînek tirsnak e… Bêguman tirsnaktî nîne. Ez dibêjim

mirov dikare çi bike? Gelek mirovan bi şaşîtî hev kuştin. Ev di çapemeniyê de jî têra xwe teyîsî. Ev pir çêbûn. Belkî jî mirov dikare bi sadan vegotin bike. Ji ber ku dema şev pevçûnekê dest pê kir, heta sibê berdewam dike. Bi rêgez wisa ye. Dengek biçûk jî dibe sedem ku yêkîne li navhev bikevin. We marîfetên komara Tirkiyê dîtin.

Rojname: Me dît.

---.: Ji bo dewletan terorîst e an jî ne terorîst e, çespandinekî baş e. Lê belê divê baş were bikaranîn.

Rojname: Yanî bê lêkolînkirin?

---.: Na, jixwe eşkere ye. Ew çespandî ye. Armanca îstîxbarata komara Tirkiyê vekiriye.

Rojname: Teqez di eniya Tirkiyê de, malbatên wan kesan têkildar dike. Ev qas deme ew nînin.

---.: Bi sadan yên wisa hene. Ji bo bibin mînak me vana nîşan da. Di rastiyê de pirsgirêkeke pir mezin e. Bi sedan wisa dibin. Komplo tên kirin. Ma hûn nabînin? Ji bo me xwe ji çi bizavan re amadekirine. Niha pir girîng e, di vê mijarê de pêwîst e pêşiya pir êşan bên girtin. Pir girîng e, ma dê ev bibin? Wê niha van bavêjin, xwedî li van dernakevin. Dê fermana van mirovan bînin.

Rojnameya C.: Neçar in lê xwedî derbikevin. Ji ber ku me tiştên wan hemû girtin. Cihê ji dayîkbûna wan, li ku derê, çi karî dikin û hwd.

---.: Belê, belê. Dê pir tişt dewr bikin. Dê serûbin bikin. Niha

ji bo ku ji vê birevin pir tişt kirin. Heta niha digotin bizavên dewleta Tirk, yên terorîstî li derve nîne. Dê di hundur de weke bombeyê biteqê. Sernûçeyek, dudu, sê. Yanê mirov her roj yekê bide axaftin, hinekê jî ev bi hostatiya we ve girêdayî ye. Heta dawiyê jî, yanê ev ji bo têkoşîna demokratîk mijarek jiyanî ye. Dê jiyana bi sedan mirovî rizgar bike. Di vê mijarê de çi zagon jî nikare astengiyan çêbike.

Rojnameya H.: Em ê vê lêkolîn bikin. Yanê bi taybetî di çêkera malbatê de. Yanê me ji polîsê esasî yê di holê de, zilamê ku di polîsyê de kar dike pirsî, me got ma zarokên wê hene? Gotin; "her hal çêbûye". Belkî li derekê hevjîna wî ducanîbe û hwd.

---.: Qet kesek nizane.

Rojname: Dê ji ku bizanin.

---.: Bi hezaran wisa tên bikaranin. Bangawaziya wan e jî. Pir xirab, pir kirêt tên bikaranin. Yanê ev polîtîka, polîtîkayek pir xeter e. Bi ehlaq re jî ti têkiliya wê nîne. Pirsgirêk heta asta herî jor bilind dibe. Ma tiştek bi vî rengî kî erê kiriye?

Rojnameya C.: Qasî ku ez têgihîştim, pir bi hostayî tevgeriya ne. Bi taybetî min 5-10 pirs pirsîn, têkiliyên wê bi kî re hene. Tim di asta jêr de girtine. Di şaneyan de kar kirine.

---.: Belê, bi şêwazê kontrayî. Yanê eşkereye, ya girîng îspat e. Ew pir di jor de tê eyarkirin, pir hêsan e. Di rastiyê de kovara 2000 Doğru dikare pir baş wê biteyîsîne... Jixwe ez hema vê bêjim, di van mijaran de hûn ê biçin gel wan û naveroka hevdîtinê bidin civata giştî ya nivîsê. Hûn digirin ne wisa? Bigirin. Yanê wek min gotî, ji bo çapemenî jî hinekî rista xwe baş pêk bînin, gelek meteryal hatin dayîn. Tinê ne ji bo rojnameyên ku hûn bi navên wan hatine,

destpêkê yên wek 2000'e Doğru, heta Nokta, ger ku bixwazibin binirxînin, hûn vana baş nas dikin, heta hûn dikarin bi civata giştî ya nivîsê re hevdîtinan çêbikin. Di vê mijarê de em erêbûnê didin. Ji bo me, bi awayekî dirust di nirxandina van meteryalan de xeteriyek nîne. Belê ya din, a we ye… Xwestin hevdîtinan çêkin, lê heta niha me di cih de nedîtiye. Bi taybetî piştî ravekirinên pêwîst yên ku ji çapemeniya Tirkiyê re hatin kirin, me got belkî em dikarin bifikirin. Ji bo wê daxwiyaniyek me çêdibe.

DYE polîtîkaya xwe ya Kurd bi awayekî fermî eşkere kir, berî her tiştî ev pir girîng e. Ev tinê Kurdên Iraqê têkildar nake. Kurdên Tirkêyê bixwe jî têkildar dike. Gotina pêwîst e mafên Kurdan hemûyan bi rêyên aştiyane werin dayîn, wê li ser pêşkeftinên ji niha û şûn ve çêbin jî bandorek girîng bike. Diyar e, ev dibe encama têkoşîna me dayî meşandin. Berî her tiştî divê mirov qala guhertina polîtîkaya DYE'ê bike. Heta duh, alîkariya ji komara Tirkiyê, li pişta polîtîkaya înkar û îmhayê ya ku dimeşand hebû. Herî kêm, berjewendiyên xwe yên siyasî, berjewendiyên xwe yên li herêmê, aniye ber çavan û fêmkiriye ku êdî sûda vê polîtîkayê jê re nîne. Êdî ferq dike ku polîtîkayên înkar û îmhayê di nava NATO û herêmê de wî dike zoriyê. Ji bo wê jî neçar dibe ku biryarek bigire. Di vir de ya nû, babeta duwem e: Berê DYE'ê tinê bi Kurdên Iraqê re têkildar dibûn. Di dema Henry Kissinger de, dixwestin bi Barzanî re têkiliyan pêşbixin û ew dem jî pir balkêş e. Bi taybetî hîn pirtir ji bo Iraqa di bin bandora Sovyetê de bînin rê, hewldidan Kurdên Iraqê bikarbînin. Bi vê armancê bi şahê Îranê re hinek alîkarî kirîbûn. Belê, piştî peymana Cezayîrê, tinê hatin hiştin û rewşek pir xirab derket holê. Tevgera me ji vê ders derxist. Piştî 75'an ji her alî ve tevgerek nû ya rizgariya netewî, amederiyên wê yên bîrdozî û siyasî em dizanin. Di bingehîn de me hemû giraniya xwe da tevgera rizgariya Kurdên di bin mêtîngeriya Tirkiyê de. DYE'ê vê dipejirîne. Niha tinê

Kurdên Iraqê, ne ji bo Iraqê bikşîne ba xwe. Em bawer in hinekê jî ji bo Tirkiyê hinek din wan girê bide. An jî herî kêm ji bo vê çûna wê ya bêlixab (dizginsiz) bide rawestandin û ji bo nehêle tevgera Kurd hîn radîkal bibe û ji bo pêşî li pêşkeftinek dijberî xwe bigire, herî kêm wisa diyar dike ku êdî bi mîsogerî ji hin çareseriyên hîn reformistir bawer dike.

Yanê ger şoreş hîn kurtir bibe, dibe heta ji Tirkiyê qutbûnek bingehîn jî biçe. Ji bo wê jî nêzikbûnek nerm mijara gotinê ye. Em ê hema bêjin lîstoka emperyalîzmê ye, ji binî ve xirab e. Lê em vê jî baş dizanin: Hêza herî bingehîn ya ku heta niha hiştiye polîtîkayên Tirkiyê yên mêtînger li ser piya bimîne DYE'ê ye. Armanca siyasî ya li pişt vê nermkirina siyasî çi dibe bila bibe, gavek pêş de, an jî herî kêm li ser pirsgirêkê dîmenik a nîqaşê zêde dike. Divê di vê wateyê de were nirxandin. Ez nabêjim pêş de, ev e, ez ê bêjim bi evîna demokrasiyê dike. Lê herî kêm diyar dike ku divê ji bo çareseriya siyasî hin amadekarî werin kirin. Pêwîst e bi vî awayî were nirxandin. Ez bawer im Tirkiyê dê derdorên curbecur ji vê encamên pêwîst derbixînin. Em hema bêjin, em dizanin li pişt çareseriyên bi vî rengî, hêzên pir bi xeter hin lîstikan pêşdixin. Em ê di vê mijarê de baldar û şiyar bin. Em ê li dijî pêşkeftinên ku Tirkiyê girê didin rawestinin. Car din em destûr nadin ku hêzên hevkar, demokrasî û pirsgirêka rizgariya Kurdan ji cehwerê wê derbixin. Di vê mijarê de yên rastî xwediyê têkoşînê, tiştên ku bikevin dijberî armanca şervanên rastiyên serxwebûnê, wan careke din bînin lîstîkan, hewldanên ku lîstîkan bîlîzin, em ê dijwar li hember rawestin. Demokrasî nikare ji bo kulmek dirêjayîya navnetewî ya yekdest be. Li ser gel lîstîkên nû, di vê navberê de ev hêzên han, dubare ji bo şiyarbûna gelê Kurd ji rê derbixin, rûpoşan têxin berçavên xwe û bi taybetî li ser me bikaranîna wan em napejirînin. Lê ger bi rastî, wekî ku me di destpêkê de jî gotî, bikevin platformên nîqaşên demokrasî,

divê ev bên nirxandin. Ev ne reformîzm me. Ev li gorî şert û mercên şênber helwesta rasteqîn danîne. Hin destkeftiyên bi têkoşînek mezin hatî bidestxistin, wisa bi şiyar avêtinên çepgir û nêzikbûnên sekter ve vala derxistin, em herî kêm bi qasî lîberalîzma rast, tasfiyekariya rast û feraseta reformist xeter dibînin. Ev rasterast dibin pêşkeftinên ku têkoşîna me derxistiye holê. Em ê têkoşînê berdewam bikin. Me mercên xwe danîne holê. Wê berxwedan pêşbikeve, şerê pêşbikeve. Lê bi awayekî xwezayî, şerê gelan yê lodên demokrasiyê jî pêşdikeve. Ev hemû li pêşiya me ne. Bi taybetî di taxtîkê de, rewşên ku divê em pir lê baldar bin derdixe pêşberî me. Raya giştî ya Tikiyê, pêşverû, demokrat, bi rastî jî di van mijaran de, pêwîst e karibin hinekê xwe nû bikin. Di vê mijarê de nîqaşên wan ên berê sitewr, ên encam nagirin û devjejiyê pêwîst e berdin. Ev destkeftî di berdêla têkoşînek pir zor de hatine qezenckirin, ji bo wê jî ez dubare, bi girîngî dibêjim, pêwîst e pir nirx bên dayîn. Pêwîst e hesabên piçûk neyên kirin. Car din divê hêzên hevkar û desthilatdar her tiştî bi awayekî zêdetirîn nexin bindestê xwe û pê nelîzin. Ger bi xwe wekî berê bilîzin, dawiya wan a xirab be em ê amade bikin. Em ê li hember vana şer pêşbixin.

Bi mîsogerî divê her kes ji demokrasiyê bawer bike. Divê mirov di vê mijarê de bi rêgez be. Yên ku hin tiştan ji me hêvî dikin, yên herî kêm ji me hêvî dikin ku em dev ji helwestên bêwate û ziyanê didin her kesî berdin. Yên bixwe bingehê vê zoriya bêwate, wekî ku me ev dijwariya kor bi awayekî eşkere danî holê, ji destpêkê ve heta rêvebirina gelekî û hemû şêwazê provakasyonan, yên ku bê exlaqiyê wekî rêbaz ji xwe re hilbijartin bixwe ne. Li gor min pêwîst e bi mîsogerî ev helwestên xwe ber çavan re derbas bikin. Bi vî rengî pirsgirêka Tirkiyê û pirsgirêka me ya bingehîn e. Hêzên hevkar yên heremê, curbecur li ser pirsgirêka Kurd xistine dewrê, negengaz e ku pirsgirêka ku em dixwazin çareser bikin, karibin tasfiye bikin.

Dixwaza Kurd, an jî Tirk kî jê re dibe amûr bila bibe, em ê li hember wî/ê têkoşînek tund bidin meşandin. Di vê mijarê de em ji parlamentoyê bigirin, heta rêveberiyên giştî, bi taybetî pêwîst e derdorên Kurd ji nû ve helwestên xwe ber çavan re derbas bikin. Rewşek me ya ku em li ser wan dimeşin heye. Em neçar in ku nasnameya xwe ya netewî û girêdana xwe ya demokrasiyê daynin holê. Di vê mijarê de platforma nîqaşan vebûye. Kesek ji sedî sed fermana xulamtiya wan nake. Têkoşîn vê derfetê vedike. Ji bo vê divê em binirxînin. Pêwîst e Tirkiyê jî û raya giştî ya rast jî, xwe ji van nîqaşan re baş amade bike. Ez hêvî dikim ku gelek tişt, di wê rewşê de ne karibin mijara me binirxînin. Niha naçar in ku vê bizanibin, em ê helwestên wan ên ji bo tasfiyekirina PKK'ê bê encam bihêlin û em jî ji zarardayînê re sînor nasnekin. Em dikarin bêjin ku ger hukûmet, heta dawiyê piştgiriya hemû rêbazên şerê taybet bike, wê bibe dawiya wê. Na, ger ku hukûmet wekî di pir babetan de, di vê babetê de jî îda dike ku xwedî çareseriyek nû ye, pêwîst e vê ne bi rêbazên şerê taybet yên zirav û pêşxistî ve neke. Divê girêdana xwe ya bi demokrasiyê danîna holê ve vê nîşan bide. Ez dikarim bi rehetî vê bêjim. Dema ku ev kir, ji bo em dawiya wê bînin, tişta ku bikeve ser milê me, heta dawiyê em ê pêkbînin. Ji bo wê di vê mijarê de berpirsiyarî dikeve ser rayedarên dewletê, yên di van xalan de berpirsiyar in. Neçar e bi taybetî dawî li polîtîkaya xwe ya hin di girtîgehan de, ji kuştin û êşkenceyê re sînor nasnake dawî lê bîne. Car din herî kêm di vê mijarê de li tevahî cîhanê şert û merc têne sereraskirin, devjê berdin. Lê ev heşt sal in hîn li Tirkiyê darizandina ew qas mirovan xilas nebûye. Tevî ku tiştek nekiriye, tinê ji bo xetere, ji bo nebûye mikûr, sezayê dardekirinê lêbirîne. Belê, ev tiştên wiha çi qas bixeter in, pêwîst e bên zanîn. Em jî bi vî rengî dikarin bi sedan kesî bigirin. Yanê ev derfetên me hene. Em ji mijarên bi vî rengî bigirin, heta ku afirandina nêvengînek ya

nirxandinan, gelek tiştên ku bên kirin hene.

Piştre jî bivac (tutarlılık), raya giştî dana bawerkirin û bi rastî em ê li hêviya gavên îspat dikin ku demokrasîne bimînin. Bê ku em van bibinin, dizanin ku bi lîstîkên wan yên zirav ve her ku em tesfiyê bibinin, em ê şer gurtir bikin. Di vê mijarê de jî, yên hinek hêviyên wan hene, ev ji bo wan bersivek e. Ez bawer im bi vî rengî, ez li ser hemû mijarên ku bikaribim bersiva pirsên we bidim, rawestiyam. Ez ê derbarê ji bo raya giştî, dostên ku me nasdikin, silavên xwe bişînim. Bi taybetî yên mildayîn şerê demokratkirina Tirkiyê, li hundur dibe, li derve dibe, di nav me de dibe, nebe, me nirxek mezin da hemûyan. Me girêdana xwe ya bi xwediyên berxwedanê re nîşan da. Li Tirkiyê berxwedana, berxwedarên leheng heye. Me ala wan ya serxwebûn û azadiyê, di şênbertiya PKK'ê de hîn pirtir bilind kir. Ez vê bibêjim, bi mîsogerî wê ev serxwebûn û demokratbûna Tirkiyê wê di dema pêş de bandora xwe hîn baştir nîşan bide. Ji bo vê her çi qasî bi çepgiriya Tirkiyê re, bi demokrasiya wê re weke ya me pir şênber nebe jî, ji bo em rêgezên wê bixin jiyanê, ger rasterat nebe jî, ez di wê baweriyê de me ku, tişta ketî ser milê me, me pêkaniye. Dubare cardin hemû malbatên şehîdan, girtî û malbatên wan, bi rastî kedkarên Tirkiyê yên di rewşên zor û zehmet de, ez silav û rêzên xwe pêşkêş dikim.

# HEVPEYVÎNA RÊBERTÎ YA LI GEL MUHABÎRÊ ROJNAMEYA HURIYETÊ

---.: Ma, we pirs amadekirin?

Huriyet: Na, me bi hev re amade kir.

---.: Tê amadekirin ne wisa? Ya duyem, pirsgirêka Huriyetê. Niha destpêkê me got qey “Nokta” ye. Me got Nokta be, dibe. Niha bo Huriyet. Lê ji bo Huriyetê….

Huriyet: Yanê ez wê dizanim. Li Viyana me bi F. re axivîbû. Ji me re got bi mîsogerî divê neyê guhertin. Yanê wekî ku we nivîsiye.

---.: Lê wê Huriyet, di vê mijarê de çi qas lihevkirî bide. Hûn heta niha Huriyetê jî, ji nêzikbûnên wê dizanin. Rewşên xeter hene. Rojnameya Tercûman û Huriyet… Jixwe yên din jî giştî yekgirtîne. Wê li ser çapemeniya Tirkiyê, polîtîkayek a me pêşbiketa. Tam di vê navberê de, vaye rojnamevan hatin. Di rastiyê de me yê ev çapemenî protesto bikira. Pir baş tê dîtin ku MÎT çi bidiyê, di cih de wê diweşînin. Yanî tirsnak e.

Huriyet: Pir agahiyên şaş û derew didin.

---.: Niha me yê du tişt bidana. Armancek a min jî, yan ji bo ku em van têkiliyan seresat bikin, min ê pêşniyarî bikira, yan jî êdî

em wan naxîn Kurdistanê. Rewşek a biryargirtinek bi vî rengî heye.

Huriyet: Belkî mirov dikare bide.

---.: Gelo mirov dikare çawa bide?

Huriyet: Ji ber ku em jî hin tiştan dizanin.

---.: Rast e, lê hêza we lewaz e. Ew bi hêz in! Zilam dibêje; “ez ê serokwezîr bênim rê”. Min di rojnameya wî de dît. Min xwend. Yanê dibêje; “çapemenî hêza yekemîn e”. Wê demê hûn ê ji bo zilamek wisan bi îdîa çi bêjin? Ez li ser yekî wisa, xwe bi hêz dihesibîne difikirim jî, em ê jî neçar bimînin ku li hemberî vê ewlekariyekî bigirin. Ger ew wisa li me dikin, em ê jî bi wan re mijûl bibin. Yanê tu yê bi awayekî zanabûn, tevî ku rewşa me spiye, tu yê reş nîşan bidî. Tu nikarî polîtîkaya dijûna, weke azadiya çapemeniyê bikar binî. Yanê niha wê bertekek me pêşbikeve. Di vê mijarê de ez dixwazim ku, di vê plansaziyê de têkoşînek hîn hemdem hebe. Bila serdema vê vebe. Ya ku ez hîs dikim, hinekî jî ne pirsgirêka Kurd e jî. Di vê mijarê de heta astekê sansûr hatiye şkandin. Ev hinekê jî, bêçandî, korî û bê berpirsiyariya rojnamevanan a li hemberî vê pirsgirêkê ye. Di vê mijarê de, pêwîst e ku bi rêgez tevbigerin. Wekî din jî heta ketina min jî ya di nav vî karî de, çi qas bi wate ye. Belkî jî pir şaş e. Min gotiye, ger pir şaş be, em çima şaşîtiyan bikin? Hûn di rewşek wisa de hatin ku gelek nîşanpirs di serê me de kom dibin. Em di amadekariya hin çalekiyan de bûn, hûn tam di rewşek wisa de tên. Ji bo wê jî pêwîst e ku em berê vê pirsgirêkê nîqaş bikin. Nêrînên van zilaman bi vî rengî ne. Em bi yên din re eşkere axivîn. Mesele min got ger hûn ziyan bidin me, em ê jî bidin we. Em her tiştî bi dilsozî eşkere ji we re bêjin. Di vê mijarê de, em ji têkiliyên bi Tirkiyê re bigirin, hete di her mijarê de, em nakevin nav, çi ji rê

derketinan. Lê dema ku em soz bidin, ev ê çêbe. Yanê di vê baweriyê de, bila raya giştî rast zana bibe. Ger di raya giştî de biryarek, an jî nêrînek çêbe, pêwîst e çapemenî alîkarî bide vê. Wisa çavsorî, her roj dijûn, her roj wisa reş nêzî me dibe. Raya giştî pir germ e. Çewtkirina raya giştî, netewîperestî, înkar, dijminatî, dibe çi? Ev e, encamên ferasetên ku nayên fêmkirin. Ya rastî, ger çapemenî giraniya xwe deyne, di van xalan de mafdar e. Em ê van vekin. Hukûmet, giraniya xwe ya demokrasî deyne, serî li rêbazên derveyî şer nede. Gelek tiştên ne demokrasî hene ku, divê çapemenî jî li dij derbikeve. Em ê van vekin. Demokratbûnê ji çi kesê/î re nahêlin. Azadiya çapemeniyê bingeha demokrasiyê ye. Rast e, ew jî heye. Şertê vê yê herî girîng jî, dilsoziya bi rastiyan ve ye. Rastî weke ku heyîn deyne holê. Herî kêm yên herdu aliyan. Hayrî Kozakçıoğlu çi qas baxive, divê me jî bide axaftin. Ma ev ne pêdiviya objektîfbûnê ye? Mafê me jî yê ravekirinê heye. Ger azadiya çapemeniyê hebe, ger piçekê jî ji demokrasiyê bawer dikin, cihkirina kevneşopiya çapemeniyê, yanê wê vê nêzikbûna nû çapemenî karibe bigire ber çavan.

Huriyet: Lê, berê xwe bidinê. Bi paralêliya pêşkeftina têkoşîna we ve di çapemeniyê de teyîsandina bûyeran jî zêde dibe. Hûn heta par jî “nijdevan bûn.” Îsal hûn bûn “PKK’yî”, we “qetil” dikir, hûn niha “dikujin” yanê ev cudayiyên pir biçûk in, lê …

---.: Çapemenî di vê mijarê de sînordar e.

Huriyet: Pêşkeftin hene, bi mîsogerî hene.

---.: Lê pir bi sînor û bêrêgez hat. Neket nav nêzikbûnek hîn şarezatir de. Mesele ev pîvanên Rojava ne serwer in.

Huriyet: ...

---.: Çima nebe? Lê di her xalê de dibêjin em ê bigêhên Rojava, em ê bigihên serdemê. Di vê xalê de, çima ev qas hov û paş ve bimînin? Pirsgirêka demokrasiyê ye. Hinek din jî pêwîst e ku em vê mijarê vekin. Berî ku em bikevin naveroka mijarê, em ê hinekê vê nîqaş bikin. Wê ji neçarî ev nîqaş ber bi vê ve biçe: Rewşa van zilaman wisa ye. Wê me neçarî têkiliyên bi xwediyên rojnameyan re bike. Ev zilamên bi şert raportajan didin me. Weki din li ser çapemeniya xwe hinek pêkanînên wan, ne di wateya gefxwarinê de jî lê rewşek wisa heye. Ger sererastkina wê gengaz be, ma hûn dikarin çi bikin?

Huriyet: Niha binêrin, yê ku ev kamp dîtî ez im. Yê ku hevalên li Şamê dîtî ez im. Yê ku bi we re hevdîtin çêkirî jî ez im. Yanê derveyî çavdêriyên min. Ew mirov bêjin; “ev wiha bû, wiha dan, lê ev wisa ye, di vê de divê ev guhertin werin çêkirin”. Bi awayekî jidil ev ne gengaz e. Temam, îro pir zêde hêza me nîne. Lê rewşek wiha nabe ku derveyî tiştên ku me nivîsî, hin tiştên din lêbên zêdekirin.

---.: Na, ez wê nabêjim.

Huriyet: Bi mîsogerî ev nabe.

---.: Ez wê nabêjim. Ez ji bo cehwerê vê dibêjim. Ev gengaz e. Dikare wisa bibe. Ez di giştî de dibêjim. Ji bo ku herî kêm, ev pirsgirêk ji niha û şûn ve bi awayekî rast pêş bikeve û herî kêm bi pîvanên demokrasiya burjuva ve girêdayî bimînin, rewşek wisa mijara gotinê ye. Yanê me ev kir. Piştre min goti bû, em ê çi bikin? Em hin ji van kesan, naxin vir. Boykota hin rojnameyan. Wê bêjin girîng e. Di vê mijarê de, ev ê ji nîqaşekê re rê veke. Di vê mijarê de

hêzek me heye. Em dikarin boykotê pêş bixin.

Huriyet: Hûn dikarin pêş bixin, ew girêdayî we ye.

---.: Ez niha wê difikirim. Niha ev ê ji bo min bibe rêbazek pir bandorker. Mesela wê bibe rêbaza herî zêde em wundahiyan nadin û pêş dixin. Tenê ew jî na. Em ê hewl bidin ku herî kêm bandora gelek çapemenî û weşanên yek alî bidin sekinandin û bişkînin. Ev dikare ji encamên mezin re jî rê veke. Ev e, ez di vê xalê de difikirim, gelo herî kêm mirov dikare çi bike? Gelo lihevkirinek? Gelo herî kêm, em guftugoyek bi tendurûstî bidin destpêkirin, ma wê hîn nebaştir be? Li ser Ewrupa dibe, ji vir dibe. Em jî dê derfetekê amade bikin. Wê ji demokrasiyê re jî bibe xizmetek. Ez bi mîsogerî nabêjim jî, ji ber ku ev hevdîtinên me yên destpêkê, divê bikaribin ber bi wê ve herin. Wekî ku yêkîtî, wekhevî û azadiya gelan tê xwestin, çapemenî jî neçar e ku di vê xalê de tişta dikeve ser milê wê pêk bîne. Yanê bêberpirsiyarî, bitenê şaşiya hovîtiyê ye, min got bû; “wisa asî, wisa bê îman” û hwd dimokrasî pêşnakeve.

Heta 2000’e Doğru jî dinivîse, dibêje; “ger axa û firarên zagonî nebin, dewlet nikare li ser piyan bisekine”. Ma we xwend? Gelo ev rast e? Niha nebin ew tiştên ketî. Pir eşkereye ku xwe dispêrin wê. Ne yeke, li her derê wisa ye. Çi qas… Ji gelek aliyan ve îzole bû ye. Bi mîsogerî yên xilte (tortu), lûmpen û palpiştîn dewletê, tên rêxistinkirin. Dîktatoriya demokrasiya mezin û hinekê din mezin tevbigerin ku dişibê vê: Ev e, Yûnanan çawa Tirkiyeya serbixwe firekiribin, ji Rojhilat jî niha amadekariya rizgariya Tirkiyeya demokratîk tê kirin. Hema wisa ye. Em şerê rizgariya Tirkiyeya demokratîk didin. Ev ji merc kirina Tirkiyeya serbixwe hîn bi nirxtir e. Niha hinekê ev tê fêmkirin. Li Mêrdînê gel radibe ser piyan, dibêje, ji %99 ev Kurd, an jî rêxistina me ye. Xwezayî ye,

tiştek wisa ku partiyên din jî bikin lê nîne. Niha jî hinekî agirbest were pêkanîn, di rewşek referandûmê de wê ji %90 piştgiriya me bikin. Carekê bifikirin; erka artêşê, ji Bûcakan, li Sîwerekê dest pê kir. Hemû hêza xwe da pişta wan axan, tevî vê jî nikarî wê rewşê asteng bikin. Mesele hûn ji Mêrdînê dizanin, di referandûmê de ji %67 bû. Tişta ku ez dixwazim bêjim, li derên ku têkoşîna me heyî, li Sêrtê jî heman rewş derket holê. Hinekî terora artêşê rawest e, civakê li ser piya be. Axa…

Huriyet: Di rastiyê de hûn rast dibêjin. Ji ber ku di wê mijarê de, mirov hinekê milên wê yên zanabûn…

---.: Ma cerdevanî çî ye? Em ê axatiyê ret bikin. Li derên wekî Şirnex û Dihê axatî bi temamî hatiye tinekirin. Feqîr û gundî gelek piştgirî didin. Divê bi mîsogerî nişêt (belîrtî) li gora wê bê ayarkirin.

Huriyet: Ji bo vê jî, ji rojnameyan bawer nekin. Lê baweriya xwe bi nûçegihanan bînin. Ji bo vê ez gelek jidil im. Bi rojnameyan bawer nekin. Ji ber ku xwediyên rojnameyan, di dawiyê de rojnameyan boyax dikin… Yanê ji ber ku xwediyên rojnameyan karsaz in; di serê wan de, tuxîbên Mîsakî Mîllî hene. Hûn şerê rizgariya netewî didin. Teqez hêvî nekin ku zilamek wekî Erol Sîmavî vê fêm bike. Lê nûçegihanên ku mirov bikaribe bikarbînin, hene. Bi rastî jî mirovên gelek şirîn hene.

---.: Pêkan e, ez bawer dikim.

Huriyet: Kerwanê derewan. Xapokerên wê jî hene.

---.: Pêkan e, derewkarê wê jî hene. Teqez dizanim.

Huriyet: Di her komê de dibe. Di her civatê de dibe. Ev ji bo

çapemeniyê jî wisa ye.

---.: Dibe ev wisa bin.

Huriyet: Lê ev sal û nîveke em bi hev re rêve dibin. Tiştên ku min dîtîn, jidil ez bandor kirim. Ji ber ku di serê me de, rêgezên diyar hene. Em ê li gor wan rêgezan rojnamegeriyê bikin û pêwîst e em bikin jî. Ez tim wisa daxivim. Ev hevdîtina ku me bi we re çêkirî, ji bo me pir girîng e. Yanê dev ji Huriyetê berdin, ez bawer im Milliyet, û Cumhuriyetê…

---.: Her kîjan be, yê ku vê bike.

Huriyet: Yanê ev negirîng e, rojnameya ku tê çêkirin ne girîng e. Ji ber ku em dixwazin di mijara Rojhilata Navîn de kar bikin, ev qas. Ger ev hevdîtina ku me bi we re çêkirî, bê kêmasî bimeşê, têkiliyên me yên bi we re wê hîn baştir bibin. Heya min ji vê heye. Piştî vê mirov dikare bi rêxistinên din yên Kurdan re, rêze têkiliyan pêşbixe. Ev fikrên ku Huriyetê gotîne, ji bo em vê avantajê bikarbînin, hatin. Bê ku ez ji Huriyetê kûrûşekê bigirim, ez hatim vir. Em bi derfetên xwe hatin.

---.: Ez li  vir bêjim, mijar ne pere ye. Têkiliyên ku ez jî li vir pêşbixim, wê gelek tiştan li partiyê bide qezenckirin û xwe bide naskirin. A giring jî ev e.  Pir vekiriye ku bi mîsogerî rojname, bi hêzê radiwestin.

Huriyet: Yanê ez ê bêjim ku xwezika min qebûl nekiriba…

---.: Sedama herî girîng, a ku çapemenî di derbarê me de tiştekê diweşîne; heta tercûman jî bi nûçeyên wisa ve, pir rehet tengav dibe û  rewşa herî zêde raya giştî lê şiyar e. Rojekê dema ku

nûçeyek bi vî rengî bide, herî kêm wê rojê rewaca xwe (sürümünü) zêde dike. Ez bawer im hinekê jî ev heye. Ger têkiliya raya giştî ya bilind nebûna, van rojnameyan ev derfet nedidan van nûçegihanan. Pir eşkere ye. Yanê sansûra hukûmetê, bêsansûr nabe. Pirsgirêk; li şûna ku sansûr wisa bimîne, teqez xwesteka raya giştî. Her wiha rewaca (sürümü) rojnameyan vê pirsgirêkê her roj bi nûçeyekê dagirtina wan ve girêdayî ye.  Divê mirov vê nebêje. Mesele piştî vê raportajê, pêwîst e ev were nirxandin. Di vê mijarê de raya giştî pir şiyar e. Niha mirov bala xwe bidiyê, raya giştî di nav tevgerek mezin de ye. Tu nikarî vê tenê bi armanca bazirganî bigirî dest, bendewariyên wan jî hene. Bi kurtasî pirsgirêk, ji hovîtiyê (ilkel) rizgarî ye.  Heta ku dixwaze bila sermiyan (patron) li pirsgirêkê binêre. Sermiyan jî neçar in, fêr bibin ku bi hin rêgezan ve girêdayî bimînin. Nexwe, em ê jî bêjin, em ê şerekî pir dijwar bidin destpêkirin. Bi hêzek herî biçûk ve em ê gefan li bayiyan bikin. Em ê bêjin, hûn vê û vê rojnameyê nakirin. Em ê gef lê bikin û bi gefxwarinê ve herî kêm qasî ku ew ziyanê bidin me, em ê jî ziyanê bidin wan.

Huriyet: Hinekê zehmet e.

---.: Çima? Ma zehmetiya wê heye?

Huriyet: Yanê ziyana ku ew bidin we?

---.: Lê qasî ku bidin, dane.

Huriyet: Na.

---.: Dane, di vê mijarê de gelek bêberpirsiyariyên mezin kirin. Mirov dikare bêje ku, nêzikbûnên herî bê rêgez di vê xalê de

çebûne.

Huriyet: Hêza we ya pejirandinê, pir hêsan nîne. Yanê wê bifikirin. Bi wê re…

---.: Wê demê, ev qas bi dijminahî nêzikî me nebe. Ma em ê çawa bikaribin bi dostanî nêz bibin.

Huriyet: Ez dikarim bêjim ku hûn bidostanî nêz dibin. Ez dixwazim hîn jî bêjim. Lê belê ji yê din cuda.

---.: Temam, hemû nedost in. Yanê bigire gula min û li yê din bixe. Ger ku tu bidî, bide. Divê em jî hin tiştan bikin. Artêşa dijûna. Ma ev ê ji kê re xizmet bike? Qet. Sûdekê nade gel û demokrasiyê. Ji bo kêfa hin sermiyanan (patron) jî welê nabe. Em bêjîn, em ê ji niha û şûn ve tim bomba bixin bûroyan, wê çawa be?

Huriyet: Heyif. Ma hûn dizanin çawa dikevin tirsê? Jixwe ziravê hemûyan diqete.

---.: Em dizanin, hemû wê bimirin. Na, îro general hewl didin ku xwe biparêzin. Lê belê, ew ê xwe çawa biparêzin. Ew cerdevan dibêjin; “bila dewlet, me biparêze”. Ma niha wê dewlet kê biparêz e? Niha xala lewaz, li gel me ye. Niha me bingehê vê, xistiye walat. Em hatin rewşa ku bikaribin vê bikin. Em ê bixwazin ku hîn pirtir belav bikin. Yek, me got ku em ê cihên tûrîstan, sabote bikin. Hêj em nikarin biryarê, bêxin jiyanê. Wekî ku dewlet, di ziyan dayîna me de sînoran nasnake, em ê jî sînoran nasnekin. Jixwe me li ku bibînin, tine dikin. Dibêjin, me wiha çeka lavê dît. Dema ku kete laşê wî/ê nizanim wiha diteqê. Nizanim dibêjin, me çekên seyîr kirin. Em ê jî têra xwe, teqemeniyan bixin qutiyan û her roj bixin otêlekê, bixin

erebeyên tûrîstekê, em binêrin, bila biçe.

Huriyet: Kirina vêna pir zehmet e.

---.: Niha, me hîn vana nedane destpêkirin. Hîn nû, nû amadekariyên van têne kirin. Wê pêşveçûnên bingehîn, ji niha û şûn ve çêbin. Niha wê çi bibe? Yanê min şiyarî kir. Ger ev ser xwe ve neyên, heta niha ziyan çênebû. Ev şiyariyek e. Wê esas ji niha û şûn ve çêbibe. Yê heta niha şiyarî bûn, lê gelek amadekarî hene. Hukûmet jî gelekê jê ditirsê, diyar dibe. Ji ber ku ew rewşa şer dizanin. Kenan Evren jî pir baş dizane ku, li wir sê artêş ketine rewşa mişextê (sûrgûnê). Ev qas pere nizanim çi, bi hezaran qareqol tên çêkirin. Wekî ku ji tirsan, hemû ji hev de ketine. Niha nû bi nû pêşdikeve. Ma wê hîn zêdetir bibe? Min got bû; ev rêbazê cihê xwe bigire. Bi taybetî çalekiyên li ser van hedefên civakî, hîn pirtir dikare were pêşxistin. Niha em dixwazin ku, teşeyê têkoşînek hîn bi hemdemî pêşbikeve. Mesele divê dewlet navengeke polîtîk veke. Wekî ku Erdal Înonû dibêje; "bi rêyên demokrasî," wê demê di rêyên demokrasî de jî, jidil bin. Vê carê em wan jî naxinin. Ev qas mirin, em ev qas şehît didin, em ê ji bo çi van bikin. Em Ecewît û filan qet bernadin. Ger werin, em ê lêxin. Aram! Niha wê bê gotin ku ev hemû rêbazên nebaş in, rast e jî. Çareseriya demokrasî hebe, ger çareseriya siyasî dixwazin, wê demê divê hinekê durûst tevbigerin. Rewş di vê astê de ye. Rewşa çapemeniyê jî, parçeyek a vê ye. Belê, ev xal we derbas dikin. Lê em bêjin piştî ku we ev nivîs bir, bêguman dibe sûdê wê çêbibe. Dibe rewşek îstîsnaî, an jî ûltimatomek. Em bi vî rengî ne, rastî ev in. Em ê dubare ji vê re bersivekê bixwazin. Em ê binêrin rewşa neyînî berdewam dike, em ê jî hêdî hêdî çalekiyên xwe bixin jiyanê. Tiştên ku em ji bo çapemeniyê difikirim hene… Bi hevalan re hinekê bigerin, hinekê çêkerê nas bikin. Ji bo we derfetek baş e. Hûn ê bikaribin careke din

bi hev re baxivin, an jî nikarin. Wê pêwîst bike ku hûn hinekê bi van mirovan re baxivin. Ji min pirtir zanibin bi wan re sohbetê bikin û baxivin. Hûn ê cihê wan ê perwerdê çavdêrî bikin. Hûn ê hinekê lê temaşe bikin, sûda wê dê çêbibe. Belê, pêwîst e hûn jî hin tiştan ji me bigirin. Yanê ne ji bo rojnamê jî… Kesek divê tinê ji bo pîşe jiyan neke. Pêwîst e tiştên ku hûn ji bo xwe jî bigirin hebin. Yê ku wisa dikeve vir, teqez ez tiştekê nedime, ez xwe şoreşger nahesibînim. Ji ber ku heta çapemenî jî pêwîst e di xizmeta hin armancan de were bikaranîn. Yanê gotina çapemenî, ji bo çapemeniyê ye, ferasetek pir kêm e.(…)

(…)

76’an salên me yên derketinê bûn. Ber bi raya giştî ve. Di 76 û 77’an de, dera ku me gava xwe neavêtiyê, nebû. Huquq, siyaset… Bi taybet huquq, di bin avahiya siyastê de, cihê ku mirov pêlê neke nîne. Teqez pir kêm mirov hene ku di wê demê de min nasnekin. Ji ber ku ez serokê tevgera xwendevanan bûm, ji 74’an ve... Me dabû destpêkirin. Ew çi bûn? Çi ji wan dostan hat… Gelek ji wan walî ne. Yên ji dewra me mezûn bûyîn, gelek ji wan bûn qeymeqam û müfettiş…

Huriyet: ....

---.: Nasuh heye. Ew hebûn di hundir de. Lê lewaz man, pir xirab e. Lê çi qas bêjêhatî (yeteneksiz) derket in. Em ê van derbas bikin. Pir bêjêhatî derket in. Ma çima wisa kirin? Yanê ecêb, ma ev qas jî bê jêhatîne? Ma qet giyana şoregerî pişt xwe ve nahêlin? (…) Serde çûyînên li girtîgehan, gelek xiraptirîn e. Helwestek pir berevajî raberkirin. Ma pevkirin (uzlaşma) bû? Stû tewandin bûn? Wê rewşa van çawa be? Jixwe êdî ji nû ve meşa van xilas bû. Pir tariye.

Huriyet: ....

---.: Na, li Almanya qet tiştek wan nîne. Ez pir baş dizanim. Ez van nas dikim. Li vir gelek man.  Zilamên fizûlî (gereksiz)ne. Teqez netevger in. Hêza tevgerê ya ku heyî, ji bo berjewendiyên xwe yên kesî bikaranîn û bi mîsogerî xilas kirin. Li Almanya hêviya tiştek herî biçûk jî nedikirin. Min Taner Akçam, Ali Dayı û Îbrahîm Seven dîtin. Bi mehan li vir man. Rêxistina xwe xilaskirin û nekarin paşde vegerin. Li Ewrupa xwe tinekirin… Li Tirkiyê Tevgera ciwanan gelek lewaz e. (…) Ma çima rêberek dernakeve? Bi rastî jî di van mercan de zehmet e. Lê belê divê me bikaribûya, bikira… Faşîzma 12'ê Îlonê ciwan guhertin, ma ne wisa?

Huriyet: Muzîk, spor…

---.: Tim daye wan, ne wisa? Serwere ha! Lê belê, em zû bernadin.

Huriyet: Li Michael Jackson guhdar dikin. Dansê dikin, basketbolê dilîzin.

---.: Welê ha! Ev pir hatine pêşxistin ne!... Rastiya Tirkiyê fêmkirin ew qas nezemet e. Lê belê kirinek (uygulatma) bi zanabûn heye. Îslamgerî gelek hat ferzkirin. Bi Îslamgeriya sexte ve sê-çar sal dan wundakirin.

Huriyet: Tûrban û piştî wê…

---.: Ew sexten e. Îslamgerî, tarîqatgerî û jixwe di nava ciwanan de mînakên weke Adnan Xoce, ne rast in, hemû mijûlkirin bû. Di wê xalê de, divê hinekê bên rexnekirin. Hemû lîstik in. Di vê mijarê de hukûmetê karên mezin û lîstikên mezin lîstindin, lê

nikarin bi me bidin daqurtandin. Niha em ê hîn baştir biçin ser wan. Herî kêm em gihîştin wê astê ku, mirinê bigirin ber çavan, an jî dema ku diçin ser hedefa xwe; bêtirs bin. Pir girîng e, me nêvenga pasifisyonê, ya sedema xwe ji tirsê digire, derbas kir. Me mirovê ku her kêlî dikare biçe mirinê rakir ser piyan. Yanê ya me, em ê ji niha û şûn ve têkevin tevgerê… Demên çewisandinan, yên awarte neçare ku çareserker derbas bibe. Di heman demê de, me nefes girt. Kêlî bi kêlî me hewl da ku, em li vir kar pêşbixin. Pir, hem jî hîn zêde, bi têkoşînek qiran bi qiran. Ji têkoşîna me ya ku ji 80'an ve me di navbera xwe û rejîmê de bilind kirî, egera derkêtina rejîmê bû.